



# ZEND

ZIVISTAN-BIHAR 1997  
Sal: 2 Hejmar: 2 Buha: 250.000 TL

Di Kurmançî De  
Guherîna Dengan  
■ ZANA FARQÎM

Arşeyen  
Diroknivîsına Kurdi  
■ MEHRDAD IZADY


Ava Welatê  
Bêkwedî  
■ FELAT DILGEŞ

Bi Zarawayen Xwe  
Ve KURDİ  
■ TORÎ

Derheqê Kirmançî  
(Kirdkî) De  
Kombiyayışe  
II. Ê Stockholmî

Dî Dema Selçukî û  
Osmaniyan De Ji  
Diroka Kurdistanê  
Dîmenek  
■ ŞAREZA AVER


Bi Hunermend  
Muhammed Salayı  
ra hevpeyvin



*Ji bo*

# İSMAIL BEŞİKÇİ

Ji Komela Mefêن Mirovan (İHD) Kampanya



Ew hîna li warê  
tariyê bi pênûsa xwe  
ya ji hubra roja  
zanînê li ser rûpelên  
spî wênenê mirovahîya  
azad çêdike.

Ji bo azadiya ramananî, bi  
îmzayek xwe piştgiriya bi İsmail  
Beşikçi ra peywirek mirovî ye.

Pêşveçûnên li dinya zanînê roj bi roj zêdetir dibin. Kopyakirin û bi qasî sî salî ci-wankirina zindîyan jî êdî ji xeyalbûna derketin rastiyê. Zanînê jî civakêni mirovan li gor berjewendiyêni xwe yên çînî, komelî û netewî bi kar tînin. Talûke ji vê niqtê derdikeve. Eger bi awakî giştî zanîn bikeve xizmeta mirovahiyê wê gavê ew dê li ber xweşî û geşîya li cîhanê awayê nû biafirîne. Mixabin rewşa cîhanê ya îro ji vê hêj pir dûr e.

Wekî welatê me, îro li sedan herêmên dinyayê şerîn qirêjî bi hêzek xurt dewam dikin. Ji gelek deverên dinyayê, mirov ji bo kuştina mirov, ji ber sebebêni cihêreg, ci ji dest tê dike.

Zanyarêni welatêni pêşveçûyî li peykêni planetêni cûr bi cûr li şopêni jiyanê digerin. Li aliyê din ramyar û rayedarêni van welatan ji ber berjewendiyêni xwe yên çînî yên qirejî, ji bo ku dawiyê li jiyana li dinyayê bînîni bi ceribandinêni çekêni xwe yên nukler û kîmyewî ketine pêşbaziyek famkirina wê gelek dijwar e. Daristanan ji holê radikin. Bi parsenga (mêzîna) sirûştê dilîzin. Bi ser gelek welatî da bi dawîna panêni xwe baranêni asîdê dibaŕînin. Yêni ku dixwazin sirûştê biparêzin jî tewanbar diyar dikin.

Li welatêni Rojhilata Navîn, Amerîka Latîn, Afrîka û Asyayî bilêvkirina dadmendî û mafêni mirovan bûye tewanbariya cezakirina bi mirinê. Bazirganiya esrar, eroîn û hwd. êdî ji alî dewletan ve tê kirin. Li Tirkîyê çete bûne birêvebirîn dewletê. Dengê marş û diwayêni tu têkiliyek wan bi pêşveçûna zanîn û mirovahiyê ra nemaye mîna ewrêni barana asîde li asîmanê Tirkîyê û gelek welatêni paşdemayî digerin. Bi gotina helbestvan Ahmed Arîf, lingekî me li dema atomê, yê din hêj di çarixa xam da li berxwedide. Xelk û alem ketiye çerxa zanînê, li asîmana li cihêni jiyanê digere, ên me hîna li ser rengen xwekujiyê helbestêni mîrxasiya xwe dinivîsin.

Gelê ku ji zanînê para xwe negire, nikane xwe di cîhana şareza da bijîne. Di çare-nûsa wî da ji xeynî berdestî, xuilmîti û bindestiya welatêni pêşverû wê da tu tiştek nîne. Aliyekî herî grîng ê ku mirov ji sewalan qediqetine yek jî zanîna mirov e. Ji bo gelê me jî ev rastî her ku diçe zêdetir xwe dide der. Pêwîst e em jî, ji meywêni dara zanînê êdî para xwe bigirin.

Nivîsêni nivîskarêni me Mehmet Bayrak, Cemil Gündoğan, Ismet Cherif Vanly û İsmail Göldâş, ji ber gelşen wergerê negîhiştin vê hejmarê, em dê di hêjmara sisîyan da biweşînin.

Li ser bîryarêni Konferansa Stokholmê ya ku li ser çareserkirina gelşen rênûsi yên kirdî hatibû lidarxistin, bi xeletî, bi navê Cemil Gündoğan hatibû weşandin. Ji ber vê çewtiyê em ji beşdarêni vê konferansê û xwendevanêni xwe lêborîna xwe dixwazin.

Di vê hejmara Zendê da jî, li ser xwastina gelek nivîskarêni me, me nivîs redakte nekirin, çawa ji me ra hatine şandin me weha di kovarê da bi cih kirin. Li ser rênûsa kurdî xebata me dewam dike. Piştî qedandina vê rênûse em dê nivîsan redakte bikin. Bi yekrengiye rênûsi ya nivîsaran em bawer dikin, zimanê kovarê dê sivilistir bibe.

Di vê hejmara Zendê da, me beşê agahiyêni ji dinya zanînê û beşê namêni xwendevanêni li beşen heyî zêde kir. Em dixwazin xwendevanêni me bi zimanê xwe yê maderî jî, ji bûyerêni li dinya zanîne deng didin haydar bin.

Di dinya kurdî da, tenê ZEND kane we ji hemî beşen zanînê haydar bike. Divê neyê jibîrkirin ku bi zimanê maderî xwendina nivîsarêni zanistî xwedî tameke zaf cihê ye. Ji ber vê yekê, daxwaza me ji her xwendevanekî me ew e ku, Zendê bi hevalekî xwe jî bide standin û bide xwendin. Heke, hûn çîqas li kovara xwe xwedî derkevin, em dê kanibin ewqasî qalîta kovarê ji her alî ve baştir bikin û bigîhînin destê we.

Heta hejmareke nû bimînin di xweşiyê da.

**RAİF YAMAN**

Kovara sê mehî ya lêkolîn û  
lêgerînên zanistî  
(Üç ayda bir yayınlanır)

Li Ser Navê Mezopotamya  
Basın Yayın A.Ş.  
**Xwedî:**  
Yıldız GÜLTEKİN

**Gerînendê Giştî yê Weşanê û**  
**Berpirsiyara Nivîsaran**

Zeynep YAŞ

**Lijna Weşanê:**

M. Şefik BEYAZ,  
F. Huseyn SAĞNİÇ,  
Felat DILGEŞ, Edibe ŞAHİN

**Cihê Kargeriyê:**

İstiklal Cad. Turhol Han  
No: 373 Daire: 2  
Beyoğlu / İSTANBUL

**Navnîşana Kovarê:**

Atatürk Bulvarı.  
Ceylan Palas Apt.  
No: 154/12 Aksaray  
**Tel:** 527 19 11  
**Fax:** 527 61 49

**Çapxane:**

Ceylan Matbaacılık

**Sala Weşanê:**

Payız 1996


Zend Dergisi Mezopotamya Basın Yayın A.Ş'nin  
Bilimsel Araştırmaları yürüten Aksaray şubesinin yayındır.

**BUHAYE İLANE**

Berga dawîn aliyê der: 100 milyon TL. Hundire  
berga pêşin û berga dawîn: 75 milyon TL.  
Di nav kovarê da tam rûpel: 50 milyon TL.  
Di nav kovarê da nîvrûpel: 25 milyon TL.

Agahiyêni Ji Cîhana Zanînê .....	3-8
Xewa Zivistanê	
<b>S. MENON</b> .....	9-10
Jawa	
<b>MEHMET DEMİR</b> .....	11-13
Hêza Ku Sînor Nasnake AFIRANDIN	
<b>Didem SANYEL (Kovara Bilim ve Teknik)</b> .....	14-19
Matematika Duyatî	
<b>LAURIE GRACE</b> .....	20-21
Çend Nivîsraw We Belgeyi Zimannewanî Dewranî Sasaniyekan	
<b>EHMED ŞERÎFÎ</b> .....	22-25
Arîşeyen Dîroknivîsîna Kurdî	
<b>MEHRDAD IZADY</b> .....	26-34
Dî Dema Selçukî û Osmaniyan De Ji Dîroka Kurdistanê Dîmenek	
<b>ŞAREZA AVER</b> .....	35-43
Hinek Noten Li Ser Metoda Dîroknivisiya Kurdan	
<b>M. CAN YÜCE</b> .....	44-48
"Zulûm 38 û Ra Dima Kî Kêm Nêbî"	
<b>MUNZUR ÇEM</b> .....	49-56
Ava Welatê Bêxwedî	
<b>FELAT DILGEŞ</b> .....	58-65
Hunermend Berpirsyar e Belam Lîre Kesî Le	
Hunermend Napirsêtewe! .....	66-77
Nirxandina Edebiyatê	
<b>LOKMAN POLAT</b> .....	78-83
Pêwîst e Di Xewn û Xeyalên Hunermend	
Da Afirandêri Hebe .....	84-86
Di Kurmancî De Guherîna Dengan	
<b>ZANA FARQİNÎ</b> .....	87-91
Çend Gotin Di Warê Rêformkirina Alfabêta Kurdî Ya Lañînî De	
<b>I. NASSO</b> .....	92-93
Derheqê Kirmancî (Kirdkî) De Kombiyayışê	
II. Ê Stockholmî .....	94-97
Alfabê û Rastnivîs	
<b>HÜSEYİN KARTAL</b> .....	98-103
Bi Zarawayen Xwe Ve KURDÎ	
<b>TORÎ</b> .....	104-110
Namên Xwendevanan .....	111-112

# *Li hemberî kanserê gena P53*



**G**ena P53 ya di lêgerînên kanserê de bi navê ‘super star’ tê naskirin enzîma ku huçran ji



nexweşiyê diparêze diafirîne. Ji sedî 60 bûyerên kanserê ji ber nexebitîna gena p53 derdi-kevin holê.

Zanistên ku li ser qanserê lêgerînan çêdikin, bi salan xeyalên xwegihandina kana nexweşiyê kirin. Dema ku kanbihata dîtin, dê berê bombardîmana dermên bidana serê û bi vî awayî dê hêviya xweşkirina vê nexweşiyê bihata dinê.

Bi dû lêgerînen bi salan, komek zanistên DYAyê biryar dan ku tewanbar genek bi navê p53 ye. Li gor vê, heke p53 bê nexweşî be, li dijî qanserê di huçrê de hînbûnê derdixe holê

CURÊN QANSERÊ	ROLA GENA P53	DI SALA 1995'AN DE SEDEMÊN MİRİNÉ
Mejî	%50	13.300
Sîdîk kesesi	%35-60	11.200
Sîng	%30-40	46.200
Malzarok	%90	4.800
Kolon	%40-70	47.500
Losemi	%60+	20.400
Keseba reş	%110-65	14.200
Kezeba sor	%50	157.400
Lenf	%30-35	24.150
Gun	%40-60	14.500
Zik	%30-30	14.700

û rê li ber bûyînâ huçrên bi nexweşî digire. Lî belê gena p53 tunebe, neşuxule an jî ji alyî hinek molekûlan ve hatibe hepskirin wê demê hûcre li hember qanserê têk diçin.

Li gor bijîsk Bert Vogelstein ku di Navenda Bijîşkiya Howard Hughes de, ji sala 1989'an ve lêgerînên xwe yên li ser vê mijarê didomîne, p53 di bûyîna 52 cûrên qanserê yên ku têz zanîn de an bi rasterast an nerasterast rolekê dilîze.

P53 cara yekem li Zankoya Princetonê di sala 1979an de ji alyî Arnold Levin ve hat dîtin. Ji ber ku demek dirêj jî bi dehan genênu kudibin sebeba kanserê yek hat dîtin, gelek li ser sekinandin. Di sala 1989an de dema ku Levine û Vogelstein îspat kirin ku di vê gena han de hêza qedandina tumoran jî hêye, her tişt guherî.

## ‘Stêra Super’

Gena p53 ya ku îro nêzîkî 2 hezar zanyarî li ser dixebeitin û di derbarê wê de 5200 lêgerîn hatine weşandin, di lêgerînên li ser qanserê de bû ‘stêra super’. Vê genê ji niha sê sal berê, xelata kovara Sienceê ya “Molekula Salê”, ku bi navê “Oscara dinya zanînê” tê binavkirin, girt.

Di huçrên saxlem de, hejmarâ wan kêm be jî, tim protêinên p53 hene. Dema ku hucre rastî radyasyonê an jî bi maden kanserojen bê dikeve alarmê û stoka p53 zêde dike. Heta ku xesara huçrê diqede p53 bi sekinandina mekanîzma zêdebûnê rê li ber belaybûna kanserê digire. Gena ku bi vî awayî hucre kanserî diceimidîne, yek caran jî mekanîzma xwekujiyê li kar

dixe, hucrê bi temamî ji holê radike.


Aaghâ tê dayîn ku sebeba se reke ya ji %60 bûyerên kanserê ji xerabûnê gena ku proteînê p53 çêdike ye. Di ser de di nav 2362 'herfêن' kîmyayî yên ku genê çedîkin de, heke (madê A, T, G û C) 'çewtiyek rênûsi' bi awayekî derkeve holê, derbasî zarokan jî dibe û dikare bi nifşan rîska qanserê ne hêle.

Heta di rewşek weha de ji da-yik an jî bavê genênek yekî saxlem bin jî, kêt nayê. Genê xera-be dikare bikeve hucrên kifşe, an jî heke bikeve lingekî ji lingênen ku proteîna p53ya pêk tîne û ya dimîne qurdelê jî dikare enzîmê ji kar bixe.

■ Rojê Civak

## Krîza dil ji talikan bez dike

Pisporan diyar kirin ku divê kesênu ku emrê wan di biniya



Calum Clark

55 salî de ne û qismekî porê wan weşiyaye dilê xwe bi-parêzin. Di kovara Yêkitiya Bijîşkiya Amerîkan de li gor lêgerina lêgerên Zankoya Bostonê ya ku li ser 437 zilamî hatiye kirin diyar bû ku rîskê krîza dil ji bo talikan ji %40 zêdetir e.


## Tu carî canê Calum naêse

Trenek ku bi şida diçe xwe jê davêje, li ser êgir xwasî di-meşe, ji dêvla ku di derî de derkeve tercîha xwe, ji aliyê ku xwe di pencerê re bavêje dike û gava van hemû tiştan dike jî tu carî canê wî naêse. Ji ber ku nexweşîya alerjîk a ku bi serê Calum Clark de hatiye, canê wî êşê his nake. Di bijîşkiyê de navê vê nex-weşiyê "intolerance Attention Deficit Hyper Disorder" e. Piştî ku bi vê nexweşiyê ketiye heta iro nêzîkî 50 qeza hatine sérî. Rojekê di qe-zayeke trafikê de serê wî di-

qelişê û gûzika lingê wî di-şikê. Dema ku ew wekî ku qed tiştek nehatibe serê wî diçe bi topê dilîze, nexweşîya wî derdikeve holê û li Ingilîstanê dibe babeta rojê. Dema ku zarok dibin teda-wiyê tê dîtin ku ev di dinê de nexweşîyeke sêrek e. Li gor gotina bijîşkan, yên ku bi vê nexweşîya alerjîk dikevin bi rehetî dikarin xwe bavêjin her tehlukekê. Dema hisa mirovan ya êşê ji holê radi-be, li hemberî tehlûken xwastina têkoşînê zêdetir di-be.

## Sûna hêşra cam dibare

Ji çavên keçikek piçûk a Lub-nanî ya bi navê Hasna ya ku ji çavên wê ji dêvla hêşiran ve perçen caman têن xwarê bala dinê kişand ser xwe. Wezîrê Parastinê yê Suudî Erebistanê, Emîr Bîn Abdûl Azîz, hemû mesrefen teda-wîkirina vê keçika 12 salî girt ser xwe. Li gor nûçeyen televîzyona Lubnanê, ji bo ku Hasna Mîslîmanî li Suudî Arabîstanê bê tedavîkirin, komîsyoneke bijîşkiyê bi balafireke leşkerî çûye Lub-nanê. Ji 6 mehan virde ji çavên Hasnayê ji dêvla hêşiran ve weke nîşkan û carna jî weke hebên pelqanan parçen caman têن xwarê. Vê yeka balkêş hema bala hemû televîzyonên dinê kişand ser bû-yerê. Lê sebeba vê yekê hêj nehatîni.



## *Robotê jêbatî*

Hondayê diyar kir ku pişti xebata xwe ya deh salan, robotekî dimîne mirovan, bi pîlan tê xebitandin, metro û heyştê santîm dirêj û 210 kilo giran e, çêkiriye. Ev robotê jêhatî yê ku dimîne astronotan dikare bê ferman bi tena serê xwe gerek karan bike.

## *Di şeran de 2 mîyon zarok mirin*

Li dinê di deh salên dawî de, di şeran de ji 2 mîyonî bêtir zarok mirine. Nûnera NY

Graca Machel di daxwîyaniya xwe ya ku li bajarê Santagoyê di navenda UNICEFê da got ku, li gor agahiyê fermî yên gihîstine Netewên Yekbûyi, di lihevxitinê li herêmên cûr bi cûr ên gerdûnê derketine de ji 2 mîyonî zêdetir zarok mirine, bi qasî sê qatî vê hejmarê jî birîndar bûne an jî seqet mane. Machel da diyarkirin ramana wê ew e ku ev statistikên fermî ji diyarkirina rastiyê dûr in. ■ Rojê Civak

zeryayek bi qasî 90km. yî kûr heye. Navgîna fezayê Galileo di berfanbara 1995an de gihîstibû Jupîterê û dest bi gera xwe ya li dora planetê ya du salan kiribû. Heta niha 16 peykên Jupîterê hatine keşfîrin.

■ Raif Yaman



## *Li peyka Jupîterê hêviya Jiyanê*

Li gor texmînê zanyaran gengaz e ku li peyka Jupîterê ya bi navê Europa jiyan hebe. Wênen pêşîn ên ku ji alî navgîna fezayê ya di sala 1989an da NASAyê ji bo li ser sistêma roje lêkolînan bîke şandibû fezayê digihê komputerê NASAyê. Di nav dîyardênu ku bi zanyaran didin fikirandin ku li peyka Europa jiyan heye, li peykê têra xwe hebûna av û germeye. Navgîna NASAyê dest bi şandina wênen peyka Jupîterê yên zeryayêni bi tebaqê cemedê yên stûr ên dagirti kir. Tê texmînkirin ku di bin van tebaqê qalind da jînek mikroskopîk heye. Peyka planeta Jupîterê Europa cara pêşen di 1610an da astronomê İtalyan Galileo Galilei kişf kiribû. Tê texmînkirin ku li peyka Jupîterê Europa ku ji heyyê hinekî piçûktir e,

## *Kopyakirina Genan “Bomba li ber Teqandinê*

Ji alî zanyarêni skoçî ve bê sperma mîr ji hucren çîcikan bi metoda “kopyakirina genetîk” di laboratuare da çêkirina mîyekê hema bala hemî zanîn û şaxê zanînê kişand ser xwe. Li gor teoriyê gengaziya rastiya “kopyakirina mirov” rî da reaksiyonên cihêreg. Li Skoçayê li Enstituya Roslin na Zankoya Edinburgê bi genan leyîstinê derxistina kopya mîyekê ji alî serokê Şaxê

Bingehînê Hîstolojî û Embriyoljîya Fakulta Bijîskiya Zankoya Selçukê Prof. Dr. Refik Soylu ve “heta bê bi tehlûke” hat hênanandin. Prof. Dr. Soylu zanîna gen şiband “kêrek her du aliyên wê tûj” û weha got: “Gengaz e ku ev şaxê zanînê di destê mirovên dilxirab da bibe çekek bi tehlûke.” Soylu da zanîn, ew bi hêvî ye ku dê bi vî awayî nexweşiyêni ji ber genêni xirab bi bûyîna mirov ra derdi kevin holê ra çare bê dîtin, lê ew bi guman e ku dê ev yek tenê bi vê nemîne. Prof. Dr. Soylu “Heke teknozanîna gen bikeve destê mirovên dilxirab dê di mirov da guherînê xirab bêñ dîtin.” û weha dewam kir: “Bi vî awayî bi girtina kromozomên genêni nexweş, mirov kane piraniya nexweşiyêni genetik xwes bike. Lê hûn nikinan rê li ber bi armancêni cihêring bikaranîna vî metodî bigirin. Hinek jî kanin vî metodî ji bo bikaranîna mirovê îdeal e kû di serê xwe da çekiriye bi kar bîne. Afirandina mirovên dimînin hev û yekreng tê wateya mudaxelekirina mêtzîna sirûştê. Teknozanîna gen, li gel xirabkirina mêtzîna sirûştî, tehlûka wê ya xirabkirina mêtzîna civakî jî heye. Ji ber ku jinek bê mîrekê kane bibe xwedî zarak. ■ Raif Yaman

## Zimanen Li Ber Candanê

Zimanzanê alman Martin Haspelmath di nivîsa

xwe ya di rojnama Mother Tongue da hatiye weshandin da iddîa dike ku ji %90 ê 7000 zimanen li dinê tên axaftin li ber wendabûnê ne.


Ji nîvî bêtirî 15000 zimanen ku di domana dîrokê da ji alî mirovahiyê ve hatine bikaranîn, ji holê rabûne. Konseya Ewrûpayê ji bo parastina zimanen mîna iibrânî di rewseke bi tehlûke da ne bernâme çêkirin.

Zimanê iibrânî yê ku pêsiya Şerê Cîhanê yê Duwem (şerê di nav ber alman û cihûyan da) 8 mîlyon cihûyen Ewrûpa Navendî û Ewrûpa Rojhilat pê diaxivîn, iro tenê ji alî 2 mîlyon mirovî ve tê têgihîştin. Ji ber ku ziman êdî nikane xwe di nav derdorêñ laik da bide jiyandin, edebiyat û çapemeniya iibrânî di têkoşîna hebûn û tunebûnê da ne. Em werin ser zimanê çaxatay, ew êdî tenê ji alî Mexsûd Şefigî (monologue-bi tena serê xwe) yê 62 saliyê hemwelatiyê Kazakistanê ve tê axafatin. Ev ziman di sedsala XIII dan da, ji bo yekitiya împaratoriyê ji alî Cengîz Xan ve ji tevlîhevkirina zimanen tirkî, mögolî û kazaxî hatiye çêkirin bi tîpêñ erebî tê nivîsandin. M.Şefigî ji bo her tişt wenda nebe, lê dixebite ku ferhengeke du zimanî ya kazaxî û çaxatayi amade bike.

*Science et Vie  
Ji fransizî: Raif Yaman*

## Wêrankirina Welatê Asûriyan

Ev pirtûk di sala 1996 da derket. Jî 390 rûpelîn pêk tê. Bihayê wê: 35 Cuneyhê Sterlinî ye. Pêşengêñ hêzên devletên (dugel) rojava (Ewrop) di destpêka sedsala nehan da û di destpêka de û di dema Şerê cîhanê yê yekemîn (1914-1918) da ketin rojavayê Erebistana



Îslamî. Di wê gavê da desthilatiya xwe li ser Iraq û Şamê pêk anîn û bandora xwe li ser Misirê jî bî hêz kirin. Hukm û fermandarîya wan heya El-Cezîrê (Mezopotamya) dirêj û fireh bû. Têkoşîna wan a bazirganî, ramyarî, sîxurî û çandî ji têkoşîna leşkerî derbaz bû, bêhtir li pêş ket. Girîngiya xwe da nîşan

dan. Vê pêşketina ku bûbû sedema destavêtina wan a dewleta Osmaniyan û belavkirina wê ji bo karên wan ên leşkerî yên girîng hêsanîyek bi xwe ra anî. Ewrûpî bi navên cûr bi cûr dihatin rojhilat; mîna lêkolîn û lêgerîna li ser berhemên kevnare ji têkoşîna wan a ramanî û leşkerî girîngtir xwiya dikir; wan Iraq û hwd. jî ji berhemên giyanbiha vala û rut kirin; ev berhem ji şaristaniya bajarêن Dîcle û Firatê dihatin hesibandin û pejirandin. Naveroka pirtûkê di derbarê xwastina Ewrûpiyan a li ser lêgerîna welatê Asûriyan e. Ev pirtûk dizin û talankirina berhemên bajarêن Asûriyan diyar dike. Dibêje: Mûzeyên paytextên Ewrûpiyan ji van serwetên hêja tije bûne Ev pirtûk bûyerên di navbera 1940-1960 da vedişêre û dixwaze ku gengeşî û hewldanêن barkirin û warguhestina Ewrûpiya û bitaybetî jî ji wan yên ingilîz bide xwiyakirin. Beşa yekemîna pirtûkêl, jiyana lêkolînerên herî pêşîn pêk tê. Mîna Awustunhenriliybert, û dîsa di vê beşê da rewşa lêkolîna serayên xwe bi berhemên hêja yên kû paşa û mîrekên wê herêmê yên berê ji mêj da şemirandibûn, û hinek caran jî, ji bo hêsanîya hebûna wan a ramyarî û leşkerî bû. Lêbelê wan lêkolîneran bi vî navî gelek agahiyêن

girîng bi destxistin, û gelek bingehêن berhemî yên veşartî, ji bîrkirî an jî nediyar dîtin. Bi pişkaftina nivîsarên bizmarî ra rastî gelek teyresan, kundeyên gelên kevnar; rîzname, destnivîs û rezên (kevneşopî) wan hatin. Bi vî awayî pirtûk xaleke dîrokî ya hêj hêja-


tir jî diyar dike. Hinek bûyer û dîrokêñ wenda-bûyî derdîxe holê.

*Lêkolîna li Welatêñ Kevnar  
Nivîskar: Mogens Trolle Larsen  
Weşaner: Routledge  
11 New Fetter Lane  
London E.C4P 4EE, U.K  
Kovara El Aalem  
Ji erebî werger: M. Reşit IR-GAT*

## Qansor Bû Dermanê Şewatê


Hûn mirovekî nexweş bin; ba ketibe jûniyêñ we, cangiranî bi we ra hebe, li ser zimanê we pizrikek derketebe, bi ser da jî dûmana cixarê roj bi roj kezeba we reşîr bike, birîn û nexweşiyêñ we her roj yeke din li xwe zêde bikin, nalînêñ we bigihêñ erd û asîmanan û tu bijîşkek nikanibe ji hawara we ra bibe derman, hûn dê çi bikin? Hûn vegeyîr gundê xwe. Baweriya we tenê bi dermanbûna giya û kulîkîn derdora we mabe, hûn dê li her rehekekê bi çavê dermanekî nenihêrin? Mehmet Sîddîk Bayram mirovekî weha bûye. Pişti çûyîna gelek bijîşkî, hêviya wî ji bijîşkan qut bûye. Bi gotina wî “wan ew terkî mirinê kirine”. Li kîjan giya û kulîlkê dinihêrê tê da dermanekî dibîne. Rojekê li zozanêñ gundekî bi navê Hesen Ebdal ê ku li ser Erçîş a Wanê ye, rastî giyayekî tê. Pelên vî giyayî dike devê xwe û dicû. Pişti cûtinê dema ku dibîne ku cangiraniya wî kêm dibe, êdî dev ji vî giyayî bernade. Xwe diavêje bextê sirûştê. Li hinek deveren herêmê ji vî giyayî ra qansor, li hinek deveran jî qanok tê gotin. M.S.Bayram şîrê spî yê vî giyayî dike nav rûnê nivîşk û pê ra li nav hev dixe, jê dermanekî dimîne merhemê çêdike. Vî dermanî dide ser birînêñ şewatê, dinihêre ku bi dermanê wî birînêñ herî xedar jî di heftekî da xweş dibin û tu tiştekî wan namîne. Dibe dermanê xwe bi dermanzan û bijîşkan dide naskirin. Li Fakulta Bijîşkiya Zankoya Stenbolê Prof. Dr. Dilek Selçuki encama lêkolîna li ser vî dermanî bi raporekê diyar dike û kopyake raporê jî dide xwediyê dermên. Di raporê da bi kurtî tê gotin ku ev derman birînêñ herî xedar û yên di derenca diwem da ne jî, dema ku di rojê de carê bê bikaranîn xweş dike. Hêj nav li vî dermanî nehatiye kirin. **Raif YAMAN**

## Niba Jî Mirîşka Qarîtkî



Lêkomînerên skoçî dema bi metoda kopyakirina genetik, kopyakirina miyê bi serketin pêkanîn, di vî warî de bala cîhanê kişandin ser xebata lobaratuaran. Nûçeyek din a ji Yékitiya Dewletên Yekbûyiya Amerîkî jî di nav zanyarê wê derê de bû sebeba matmayînek din. Li bajarê San Diego zanyaran hucren embriyonîk ên cûda ji giyandaran girtin, di mêtîyê giyandarekê de gihadin hev. Di Enstîtuya Norobiyologiya Zanyariyê de, pispora norobiyologiyê Eban Baleban parçekî ji hucren deng ên qarîtkê di mêtîyê mirîşkê de bi cih kir. Niha mirîşk wekî qarîtkê serê xwe dihejîne û wekî mirîşkê deng derdixe. Lêkolîner Eban Balaban dibêje: "Ji bo serhejandin û dengderxistina qarîtkê ji hucren cihêreg dengderxistin û pêhesinê her yek ji wan bi serê xwe dikarin bêñ guheztin û gelsek di vî warî de tûne ye. Xebafêن Eban Balaban di Akademiya Zanyariya Netewî de, 12 salan hatîne weşandin û pêkanîn. Hêk

û bergirtina hêka qarîtkê 48 saetî di kurkitiyê de dihêle. Di wan hêkan de qulikên piçûk vedike ji goştperêyên wê hêkê celeb celeb hucreyên mêtî digire. Ji wan hucreyên ku ji hêka mirîşkê girtine hinekan di nav hucreyên mêtîyê qarîtkê de bi cih dike û li benda derketina çêlika mirîşkê dimîne. Ji bo ku tevger û lebitandinê wê çêlikê bibîne 14 rojan dipê. Di pişt re zanyar Baleban, li ser mêtîyên mirîşkên mirî, lêkolînen xwe dimeşîne. Tu gizekî xebata Eban Baleban, operasyona berx a Skoç-yayê, hem jî guheztina embrîoyên (Goştper) qopyakirina meymûnan li D.Y.A yê tuneye. Baleban dema ku li ser vê mijarê agahiyê dide raya cîhanê, dibêje: "Li ser mirovan bikaranin û serkeftina me ya xebata di warê lêkolîna li ser guheztina hucreyên gîhandaran de, ne mumkûn e. Hem jî lêkolînvan Baleban dibêje; mirov ji bona xatirê tevgeren xwe



yên fizîkî û bedenî, guman dikin ku kêmasyîwan ên cûr bi cûr guheztinê hucreyên mêtî em bidine rastkirinê. Ew hucreyên ku em dixwazin di mêtî de bidine bi cih kirinê, ew bi girîngî hinekî hucreyên kimyayîidine hewandin. Baleban dibêje: "Em ji bo tevgereke ku di mêtî de winda bûbe nikarin hinekî dezgehêne tayîkan bidine bicikhîrinê, lê bi tenê armanc ji xebatêne me yên guheztinê hucreyan ew e ku em wan besen ji tayîken mirî, bidine lipitandinê. Kesên zanyar, di xebatêne xwe yên genetikî de dixwazin ku wan hucreyên di mêtî de mirine bilipitînin; vê ji bo xwe dikan armanc.

■ Celadettin Yögler

## Miya bi gena mirov di rê de ye

Bi serkeftina hilberîna qopyakirina genetikî ya miyê, zanyarê skoçî, niha jî bi tevlîkirina genêni mirovan ji bo miyek ji genêni xwe amade dikan. Di pêkanîna qopyakirinê de, lêkolîneren Enstitûya Roslinê û şirketa PPL yê di pêşveçûyinê xwe yên xebatêne hevbes de, ragihandin ku hetanî dawiya vê salê wê çelekekê bi genêni qopyayî bidine zayînê. Hem jî lêkolîneran, di serkeftina guheztina genêni cihêreg de, çêkirina kopayan di vê salê de ragihandin.

■ Celadettin Yögler

# XEWA ZIVISTANÊ

**S. MENON, DISCOVER, BERFANBAR 1996**

Werger: Hasan Kaya

**B**iyologên ku di derbarê xewa zivistanê de lêkolîn çêdikirin, heta demeke nêzîk, li ser zindiyêن bakurî rawestiyabûn. Niha jî lêkolîner, xewa zivistanê ya heywanên bi guhan ên başûrê Ekwatorê vedikolin.

Heta demeke nêzîk, dihat zanîn ku bi tenê li nîvqada bakur heywan diketin xewa zivistanê. Belê, van deh salêndawî li ser heywanên bi guhan ên ku li başûr dijîn hinek xebat û lêkolîn çêdibin û agahdarî têne tomar kirin. Mînakak ji vê xebatê semasiyê ciyyayî yê 20 cm ye. 2000 ji van semasiyan ji bo lêkolînê, li bilindahiya 1500 mt ya Alpê Avusturalyayê hatine danîn. Cihê ku lê hatine danîn xirabcih zinar û lat bû. Ji Unîversiteya New Englandê Zoolog Fritz Geister di derbarê van heywanan de lêkolîn û lêgerîn çêkir. Derket holê ku ev heywan di zivistanê de weke gokekê xwe tot dîkin û dikevin xewa zivistanê. Geister, 10 heb radarên ku ji germahiyê re hesas bûn, di laşen semasiyan de bi cih kir. Bi domahiya pênc mehan germahiyâ laşê wan pîva û tomar kir. Dema ku semasî dikevin xewa zivistanê, germahiyâ laşê wan ji 35°C dikeve (tê) 1,5°C û lezîna metabolizma wan ji %99 tê

jêr. Dema ku hirçen ji heywanên bi guhan ên nîvqada bakur, dikevin xewa zivistanê, germahiyâ laşê wan bi tenê 3°C tê jêr.

Xebateke bi vî awayî jî, li Unîversiteya Marburga Elmanyayê, bi destêñ Gerhard Heldmaierê Zoolog hatiye çêkirin. Wî derxist holê ku mişkên lemurên gewr (heta par dihat zanîn ku ev nifş qediyaye) dikevin xeweke giran a rojane. Di xewa normal de germahiyâ laşê heywanên bi guhan, biqasî nîv dereceyê dikeve (tê jêr). Lewma ku mirov radikevin, pêdiviyê bi nixumadinê dibînin. Dema ku "le-



mur". dikevin xewa germahiya laşê wan. 16°C dadikeve jêr, lê piştî ku dilivin, germahiya laşê wan dîsa vedigere normalê. Guherîna germahiyê di navbera 6 saet û heşt saetan de tê pê. Her ku hewa tê guhertin û germ dibe, lemur ji germ dibin. Heta nêzî nîvro, laşê wan digihîje germahiya xwe ya normal. Her çend ev azîn weke stratejiya heywanen xwînsar were dîtin ji, ji ber ku "lemur" xwe bi xwe germahiya laşê xwe diafirînin, ji heywanen xwînsar pir cihê ne.

Lemurên mişkanî, di sevê de derdikevin nêçirê û germahiya laşê wan ya normal 36,5°C e. Heldmeier, di lêgerînen xwe de, tesbît kiriye ku, germahiya laşê "lemuran" danê sibê, saet di 6'an de dadikeve 20°C'yan, bi vê yekê xerckirina vejena normal ji %40-50 kêm dibe.

Rewşeke sosret ji ev e: mişkên gewr di mercen nermayî de, dikevin xeweke demdemî. Li Madagaskara tropikal a ku mişkên gewr lê dijîn, germahî hindik caran dadikeve bin 10°C'yan. Lé di demsala çile de, kêzikên ku xwarina mişkên gewr in, pel û fêkî kêm dibin. Xewa zivistanê, weke ku bi gelempêrî tê zanîn, ne bi tenê adaptasyona li hemberî sermayê ye, heman wext, stratejiya parastina vejenê ye.

Rewşa Amerîka Başûr, ji hêla kîşwerê ve, ji Avusturalayê tê veqetandîn. Li Amerîka başûr ji hêla kîşwerê ve cihêtiyên pir dijwar nayên dîtin. Ji ber ku li Avustralayê, ziwatî û rewa, pir peyde dibe, heywan dikarin dek û dolabê

metabolîk pêş ve bibin. Ketina xewa rojane, dê vejena wan a ji bo lêgerîna xwarinê ya di heyama ziwatiyê de biparêze.

Xaleke din a ku lêkolîner li ser hûr dibin, "lezîna metabolizmaya heywanen bi guhan ên başûrî kêmter e ji yên ku li bakur dijîn" e. Sedema yekê, heywanen bi guhan ên ku li başûr dijîn, ne xwediyê termoregulatorên kevnare bûn. Pêdivî bi van regulatoran hebû. Lê, lêkolinên ku li nîvka da başûr çêbûn, da xuyakirin ku ev livîna heywanan ne bîranîneke ku ji bav û kalên wan ên xişok tê (holê), adaptasyoneke ku li hemberî mercen kîşwerî hatiye pê ye.

Geiser, Weke encam dibêje: Ketina xewa zivistanê, pêş ve birina adaptasyona gelekkifîn ku li hemberî krîza vejena potansiyel rû bi rû ne.

### **Rewşeke sosret ji ev e:**

*mişkên gewr di mercen  
nermayî de, dikevin  
xeweke demdemî. Li  
Madagaskara tropikal a  
ku mişkên gewr lê dijîn,  
germahî bindik caran  
dadikeve bin 10°C'yan. Lé  
di demsala çile de, kêzikên  
ku xwarina mişkên gewr  
in, pel û fêkî kêm dibin.  
Xewa zivistanê, weke ku  
bi gelempêrî tê zanîn, ne  
bi tenê adaptasyona li  
hemberî sermayê ye,  
heman wext, stratejiya  
parastina vejenê ye.*





# J A W A

**MEHMET DEMİR** (Ji Tirkî: Samî Tan)

**T**eknolojiya komputeran û berên wan bi lezgîniyeke mezin bi pêş dikeve. Hê duh em bi komputerên 4.77 Mhz.'yî ji binesaziyan 8086 dibexhibitîn, lê niha em pê dihesin ku komputera bi 400 Mhz. derketine piyaseyê.

Bi guherîna binesaziya komputeran re, di warênu ku lê komputer tên bikaranîn de jî derfeten nû derdikevin pêşberî mirov. Sistemên ku xwediyê navber-rûyên (interface, arayüz) cuda ne, li warênu xebatê yên cihê derdikevin pêşberî karhêneran (operator). Mirov dikare sistemên mîna Unix, Macintosh, Windows, DOS û OS2 wekî nimûne bide. Ev sistem bi arastinê (hardware, donanım) komputeran re bi şeweyêna cuda dikevin têkiliyê. Ji ber vê yekê programekî ku di sistemekî de bêtengasî dixebite, di sistemeke din de tengasiyan derdixe, heta qet naxebite. Cudatiya di navbera sisteman de dibe sedema aloziyêni lihevkirinê di navbera sistem û platforme de. Bi belavbûna Internetê re xebatêni lihevanînê sistemân jî bi giranî berê xwe da wî warî. Wekî tê zanîn Internet têkilda-nîna komputerên serbixwe

û ji hev dûr in. Ew komputer bi riya telefon û modemê têkilî hev dibin.

Heke di komputerê de Windows 95 hebe û sistema komputerê ku wê bi riya Internetê pê re têkilî danî Unix be, wê çaxê hinek aloziyêni lihevkirinê derdikevin. Sektora komuterê ji bo ku li ser Internetê vê aloziyê ji holê rakin, zimanekî komputeran ê bi navê 'Jawa' a-firandin. Taybetiya sereke ya vî zimanî hebûna serxwebûna sistem û platforme ye.

Ev ziman ji aliyê firmaya bi navê 'Sun Microsystem' ve di sala 1991'ê di çerçoweya projeyeke lêkolînê hate afirandin. Warê ku dixwestin lê Jawa bi kar bînin bi piranî programên cihazên elektronik ên wekî televizyon, makîneyên tostçêki-rinê û teyban bûn. Avantaja

Jawa ev e, ji ber ku biçük e, bi hêsanî mirov dikare ji platformekî bibe yeke din. Vê taybetiyê zimanê Jawa kir zimanekî ideal ji bo nivîsandina programên ku dikarin di WWW'ê (komputerên ji tip û kapasiteyan cuda pê ve girêdayî ne) de jî bixebitin.

Jawa di nava firmaya Sun de di gelek projeyan de hate bikaranîn û xebata bi navê 'Hot-Jawa Applet' ku di sala 1994'an de hate afirandin, berhemâ (tetbiqa) berî kompleks bû ku bi zimanê Jawa hate nivîsandin.

Zimanê Jawa bi piranî di dizayna rûpelên Webê de hat bikaranîn. Dema yek bi Internetê re dikeve têkiliyê wekî dîmen pêşî ev rûpel derdikeve pêşberî wî/ê. Lê derfeta serxwebûna platforme ya Jawa û hêsanîya nivîsına (yazılım) wê kir ku bergeha bikaranîna vî zimanî geleki berfireh bibe. Wateya serxwebûna platforme ev e: Gava programek di Windowsê de hatibe nivîsandin, mirov dikare bêyî guhartina tiştekî di

Macintoshê de jî bide xebitandin. Binesaziya zimanî ya Jawa bi awayekî rûberî (karşılaştırmalı) hatîye avakirin. Her wekî di panoyê de jî tê dîtin zimanê Jawa ji bo pêkanîna serxwebûna plorman hewcedarî



**Java hem dikare di komputerên heyî û sistemên wê yên pêkarkirinê (wekî Windows, MacOS) de û hem jî dikare di arastinênu ku bi tenê ji bo Java hatiye amadekirin de bixebite. Programnivîs ger bay jê nebin jî, piştevaniya platforma sistemeke rajêrî ya pêkarkirinê û ji arastineke azad dikan.**

tebeqeyan e. Ev yek jî xebitîna zimêne hinekî hêdî dike.

Bi kurtasî êdî Jawa bi tenê ji bo amadekirina rûpelên Webê ên zarîf nayê bikaranîn. Ew wekî zimanekî programî yê ku dikare ji heqê aloziyê kar ên herî tevlîhev derê, derdikeve holê. Di dîroka nivîsîna zimanê programên komputerê de, tu zimanî di demeke ew qas kurt de piştevaniyeke ew qas zêde negirtiye.

Wisa xuya ye ku wê di destpêka salên 2000'î de Jawa serî li sîstema pêkarkirinê (İşletim) a bi navê Windows'ê jî bigire. Niha ew sîstem ji he-

mûyên din zêdetir tê bikaranîn.

Di rastiya xwe divê Jawa bi tenê wekî zimanekî programê nayê binavkirin. Ew heq dike ku ew jê re platforma nivîsinê (yazılım) bibêjin. Ji ber ku di nivîsinê de makîneya zahîrî (virtual machine) ya Jawayê ku komputerê lasayî (qay, zarve, simûle) dike, heye.

Jawa hem dikare di komputerên heyî û sistemên wê yên pêkarkirinê (wekî Windows, MacOS) de û hem jî dikare di arastinênu ku bi tenê ji bo Java hatiye amadekirin de bixebite. Programnivîs ger hay jê nebin jî, piştevaniya platforma sistemeke rajêrî ya pêkarkirinê û ji arastineke azad dikan.

Di gel van avantajan, niha hinek kêmasyiyê Jawayê jî hene. Ji van a herî girîng, ji ber ku ew girîngiyê dide serxwebûna platformê, ji koda berhev-kirî (compiled code, derlenmiş kodu)

bêpar e. Lew-re jî li gorî zimanen din

ê n

programan hêdî dixebite. Bo nimûne li gorî koda berhev-kirî ya bi navê C++ Jawa deh qatî hêdîtir dixebite. Kêmasiyeke din jî nebûna kanalên ewletiyê ye. Ji ber ku platforma Jawa nû ye û telisîya ewledariya wê zêde nehatiye kîrin, riya li ber hinek aloziyan vekirî ye. Gelek nivîsarvanenê Webê, di nava rûpelên Webê ên ku bi Jawa hatîne nivîsandin de programan di-nivîsin û bi vî awayî jî ewletiya van rûpelan binpê dikan. Wekî mînak demakê berê di rûpelên Webê ên televîzyona Kanal-D de bi dehan alên yewnanî derketin. Karhênerên ku bi Kanal-D re têkilî datanîn, dema ew rewş dîtin heyirî man. Mînakên bi vî rengî gelek in. Lî digel vê yekê jî amadekarên programan, dest avêtin nivîsanda programekî bi navê 'Dî-warê ewletiyê.'

Niha hilberînerên arastinan (donanım üreticileri) lê dixebeitin ku çipen ku dikarin rasterast bi Jawayê bixebeitin hilberînin. Heke ev çip belav bibin, pirs-girêka lezgîniyê ya platforma Jawayê ji holê rabe.

### Gamelan


(<http://www.gamelan.com/index.shtml>)

Ev rêza online wê berê we bide bi hezaran programkar û pêkar, hacetên pêşvebirina Jawa û bi sedan sîteyên Webê yên Jawayê.

### Sîteya Ewletiyê

Ji bo zêdetir agahiya li ser ewletiya Jawa binêrin li rûpelê Jawa Security FAQ a taximê Princeton Safe Internet Programming.

Navnîşanawê: <http://www.cs.princeton.edu/sip/jawa-faq.html>



# A FIRANDIN

*Hêza ku sînor nasnake*

**D**i pey nivîsandina Verne re, nêzî sed salî şûn de, warisê wî xeyala wî bi cih anî; rêuîtiya ser hîvê kir. Kurê însên di rêzkirin û hîmavêtina fezayê valatî ya 1999 ji bo avakirina destpêkê heyâ sala 1999an sebra wî nema û nesekinî. Di hinek zemanan de, dûr û nêzîk di dîrokên wekhevde, avakirina wan xeyalan plan dikir, ew xeyal û hinek xeyalênu ku îmkana avakirina wan ne-


dîtibû, dema ku hatin avakirin wê çaxê sersal cûda bûn. Dr. Müge Şeneri di Konferansa Navenda Hilberîna Netewî (MPM) ya hefteya adanî de di naveroka sazkirina çalakiyên 27ê berfanbara 1996an de bi navê afirandin û teknika afirandinê dibêje ku "Ji serê 1990î vir de dîtin û fêmkirinê pir cûda ji saziyên perwerdi û heyâ saziyên şuxulên karmendî di gelek akaran de pêwîstiyek


pir girîng kifş dike. Ew çalakiya ku bi navê konferansê hatiye ravekirin di naveroka wê de, tetbiqkirina afirandinê û geskirinê di jîyana me de cihê afirandinê derxist holê. Dîtina temamî kesan dîtin bi tenê di demên derbasbûyî de qet kes lê nefikiribe û mirov lê bifikire, qed kesekî li çekirina wî nexebitebe mirov çêbike...

Dema ku mamostê wî ji yekî heyâ dehan berhevkirina hejmaran jê xwest, mîna ku Gauss çêkir di demên derbasbûyî de, qed tu kes bi wî tewri nefikirî û  $(10+1=11:9+2=11:8+3=11\dots)$  Gauss fikirî bi wan dîtinê xwe yên cûda di demên derbasbûyî de, qed kesekî van zincirên pêwendîyan nedîtibû, wî dît.

Bala Gauss iro tim bi rîbaze-kî (metod) tenê bi navê xwe bi serê xwe tê bibiranîn. Dewitt Jones di buhurandina 20 salan de li National Geographic de nivîskarî wênekêşî bi terzek aktivî kiriye, dibêje ku "Afirandin; tiştekî ji rêzê mirov bi tewrekî wilo ferq bike ku ne ji rêzê be. Tê gotin ku bi nivîs û wêneyêni xwe Dewitt Jones ji xwendevanêni xwe re cihanek nû bi çavêni nû dîtinek anîye holê û her yek ji wan re bi serê wan afirandêriya wan û kifşkirina wan anîye holê.

Dema ku gotin bi fikirandina cûda were, mirov di romana ku navê wê "Prensê Piçûk" e, marrê Boa çawa ku fil heland, neyne ber çavan û bi wan wêneyan mijûl nebe, bêdadiyek mezin





dibe. Şewqekî ku li cem gelek kesan afirandin tê de tune ye û bi tenê ji şewqe zêdetir wêne tê de nayê xwiyakirin, we çi dît nayê gotin, lê we çawa lê nihêrî li gor wê tê şirovekirinê. Afirandin ew e ku kes dinyayê bi tenê ji bo xwe bihesibîne û bi wî tewrî lê mîze bike dirûv bîdê an jî rast bike tê şirovekirin.

Arthur Koestler di pirtûka xwe ya bi navê Çalakiya Afirandinê de dibêje ku; "Afirandin: ji hev û din cûda cûda fikrandin yan jî temamî fikran anîna bal hev e; dibe hinceta demek nû û dibe destpêka sentezek nû bi çûyîna bi alîyê pêvajoyek nû ve tê şirovekirin."

Di dema konferansa xwe de Müge Şenerî afirandinê weha şirove dike: "Afirandina kîşfkrîna fîkrîn nû yên bi feyde û yên rast bi mûcîze û wateyên kûr ku tê pêkanîn di pey pêvajoyek zenê de, lê ji bo afirandinê çiqas şirove hatine kirin kêmahî tê de heye jî weha dibêje:

"Bi rewsek zelal afirandin di jiyana me de bi gelek tiştên nû berê xwe dide me, ji bo vî qasî jî ku mirov, mirovê zanyar û bi rûmet bibîrneyne ne baş e û na-be jî; ji ber ku wan zanyaran ew



tiştên ku anîne ber çavêن xwe û şirove kirine, ji gelşan re bi dî-tina bersivêن wan gelek dîtinê nû tînin ber çavan û imza xwe davêjin binî. Dîtinê nû di bin tettîqkirina bersivêن ku wan dîtine û pêk anîne. Di sala 1608an de Hans Uppershey de-ma ku taybetiya mezinkirina du heb mercekar dibîne, tê zan-nîn ku wê demê wî teleskop çê-kiriye. Di pey re, di demek kin de Galileo Upphersey bi belav-kirina hinek îcadan bi taybetî bi "teleskopê" di çavdêriya stér-kan de xebitand. Her weha îcad-dê meydana xebatê dît, bû keş-fek û afirandêriyek û di warê fikra aborî de jî hat nirxandin û di meydanê de ket rewsek nû.

### Ampûl vêket

Şenerî di konferansa xwe de tîne zimên ku çêbûna fikra afirandê di pêvajoyê de gelek tevlîhev e, dibêje û weha temâsî fikra afirandinê dike: "Dema ku kesê afirandê ji bo care-

serkirina hinek probleman pêk bîne û têke rewşek programatîk wan gelşan analîz dike û dest bi weşandina wan dike. Lê belê çiqas pêvajoya afirandinê tiştên wek amadekirin, çêbûn, peyam, rastkirin û sosyalîzasyona van tiştan di naveroka xwe de bigire jî, lê gav bi gav pêşdaçûyîna çalakiyekê nîne. Dî viyan de fikra di bin zanînê de û fikra ku zanînê pêş ve di be pêwîst e ku wek gilokek rîs li nav hev bikeve; wê demê rola çalakiyê nîşandayîna wan pir mezin e. Çimkî bi piranî fîkrêni di zanînê de, di xewnan de têن holê, Descartes feraseta xwe ya analîtîk, géometri di siya wan xewnen xweyê helok de pêş ve biriye. Divê ku mirov ji vê jî şasaş nebe. Lê di vir de kesên herî afirandêr ên ku bi hêsanî gelemşê çareser dikirin, bi taybetên ewên ku dizanibûn pirs rind pirs bikirana ji nav wan derdiketin, divê ku ev jî neyê jibirkirin. Pirskirin bi piranî di salên me yên zaroktiyê de, pêşekî ku me tim serî lê dida bû.


Belê, di zimanê afirandinê de, ji ber ku kesên awarte û elewş têن saloxdan, rewşen ku pêdivî bi pirsiyariya wan tune be, ber ve pirsiyariyê ve têن birin, loma wekî navgînek ku awirê dorfîreh dike têن dîtin. Mînak: Di pêvajoya synectîcê de gelşen ku bi mînakî têن dîtin, mesela ku mirov pirsâ xebata firokhanekê bi ci awayî bi rêk û pêktir dike, bi awayekî din mirov dikare bi ci awayî xebata firokhanekê ji ya firokeyek jetê bêtir bi rêk û pêktir bi ke û bipirse, divê ku pîvan jî were guhertin. Lépirsîna bi awayekî rast ne bi tenê ji bo kesen zanyar pêwîst e. Erîc Von Hîppleyê ji MITê derxistiye holê ku di bazara elektronikê

de bi gelempêrî berxwariya pîrsa rast kiriye, lêgerînê encama wan dane xwiyakirin ku ji %70 zêdetir berhemên nûjen ên ku kesen ku li gorî daxwaza xwe li bazarê berhem nedîtine û li mal afirandine. Îcada Hîpple kemasiyên afirandinêni di mijara xebatê AR-GE de têن rojevê. Di derbarê vê xalê de ji lêgerîneran tê xwestin ku bi pêşanî di derbarê berhema ku di bazarê de zaf tê xwestin de pirsên rast bipirse. Çawa ku di çareserkirina pirsê de afirandin girîng e, di pirsiyarê de jî girîngiyek heye. Dema ku di rîwîteyekê de Edward Land wênê malbata xwe kişandiye pîrsa ku keça wî ya piçûk pîrsî her çiqas bereda-yî xwîyabibe jî, wê pîrsê guherînek di jiyana me hemiyan de çêkir. Di wê dema ku wênen Polaroïd tunebûn de pîrsa ku pîr bal kişandibû ev bû: Ji bo ku em wênen xwe bibînin çîma em li benda wan dimîni? Pişti ku pêşniyarê çareserkirinê di laboratuvarê de hatin ceribandin, di demek ne dûr de wêne-kêş derketin bazarê. Ji bo ku bersiva pîrsê were dayîn pêwîst

e ku navgînê munasîp bêñ dîtin. Ev yek bi serê xwe zîrekbûnek e, dibe afirandêriya çareserkirina gelemşê.

Ji bo hilberîna ramyariya afirandêr gûherandin jî girîng e. Li gorî Mednick, ramyariya afirandêr ji hêmanê pêhesandîyên têkelên cihê pêk têñ. Wek axaftina Müge Şeneri ku li pey konferansê re afirandina ku pêk anîye û kiriye jiyanê yêk ji wan teknîkên bagera hiş e. Bagera aqil dema ku kovara Zanîn û Teknik a TÜBITAKê (Bilim ve Teknik) di hejmara xwe ya 348 a meha sermawezâ 1996an de li ser peyva (kosele) diaxive, di nav besdaran de fêmkirinê cûda cûda têñ holê, wek neçîrvanî, sol, erd, hiş... Di viyan de di navber dîtinê kesan de cûdaşî tê ber çavan.

Tiştê ku dibe peyxam ji bo dîtina Bellîn a telefonê bi zaravê almanî nivîsîna nivîsarekê ye. Kêmahiya bi zaravê almaniya Bellîn pişti demekê hatiye zanîn. Çavkaniya peyxamê xwendîye, lê bi şaşî fêm kiriye. Ev fêmkirina wî ya bi şaşî telefon heta, malen me anîye. Di



vê gotina han de bi rastî rastlê-hatin ji heye. Ji bo çareserkirina gelşen afirandêr, mesela di dîtinek zanistî de tiştên ku mirov texmîn nake bikarhatina bextê wan zêde ye; lê ew çareseriya ku tê bikaranîn bi serê xwe tenê çareserî nîne. Ji gazî-kerên pêşveçûyîna çareseriyan divê mirov feyde bibîne û wan çareseriyan nû bike.

### Di Nav Ewrêن Şîn de Rêwîtî

Afirandina hunermendan tê xelatkirinê. Saziyên ku perwerdehiya hunermendiyê didin ji bo pêşveçûyîna şagirtên xwe hewl didin xwe. Lê besa civakê ya ku li ser hunerê perwerde nebûye, ji vê hewldanê para xwe nikare bigire. Li ser vê Mûge Şeneri dibêje ku "Di sîstema perwerdehiyê de kêmâniyek mezin heye. Şenerî balê di-kişîne dibêje "Hinek puanê bilind ên serfiraziyê yên di ser re û hedefen eware li ber şagirtan hatin danîn û ji xwendevanan re ji bo lêkolîn û rexnekirinê dem nehatiyê hiştin. Ji ber vî qasî jî, bi tenê bersiva wê ya ku bê pejirandin helwesta perwerdehiyê ya ku hatiye pîvandin, di plana pêşin de hatiye derxistin. Di dawiyê de dema ku standard di perwerdehiyê de cih digirin û pê ve dizeliqin ew di xwendevan de dibe navgîna bicihbûna hinek xebatên eşkere. Bi gotinek dîn di welatê me de di dewsa hunera afirandina xwendevanan ku karîbin çareseriya gelşan bi pêş ve bibin ji xwendevan re hinek zanînê ku sîstema perwerdehiyê tê de amade ye. Şenerî bal dikêse dibêje ku "Heke xwendevan ji bo têgihîştinê nû bikarîbin cih bigirin, divê zêdetirî ji xwegirêdanan bi wan têgihênu ku ji kesan hatin pejirandin, pêwîst e

ku wan zanînê ku têgihênu wan ji der ve hatine li gor wan xwe muşexes bike û bi wê sîstema perwerdehiyê ya ku kesitiyan digihîne re be" dibêje û pêwîstiya ewqasî diniqîne. Bi vî awayî dawî li gotinê xwe tîne: "Di cîhê ku mirov ji zarok re bibêje temamî nava sêkenarê 180 ye, mirov zanînekê amade bike, lê zarok van zanîna bi alîkariya pergelan bipîve û bi kar bîne, zanîna xwe bi wî tewrî pêk bîne di pêşerojê de êdî baştir tê xebitandin. Li hember zarok sê cûre gelş derdikevin. Ya yekem gelşen ku tê pêşkêşkirin di imtihanan de derdikevin pêşberî zarok ew xwedî bersivek kifş in. Tîpa duyemîn gelşen ku hatine kifşkirin û çareseriya ji alî kesan ve tê pêşvebirin. Tîpa gelşa sêwemîn a ku zarok lê rast tê gelşen ku tê afirandin di demen pêş ve di meydanekê de qed gelş nehatin dîtin; di wê de li navberê avêtina hinek pir-san ji gelşen afirandêr destpêkê

tîne holê. Ev wek mirovên zan-yar ku tiştekî nû yê ku nehatiyê zanîn ji bo ku eşkere bi gelşkê biavêje navê an jî wek destpê-kirina hunermendekî ku dest bi berhemâ xwe dike.

Gelş bi tenê bi nêzîkahiyek bi bal afirandinê ve tê çareserkirin. Gelşen ku tê afirandin û kişikirin zêhna mirov û zanîna wî fireh dîkin, lê pirsên ku tê pêşkêşkirin dibin navgîna analîza wan zanînê lê xwedî ne, di vî warî de pir bi feyde ne û ev ji alî pisporan ve ramanekê tê parastinê ye. Bi awayekî din pispor dibêjin di navber zîrekî û afirandinê da têkiliyek rast-rast tune. Zîrekî bi tenê dema ku afirandina rast derdikeve holê ew jî dibe navgînek girîng, lê di nav zîrekiyê de li ser destî normalê, û di nav afirandina tam de pêwendiyek nehatiyê dîtin.

Di pey ku em hînbûn besa mezin ji civakê ji bo afirandinê gihiştiye sînorê zîrekiyê û pua-

### Hîndarîyê Afirandêriyê

**D**îvê ku di temamî besen jiyana xwe de em afirandina xwe bi kar bînin. Dema ku afirandin pêş ve here, wê çaxê dibe ku gellek pêkhatinê bingehîn bêh holê. Bi afirandina xwe ya zarokti bi serê xwe yan jî li gel civakê teknîkên afirandin em dikarin têkin jîyanê û ji nû ve bigîhînê. Bi vî terzi jî jîyan êdî bi xweşbûnê tim li ber çavan e. Bi afirandina fîkrîn çareseriya gelemşan pêwîstiyeke ku jê dev nayê berdan. Dema ku em afirandêr bin, jiyana me bi gelek kîfxweşiyê nû dibe ku bê guhertin. Di jiyana me ya rojane de ji bo pêşvebirina afirandinê de hinek pêşniyârên kîrhatî: Gelşan di hinek dîtinên cûda de, li nihêrandina wan bixebeitin.

Tim hêza hiş bixebeitin. Ramanen xwe di bin zordariyê de negirin. Fîkrîn nû çêbikin. Ji darazîna ramana xwe netîrsin, ew ji ramana we ya afirandêr re dibe asteng. Bi ramana bawer bin, dibe ku hûn bi hêjmarek zêdetir ramana hilberînin; celebêwan baş binir-xînin. Ji hilberînen xwe re nebin asteng. Li vajayî fikirandina xwe ji bifikirin. Heke hûn zaf li bidestxistina peran dixebeitin, zaf xerckirina peran ji bifikirin. Tiştên beredayî dibe ku we bibin çareseriya hinek tiştên nû. Dema ku Newton ferq dike ku sêv dikeve erdê lê hîv naeve erdê, ev dibe sebeba zagonen Newton.

Xwe ji sedema hilberîna fîkrîn nû neşînin. Peyxam di demek qed mirov napê dîbe ku were

nek bi rewac dikare hilîne, wê demê ew kesê ku li konferansa Müge Şeneri nihêrîbû, piraniya wan pirsa "gelo ez çiqas afirandêr im" ji xwe bipirse qed ne şaşî ye; lê mixabin ew civaka ku ji alî zîreki ve gihîstiye puanen baş nayê gotin ku wan bi temamî ji afirandinê puanek bi rewac standiye.

Dema ku dê li hîmê wê bê nihêrîn, zarok heyâ 5-6 saliya xwe di warê afirandêriyê de başbûna wan tê zanîn. Dema listika Firî firî de, zarok tevlî hîsa firînê dibe, tevlihevbûna eeee windabûna diya wî tîne ber çavan û fikirandina zarok daf dide bi bal afirandêriyê ve. Dema ku hewa ber bi tariyê ve diçê zarok hatina bavê xwe tîne ber çavan. Dema ku tarî dibe, zarok dibêje "bavo"; yanê tarîtiya hewayê bavê wî tîne bîra wî. Dema ku salêñ zarok pêş ve diçin, zarok hinek hêmanêñ bîranînê dixebitîne, helbestan ji ber dike, kafiyêñ helbestan di guherîne, ji dê û bavê xwe re tînazan dike. Ev çalakiyên zarokan dabin sebeba serlêdana hinek riyêñ nû nîşana afirandinêñ mezin. Bo nimûne zarokek 2 salî dema ku axaftina pişike-kê di filmê qartonî de dîtibe, ew bi pişika malê re diaxive û bi wê. pişikê re dikane têkilî dayne. Dibe ku hevalek wî ya xeyali jî hebe, bi wê re listikan dilize. Ji bo wî roja hêşîn û dara mor jî dabin heval. Dema ku zarok dabin 7-8 salî êdî rind bi mantik û objektîfi dest bi fikirandinê dikan; wê demê êdî rojzer e, û dar jî hêşîn e.

Di zankoya Bob Jones de mameste perwerdehiya hunerê Kathy Bell dibêje ku afirandêriya zarokan 5 û 7 salî ji %90 kêm dibe. Di van salan de bandora herî girîng li ser afirandê-

riyê reva ji şaşyan e.

Di 8 saliya xwe de pirtûkên ku xwendine ji bo pêşveçûyîna zarokan di afirandêriyê de merheleke rind bi dest xistiye û çalakiyên girîng pêk anîne. Hobî ji dîsa yên ku afirandinê pêşve dabin çalakî ne. Dêma zarok di oda xwe de tiştîn xwe bi cih dike divê mirov zarok serbest bihêle û destûra wan bide. Pêwîst e zarok serpêhatiyan bini-vîse û wênan çêbike. Ji bo tewreke afirandêr xwe dayne navê divê mirov derfetan bide wan. Bi taybetî di temanî wan pêvajoyan de kreş an jî perwerdîn dibistanan alîkariya wan mezin e.

Di welatê me de çiqas jî di hinek dibistanêñ seretayî de hinek krêş û pêşvebirina afirandinê tê dersdayînê, lê dema ku mirov îhtîmalê tîne ber çavan ji vê pir hindik zarok para xwe hiltîne. Ji ber vê sedemê divê ku mirov ji bo piraniya vê sîstemê li her deverê bê holê hewl bide. Pêwîstiya ewqasî derdi-keve holê. Di derberê vî qasî de peywira ku dikeve ser milê mamostan zaf mezin e. Bi taybetî di berî destpêka dibistanan de pêvajoya hînbûna zarokan ji bo pêşveçûyîna afirandêriya zarokan dibe ku bibin warê pêşveçûyînê. Bi taybetî di vî warî de para mezin dikeve ser xebata mamostan.

Di konferansa xwe ya MPM de Müge Şeneri dibêje ku, afirandin bi zemên ve nîne. Kesên afirandêr hêdî hêdî bi tempokê lê bi hêzekê wekhev dikare gelik hilberînî pêk bîne. Ji ber vî qasî jî, divê ku hilberînê xwendevanan bêñ çavdêrkirin. Di pêvajoyek ku afirandêriyê bi kar tînin, divê tiştîn din ji wan neyîn xwastin. Dema ku tiştîn di rojê de neqedandibin divê mirov ji bo qedandinê derfetê ji bo rojek din bide wan. Ew cihê ku lê dimînê divê mirov ji xebata wî û bi qasî xebata wî cihekî mezin jê re amade bike. Di warê xebitandina malzemên xwendevan de divê ku mamoste jî afirandêr be. Bo nimûne ji bo xebata kolejê bi buhayê piçûk peydakirina malzemên nû zaf ne zor e. Di sini-

çekiriye. Şenerî di kêmkirin, zêdekirin, zeliqandin û wergereandina bi eksê de pêwîstiya xebitandina lêkeran û berhemîn tiştîn wan ên nû serbixweyî, çandî, aborî, teknikî, bazırganî, sosyopsikolojîk, der û dor û di ronahiya pîvanêñ sazûmanan de, teknika ku ji tiştan tê pirsiyarkirinê wan tiştîn ku elel ûsûl li ser zêhna mirovan bû pak dike, di berhem û teşa hilberînê de bi meqseda hinek afirandinê nû xebatê dide kifşkîrin.

Çalakiya zarokan a ku malzeme parce parce dike û ji nû ve bi hev ve dizeliqîne bi awayekî mîna xebata zanyaran e û ji wê cûda nîne. Analîz, nirxandin û sentez guhertinê di rewşa wan zaroken di dibistanan de dixwînin de çêbike jî, lê sinifîn dibistanê ji sedema pêşveçûyîna afirandêriya zarokan dibe ku bibin warê pêşveçûyînê. Bi taybetî di vî warî de para mezin dikeve ser xebata mamostan.

Di konferansa xwe ya MPM de Müge Şeneri dibêje ku, afirandin bi zemên ve nîne. Kesên afirandêr hêdî hêdî bi tempokê lê bi hêzekê wekhev dikare gelik hilberînî pêk bîne. Ji ber vî qasî jî, divê ku hilberînê xwendevanan bêñ çavdêrkirin. Di pêvajoyek ku afirandêriyê bi kar tînin, divê tiştîn din ji wan neyîn xwastin. Dema ku tiştîn di rojê de neqedandibin divê mirov ji bo qedandinê derfetê ji bo rojek din bide wan. Ew cihê ku lê dimînê divê mirov ji xebata wî û bi qasî xebata wî cihekî mezin jê re amade bike. Di warê xebitandina malzemên xwendevan de divê ku mamoste jî afirandêr be. Bo nimûne ji bo xebata kolejê bi buhayê piçûk peydakirina malzemên nû zaf ne zor e. Di sini-

fan de, pêşberiya şasıyan bi dîtinê xweş, bi dîtinê nû û bi hewayek vekirî divê were pêkanîn. Bi dengekî nerm û nizm ji axivandin û germoleyen re divê çav bêñ girtin û bi vê helwestê di hilberînê de gerek serbest be û ev serbestî divê jê re bê bikaranîn. Pispor dibêjin û gotina xwe diparêzin: Kesên afirandêr li gor kesên neafirandêr serbesttir in. Xebatêñ zarokan ên pir xweş bi zewk wan ên ku li hember wan an jî wan ên ku li hember wan û dinya wan a hundiñ û an jî ya der ve ya ku li ser dixebeitin. Mînak: Anîna sewalekî ya sinifê, li ser lêkolîn û gengeşikirin, di vî warî de li ser sewalê raman û fikir nîşan-dayîn, bikaranîna zanînê xwe yan jî nihêrîna li neynika li pêş xwe yan jî çêkirina wêne xwe, ev jî ji xebatan re mînak tê dayîn.

Bi pêşvebirina metoda bikaranîn û çêkirina gelemşan jî, zarok bi piranî dibe afirandêr. Ji bo vê jî hinek gelemşen xeyali jî têñ hilberîn. Mînak: Pêşniyariya makîna xewê yan jî makîna lîstikê dibe ku ji zarok bê xwastin.

Di kovara Zanistî û Teknikî ya zarokan a TÜBİTAKÊ de gelsek mîna wê hat sehkîrin: Di welatê me de livandina gelek zarokan bi kar anî. Xwendevanîn me ji me re dinivîsin, em qasidekî ku naman bibe ji hevalîn Marsî re pêşniyar dikan. Me hinek name girtin. Yêñ ku ragi-handinê di navber Dinya û Marsê de dikan, Serwîsa bi lez a di navbera planetan de, di navber Dinya û Marsê de qabloyek şidand û nama xwe kîrine kîsikê naylonî yê ku bi qabloye ve hatibû daliqandin. Di nama ku ji hevalîn Marsî re hatibû şandin de hatibû gotin ku di


valahiya zikê Keştiya Fezayê de name dihatin bicikirin. Di nêzîkdayîna gelemşê de, di riya çareseriye de gelek hêman têñ bîra mirov. Hemî rî ji afirandêr in. Bikaranîna wan çalakiyan a di jiyanê de tiştekî rengîn e. Bi encamî ji civakeke ku bi gelşan re derdikeve ser pêk tê.

Bi rastî afirandina însanan di hingavek wilô de ye ku gihîstîna wê imkan nade Heya dema îroyîn kurê mirov bi sebeba afirandêriya xwe ji zanîn û teknozanînê nû re derî vekiriye. Li aliyê din jî mista di destê wî de afirandêriya wî bû. Lê afirandêriya kurê mirov bi tenê sere-derî dernexist li hember gelşek

girîng a ku li pêş wî heye: Afirandina makînêñ bi qendî wî afirandêr. Xebatêñ ku heyâ niha hatine kirin bê encam mane. Bi komputerê ku dikare wekî Beethoven beste bide çêkirin. Wek Sheakespear nivîsekê em dikarin binivîsin. Lê wek encama ku me bi kar aniye ji wî wê de em nikarin gav biavêjin. Bi hindikahî iro di vê derencê de ye. Wek wilô ye, ji bo ci em wek mirovîn afirandêr makînêñ afirandêr çenakin û li kêleka pêşvebirina makînêñ afirandêr em pêşvebirina afirandêriya xwe çîma nekin armanc.

Kovara Bilim ve Teknik, Hejmar:  
Didem Sanyel (Ji tirkî: Kerem Soylu)





Digotin ji derxistina kuncan spesên girtî di matematikê da mimkûn nebû, belam fizîknasan riyek peyda kiriye. Kad û kade her du ji rûyên du dîmenênu ku bîhêne cemandin, lêbelê kuncen wan ne weki hevdu ne. (Kadeyê kuncek heye kadê çi kunc nîne) Lêbelê heke rexekî kadê zirav bibit, ew rexê zirav bûyi dê jê veqete. Hingî kade dikarit serûnû bîhête şîklê kadê.

# Matematîka Duyatî

**LAURIE GRACE** (Ji İngilizi: Çeto Özel)

*Scientific American, Rêbendan 1996*

*Lebelê matematîknas razî dibin ku fizîknas, bi metodênu xwe yên ku bîhêne pirsyarîkirin, rastiyênu matematikî derdixînin. Morgan dibêjît "em nikarin xwe ji tundiyyê bi kin, nexwe dê navce bikevit."*

**F**izîknasan bi harîkariya sehkirinê, hevçûni û peyxama matematikâ taybetî, hindek problemen matematikâ klasikî ya dûr û dirêj ferisandin. Ew ên pewe ku milekî nû dibêjine geometri ya kuantum di matematikê da vekin. John Morgan, matematiknasekî li Universîta Colombiayê dibêjît "fizîknas rê nîşanî me didin" "Ew rîya wan a heyî me nîne li ser ramanen wisa"

Sala 1990î Edward Witten

li Enstîtuya Advanced Study ya li Princetonê ye, N.J., xelata navçeyi wergirt-nobela matematikê- ji ber ku wî gellek metodênu fizîka teorîk xebitandin û têderxistinokên matematikî feristandin. Têgeheka giring ya fizîkê, supersimetri, bi geometriya nûjen ve giredayî ye. David R. Morrison li Universîta Duke yê dibêjît "ew tiştekî gellek surpriz e." Serfiraziya herî dawî ya supersimetri curandina çardîmenen spesî ne.

Ew dîmenênu ku bi dinya rastî ve girêdayî ji hemiyan komplekstir in.

Sala 1982 yan Sîmon K. Donaldson li Unîversîta Oxfordê xebitandina navçeya kuantuma teorîk ji bo hejmartina kuncan li nav çar-dîmenênu spesiû cûrekirina wan ya topolojîk dabû berçavan. (Mînakî, kad, kade, û xelekên ayîdî kategoriyên cûda yên du-dîmîn rû ji ber dîke nav wan da kuncen cûda hene.) Lîbelê, ji ber rikdara tabîeta navçeya teoriyê hejmartina wan erjeng bû. Sala 1994 an Nathan Seîberg li Unîversîta Rutgers û Wit-

me."Duali ya cûrekî ji yê din cûda dîke, dibêjinê simetriya xodîk, pirsek dîke ya giring ronî kir. Matematîknas dixwazin ku bizanin li ser spesiyeke partîkuler çend cep di Karinbihêne xêz kirin. Ferisandina wê problemê bi xasmetî ji bo çepen hatiye berdan zor e. Belam, Brian R. Geene li Unîversîta Cornell û Ronen Plesser li Unîversîta Hebrew li Kudsê tê derxist ku xelekên li ser spesên cûda dawînkêne wekhev didin. Bi harîkariya wê simetriya xodîk, Philips Candeles li Unîversîta Texasê li Austin û hindek ên dîke, karin ku da-

cûda heyî, wekî kad û kade, qabil diket ku ew li ser yek û du asanî transforme bibin, tiştekî ku nehate hizra matematîknasan. (Qeîdê standard ji bo manîpule kirina spesan rî dide ku ew bihêne direj kirin û tepisandin, lîbelê ci kunc nikarin di nava wan da bihêne vekirin û vegirtin.) Lîgerîna spesên weha yên dîbite navçeyeke nû ya kuantuma geometri.

Wan icadan jiyanekê nû daye disiplîna birêz ya geometriya alcebraî û teoriya nimrî. Shing Tung Yau li Unîversîta Harvard (helgirtekî dîke yê Xelata Navçeyî) dibêjît ew babetên binetarêne matematîkê ne "Heke em lîre aqarekî vekin, gellek teşîr dê bihêne li ser hemû matematîkê" Astengeke mezin ew e ku matematîknasan hêşa dawînkêne teoriya xelekî ya ku wan dilşad biket, aşkarin nekiriye.

Lîbelê matematîknas razî dibin ku fizîknas, bi metodêne xwe yên ku bihêne pirsyarîkirin, rastiyêne matematîkî derdixînin. Morgan dibêjît "em nikarin xwe ji tundiyê bi kin, nexwe dê navçe bikevit." Belê tundi dikare bibe barekî giran li ser milêne matematîknasan û ew dê baweriya peşweçûnê, yêt ku fizîknas şabûnî diken, dûr êxît. Ew pirsayar diket, "Ma em dîsa dê hêviya fizîknasan bin da ku bêjine me, em berê xwe bidin?" "Anjî em dê hêne merhalekê ku em riyekî ji bo wê sehkîrinê peyda bikin?"

***Bi rastî, teoriya xelekî dikare ji matematîka klasîkî pirtir tiştan derxîne meydanê. Harîkariya ku tête zanîn derdikevite meydanê ew gava xelek ji kuantum a mekanîk tête birrîn. Xelekên kuantumê ên li ser gellek spesiyan dizivirin û divêt matematîknas li ser wê bixebeitin.***

ten şîrove kirin ku dawînka navçeya teorîk ya kuantuma supersimetrikê dîbit ku biterzekê dîke bihata peydakîrin, bi rêka sîmetriyekê dibêjne dualîti.

Bi vî awayî, dîbit ku hejmartinê sanahî ji bo hilgirtina dawînkêne zor bihêne xebitandinê. Witten hindek nimrîn wekhev yên ku hema hema 100 caran xweşîr ji "nimrîn Donaldson" bihêne hejmartin alî peyda kirin. Morgan dibêjît "teoriya Seîberg-Witten navçe vekir û firseta bersivdana gellek pirsên mezin bi tevahî dane

wînkêne bê mecal biden berçavan.

Bi rastî, teoriya xelekî dikare ji matematîka klasîkî pirtir tiştan derxîne meydanê. Harîkariya ku tête zanîn derdikevite meydanê ew gava xelek ji kuantum a mekanîk tête birrîn. Xelekên kuantumê ên li ser gellek spesiyan dizivirin û divêt matematîknas li ser wê bixebeitin. Wê ji zedetir, Green, Morrison û Andrew Strominger li Unîversîta California'yê li Santa Barbara daye berçavan ku tesîra kuantumê li ser spesên kuncen cûda

# Çend nivîsraw we belgeyî zimannewanî dewranî sasaniyekan



**EHMED ŞERİFİ**

S erdemî sasaniyekan ke nizîkeyî 400 sal mêtjûkî ûrûpê dade girê, çaxî buyanewê we geşe je neşeyî ferheg we hunerî gelanî ûrûpê bûwe. Lew taxe da müsikka, hunerî, gelanî ûrûpê xanûbere çêkirdin, barde nûsî we peykerriştaraşî, sikemêran we şar û bajarsazîbew parî xoy geyî.

Her lem dewrane da zormey şayakanî sasanî be nawî xoyanewe, sikeyan lêdawe we wêneyî xoyan be şêweyî peykere le ser gaşe berdekan da neqîsandûwe. Lem sîke we nexîsane da hêndê nûsiraweyî ew serdeme heye ke le barî zimannasiyewe yekcar girîng û pir beyexin, be taybetî bo selmendinî nizikayetî zêwan zimanî serdemî sasanî we kurdi kon we êsta cêgeyî serinc in. Ez lem nûsirawê da basî çend sîke we nûsiraweyî dewranî sa-

**Her lem dewrane da zormey şayakanî**  
sasanî be nawî xoyanewe, sikeyan lêdawe we  
wêneyî xoyan be şêweyî peykere le ser gaşe  
berdekan da neqîsandûwe. Lem sîke we  
nexîsane da hêndê nûsiraweyî ew serdeme  
heye ke le barî zimannasiyewe yekcar girîng  
û pir beyexin, be taybetî bo selmendinî  
nizikayetî zêwan zimanî serdemî sasanî we  
kurdi kon we êsta cêgeyî serinc in.

sanî dekem.

**1- Nûsîraweyî sîkeyekî Erdeşîr Babekan:**

Erdeşîr le dewr û berî salî 220î zayînî da, be ser werdele şayekatî Iran da zal bûwe we le salî 227î zayînî da resmen tancî şayetî ye ben hawe we hawî xoş hawe Şahînsahî Iran.

Le dejran we çaxî Erdeşîr da hêndê sîke lêdirawe ke êsta be yadîgar bo bereyî ême mawne-we. Le qerax je pişt we rûyî sîkeyekî Erdeşîr nûsîrawe:

**I A-** Mizdyesen bgy Erthşîr milik Iran

**B-** Mizdyesen bgy Erthşîr milkan milik Iran

**Yanî:**

**a-** Sitayışgerî yezdan Erdeşîr Beg Şahî Iran

**a-** Sitayışgerî yezdan Erdeşîr Beg Şahînsahî Iran.

**II- Le ser sîkeyekîtîrî Erdeşîr weha nûsîrawe:**

**A-** Mizdyesen bgy Erthşîr milkan milik Iran minw çtry min yezdan

**Yanî:**

**a-** Sitayışgerî yezdan Erdeşîr Beg Şahînsahî Iran çetirî yezdan e.

Hurmuz dî kurî Erdeşîr le salî 273î zayînî da debête şalyar we fermanrewayî welaftî Ermenistan. Bem banew le mangî avrîlî salî 273î zayînî da tanc la sar danê we bo bîrewerî tanv le ser nanî sîkiyîk lêdeda ke le se-ri nûsîrawe:

**III- A-** Mizdyesen bgy whrmizdy ba milika ermen

**Yanî:**

**a-** Sitayışgerî yezdan Hurmîz Beg xôw we şay Ermenîstan

**B-** Mizdyesen bgy whur-

mîzd milkan milik Iran we enyran çtry min yezdan

**Yanî:**

**b-** Sitayışgerî yezdan Hurmîzd Begy Şahînsahî Iran we enyan ka çetirî yezdan e.

Her weha çendîn sîkeyî nûsîrawedar ke pêwendîyan heye be serdem we çaxî Behiramî Yekem we Behiramî Duwemî Sasamî le dest daye. Behiramî Yekem le dewr we berî salî 274-276î zayînî da fermanrewayî kirdûwe.

Le ser sikeyekî nûsîrawe:

**A:** Mizdyesen bgy wrhran milkan milik Iran we enyran min we çtry min yezdan

**Yanî:**

**a-** Sitayışgerî yezdan Behram Beg Şahînsahî Iran we enyran ke çetirî yezdan e.

Behramî duwem î sasanî ke le dewr we berî salî 284-293î zayı da debête şah we fermanrewayî seranserî Iran, destûr deda het sîkeyî be nawyewe lêdan. Le ser sîkekanî Behramî Duwem nûsîrawe:

**A-** Ayry mizdyesen bgy wrhran milkan milik Iran we enyran minw çtry min yezdan

**B-** Mizdyesen bgy wrhran milkan milik Iran we enyran minw çtry min yezdan

**Yanî:**

**a-** Aryayî Sitayışgerî yezdan, werhiran (Behram) Beg Şahînsahî Iran we enîranka çetirî yazdan e.

**b-** Sitayışgerî yezdan werhiran (Behram) Beg Şahînsahî Iran we enîran ke çetirî yezdan e.

Le ser sîkeyî şazade xanimekî sasanî nûsîrawe:

**A- Şhypwhr dwhtky zy mîlkân milkit**

**Yanî:**

Şahpûr diwêt (kiç) melekeyî melekan

Katê erdeşîr Babeken le salî 227î zayînî da debête Şahînsahî Iran we resmen tanc le ser denê we destûr deda peykerî xoy we Ehûra Mazda le ser gaşe berdêk le lay Şiraz helkenin ke be nexîşî Rostem navdar e.

Lem nexîş we peykerey da Erdeşîr we Ehûra Mazda her du kîyan suwarî hesp in we Ehûra Mazda fereyî lîzedî deda be Erdeşîr. Le jér pêy hespekan da peykerî erdewanî pêncumî eşkanî we Ehrîmen debîndirê, ke be kiz û mat we melulî nîşan dirawin.

Le ser sîngî hespî Erdeşîr nûsîraweyek be sê zimanî parti we yûnanî we goya farisi nawerazt debîndirê.


Belam ewey ke be farisi na-werast be naw bang e, her ew zimaneye ke zor car be pehlewîş le qelem dedirê, ke le rastî da niziyayetiye kî seyri de gel zimanî kurdî heye. Ewendeyî ew zimane le kurdî êsta nizîke nîw hênde le farsî nizîk nîye. Deqî ketibeke bem cûreye:

**A-** Petkery znh mizdyesen bgy Erthşîr milkan milik Iran minw çtry min yezdan brh bgy pa piky milik


**Yanî:**

**a-** Eme peykerî sitayışgerî yezdan Erdeşîr Beg Şahînsahî Iran ke çetirî yezdan e, bereyî Papek Begî şah e.

Le ser sîngî hespî Ehûra Mazdas nûsîrawe:



Li Naqşî Rustem dema ku Erdeşîrê I. ji Ahûramazda sîmbola qraltiyê digire.



Li Naqşî Rustem dema ku Şahpûrê I. İmparatorê Romayê Valerius hêşir girtiye.

A- Petkery znh whrmuzdy

**Yanî:**

a- Eme peykerî we Hurmuzde

Şapûr şahî sasanî le salî 262yî zayînî da destûrî dawe nexîş we petgerêkî xoy we bine maleyî we gewrekanî welatî çê biken. Em nexîş we nîgare ke êsta be nexîşî rexeb nawdar e ketibeyek we nîgareke be sê zi-mâni partî we yûnanî we kurdî an farisî nawerast, yan baştır bêjim kurdî kon nûsirawe ke bem cûre ye:

A- Petkery znh mizdyesen bgy Şhpwhry milkan milik Îran we enyran mînw çtry min yezdan. Brh bgy Erhştîr milkan milik Îran mînw çtry min yezdan npy papeky milik.

**Yanî:**

a- Peykerî sitayîşgerî yezdan Şahînsahî Îran we enîran ke çetîrî yezdan e. Bereyi Erdeşîr Begî Şahînsahî Îran çetîrî yezdan we newiyî Papek Şah e.

Şahpûrî Yekem le 243-272yî zayînî da fermanrewayetî kirduwe, ewî wek yadîgar bo ême be cê hêştûwe.

Şahpûrî Duwem we Şahpûrî Sêwemîş le dewranî Fermanrewayetî xoyan da yadîgarêkî zo-rîyan le xo be cê hêştûwe. Yekêk lew yadîgarane peykerêkî her du şapûre ke le takkî bustanî Kirmanşan da ye. Lew peykere da Şahpûrî Duwem le salî 309-379yî zayînî da jîyawe we Şahînsah bûwe. Le berde nûse da nûsirawe:

A- 1) Petkerî znh (2) Mîzr-yesen lhy (3) Şhpwhry milkan (4) milik Îran we enyran mînw (5) Çtry yezdan brh mizdesen (6) Lhy whrmizdy milkan (7) milik Îran we enyran mînw (8) Çtry min yezdan npy lhy (9)

Nrshy milkan milik.

**Yanî:**

- a- 1) Eme peyker
- 2) Stayışgerî yezdan
- 3) Şahpûrsahî
- 4) Şahî Iran we enîran ke
- 5) Çetirî yezdan we bereyî yezdanperest e
- 6) Le Hurmizd
- 7) Şahî Şahanî Iran we enîran ke
- 8) Çetirî yezdan i we newe yî
- 9) Nêrsî Shahînşah e

B- (1) Petkerî (2) Znh mizdyesen (3) Lhy (4) Shpwhry (5) Milkân milik (6) Iran we enîran (7) Mînw çetirî yezdan (8) Brh mizdyesen lhy (9) Şahpwhry milkân (10) Milik Iran we enîran (11) Mînw Çtry min yezdan npy (12) Lhy whrmizdy (13) Milkân milik

**Yanî:**

B- 1) Eme peykerî 2) Stayışgerî yezdanperest 3) hy 4) Şahpûrî 5) Shahînşahî 6) Iran we enîran 7) ke çetirî yezdan e 8) Bereyî yezdanperestî 9) Shahpûrsah 10) Şahî Iran we enîran 11) ke çetirî yezdan e we neweyî (12) Hy Hurmuz (13) Shahînşah e

Le ketîbe we nûsirawekanî paş Şahpûrî Yekem êdî wajeyî BEG le beyîn deçê. Her wekî le ketibeyî Şahpûrekânî Duwem we sêwem da debînîn êdî wişeyî “beg” be kar nehatûwe.

Le ketîbe we nûsrawane da zor wajey wa heye ke êstaş her le kurdî da mawetewe. Eweş sur runî dekatewe ke zimanî serdem we derbarî sasamiyekan kurdî kon bûwe.

Ez le gutarekî dîke da bas binemaleyî sasanî dekem we belge sabîti dekem ke sasaniyekan kurd bûne.



Li Naqşî Rustem kevirekî neqîsandî yê şahpûr li hespê siwar e.

*Belam ewey ke befarisî nawerast be naw bang e,  
ber ew zimaneye ke zor car be peblewîş le qelem  
dedirê, ke le rastî da niziyayetiyyekî seyrî de gel  
zimanî kurdî heye. Ewendeyî ew zimane le kurdî  
êsta nizike nîw hênde le farsî nizîk nîye.*

## F E R H E N G O K

Ary	: Arî, ariyayî. Necîb. Spîde
Beg	: Beg. Gewre, mezin. Wişeyek Avestayê ye, be manayî xweda
Brh	: Bere. Nesîl
Çtry	: Çetir, sêber, saye
Dhwtky	: Duwêt, kîç, kenîşik, kîj
Enyan	: Enîran. Xeyrî ariyayî
Ermen, Hermen	: Ermenî, Hermenî
Lhy	: Lehî, hîyew
Milik	: Melîk, şah, xêw. Renge le zimane Iranîyekanewê newe çubête naw zimanî erebî
Min	: Min, ez. Le
Mînw	: Nuwandîn. Nîşandan. Beheşt. Le kurdî da wek Mînu, Mîna, Mîne manetewe.
Mizd-Hurmuzz	: Nawî yezdan e le Avesta da
Npy	: Newe
Nrshy	: Nêrsî. Nawî piyawane
Papik	: Babek, papek. Nawî piyawane e
Petker	: Peyker, tendîs, mîceseme
Reb, Rbe	: Xwa. Xêw. Renge le zimane Iranîyekanewê çubête naw zimanî erebî
Şhpwhry	: Şah-pûr. Kurî Şah-Şahpûr
Whurmizd: Hurmiz	: Ehura Mazda, xêwî awir. Wajeyekî Avestayê ye
Wrhran	: Wehiran, waram, baram
Yesen -Yesîn	: Pesent (d). Sitayîş. Wajeyekî Avestayî ye
Yezdan	: Yezdan. Xwa
Znh	: Zene, jene. Lêdan. Helkendin
Zy	: Zî, jî, ce. Le
Zy	: Za. Zan. Bûn.

# Arîşeyê Dîroknivîsîna Kurdî

*Bi kurtası, rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdi  
ya lipaşmayî, ne ji ber nebûna materyalên  
lêkolînê ye, ji ber pirbûna wan e. Qeydên leşkerî  
û karsazî yên navherêmî ku li ser tehtan hatine  
nivîsin û nivîsen dîrokî, dewle mendiya  
bermabiyên dîroka dema navîn û dema klasik  
en ku ji windabûnê rizgar bûne, karin alîkariya  
berhevkiri na dîroka kurdan bikin.*

**MEHRDAD IZADY** (Ji İngilizi: Sami Tan)

D anhev û sazkirina dîroka kurdi karekî demxur e. Baş e ku sedema vê yekê cildên stûr ên çavkaniyên kevnare ne, lê nebûna wan nîn e. Pêsiyên kurdan wekî mirovên di serdilka cografi ya Rojhilata Navîn a mezin de cih girtine û gelek kanêni si-ruşî û mirov xistine bin destê xwe. Lewre jî bivê nevê têrî xwe ketine nav qeydên mirovên ku cara yekemîn bi karê nivîsandinê re dakte. Her wiha kurd xwedîyê diwaroje-ke hevpar in bi gelên Rojhilata Navîn re ku civakêni xwendede yên herî kevn in li ser rûyê erdê.

Heke ku kurd ji ramana

qeydkirina dîroka xwe bi zanatî bireviyana jî, wan nikaribûn ji qeydbûnê rizgar bibin. Lewre ewê bi destê zanayên gelên li mezopotamyayê bihatana qeydkirin. Ji ber ku kurdan her tim têkilî, danûstan-dinên xwe bi wan re domandine. Şansê baş ew e ku ne kurdan dev ji karê nivîsandina dîroka xwe berdane, ne jî dîroknivîsen gelên cîran qeydkirina wan avêtine pişt guhê xwe. Bi kurtası, rewşa îroyîn a dîroknivîsîna kurdi ya lipaşmayî, ne ji ber nebûna materyalên lêkolînê ye, ji ber pirbûna wan e.

Qeydên leşkerî û karsazî yên navherêmî ku li ser tehtan hatine nivîsin û nivîsen dîrokî, dewlemendiya bermabiyên dîroka dema navîn û dema klasik ên ku ji winda-

bûnê rizgar bûne, karin alîkariya berhevkirina dîroka kurdan bikin. Di van çavkaniyan de dîroka kurdi kitekit hatiye qeydkirin û hema mirov dikare bibê li herzanîngeh û pirtûkxaneya mezin ên cîhanê karin bêñ bidestxistin. Dibe ku yek bi mafdarî bipirse: "Pêdiviya berhevkirin û nivîsandina dîroka kurdi ci ye, heke jixwe li wan deran amade be?"

Di hemû çavkaniyên dîroka berî dema nûjen de, dîroka kurdan wekî parçeyekî serpêhatiyên berfireh ên tomerî yên Rojhilata Navîn hatiye nivîsin û qeydkirin. Di vî parçeyê cîhanê yê ku herî zû medenî bûyî de, dîrok kêm caran bi awayekî beşkirî û terxankirî hatiye nivîsin da ku hin komên ji qewmekî ku li ser yekîtiya zimên hatiye tarîfîkirin, destek bike an jî biçuk nîşan bide. Bi tenê dema komeke nû ji nav ên din derketiye pêş, ji bo ku serweriya Rojhilata Navîn bike, (wekî erebêñ sedsala 7'an û moxolên sedsala 13'an) ev qayde hatiye şikêndin, ew jî bi tenê ji bo demeke kin. Lewre jî cesareta ehmeqan pêwist e da ku mirov têgînên civakî-siyasî yên qewmiyeta îroyîn ji bo civakêni Rojhilata Navîn ên berê, bi karbîne.

Ji bo van gelan baweriyên olî ku awayê jiyana aborî jî dida pey, ji bo pêkanîna hestêñ komeleyî, li pêş hemû faktorêñ din bûye. Hêmana zimên a ku ji bo ewrûpiyan girîng hatiye dîtin (ji yewnana kevnare heta fransizên nûjen), ji bo mirovên Rojhilata Navîn ên berî dema nûjen, gelek caran wekî tiştekî li derî dêhna wan xuya dikir. Lî, binêrin li

wê nakokiyê ku, tarîfa qewman a ku bi bandora ewrûpiyan derketiye holê û li qada navneteweyî li serê lihevirkirinek çêbûye, li gorî vê diyardeyê bi tenê tê kirin.

Lewre ji van çavkaniyan derxistina parçeya dîroka Rojhilata Navîn û mîrata mirovahiyê ya ku bi taybetî malê kurdî-axêvan e; (çi hind-ewrûpiyên îroyîn û çi jî huriyên dema pêşîn) karekî geleki giran e. Ji hin kes û komên serbixwe wêdetir, ancaz saziyên ku dewletek li pişt e, karin ji binê vî barî rabin. Komên herêmê yên ku njha xwedandewlet in dîroka xwe ya qewmî bi xebateke ku dewlet li pişt e, berhev kirine û nivîsandine. Dewletan bi avakirin û xwedîkirina akademîyan û bi saya beşen hunera liberal a zanîngehan dîroka qewmî-zimanî pêk anîne û navdar kirene.

Bi rûdana doza dewleta neteweyî, li Ewrûpaya sedsala 19'an, mirovan giraniya ramana xwe dan ser qewmiyeta ku li ser yekîtiya zimên pêk hatiye. Sedema vê yekê jî xurtkirina meşrûbûna dewleten neteweyî bû, ku sînorêñ wê li ser vê yekîtiyê hatibûn danîn. Ji bo hikûmeteke neteweyî ev bû karekî pêşîn ê jînager bi du mebestan: Yek; ji bo nîşdayîna xwerûtiya qewmî xwe di dîrokê de, du du pejirandina meşrûbûna idîaya li ser erdê ku ew wekî warê qewmî xwe diyar dike.

Piştî vê yekê, dîroka kevn a tomerî dibe warê lêhûrbûnê ji bo komên qewmî yên taybet. Tiştên ku di belgeyên dîrokî de nîn in, lê têz zêdekirin, an ji ku ne bi dilê avakarêñ van dîrokan bin, jê tê derxistin,

bi kurtî dîrok tê "çêkirin". Bernard Lewis di pirtûka xwe ya bi navê "Dîrok: Bibîranîn, veşartin, afirandin" de, bi mînakêñ balkêş nîşan dide ku "netewe"yên Rojhilata Navîn çawa ev kar kirine.

Dîroka qewmî ya kurdêñ bêdewlet ku ji hêza saziyên dewletî û ji piştgiriya aborî ya çînêñ mirovhez bêpar in, divê ji nav girseya çavkaniyan dîroka tomerî bê derxistin û berhevirkirin. Edî mirov qîma xwe bi naskirina serkeftinêñ hevpar ên mirovahiyê naynin. Ew dixwazin dîroka li gorî qewman terxankirî bizanîn û serkeftinan li kiryarêñ wan par bikin. Kesêñ ku nikarin para xwe di nav van serkeftinan de destnîsan bikin, di dîrokê de marjînal têñ daxuyandin; çanda wan bipêşneketî (prîmitif) tê dîtin û idîaya wan a li ser xaka ku lê dijîn, cidi

nayê girtin. Hemû mîratêñ qewmîn ku li qadêñ jêrin hatine bicikirin, dikevin muzevêñ dîroka siruştî; cihê wan li muzevêñ hunerê nîn e, ancaz muzevêñ arkeolojiyê bi dest wan dikevin.

Serpêhatî û dîroka van gelan dibin warê lêkolînêñ antropolojîstan, civaknas û dîrokñas jê xwe dûr dixin. Bermahiyêñ têkildarî wan valahiya di navbera hoveberî û şaristanîyê de, dadigirin. Di muzevêñ dîroka siruştî de cihê van "çandêñ prîmitif" li nik giya, heywan û madeyên din e.

Doza van gelan a xwerêveriyê têñ paşcavkirin, ji bo xatirê hêzên împeryal ên ronîbûyi an ji li hemberî daxwaza îlhaqê ya "dewletên nûjen" çimkî ew dewlet wekî dîwerên li pêş bêaramiyê têñ dîtin.

Ji ber vê senifandina spekulatif, ne tenê kurd, gelek çandêñ yên kevnare ji mehkûmî marjînalîyê bûne. İro, şaristanîya muhteşem a Amerîkaya Navîn têdikoşe ku navê hoveberiyê ji ser xwe biavêje. Dûwajoyêñ şaristanîyê wekî maya, înkayan ji wekî kurdan, ji ber ku ne xwediyyê lobyîstêñ akademîk û finansorêñ dewlemend in, ketine derdê ji destbernedana kelepora xwe ya çandî ya dewlemend. Ji ber nebûna berhemêñ nivîskî yên li ser kelepora kalikêñ wan, em pisporêñ biyan deynin aliyeķî, ew edî nikarin bi ciwanêñ xwe ji girîngiya raboriya xwe bidin bawerkirin. Her wekî kurdan, şaristanîyê maya, însa û aztekan ji hê li muzevêñ dîroka siruştî têne pêşandan û ji aliyeñ antropolojîstan ve li ser tê xebitîn.

*Bi rûdana doza  
dewleta neteweyî, li  
Ewrûpaya sedsala  
19'an, mirovan  
giraniya ramana  
xwe dan ser  
qewmiyeta ku li ser  
yekîtiya zimên pêk  
hatiye. Sedema vê  
yekê jî xurtkirina  
meşrûbûna dewleten  
neteweyî bû, ku  
sînorêñ wê li ser vê  
yekîtiyê hatibûn  
danîn.*

Eynî senifandina spekulatif di nirxandina kalikên kurdan, huriyan de jî tê kirin. Li ser vê bêmantiqiyê G. Wilhelm di berhema xwe ya bi navê "Nivîsên Huriyan" de van tiştan dibêje: "Ji şaristaniyên kevnare yên herî girîng di dîroka Rojhilat de, hurî ne. Beramberî vê yekê jî agahiyên me yên der barê huriyan de (çî ji aliyê zimên, çî ji aliyê dîrok û çandê ve) pir hindik in, li gorî agahiyên li ser sumerî, asûrî, hîtitî û heta bigihîje kenaniyan." Paşê Wilhelm xemgîniya xwe diyar dike, ji bo ku tevî delîlên pêselmîn ên li ser girîngiya huriyan jî, hinek nirxandinênu ku dibin sedema senifandina spekulatif hene. (Wilhelm, 1989; 1-9)

Tîstê ku ji bo rewşa lêkolînên der barê neviyên huriyan kurdan û kelepora ku wan li gencîneya mirovahiyê zêde kirine de, bê gotin ev e: Bi rastî jî metoda senifandina spekulatif li dijî kurdan bi a-wayekî neyarî, hê jî tê xebitandin. Nêrîna li kurdan a ku bi gotinê "eşîrên koçer" (em qala sifatên wekî rîbir, hov û hwd. nekin) tê zimên, pisporênu kurdolojiyê yên ku gi-raniya xebata xwe dane ser vê mijarê dixe bin bandora xwe.

Di sala 1995'an de Thomar Boisê ku kurd xistine çapa duymîn a Ansîklopediya İslâmî, li ser kurdan pirtûke-ke navdar nivîsiye. Navê pirtûkê bi frensî "Connaissance des kurdes" yanê Nasîna Kurdan e. Ev pirtûk di bin navê "The Kurds" (Kurd) de li îngilizî jî hate wergerandin. Di pêşgotina vê pirtûkê de Bois gotinê Minorsky ku di çapa yekemîn a Ansîklopediya

İslamî de (1913) cih digirin, dubare dike. Ev nivîs li ser kevnarebûna kurdan û danûs-tandina wan a xurt bi xaka Mezopotamyayê re hatiye ni-vîsandin. Tevî vê yekê jî ni-vîskar, gotara Minorsky a rînîşandar fêm nekiriye. Ni-vîskar ji bo danasîna civak û şaristaniya li Kurdistanê bi xwendevanê xwê, ev qas si-fatêن xerab li dû hev rîz kiri-ne ku ancax mirov dema xwe gelekî biêşîne dikare, vê yekê pêk bîne. Wekî nimûne: "De-ma (Qralê asûriyan) Sennac-herib li sazûmankirina herêmên babilê dixebeitî, me-dan, yanê çiyayiyen Zagrosan, heta wê demê bi tenê ji wan qewmîn hoveber bûn û li çiyê xwedîyê jiyanke koçe-rî bûn, an jî li gundêñ gelek xizan dijîn." (Connaissance r.12) Lê xwendevan bi tu awa-yî ji aliyê Bois ve nedihatîn a-gahdarkirin, ka ew ji kîjan çavkaniyan hoveberiya jiyana çiyayiyan û rewşa xizan a gundêñ wan hîn bûye. Ev nêzîktêdayîna xwedigiravî dostekî kurdan û kesekî ku wekî kurdolog tê zanîn e.

Ne tiştekî nû ye, mirovek li ser tiştekî çiqas hindik xwe-dan agahî be, ev qas wî tişti di warê girîngiyê de dixe rîza dawîn. Pir dijwar e ku miro-vek dev ji rihetiya tiştekî ku dizane berde û bikeve zehme-tiya hînbûna tiştekî ku nayê zanîn, heta dema nerastiya tişte ku tê zanîn, eşkere bûbe jî. Wekî ku di hejmarêner berê yên Kurdish Life de (No.4, 1992) hatiye diyarki-rin, akreolojîstan li Godîna li rojavayê Dînawerê hin cihîn kevnare kolandin. Piştî van kolandinan li vê herêma roj-hilata Kurdistanê, hin berma-

yî bi dest xistin. Ev bermayı nîşan didin ku cara yekemîn rez li vê herêmê hatiye danîn; şerab û bîraya ji ceh jî, li wir çêbûye. Gelo kê ew tişt icad kirine?

Diyar e ku tirî û ceh berên xwerû, yên çiyayîn Zagros û Torosan in, cara yekemîn li wir ber dane û tê zanîn ku şitlîn mîwê li avzêlîn germû li ser erdê bixwê yên deştên başûrê Mezopotamyayê yanê Iraqê şîn nayê. Tevî wê yekê jî arkeolojîstên ku bi karê kolandinê re têkildar in di ser çanda kurdên kevnare yên çiyayî re qewaz didin û icadki-rina van her du beran dikin malê sumeriyen başûrê Iraqê. Li Godînê kûpêñ bîrayê di menzelekê de hatine dîtin, her wiha li wir guleyîn ji bo ke-virkanê leskeran jî, hebûne. Dîroknasên greko-romen ên klasik vê metoda şerkirinê bi gelên zagrosî ve girê didin; bi taybetî jî yên jê re kurti yanê kurd tê gotin. (Mînak, Polybius V.lii.5; Livy; XXXVII. xl.9' Diodorus, XIV.xxvii.3) "Kevirkana Kurtiyan" ev her du peyv ji hev nabin di bel-geyen kevnare de.

Dema rastiyen cografi ü botanik nikarîbin tiştekî bikin, ma guleyîn kevirkanê karin ci bikin ji bo guhartina kevneşopa dîrokî? Kalikên kurdan hûrî, çawa karin doza rûmetê bikin li ser tişten ku ji warê wan hatine derxistin, bêyi rakirina bend û sînorêñ (wekî G. Wilhelm bi mafdarî jê re dibêje) vê senifandina spekulatif.

Di berfanbara 1994'an de Dr. Virginia Badlerê li Komeleya Antropolojîk gotarek pêşkêş kir. Dr. Badler li Zanîngeha Torontoyê mamoste

ye û niha serokatiyê ji heyeta kolandina li Godinê re dike. Tevî vê yekê jî, wê di gotara xwe de dixwest, bi veşartina delilên fizikî yên ku tezên wê pûç dikin, statukoyê biparêze. Her wiha bidestketina guleyên kevirkanê wekî delîl nîşan dida, idia dikir ku şerab û bîra îcadêner sumeriyan in. Ji bo ku mázereta xwe ya diyar xurtir bike, ew dibêje: "Wê demê guleyên kevirkanê yên ji gilkê, ambûrên şer in." (Science News, 146, 1994, 390). Em bi tu awayî nayêng agahdarkirin li ser qewmiyeta leş-

ku Godin ne di nav sînorêne Kurdistaneke serbixwê de ye û akademiyeke kurdî ku li dijî wê gotinê derkeve nîn e, wê ev encama ku Dr. Badler diyar dike, bikeve nav kana kevneşopêni dîrokî ku hê jî rê li ber kalikêne kurdan hûriyan digire da ku ew bibin xwedî rûmet ji ber tiştênu ku wan xistîne nav gencîneya mirovahiyê; ci tiştênu ku bi belgeyan eşkere bûne, ci jî yên ku wê di ayandeyê de derkevin holê.

Liberxwedana lêkolîneren dîroka dema pêşîn a ji bo rûmetnedana hûriyan (li ser rola

lek tekstê standart ên îroyîn û rîza bûyerêni li ser dîrok û perisîna çanda Rojhilata Navîn û Behra Spî derxe holê. Her wiha senifandina ji nû ve li gorî bikiran jî wê pêwist bi-be.

Ger mirov bend û rîzikêni ku bi senifandina spekûlatif derketine holê deyne aliyekî, gelo kurdan tu alikariyêni ku hêjayî bidestxistin û daxuyandinê bin, gihadina şaristaniya herêmê? Ji bo bersiva vê pîrsê em careke din, bidin ser riya mantiqê ya sar. Bi xêra cihê navendî ku li Rojhilata Navîn a mezin girtine be jî, divê alîkariya kurdan di radeyeke bilind de çêbûbe. Lewre ew cib, warê şaristaniya domdar a herî kevnar e. İcar, pişti vê encama mantiqî, mirov kare çawa, rastiya diyar ku niha li ser navê kurdan li tu muzeyle arkeolojîk ên cihanê firaqek jî nayê pêşandan, şirove bike? Şiroveya vê yekê gelekî hêsan e; tişt bi zanatî li ser navênc çewt têne nasandin. Ew yek bi tenê ji bo firaqan jî nayê kirin. Bi destûra we ez mînakeke din bidim.

Îsal, 1100 saliya yek ji zanyarêni herî mezin a dîroka kurdan û şaristaniya îslamî Abû Hanîfa Dînawarî ye. Di çappa yekemîn a Ansiklopediya İslâmî de ku sala 1913'yan derket, Abû Hanîfa Dînawarî ji aliyê C. Brockelmann ve wiha hatiye nasandin: "Zanyar û zimanzanê erebî." Peyva erebî di zimanê akademîk de ji bo kesen ku xebatêni xwe bi zimanê erebî kirine, lewre jî malê kevneşopa zimanê erebî ne, tê bi kar anîn.

Ev tişt dişibe vê yekê, wekî ku mirov rabe, hemû kesen ku nivîsên xwe bi îngilizî dînivî-

---

***Bi xêra cibê navendî ku li Rojbilata Navîn a mezin girtine be jî, divê alîkariya kurdan di radeyeke bilind de çêbûbe. Lewre ew cib, warê şaristaniya domdar a herî kevnar e. İcar, pişti vê encama mantiqî, mirov kare çawa, rastiya diyar ku niha li ser navê kurdan li tu muzeyle arkeolojîk ên cihanê firaqek jî nayê pêşandan, şirove bike? Şiroveya vê yekê gelekî hêsan e; tişt bi zanatî li ser navênc çewt têne nasandin.***

---

kerên ku ew gule bi kar anîne û 5500 salî berî niha ew depo kirine, li cihê ku niha fiçiyêng bîra û şeraba herî kevin hatiye dîtin.

Heke di dîrokê de keviravêjêng herî navdar kurti/kurd bin; ceh û tirî berê ci-yayêng kurdan bin û cara yeke-mîn li wit ber dabin; û heke Godina ku ev destkeftiyêng belgeyî lê hatine dîtin, li ci-yayêng kurdan be, çawa encama ku Dr. Balder diyar dike, yanê "şerab û bîra îcadêner sumeran in" rast tê dîtin? Ji ber

wan a di perisandin û dewle-mendkirina şaristaniya Rojhilata Navîn û Behra Spî de), dibe sedema nedîtina pêwistîya avakirin û pêşvebirina dîroka kurdan a mayî jî; yanê dîroka ji dema hûriyan heta destpêka sedsala 20'an. Di her du rewşan de jî arişe ne kêmî û alozbûna materyalên çavkaniyê ye. Tiştê ku dibe sedema vê rewşê, bi gotina pêşîyan, tirsa vekirina "Qutuya Pandorayê ye. Vê yekê dema di warê hûriyan de dest pêkir, wê pêdiviya guhartina ge-

*Ji ber ku parek ji bo kurdan ji kelepora bevpar a çandî û dîroka Rojbilata Navîn nehatiye vegetandin, amadekarê van ansiklopediyan ji weki gelek nivîskarên nûjen naxwazin tiştekî ku kurdan doza wê nekirtye, bidin wan. Ma wê ji bo çi keştiya statukoyê bihejînin, heke kesen ku ji vê bazarê zirarê dibînin, serê xwe xistibin binê qûmê? Di vê demê de ku kurdên li jiyanê mecbûr têñ biştin da ku kurdbûna xwe îsbat bikin, wê çawa zanyar û dîrokzanekî sereke yê bezar û sed sal berî niha weki kurd bê binavkirin? Abû Hanîfa Dînawarî bi erebî nivisiye û misilman bûye, lewma divê bibe ereb û ji qewmê ereban be, li gorî mantiqê bêhempa yê nivîskarê çapa nû ya Ansiklopediya Islamê. Her wiha jî ji ber ku Dînawer niha di nav destbilatdariya dewleta Iranê de ye, li gorî mentiqê nivîskarê Ansiklopediya Iranî Abû Hanîfa bi tenê dikare bibe malê farisan.*

sin, bike îngiliz û paşê jî hêvî bike ku wê xwendevan guhê xwe nedîn wateya neteweyî û etnîkî ya di nava vê têgînê de. Di rastiya xwe de her wekî nîha tê dîtin, tevíhevkirina her du tiştan, ji tirsê û nezanînê pirtir, tercîh e.

Di destpêka sedsala 20'an de dest bi nivîsandina dîrokên qewmî yên cur bi cur bû. Komên qewmî dengê xwe bilind kirin, ji bo zeftkirina her tişte ku karin bikin mal ji dîrok û mîrateya xwe ya biqîmet re. Ansiklopedî bi tenê a-lîkariya vê pêvajoyê dike. Ew zimanê tevlihev a ku di çapa yekemîn de ji bo danasîna Abû Hanîfa Dînawarî hatibû bikaranîn, di çapa duyemîn a sala 1968'an de xuya nabe. B. Lewin di vê çapa nû de wiha dest bi danasîna Abû Hanîfa Dînawarî dike: "Zanyarê ereb ê sedsala 3 û 9'an." Ew, vê dazanîna eşkere ya li ser koka wî ya qewmî dike, teví agahiyê ku ew bi xwe dide, li ser kevneşopa şexsiyeta xurt a Iranî û daxuyaniyêhesti yên di xebatê Abû Hanîfa Dînawarî de. Dîsa ew diyar dike ku ji van daxuyaniyan hêjahiya Abû Hanîfa Dînawarî di çavê derdorêne ereban de kêm bûye. Her wiha, Lewin bi xwe dibêje ku di nav kallikên Abû Hanîfa de kesî ereb tune bûye, bapîrê wî Wanand ne misilman bûye û Abû Hanîfa li Dinawara başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê û li wir jî miriye. Teví ku ew, van gişkan dizane û vedibêje, jê re sosret nayê ku bi van gotinê bêşermîn, dest bi gotara xwe bike û bibêje: "Zanyarê ereb ê sedsalân 3 û 9'an."

Ev çewtiya eşkere ya li ser nasnavê zanyar ji aliyê edî-

torêñ Ansiklopediya Islamê ve nayê redkirin, ji ber ku li gorî wan heta bervajî bê îsbatkirin, hemû misilman ereb in. Bi awayekî sirûşî, dil dixwaze ji amadekarêñ ansiklopediyeke ku li Holandayê tê çapkîrin hêvî bike ku gelemeşeya netewetiya kesê ku dixin nava ansiklopedeyê wekî mijareke girîng nebînin li hemberî payebilindiya zanyar û li derveyî ansiklopedeyê bîhêlin. Lê heke ew wekî tiştekî girîng tê dîtin, mirov hêvî dike ku bi giştî girêdahî rasîtiyê bimînîn û bi alînegirî vî aliyê zanyar rohnî bikin. Di nav bi hezaran rûpelîn ansiklopediyê de zanyarek jî li ser navê kurdan nehatiye nivîsin û birek zanyarêne ereb li ser navê ereban hatine nivîsandin. Ev rasî nîşan dide ku mijara netewetiyê ji bo nivîskarêñ ansiklopediyê ne tiştekî ji rîzê ye û qewmê ku wan tercîh kiriye ereb in. Wekî karê zarokan xuya dike, lê ev yek rast e.

Bi tenê ereb û piştevanêñ wan malê kurdan desteser dikin? Va ye mînakeke din. Destpêka beşa Encyclopaedia Iranica (Ansiklopediya Iranî) ya der barê Abû Hanîfa Dînawarî de: "Abû Hanîfa Dînawarî rîzimanzan, ferhengnîvis, stêrnas, matemâfîkzan û zanyarê İslâmî yê ji nijada farisan..." Kurd bîr nabin ku li nirxên xwe xwedî derkevin, lê ereb, faris wan dikin malê xwe. Sedema vê dizitiya aşîkar payebilindiya Abû Hanîfa ya di qada zanistî de ye. Ev nav û deng dibe sedem ku biyan bêşermiyê bidin ber çavêñ xwe li wî xwedî derkevin.

Ji ber ku parek ji bo kurdan

ji kelepora hevpar a çandî û dîroka Rojhilata Navîn neha-tiye vejetandin, amadekarê van ansiklopediyan ji wekî gelek nivîskarênen nûjen nax-wazin tiştekî ku kurdan doza wê nekiriye, bidin wan. Ma wê ji bo ci keştiya statukoyê bihejînin, heke kesen ku ji vê bazarê zirarê dibînin, serê xwe xistibin binê qûmê? Di vê demê de ku kurdêni li jiyanê mecbûr têni hiştin da ku kurdbûna xwe îsbat bikin, wê çawa zanyar û dîrokzanevê se-reke yê hezar û sed sal berî ni-ha wekî kurd bê binavkirin? Abû Hanîfa Dînawarî bi erebî nivîsiye û misilman bûye, lewma divê bibe ereb û ji qewmê ereban be, li gorî mantiqê bêhempa yê nivîskarênen çapa nû ya Ansiklo-pediya İslâmî. Her wiha ji ji ber ku Dînawer niha tli nav dest-hilatdariya dewleta İranê de ye, li gorî mentiqê nivîskarênen Ansiklopédiya İranî Abû Hanîfa bi tenê dikare bibe malê farisan.

Werin em beramberî girîngiyya Abû Hanîfa Dînawarî kêmnavdانا wî, bi navdariya Évliya Çelebiyê ku ne zêde girîng e re, muqayese bikin. Vê demê belki mirov mekanîzmeya nepixandinê ya ser-bilindiya ji ber çand û dîroka neteweyî, nas bike.

Evliya Çelebiyê sedsala 17'an ku di temamî jiyana xwe de, karibûye hin rojenivîskêne gelek baş binivîse, ni-ha wekî pêşengê zanyarênen cihanê tê pêşkêskirin. Ev yek bi xebatê Enqereyê, (yên wekî hempayêne wê yên li Amerîka û Ewrûpayê), pêk hat. Her parçeyê rojenivîskêne wî bûn warê lêkolîn, werger û şiro-vâyen dirêj ên lêkolîneren jîr

ku ji aliyê qelîteyê ve mirov-nikare bide ber rojenivîskêne bi rengê "ez çûm, min dît û min nivîsand" û li ser kaxizêne pir xweşik hatin çapkiran. Wekî ku ev tiş têrê nekin, içar-zanîngeheke mezîn a Amerîkayê besêke taybet diyarı Ev-liya Çelebî kir.

Her mirovê ku hez ji zan-yariyê dike, divê bi rûmeta ku ji bo gerokêkî hêja tê nîşan-dayîn, kêfxweş bibe. Lê dil dixwaze ku eleqeyeke mezintir ji bo zanyarekî wekî Abû Hanîfa Dînawarî bîrbir û dûr-bîn bê nîşandayîn.

Lê mixabin tiştekî wisa xu-ya nake. Ji ber ci? Ji ber ku tu peywendiya vê rûmet û pesin-dayîna ji bo Evliya Çelebî, bi serkeftinêne wî re tune ye. Ev-liya Çelebî ji ber ku malê çand û dîroka gelê tirk e, ew ji wekî gel, çand û dîroka tirk-an, di nav rîza pêşin a zan-yaran de hatiye bi cihkirin, li gorî wê ji eleqeyê dibîne.

Abû Hanîfa Dînawarî yê ku yek ji zanyarênen herî ronak a şaristaniya İslâmî û cihanê ye di 1100 saliya xwe de, di nava mij û dûmanê de dimîne, ji ber ku ew ji neteweyeke bindest ango ji kurdan e û ew netewe bi destê spekûlatoran ji aliyê girîngiyê ve li rîza pa-sîn hatiye nîşandayîn.

Ev meyla kêmrumetdayînê ji bo rola kurdan a di dîrokê de, bandora xwe li kurdêne dema nû ji dike. Ev rast e, hew-la guherîna wê rewşê ji ne zehf e. Helbet hin sedemîn vê yekê hene, wekî nebûna per-werdehiya li ser babetê têkil-darî kurdan. Kurd, bi tekstêne ku ji hêla wezaretêne hikû-metêne herêmê ve bi şewyeke polîtik û ji aliyê dîrokê ve timarkirî hatine amade kirin,

tên hêvotin. Armança amade-kirina van pirtûkan ev e: Divê ew riya xwendaran bi tu nîşanê pêzanînen li ser raborî û dema têdeyî ya kurdan ne-xin. Zarokêne kurd bi pesindâ-yînê ihtişama Sîrûsê (Cyrus) farisan, Ertugrûlê osmaniyan û Cemal Abdûl Nasirê ereban digihîjin. Di vê pêvajoyê de ew ji pir-hindik, şewq û dax-wazeke bi qasî ya ereb, faris û tirkan nîşan didin. Lewre ew ji di bin timara eyñî bîrdozê re derbas dibin, heman (eyñî) pirtûkêne dersê dixwînin, he-man weşanan temaşe û guh-darî dîkin û di ber heman bill-boarden propagandayê re derbas dibin. Wê ji bo ci ew ji heman xîret û daxwazê nîşan nedîn. Dema Ansiklopediya İslâmî ya navmezin bêpaxav û bi şewyeke zelal bide zanîn ku Abû Hanîfa Dînawarî ereb

*Hêvî beye ku kurd, di sala 1998'an de ji bo pîrozkirina 1800 saliya wî ji eleqaya ku di 1990'i de ji bo warê Lucian yê delal nîşan dan, zêdetir eleqeyê nîşan bidin. Tê zanîn ku warê delal ê Lucian ango Semsat ku gelek caran dengê stranêne wî jê bilind bûye, di 1990'i de tevî mîrateyên xwe yên arkeolojîk di bin ava gola Bendava Ataturk de winda bû.*

e, em pîrozkirina salvegera wî deynin aliyekî, çîma kur-dek bixwaze ku wî nas bike? Hê ansiklopediyeye kurdan ku were wî rizgar bike jî nîn e.

Kurdên ku wekî şagirt (xwendekar) derfeta hînbûna dîrok û mîrateya xwe li dibistanan bi dest nexistine, ji bo pêkanîn û zeximkirina hestêن xwe yên welatperweriyê (yên di bin tehditan de), ji xwe re çend şexsiyetên siyasi neqandine. Rewşenbîrên nûjen ên kurd êdî hatine vê radeyê ku serbilindîya mezin a ku karin di hezkirina Abû Hanîfa Dînawarî de bi mafdarî zeft bikin,bihêlin û herin pesna xwe bi hin şexsiyetên politîk û serokeşîrên wekî "Simkoyê Mirovrxwer" bidin. Dema kurd jî karibin eleqeya ku tirk nîşanî Evliya Çelebî didin, nîşanî A-bû Hanîfa Dînawarî bidin, wê lehengê kurdan ê neteweyî ku li cîhanê jî di rêza pêşin de ye, derkeve holê.

Her wiha, Abû Hanîfa Dînawarî wê bi tenê jî nemîne. Her sala nû hin salvegerên jiyan û serkeftinêن rewşenbîr û navdarêن kevnare yên kurdan nîşan dide. Sala çuyî 300 saliya nivîsandina destana nete-veyî Mem û Zîna Ehmedê Xanî bû. Îsal 1100 saliya Abû Hanîfa Dînawarî ye, sala 1997'an 400 saliya nivîsandina Şerefnameyê ye. Ev berhe-ma ku bi destê Şerefjanê Bedlîsî hatiye nivîsandin, yekemîn pirtûk a, li ser dîroka kurdan e. Her wiha sala 1998'an 1800 saliya Lucian e ku ew jî yek ji mezintirîn e-pîstemologîst, (agahînas), hostayê xwespeyivînê (rhetorician), wêjevanê nivîsen şer-cûnî yanê satirîstê cîhana

greko-romen e.

Gelo Lucianê ku yek ji wêjevanên bijarte yê wêjeya klasik a grekî ye, kurd e? Ew li başûrê rojhilatê Semsûrêango navçeya Semsetê hatiye cîhanê û li wir mezin bûye. Lucian di nivîsen xwe de, bi pesndarî dide zanîn ku, ew gelek zaravayên grekî pir baş dizane. Wêjevanê mezin diyar dike ku, li Antakyayê wî wekî yekî yewnanî (Ionian) dizanîn û li Atînayê jî mirov zen dikin ku ew antakî ye. Her wiha ew bi rûgeşî dibêje ku tu kes ji xwerûnebûna zimanê wî neketiye şikê, lê ew bi eslê xwe kurdeki soran e û di xortaniya xwe de ew hînî grekî bûye. Li gorî gotina wî, wê demê di mala rêveberekkî herêmî yê romanî de wekî suxrekar (berdest) xebitiye û di wê malê de yewnanî wekî zimanê (navqewmî) danûs-tandinê hatiye bikaranîn.

### *Kurd dema doza*

*zanyarê xwerû yê erdê xwe bikin, divê wî ji dest parêzgebêñ ereb û farisan derxin.*

*Hêjabıyeke wisa kes bêtêkoşîn ji dest xwe bernade. Lewma jî ber cure hewla pêşin a berbevkirin û sazkirina dîroka kurdî girêdayî bilîndkirina tékoşînê û tékbirina bin rikberan e.*

(Harmon, Lucian, 1991. pas-sim)

Hêvî heye ku kurd, di sala 1998'an de ji bo pîrozkirina 1800 saliya wî ji eleqaya ku di 1990'i de ji bo warê Lucian yê delal nîşan dan, zêdetir e-leqeyê nîşan bidin. Tê zanîn ku warê delal ê Lucian ango Semsat ku gelek caran dengê stranê wî jê bilind bûye, di 1990'i de tevî mîrateyên xwe yên arkeolojîk di bin ava gola Bendava Atatürk de winda bû.

Lîsteuya navên keleporê çand û dîrokê ku kurd divê salvegera wan pîroz bikin, mirov kare hê jî dirêj bike; dewlemendbûna vê keleporê ne tiştekî tesadûfi ye. Heke neteweyek xwediyê dîrokeke dirêj û navdar be, wê karibe her sal salvegerên wiha mûhteşem pêk bîne. Birastî jî kurd dikarin bi mafdarî her sal gelek bûyerên wiha pîroz bikin, ew jî pîvaneke diyar a dewlemendiya kelepora wan e.

Her kes û rêexistina ku dest diavêje karê rastkirina çewti-ya qestî ya kêmnrıxdayîn û biçük nimandina vê mîrateyê, pêwist e rik û êrişen hin mirovan bide ber çavan. Ci li qada akademîk, ci jî li qada siyasî di destpêkê de wê ew bi rika hin kesan re rû bi rû bimîne. Divê mirov li benda vê reaksiyonê be, ji ber ku her xwedîderketina nû ya li par-çeyek mîrateya mirovahiyê, divê doza kesen din. Mînak: Niha ereb li Abû Hanîfa Dînawarî xwedi derdikevin, ji ber ku wî bi erebî nivîsandiye, her wiha faris jî doza xwedîtiyê dikin ji ber ku Dînawar dikeve nav sînorêن Iranê. Kurd dema doza zanyarê

xwerû yê erdê xwe bikin, divê wî ji dest parêzgehêner erek û farisan derxin. Hêjahiyeke wisa kes bêtêkoşîn ji dest xwe bernade. Lewma ji her cure hewla pêşîn a berhevkirin û sazkirina dîroka kurdî girêdayî bilindkirina têkoşînê û têkbirina hin rikberan e. Helwesta xwediyêni hişyariya lêkolînî yan ji çakiya niyazan ci dibe, bila be.

Gelo dîroka neteweyî çima wisa dibe sedema şer û pevçûnan nivîski? Çima mirov ji bo parvekirin û bidestxistina mîrateyên dîrokî bi hev dikevin? Ka ji ber ci hêjahiyan ji hev didizin?

Kirîna dîrokê riya herî erzan e ji bo bidestxistina cihekî di qada navneteweyî de. Her wiha riya herî erzan e ji bo ku yek doza xwe ya serdestiyê û doza li ser xakekê bide pejirandin. Êdî ew doz çiqas tewş dibin bila bin. Tu besa din a zanistiya civakî û mirovî bi qasî dîrokê, bi polîтика, dozêni rawebûnê û idîayêni li ser erdekî ve neketiye nava hev. Bi tenê kurd hê nû bi girîngiya teqane ya dîrokê dihesin ji bo berzkirina doza welatê xwe. Xuya ye ku iro ne pir zû ji vê yekê. Ma hewce ye mirov bi bîr bixe ku Îsraîlê çawa doza xwe ya li ser Zionê bi erdekî veqetandî yê di încilê de xurt kiriye? Ne girîng e ka di Încilê de tiştekî wisa heye an na. Rastî ev e, dîrok ji aliyê vê dewletê ve wekî ta-pûyê (şahid) hate nimandin. Teqez ev yek bû sedema han-danê (teşwîq) ji bo hemû dewletan û komên ku doza dewletekê dimeşînin, da ku birek dîroknas xwedî bikin.

Nivîsandina dîrokeke neteweyî piştgiriya mezin û dom-

dar a cemawerî û komên taybet divê. Ji bo kurdan, bêgu-man serkeftina di vî warî de avaniyên akademîk ên kurdo-logên bisinc û canfeda (ku niha hejmara wan gelekî hindik e) dixwaze. Ji ber ku ew berê xwe dide karê guhartina statûkoya ku mîrateya neteweyî ya kurdî biçûk dixe, û wê dadixe radeya çandeke koçerî ya marjînal ku ji rewşa e-şîrên hoveber ên çiyayî û gundiyyêni xizan zêde bi dûr neketiye. Çawa ku Bios ji kallîkên kurdan bi vî awayî dide nasîn û kurdologê rojavayî yê pispor Martin Von Bruinessen tevli dîtinêni wî dibe. Ev 70 sal in ji bo şikînandina moralâ kurdan; ci ya mirovîn ji rîze, ci jî ya rewşenbîran, ev karê ji rûmetê-xistinê tê meşandin. Pirbûna çalakiyên bi vî rengî ne tesadûfi ne. He-ta ew ne berê mentaliteya bazarê ya hin lêkolîneran e ji, ku ci dikarin bi dest bixin, bi dest dixin û dikin malê komên ku li ser lêkolînê dikin. Dema ev nêzikîtêdayîna bi pêşdaraz a Ansîklopediya İslâmî û Ansîklopediya İranî (di pirsa netewetiye zanyarêni ku ew di-din nasîn de) li ber çavan bê girtin, tê dîtin ku tu qeza û tesadûf ne berpirsên vê şêweya xerakirina dîrokê ya erebgir û farisgir e. Ev yek li Rojavayê ku navê alînegirtinê di xwe dide, pêk tê. Dema li Ewrû-payê rewş wisa be, mirov ki-rinêni hin saziyên dewletê yên li Rojhilata Navîn a ku ne xwediyê idîaya alînegirtinê ye, fêm dike. Yanê mirov fêm dike ka çima ew mîrateya kurdan înakar dikin û lê dixe-bitin ku kurdan ji xwerêvebe-riya neteweyî û serbilindiyâ nasnava wan qut bikin.

Dema kurdeki ji Rojhilata Navîn radibe û ji bo xwendinê diçe Rojava, rastî gotinêni bi vî rengî tê: "Ji bo ku işbat bi-be, ka kurd netewe ye an ko-meke etnîk e, delîl pêwist in." Îcar tu mirovîn din, ci ji Rojhilata Navîn, ci jî kesen ji deveke din a cîhanê, mecbûr namînin ku nasnameya xwe ya neteweyî işbat bikin. Li pirtûkxaneyê hemû zanîngeh û dibistanan hin çavkanî û pirtûkîn perîti, hene. Ew çavkanî ji bo hemû xwendekarêni zanista siyasi û za-rokêni bimeraq ên eşîrên kurd in. Dema ew bixwazin li ser netewetiye kurdan xebatê bi-kîn û tiştinan binivîsinin ew karin bi tenê wan bi dest bixin. Heta hin caran mamoste

*Dîroka kurdan divê pêşî  
ji aliyê dîrokzanêni kurd  
ve bê nivîsandin. Heke ew  
dixwazin di warê  
dîroknivîsinê de bigibêjin  
ciranêni xwe. Zanyarêni  
rojavayî beta niha işbat  
kirin ku ne dikarin, ne ji  
dixwazin bi çavekî  
zanyarî, bêlayanî û  
dadmendî nêzî dîroka  
kurdan bibin. Lewre  
tunebûna xelata madî di  
vî karî de, dibe sedem ku  
bin zanyarêni kêmşareza  
û kesen nedîrokzan  
(antropolojist û  
siyasetvan) berhemên di  
ser re û bi piranî ji bi  
pêşdarazî li ser raboriya  
kurdan biafirînin.*

xwendekaran teşwîq dîkin ku peywirnameya xwe an jî teza xwe ya kutakirinê li ser sero-keşrekî kurd; şerê di navbera eşîran de (wekî pevcûnên negirîng ên siyasi), an jî pirsa di eşîrekê de kî bi kî re zewicie, amade bikin. Ew nikarin li ser dîroka kevnare, klasîk an jî serdema navîn berhemekê bi dest bixin.

Aloziya bîrî, zivêrî, gema-roya rewşa giran a çandî û aborî dibe sedem ku gelek kurd bêyî ku haya wan jê çêbe, bibin haceta biçûkxisti-na neteweya xwe. W. R. Hay jî vê rastiyê destnîşan dike: "Kurd xwediyê xisletekî xurt in di warê xwe biçûkdîtinê de û ev meyl bi destê tirkênu hemû bala xwe dane, osmanî-kirin û jiholêrakirina hemû hestênu wan ên qewmî, hatiye tundkirin. Însanekî kurd dema qala xwe dike, her tim peyvîn wekî, zahîrbîn (kesê ku bi tenê rûyê tiştekî dibîne) tamakar an jî wahşî bi kar tî-ne."

Çavkaniyêng yên a-gahiyêng der barê dîroka kurdan de (ji dema antîk heta roja iro) gelek in û li hemû pirtûkxaneyêng mezin ên li seranserê cîhanê bi dest dikevin. Tişte ku rê li ber daneheva dîroka kurdan digire, tunebûna lêkolînan e, ne kêmboûna ma-teryalen lêkolînê ne. Dîrokni-vîsîna kurdî bi qasî hewlîn dewletên dijber, ji tunebûna çalakiyêng kurdan jî ziyanê dibîne. Nînbûna dibistan û sa-ziyêng akademik ên kurdan bi xwe ku bibin warê lêgerîn û daneheva dîroka neteweyî rê dide pevcûna dewletên herêmê ya iro ya li ser parve-kirina kelepora mirovahiyê ya şaristanî û dîrokî.

Dema mirov dibîne ku kurdan girîngiya xwehêvotina li malê fêm kirine û dest avêtine çalakiyêng li derveyî vê atmosfera ku morala mirov xera dike, cesaret tê mirov. Ew bi pêwistiya bidestxistina raboriya xwe û parastina çanda xwe hesiyane, bêyî ku li dû selmandina biyanan bigerin. Mesela, amadekarêng Ansiklopediya İslâmê û Ansiklopediya İranî tu car xebatêng bi wî rengî taswîb nakin. Ji ber ku ew çalakî wê gelek tiştên ku di van ansiklopediyan de wekî rastî hatine pêşkêşkirin, pûc bikin û wan mecbûr bihêlin ku cildêng stûr ên ansiklopediyê ji nû ve binivîsin, ji bo'ku cih ji kurdan re vebe di qada dîrokî ya Rojhilata Navîn de.

Dîroka kurdan divê pêşî ji aliyê dîrokzanêng kurd ve bê nivîsandin. Heke ew dixwazin di warê dîrok nivîsînê de bigihêjin cîranêng xwe. Zanyarêng rojavayî heta niha îsbat kirin ku ne dikarin, ne jî dixwazin bi çavekî zanyarî, bêlayanî û dadmendî nêzî dîroka kurdan bibin. Lewre tunebûna xelata madî di vî karî de, dibe sedem ku hin zanyarêng kêmşareza û kesen nedîrokzan (antropolojîst û siyasetvan) berhemêng di ser re û bi piranî jî bi pêşdarazî li ser raboriya kurdan biafirînin.

Piştî ku dîroka kurdan hate nivîsandin divê bê navdarkirin.


Pêwist e hemû netewe bi pîrozbahiyêng populer û serbilindiya besdariya wan, nêzîkî raboriya xwe bibin. Lehengêng neteweyî û serbilindiya bi dîrokê, dema mirov van ji cemawerê re taswîr bike û salox bide

derdikeve holê. Mesele ne girîngbûna şexsan e, her wekî di meseleya Abû Hanîfa de diyar e. Heta, mesele ne saloxêng baş ên di ansiklopediyêng xwelîgirtî de ne jî. Mesele ev e: Bi mîrateya neteweyî ya komekê ve ew çawa hatiye girêdan û çawa hatiye nasîn ji aliyê mirovîn li kuceyan ve. Lehengêng neteweyî divê bi debdebe bêng ragihandin. Bêyî daxuyandinêng bi vî rengî, lehengêng neteweyî rû nadîn. Mînaka diyar ji vê yekê re Evliya Çelebiyê li Tirkîyeyê ye.

Şansê kurdan ji gelêng din bêhtire, lewre ji bo nivîsandina dîroka xwe ya neteweyî û pêkanîna serkeftinêng di vî warî de pêdiviya wan bi tiştên çêkirî û idiyâng tewş tune ye. Her wiha hewcedariya wan bi kirîna dîrokekê jî tune ye. Li ber kurdan bi tenê karê vejiyandin û navdarkirina dîrok û mîrateya ku wan gîhandiye mirovahiyê heye. Piraniya bermahiyêng arkeolojîk û belgeyêng sereke yên dîrokî ji lêkolîneran bi tenê vejetandina demê dixwazin, spekulasyonê naxwazin.

Lewre gelek çavkaniyêng xas hene, tengasiya peydakirina wan tuneye. Êdî dema carekê dîrokzanek tirsa li hemberî statukoyê bişikêne; xwe ji meyla paşçavkirinê (heta dijminatiyê) ya dîrokzanêng kevneşopî û reaksiyonêng xweparastinî yên qewmîn cîran rizgar bike, wê dîrok û mîrateya kurdan bi awayekî tekûz bêng nasîn û senifandin.

# DI DEMA SELÇUKÎ Û OSMANIYAN DE JI DÎROKA KURDISTANÊ DÎMENEK



*Kurd gelekî niştecîb bûn  
û bezar salan li ser vê axê  
dijîyan. Selçukî girêdayî  
civaka tirkmen a koçer û  
leşkerên memlukî bûn.  
Zimanê dewlet yê fermî,  
zimanê çand, huner û  
wêjeyê Farîsî bû. Hewceyi  
gotinê ye ku Selçukî bes bes  
in ango çar dewletên cûda  
ne. Ev agahî lî ser Dewleta  
Selçukî ya Mezin e.*

## ŞAREZA AVER

### A-Destpêk

Ev gotar ji bo dîroka Kurdistanê, dîmenek e. Guncan nîn e ku evqas demeke dirêj bi kûr û hûr bikeve nava gotarekê. Ji bo sedsalêن vê mijarê bi sedan lêkolîn û lêgerîn, bi cîld û bergen nivîsandina pirtûkan pêwist e. Di nav vê dîmenê de rengê civakî, rêzanî, mêtinkarî, rêverbî û yên serhildanê û ixanetê xuya dikin.

Di Şerefname û gelek berhemên din de Lor beşek Kurdan hatinepejirandin; Loristan jî parçeyek Kurdistanê. Hinek zanyar bi taybetî yên Ewrûpî hemberê vê ramanê ne. Sedem girêdayî van dîtin û ramanan nebe jî dîroka Loristanê derê vê gotarê ye. Ji bo pirsgirêk û mijara Lor û Loristan lêkolînên cûda, kûr û bi rêk û pêk pêwist in.

Hindikahiyan Kurdistanê weka asûr, ermen, tirkmen, azerî û yên din; têkiliyên wan û Kurdan ji bo dîrok girîng in. Dîroka ermenîyan û asûriyân de qirkirin û koçberî diyar e. Dağırkerên Kurdistanê ji bo ku nakokî têxin navbeyna wan û kurdan hemû celeb listik leyistine. Di nav vê gotarê de dabaşa hindikahiyan jî nehatiye kolandin.

Em bawermendên dîroka bûjenî ne. Bingeha zanîsta dîrokî û zanyariya rasteqîne ev e. Lê belê di nava serdemek dîrokê de rengê cûda hene. Dîtina van rengan pêwist e. Weka rengê dîroka Kurdistan yên sedsalêن dawî.

### B- Kurtedîroka Gelemeperi

Îro hatiye selmandin ku Kurdistan warê nîştecih ê yekem e. Li basur Şenîdar, li Amed Qotê Ber Çem, li Elûh Çemê Halanê

<sup>1</sup> Ji demêñ Kevin heta îro tirk, Kurd û İranî. Weşanêñ Weşanxaneyâ Firat, bi Tirkî.

û li Ruha Newala Çorî ji bo mirovatî warêن yekem in.

Kasî, Med, Mîtanî û Kardox pêşengokêن Kurdan têن pejirandin. Li ser Huri û Urartûyan dîtin û ramanêن cûda hene.

Ji aliyê çand û antrapoloji (mîrovzanî) ve têkiliya Kurdan biwan re ber bi çav e. Prof. Egon Von Eickstedt Huriyan bi bedenî dapîr û bapîrên kurdan dibîne.<sup>1</sup> Dîsa ev zanyar dewleta Elam wek dewleteke Loran ya kevin dipejirîne.

Pers û Makedonî, Roma û Bîzans, Part û Sasanî, Mongol, Akkoyunlî û Karakoyunlî, Ereb û Osmanî û Safewî carna Fransa, Îngîliz û Rûs bûn dagirkerên Kurdistanê yan parçeyek wê, Kurdan bi berxwedan û xweparastinê bersiv dane dagirkeran. Carna bûne xwedîdewlet û mîrnîşnân. Bi sedsalan rêveberiya xwe kirine. Dewletên şedadî, merwanî, Hesenweyhî, Zengî û ji aliye kurd yên bisilman in. Mîrnîşnân Botan, Baban, Erdelan, Soran, Bîtlîs, Hekarî û Loristan demeke dirêj, hinek ji wan bi sedsalan jiyane.

Serdema Navîn û Nêz de cend qurnêن dîroka Kurdan he. Qurnek ji wan di sedsala heftem de ji Ereban ve dagirkirina welatê wan e. Asya Navîn hatina Tîrkan, Şerê Bazîd Axa (Çaldiran) û Peymana Lozanê qurnên din in. Bêguman destpêka têkoşîna netewî ya hemdem qurneke nû ye. Cîhetên qurnên din ji bo Kurdan ber bi mirinê bûn, ew vejin e. Destpêka sedsala yanzdem de eşîrên Tîrki ji Asya Navîn berê xwe didin rojava. Di sala 1037 de digihêjin Kurdistanê: Eşîrên Oğuz cara yekem êrişî Meraxe dikin.

Dû re nijd û cerdi Hekarî û

Mosil pêk tînin. Li wan deran dibin sedemên tevkujiyan. Lîbelê dîsa netevanîn li Kurdistanê rawestin. Du buyerên dîrokî deriyê Kurdistanê ji bo Selçukiyan vedikin, ev buyer; di sala 1055 de bi pêşengiya Tuxrul Beg li Bexdad zalbûna wan û sala 1071 de Şerê mlazgîrd û serkeftina Alparslan in.

Li Kurdistanê carna zorandina Selçukiyan xuya ye. Lîbelê zalbûne wan tenî rukkî ye. Mercen serdestiya wan li wî welatî kêm bûn. Dewlet û hukumetên Kurdan bi şer an bi aşîti

dewletêن cûda ne. Ev agahî li ser Dewleta Selçuki ya Mezin e. Selçukiyan Enedolê tenê gîhiştine rojavayê Kurdistanê. Elbîstan, Meletî û Gurgum dikeve binê bandora wan.

Bî fasilbûna Selçukiyan û rûxandina Dewletên Kurd ên wê demê mercen rîzanî û leşkerî tenî guhertin. Mîrnîşnân Kurd cîhê wan digirin. Ev mîrîti û Mîrnîşnî di dema serdestiya Osmaniyan û Safewiyan de xudmxtariya xwe didomînin. Li gor E. Xemgîn di dema zalbûna van her du dewletan de qasî sîh Mîrnîşnân Kurdan hene. Rewşa Kurdistanê qasî sêsed salango heta destpêka sedsala nozdem wisa didome. Bi xwezayî, ne weka riyek rast û jiyanek asayî û sade.

*Ji aliyê çand û  
antrapoloji (mîrovzanî)  
ve têkiliya Kurdan  
biwan re ber bi çav e.*

*Prof. Egon Von  
Eickstedt Huriyan bi  
bedenî dapîr û bapîrên  
kurdan dibîne.(1) Dîsa  
ev zanyar dewleta Elam  
wek dewleteke Loran ya  
kevin dipejirîne.*

li ber xwe didan. Revendî, Şevankar, Merwanî, Şedadî, Eyûbî û Ezîzan li hember Selçukiyan radiwestin. Ji bilî sedemên rîzanî û leşkerî mercen şarezayî, çandî û civakî dijî Selçukiyan bûn.

Kurd gelekî niştecîh bûn û hezar salan li ser vê axê dijîyan. Selçuki girêdayî civaka tirkmen a koçer û leşkerên memlukî bûn. Zimanê dewlet yê fermî, zimanê çand, huner û wêjeyê Farisî bû. Hewcîyi gotinê ye ku Selçukî bes bes in angó çar

**C- Di Destpêka Sedsala  
Nozdem de Rewşa Cihanê û  
Ya Rojhilata Navîn**

Di destpêka vê sedsalê de tevî bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê, Rojhilata Navîn li bin desthelatdariya Osmaniyan de ye. Rojhilatê Kurdistanê li bin destê Iranê ye. Tixubên Şehînşahiya Rusya gîhiştine Kurdistanê. Desten Ingilistan, Fransa û Elmanya ji bo berjewendiyê wan li Rohilata Navîn in. Berê vê sedsalê têkiliyan Osmaniyan bi Fransê re xurt bûn. Di sedsala nozdem û bîstem de Dewleta Osmanî bi Elmanya yê re peymanen leşkerî, aborî û rîzanî pêk tîne. Gelaleyâ Rayê Berlin-Bexdad ya Elmanî encama varf têkiliyan e. Bandora Elmanya roj bi roj li ser Osmaniyan xurt dibû.

Dewleta Osmanî li Ewrûpa weka mirovekî nexwes dihat pejirandin. Zilhêzen cîhanê li ser mîrasa vê dewletê rîzaniyê

xwe dimeşandin. Osmanî û Iran êdî dewletên lawaz bûn. Lêbelê nakokiyên ku di nav zilhêzên Ewrûpa de hebûn destûr nedan ku ev dewlet bêñ rûxandin. Her du dewlet bûn nîvmêtingeh. Şerîn tund û dijwar li navbeyna Osmanî-Rus, Osmanî-Iran û Rus-Iran derketin. Qada van şeran Kurdistan û Ermenîstan in. Cefakêş û ziyankarêñ van şeran zêdetir kurd in. Her sê dewlet ji bo berjewendiyêñ xwe êl û eşîren Kurdish bi kar tînin.

Dewleta Osmanî ji aliyê dârayî, leşkerî û aborî ve girêdayî zilhêzên Ewrûpa yên sermayedar e. Roj bi roj desthelatdariya wê li ser axêñ Ewrûpa yên ku berê di bindestên wê de bûn, kêm dibe. Pêwistiya ji vê rewşa xerab derketinê dibîne û serî di de dutavdirêñ bingehîn! A yekem nûsazî (reform) ye; a du-yem ji holê rakirina mîrnîşînên Kurdish û desthelatdariya wan e.

Endozyarê van tevdîr û rêza-nian Sultan Mehmûdê duyem e. Bi nûsaziyê, dixwaze Dewleta Osmanî bike ya "Ewropî" û piştgiriya dewletên Ewrûpa bigere. Ne rasterast be jî Kurdish zi-

yanê nûsaziyê jî dîtine. Sedemê vê ziyanê rêzaniya dewletên Ewrûpa ya li ser hindikahiyêñ file ne.

Rêzaniya ji holê rakirina mîrnîşînên Kurdish di serdemâ Karakoyunlî û Akkoyunliyan de dest pê kiriye. Padişahê Osmanî sultan Muradê Çarem şoparêzê vê rêzaniye ye. Lêbelê Sultan Mehmûdê Duyem bi sazûmanî û leşkerî vê rêzaniyê "nû" dike û karvaniya wê pêk tine. Bingeha rêzaniya Sultan Mehmûdê duyem. Evdilhemîdê duyem û ya Mustafa Kemal yek e. Tenî li gor guherîna dem û mercan drû-vêñ karvaniya wan ji hev cûda ye.

#### D- Di Sedsala Nozdem û Bîstem De Rewşa Kurdistanê

##### 1- Rewşa Hilberîn û Aborî-sazûmanî feodalî

Sazûmana axatiyê (feodalî) demeke dirêj li Kurdistan zal bûye. Zalbûn û zorandina vê sazumanê heta salêñ 1960 an xuya ye. Ji sazûmana koletî derbasbûnî sazûmana axatî hewce-

yî lêkolîneke dîrokî ya din e.

Piştî mêtîngîhbûna welêt li nav sazûmana axatî rengên me-tîkarî têñ ditin. Weka sazûma-na Osmaniyan ya li ser ax û ze-viyân; timar, zeamet û xas.

Çandinî û xwedikîrina pez û sewalan li Kurdistanê kar û gu-reyên dîrokî ne. Ji aliyê çem û rûbaran ve Kurdistan kaniya Rojhîlata Navîn e. Başur û ba-surê rojavayê wê dest in. Ji Dî-lûkê heta Silêmanî hemû dever xwediyê desten mezin û ze-viyân berdar in. Dorhêlê Ker-manşah, Urmîye û Dezful ji bo çandinî, ji bo bax û bexçeyan cihêñ gelek bi kêr in.

Her wekû tê zanîn di sazûma-na axatiyê de di pergala axatî de pergala bingehîn ax e. Ew jî di desten axa û began de ye. Ji berî sedsala nozdem di gelek de-verên Kurdistanê de gundi tenê girêdayî beg û axayêñ xwe bûn. Weka Hezo, Gêl, Palo, Dara-hêñê, dorhêla Botan û Rewan-diz. Lêbelê roj bî roj nîrêñ gun-diyan ber bi giranbûnê diçûn. Teví bar û rantên axayêñ wan, yên dagirker jî ketin ser milêñ gundiyan. Hêjayî gotinê ye ku



*Dewleta Osmanî li  
Europa weka miroveki  
nexweş dihat pejirandin.*

*Zilhêzên cîhanê li ser  
mîrasa vê dewletê  
rêzanyîn xwe  
dimeşandin. Osmanî û  
Iran êdî dewletên lawaz  
bûn. Lêbelê nakokiyên ku  
di nav zilhêzên Europa  
de hebûn destûr nedan ku  
ev dewlet bêñ rûxandin.*

*Her du dewlet bûn  
nîvmêtingeb.*

tu car sazûmana axê ya Osmanî bi awayekî vetûrî li Kurdistanê zal nebû. M.Alî Kılıçbay di pirtûka xwe ya bi navê "Feodalî û Terza Hilberîna Osmanî ya Veturî" (2) de vê rastiyê tîne zimên. Birêz Kılıçbay dibêjê: "Ji derê tîmara Osmanî sazûmanek axê 'malîkane-dîwan' hebû. Bi taybetî li Konya û Rojhilatê Enedolê ev sazûman zal bû. Ji berê Osmaniyan feodalîteyek wisa hebû û ewan hemberê wê tevdîr girtin."

Her sê celeb rantên feodalî li Kurdistanê bi kar hatine. Ranta ked, ber û ya pereyan. Li gor pêvajoya sazûmana feodalî û mercên axatiyê di salên 1950 de pererant zal e. Di van salan de hêj hewcar pergala cotkarî ya bingehîn e. Ranta vetûrî û hewcar nîşanên sazûmana feodalî ne. Karl Marx dibêjê "ji hev cûdakirina serdemên aborî girêdayî celebên kar nîn in, girêdayî pergalên karê ne." (3)

Heta salên 1960 an li Kurdistanê sazûmana feodalî zal e. Gundiyên ku qet zeviyên wan nîn bûn ji nîvî zêdetir in.

## (2) rûpel:381

(3) Hêmana ramyariya Aborî, Weşanên Akademiya Zanistên Sowyetistanê. Rûpel: 28, bi Tirki.

Mamoste İsmail Beşikçi di pirtûka xwe ya "Eşîra Elikan a Koçer" li ser parbûna axê jî râwestiye, li gor rîjeyên ku wî dane li Bîtlîs, Mêrdîn û Amedê parbûna axê wişaye: Bilîsqasî ji %2,4 mal xwedî ji %28, li Mêrdîn ji %4,5 malbat xwedî ji %49 û li Amed ji %6,6 malbat xwedî ji %69 zeviyan in. Birêz Beşikçi li ser Ruhayê tiştek nenivisiye. Lê çavkaniyên dewletê weka DİE nîşan didin ku rewşa Ruhayê ji her sê bajarê din bedtir

e.

Li gor Qasimlo di destpêka salên 1960 de li an Rojhilatê Kurdistanê zorandina axatiyê hene û zêdetirîn zevî di desten axa û serekeşîran de ne. Li gor hewcedarıya sazûmana mêtînkarî be jî Şahê Iranê di van salande reformek axê pêk tîne. Em ji pirtûka Qasimlo hîn dîbin ku peyî nûsaزî hêj nîvî zêdetir gundi bê zevî ne. Birêz Qasimlo di van salan de zalbûna sazûmana sermayedarî jî tîne zimên.

Di sedsala nozdem û heftê salên sedsala bistem de debara gelê kurd berî her tiştî giredayî çandinî û pez û dewarê ye. Li gor Qasimlo di sedsala nozdem de zorandina koçerî li Rojhilat heye. El û eşîren koçer qası sedsalan demeke direj be xwedîkîrina pezî jiyane. Hinek hozên eşîra Caf, Mîra, Elîkan, Dûdeyrî, Millî...hwd. bi koçerî têna sîn. Bazırganî û pîşekarî jî li Kurdistanê mêtîjûyî ne. Bazîd, Amed, Kermanşah, Mosul û heleb ji Kurdish navdên bazırganî bûn. Di sedsala nozdem de pîşekarî zêdetir di desten hindîkahiyê de ye. Ji vî alî ve pêşveçûna Ermêni û Sûryaniyan ber bi çav e. Pîse û pîşekariyên navdar sazkirina pergalên cotkarî û çekan, xeml û ziynet, telekarî, çûlagî û avakarî nin. Metîngehbûna Kurdistanê û zorandina sazumana sermayedarî ev pîşeyên bedew xistine derê pêşbaziyê.

Dewlemendiya Kurdistanê ji aliye daring û kanan ve tê zanîn. Osmaniyan û Elmanan di sala 1850 de dest avêtine sıfîrên Argînî. Li Xulamana Xarpêtê ji sala 1915 ve krom derdikeve. Ercic û zrêçen Xarpêtê ji sedsalî zêdir e bi kar têna. Kanêñ Devrîk yêñ hesin di sala 1938 de vebûn. İro devî Dêvrîk kanêñ He-

kîmxanê vekirîne. Piştî 1960 an li Kurdistan lijêñ barît, fosfat û azot kifş bûn.

Dîrika niftêñ Kerkuk, Kermanşah, Amed, Elîh, Semsûr û Behbaxanê û vejenê karabayê çemên Kurdistanê dirêj e. Pêwist e baş bê zanîn.

Li Kurdistan palukeyên mezin ava nebûne, çend safixane (rafinerî) û navendêñ vejena karabayê hene.

Weka Elîh, Kermanşah û Av-

---

*Li ser pêkhatin û  
beşkirina eşîrên Kurdan  
ramaneke bevgirtî nîn e.  
Ziya Gökalp. Martin Von  
Bruinessen, Evdirehmen  
Qasimlo û Ismaîl Beşikçi  
pêkhatin û navkirinên  
cûda beyan dikin.*

*Saziyên civakî yêñ wê  
demê hêj bewceyî  
lêkolinan in. Em bi  
awayekî vetûrî, ji jor ber  
bî jér navkirin li cîb  
dibînin. Bend ji eşîran  
pêk batine û zêdetir  
saziyên siyasi ne. Tire  
ango bar besen eşîr in,  
di binê wan de boz  
bene. Hoz ji malbatan,  
malbat ji malan  
sazdibin. El zêdetir ji bo  
mirovêñ devereke tê  
gotin. Beşek zanyar  
têqîna "el" Tirkî yan ji  
Mongoli dipejirînin.  
Bendêñ navdar yêñ  
dirokî Mîl û Zîl in.*

şînê. Ji derî vana tenî li çend bajaran pişesazî heye. Palukeyên piçûk yên pişesazî li şer çûlagî titun, ardan, çimento, şekir, xeradî û adanî ne.

## 2-Rewşa Civakî

Heta nîviye sedsala nozdem li Kurdistan mîrnîşnên serbixwe yan î xudmuxtar hebûn; Erdelan, Baban Soran, Hekarî, Bilîs yên navdar in. Mîrnîşn ji eşîran, yan jî ji bendên eşîran pêk hatibûn. Deverên ku girêdayî paşatiyên Osmaniyan yan jî valiyên Îranê bûn li wir jî disa ligor zagonên eşîren Kurdan jiyan dimeşıya. Civak ji çinêna sazûmana feodalî pêk hatibû. Malbata mîran û ya serekeşîran, axa û giregirên olî, wek şêx û seyîd refê çîna serdest bûn. Bazîrganên giregir jî têvî yê çinêne. Çîna serdest ya Kurdistanî çîneke serbîxwe nîn e; girêdayî dagîrkerên welatê ye. Di nav refê çîna navîn de şaristanî, bazîrgan û esnafên piçûk, pêşekar û gundiyyên maldar hebûn. Reaya yan jî gundi çîna bindest bûn.

Li ser pêkhatin û beşkirina eşîren Kurdan ramaneye hevgirtî nîn e. Ziya Gökalp. Martîn Von Bruînessen, Evdirehmen Qasimlo û İsmâîl Beşikçi pêkhatin û navkirinên cûda beyan dikin. Saziyên civakî yên wê demê hêj hewceyî lêkolinan in. Em bi awayekî vetûrî, ji jor ber bî jêr navkirin li cîh dibînin. Bend ji eşîran pêk hatine û zêdetir saziyên siyasi ne. Tîreango bar beşen eşîr in, di binê wan de hoz hene. Hoz ji malbatan, malbat ji malan sazdibin. Êl zêdetir ji bo mirovên deverekekê tê gotin. Beşek zanyar têqîna “el” Tirkî yan jî Mongolî dipejirînin. Bendên navdar yên dîrokî Mîl û Zîl in. Di sedsalên nozdem û

bîstem de Caf, Celalî, Rojkî û Revendî bendên navdar in. Benda Cafan desthelatdarê Şarîzor bû. Li Kerkûk, Hewlîr, Koysancax, Silêmanî, Rewandiz herîr û zal e. Ji cil û pênc eşîran pêk hatiye. Ji van eşîran hinek koçer, hinek niştecih in. Di nav van deveren jorîn de ku di bin destheletdariya Cafan de bûn tenê gundiyyên Koysancaxê bac dane Osmaniyan. Benda Rewandî ji bîst û pênc eşîran pêk hatibû zorandina wê dorhêla Rewandiz e. Ev eşîren niştecih in û titûn, ceh, gîlgîl diçînin, rezvanî û bexçevanî dikirin. Benda rojkî desthelatderê herêma Bilîsê bû. Bendeke dîrokî ye. Fermanrewatiya mîrnîşnâna Bilîs di destê wê de bû. Ji bîst û çar eşîran pêk hatiye. Di nav van eşîran de yên Kird (Zaza) û Şêxbîznî (Soran) jî hene. Di sala 1840 de li Bâzîdê benda Celalî pêk hat. Heşt eşîren Kurdan di nav wê bendê de cîh girtin.


Ji derî van bendên jorîn, li hemû deverên Kurdistanê bendên piçûk û eşîren serbix-

weyên cîvakê bûn. Birêz M. E-mîn Zekî di “Dîroka Kurdistanê” de bi sedan navê eşîran dide. Eşîren rojhilat yên mezîn ji bakur ber bi başur ev in; Celalî, Mevlânî, Şîqaqî, Herkî, li rojavayê Urmiye Beyzade, li başurê Herkiyan Zerza, Mamêş, Bîran hîn başur Mengurî, li rojhilat û başurê Mehabad Debugirî û Mukrî. Li dorhêla Eqîz Feyzullah Begî, navbeyna Seqiz, Mehabad û Serdeş de Kevorkî, li bane Üsîfxanî. Eşîren merîwan, Hewreman, Cîwanrûd û pariyek caf dikevin başurê yên jorîn. Li rojavayê Kermanşahê Sencabî û Goran, li başurê rojava Kelhur dijîn. Di nav van eşîran de yên herî mezîn Kelhur (120000) û Şîqaqaî (40000) bûn. Ji derê van eşîran qasî 60 eşîren piçûk li Rojhilat dijîyan.

Li Mosil û Behdînan Zîbarî, Doskî, Mizurî, Sindî; li Hewlîr, Xoşnav, Surçî, Bradostî; li Botan Hecîbayram; li Serhed Zîlan, heyderan, Sîpkî, Hessenan; li dorhêla Abega û Elbeka Herتوشî, li dorhêla Qerecdaxa Amîdê Millî; li Sirucê Berazî; li Merdînê Kîkî, Xelîcan, Dekşûrî, Kalederan, Omerkan, Lîf, Tat û Mîran; li dorhêla Dêrsîm Ebâsî, Bilbasî, Kovalîsi, Kalan, Kevan, Koçan, Demenan, Ferhîdan, Şadan û Îzol li Gimigim Lolan, Cîbran û Xormekî eşîren mezîn in. Eşîren Meletî wek Atma û Drêjan û yên Koçgîrî bi eşîren Dêrsîmê re di têkiliyê de bûn.

Heta van salêن dawî li Kurdistanê dêmanî û koçerî pev re bûn. Li ser rîjeya koçerî navbeyna çavkaniyan de nakokî he-ne. Li gor Qasimlo heta sedsalânozdem Kurdêñ Rojhilat zêdetir koçer bûn. Ev dibêje di sala 1851î de 8 gundêñ Banê, 14 yên Merîvan û 9 yên Hewreman he-

**Sedsala bîstem ji bo  
Kurdan dibe sedsalâ  
rêxistiniya rêzanî. Di  
destpêka sedsalê de  
Kurd dest bi pêkanîna  
rêxistinan dikin.  
Piraniya wan  
rêxistinêniy siyasi ne. Lé  
di nav de yên çandî û  
bunerî jî hene.**



*Di sedsala nozdem de  
rêveberiya Kurdan roj  
bi roj paşve çû, ya  
Osmaniyen û İranê li  
Kurdistanê zorandinâ  
xwe diyar kir. Bakurê  
Rojbilat ket bindestê  
Rusya yê. Di sedsala  
bistem de berêmên  
bakur û rojava bûn  
wîlâyetên Tirkiya,  
parêzgebêñ başûr bûn  
muhafazayêñ ıraq û  
deverên rojbilat jî bûn  
ostanén İranê.*

bûn. Di sala 1951 de ev hejmar gihiştine 161, 111 û 121. Nivîskarê "Komara Mehabad ya Kurd" William Aegleton di pirtûkê xwe de di nav Kurdan de kîmbûna koçeriyê beyan dike. Arşîvîn Osmaniyen û pirtûkênu ku li ser bingeha wan hatine nîvisandin ji bo Aegleton destek in. Qet nebe ji bo Bakurê Kurdistanê wisa ne. Nejat Göyünç di pirtûka xwe yê bi navê "Di Sedsala Şanzdem de Sancaxa Mîrdînê" de belgeyên Osmanî bi kar anîne. Li gor vê pirtûkê di sala 1526 de 503 gund û 145 gomeyên (mezrayên) Mîrdînê hebûn. Li gor jimartina 1965 Mamoste Beşikçi rîjaya koçerî %1 - 1,5 dide.

Eşîrên koçer yên mezin ev in: herkî, hinek Cafan, Mîra, Berîtan, Dûdeyran, Musîreşan, Batuwan, Kêçan, Tayan û Elikan. Ziya Gökalp di salên 1920 an de dibêje ji Kirdan (Zazayan) tenî Zîkdê koçer in.

Ji derê bend û eşîran, gundiyên rencber û bê eşîr li Kurdistanê parçeyekî civakê bûn. Ji wan gundiyan re gûran te gotin. Li gor beyanên Bruînessen û hinék zanyarên din rîjeya guranan ji gundiyan din bilindir e.

### 3-Rêveberî

Dema ku Selçukî ji Asya Nâvîn hatin Kurdistanê, dewletên bisilmân yên Kurd hebûn. Dewlata Şedadî û ya Merwani li gor pîvanê wê demê xurt bûn. Bi xurtbûna Selçukiyan ew jî dikevin binê bandora wan. Rêveberiya Selçukiyan bi riya eyaletan ve bû. Du celeb eyaleten wan hebûn. Beşek bi kargeriya "Subaşî" yek ango valiyek rasterast girêdayî sultanen Selçukî û hukumeta wan bûn. Eyaleten din bi rîveberiya mîrek pabestî sultanan e. Kurdistan di beşê duyem de cîh digire, lê dîsa serdemê Akköyûnî û Karakoyunliyan jî tê de li ser rîveberiya van sedsalan em zêde agahîdar nîn in. Ji bo dest helatdariya wê demê du mercen bingehîn pêwist bûn. A yekem li ser navê hukumdar xwendina xutbê ye. A duyem bi navê wî derxistina perayen e. Ev her du merc nîşanen dewleteke Bisilman ya serbixwe ne. Komkirina bac û xeracê tevî van mercan dibe. Ji bilî kargeriya dewletê, rîveberî li gor rewşa civakê û saziyên civakî dimeşıya.

Serdema Osmaniyen ji aliyê rîveberî ve baştır tê zanîn. Di sala 1517 de bi ferманa Yavuz Selim, İdrîsê Bilîsî dibe rîveber û reyadarê Kurdistanê. Bilîsî Amîdê dike 19 sançax, rîveberiya li sancaxan bi erkdarên Osmanî, 8 bi yên mîrên Kurda bû. Palû, Gêl, Cizîr, Hezo û Dara-hînê hukumetên serbixwe ne, li gor M. Emîn Zekî Elaşgîr û Xa-

bur jî serbixwe bûn. Çavkaniya vê agahiyê "Cihannâme" ye. Martîn Van Bruînessen dibêje serxwebûniya van hukumetan heta sedsala nozdan didome.

M. Emîn Zekî li ser rêveberiya dorhêla Wanê jî radiweste. Li gor beyanên wî, li dorhêla Wanê 37 sancax û 4 hukumetên serbixwe hebûn. Bilîs, Mehmûdî, Hekarî û Pinyanîş serbixwe ne. Lîbelê li gor Zagonnameya Osmaniyan ya 1589 li wir 13 sancax hene û tenî Bilîs hukumetê serbixwe ye.

Amediye û Mehriwan hukumetên serbixwe yên başûrê welêt in. Rojhilat li bin destê Îranê ye. Piştî Peymana Qesra Şîrin desthelatdariya Îranê dibe "fermî". Li gor agahiyê Ewliya Çelebî Qotur, Pireduzî, Cevlanî, Demdemî û Dunbulî hukumetên Rojhilat yên serbixwe ne.

Di destpêka sedsala nozdem de êdî li Kurdistanê hukumetên "serbixwe" nîn in. Mîrnîşinê xudmuxtar hêj rêveberiya gel dikin. Mîrnîşinê mezin yên wê demê ev in; li başur Baban û Soran û Hekarî. Li Rojhilat Erdelan, li bakur Bilîs û li Herêma Navendî Botanî, Behdinan in. Deverênu ku ji derî rêveberiya mîrnîşinan bûn, li wan deran yan rêveberiya Şehînsahîyê dagirker, yan jî ya eşîrên Kurda hebû. Hinek eşîr bi tevahî azad û serbixwe ne. Eşîra Millî û eşîrên Dêrsim ji wan mînak in. Li bakurê Kermansahê eşîra Janro dijiya. Li gor Qasimlo hefta sala 1953yan ew eşîrek serbixwe ye.<sup>4</sup>

Saziya rêveberiya Osmaniyan li ser bingeha wîlayetê ango eyaletan bû. Di sedsala nozdem de ev bajarê Kurdistanê Wila-



Şêx Saîd

*İro dem û merc batiye  
gubertin. Rewşa Cîban û  
Kurdistanê ne weka  
sedsalan berê û ya  
destpêka sedsala bîstem e.  
Ji alîyê rêzanî û rîxistinî  
ve Kurdish gelek gavêne  
gîring avêtîne. Kefen êdî  
batiye çîrandin, veger û  
mirin, di nav pelên tarî  
yên dîrokê de li paş man.  
Rojeke azad bi tîrêjên xwe  
ronî dide sseranserê Welatê  
Rojê. Lîbelê hêj li pêş  
riyeke zebmet û dirêj beye.*

yetê Osmanî bûn: Erzerom, Mosil, Amed, Wan, Xarpêt, Şarîzor, Qers, Çildir û eyaleta Zulqedriye. Kargerêne wîlayetan paşyê Osmanî ne.

Eyaleta Şarîzor ji bîst sancahan pêk hatibû. Mehriwan tê de hukumeteke serbixwe ye. Hinek deverêna Başur girêdayî Bexdadê ne. Ruha û Ssirûc û demekê jî Xabur girêdayî Eyaleta Reqa; Birecûk û Kilîs girêdayî Eyaleta Helebê bûn. Eyaleta Qersê ji 6 sancaxan ya Çildirê ji 13 sancaxan pêk hatibûn. Çend sancaxan Çildirê ji derê Kurdistanê ne. Erzerom 10 sancax e. Gurgum (Meres), Meletî, Dilûk û Semsur bi navê Eyaleta Zulqedriye tên nasîn. Koçgîrî pabestî Wilayeta Sêwasê bû Hewcayî gotinê ye ku rêveberî û desthelatdariya Osmaniyan tenê li dorhêla bajaran e. Aborî û rêzanî ji bo rêveberî bingeh in. Di dîroka Kurdistanê de ev rastî gelek caran hatiye selmandin. Di sedsala nozdem de rêveberiya Kurdan roj bi roj paşve çû, ya Osmaniyan û Îranê li Kurdistanê zorandina xwe diyar kir. Bakurê Rojhilat ket bindestê Rusya yê. Di sedsala bîstem de herêmên bakur û rojava bûn wîlayetên Tirkiya, parêzgehêne basûr bûn muhafazayên İraq û deverêne rojhilat jî bûn ostanê Îranê.

#### 4- Rewşa Rêzanî

Di destpêka sedsala yanzdem de Şehînsahîya Ebasî ketibû halikî jar. Hebûna xelîfe tiştekî têni dawerî (sembolîk) mabû. Hêz û desthelatdarî ketibû desten Ariyan Büyid. Tirk eşîr bi eşîr ji Navenda Asya koç dikirin û dihatin Îran û Mezopotamya. Kurd xwedî dewletên Bisîlman

weka Merwanî, Şedadî û Hesenweyhî ne.

Têkiliya Kurdan û Tirkan bi Selçukiyan dest pê dike. Ev tekili carna bi aşitî carna bi şer dimeşe. Ne Selçukî û ne jî peyrewên wan karakoyunlî û Akkoyulî yekber nikarin bibin desthelatderê Kurdistanê. Di tekiliya Kurd û Tirkan ya wan sedsalan de tîştêñ balkêş jî hene. Mîrnîşîna Germiyan mînakeke vê têkiliye ye. Ev mîrnîşîn di sala 1275 de, li rojavayê Enedolê hatiye damazrandin. 125 sal jiya-ye. Paytexta wê Kutahya ye û desthelatdariya wê digihêje heta Aydin, Denizlî û Afyonê. Mîrnîşîneke hevbes ya Kurd û Tirkan e. Rêveberên wê zêdetir Kurdên Yezdanî ne. Seydayê Zanîngeha Sorbonê Claude Ca- hen yê Beşa Dîroka Bisîlmanî di pirtûka xwe de li ser vê taybetiyê radiweste. Navê pirtûkê "Ji Berê Osmaniyan li Enedolê Tirk" e.<sup>5</sup>

Peymana Yavuz Selîm û İdrîsî Bîdlîsî jî dewletbûn û pêşveçûna cîvaka Kurdan e. Lê dîsa peymaneke dualî ye. Ji bo Kurdan "bextreşî" yan jî "qewlê ji holê rakirinê" bi destpêka sedsala nozdem zal dibe. Di destpêka vê sedsalê de taybetiyê rêzaniya Cihanê û ya Rojhilata Navîn ev in:

Fransa û îngîlîstan hêj zilhêzen dinyayê ne. Rusya û Elmanya weka hêzên nû teví wan dibin. Ev her çar dewlet li gor berjewendiyê xwe endaz-yariya rêzaniya Rojhilata Navîn dikin. Li ser vê.bingehê bi aşitî yan bi şer tekiliyê wan û Osmaniyan hene. Nasnavê Dewleta Osmanî "Mirovê nexwêş" e. Desthelatdariya Osmaniyan li Ewrûpa û li Balkananjar bûye.

Nakokiyêñ ku di navbeyna zilhêzan de hene destûra faşilbûna Dewleta Osmanî nadîn. Rusya roj bi roj bi başur ve diherike û di destpêka sedsalê de digihêje tixubêñ Kurdistanê. Navbeyna Osmaniyan û Îranê, Îran û Rusya, Rusya û Osmaniyan de şerên tund û dijwar derdiketin.

Serêñ van dewletan ji hemû alî ve li ser axa Kurdistanê û Ermenistanê domand. Ji dewsâ Fransa, Elmania bû piştgir û hevelbendê Osmaniyan.

Rêzaniya Osmaniyan ya li ser Rojhilat, ji holê rakirina mîrnîşînen Kurdistan û destheletdariya wan bû. Sultan Mehmed Duyem bi vê mebestê artêşen we dişine li ser Kurdan. Dewleta Elman bi serbazî û çekan piştgirê vê rêzaniya Osmaniyan e. General Moltke ji bo vê piştgirî mînakek e.

Di nav mîrnîşînen Kurdistan de Soran û Botan xurt bûn. Mebest û armanca wan dewletbûn û pêkanîna yekitiya Kurdistan bû. Her du mîrnîşînan konseyên rêzanî û leşkerî, heta yêñ zanyarî saz kirin. Palukeyên çekan û topan damezrandin. Lî ser avahî, avakarî û çandinî radiwestin. Bi erişen Osmaniyan yêñ ne rewa tund û dijwar di sala 1836 de mîrnîşîna Soran, di 1846 de ya Botan têk çû.

Piştî nîvbûna sedsala nozdem li bakur û başurê Kurdistanê tu mîrnîşîn li ser piyan nema. Li Rojhilat tenê mîrnîşînnâ Erdelean 15 sal piştî faşilbûna yêñ din desthelatdariya xwe domand. Têkîna vê mîrnîşînê sala 1865 e.

Peyî encama mîrnîşînan ya nebaş bi awayekî din serhildana Kurdan dest pê kir. Serhildanê

sedsala nozdem yêñ navdar Serhildana Yezdan Şêr ya 1856 û ya Ubeydullah Nehri (1880) ne. Li ser parçekirina cîvaka Kurdan rêxistîneke leşkerî ji aliyê Osmaniyan ve dawiya wê sedsalê hat damezrandin. Bi nav, Alayê Hemidî ziyanê gelek mezindan Kurdan û cîranêñ wan.

Sedsala bîstem ji bo Kurdistanibe sedsala rêxistîniya rêzanî. Di destpêka sedsalê de Kurdest bi pêkanîna rêxistinan dikin. Piraniya wan rêxistinê siyasî ne. Lê di nav de yêñ çandî û hunerî jî hene. Rêxistinê ku têñ zanîn û mejûyêñ damezrandina wan ev in: Cemiyeta Azmî Qewî ya Kurd (1990), Cemiyeta Teawûn û Terakî ya Kurd (1908), Cemiyeta Teawûn û Terakî ya Kurd (1908), Cemiyeta Tamîm û Maarîf (1919), ev rêxistin şaxek Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê ye. Cemiyeta Tealî ya Kurdistan (17 Bbefranbar 1918, Stenbol), Cemiyeta Tealî ya Kurd (1918, Amed), Cemiyeta Muhibanî Kurdistan (1912 ?), Cemiyeta İstîqlalî Kurdistan, bi navekî din Azadî (1923, Erzurum), Xoybûn (1927, Meha Kewçerî, li Beyrût), Komala Jiyaniweyi Kurdistan (1942, Mehabad), partiya Demokratî Kurdistan (16 Gelawê 1945, Mehabad).

Ji van rêxistinan çendek amadekarê serhildanan in. Endamê Cemiyeta Tealî ya Kurdistan Nurî Dêrsimî û hevalên wî di nav pêşengiya Tevgera Koçgirî de ne. Amadekarê Serhildana Şêx Seid rêxistina Azadî ye. Di nav mebesta Xoybûnê de pêşengiya Serhildana Agirî heye. PDK Komara Kurdistanê damezrîne. Ji bilî serhildanêñ

rêxistinî yên vetûrî ev in: Serhildana Sîmko (1922), Berzencî (1919), Dêrsim (1938), Berzanî (1961).

Merc û dem ji hev cûda bin jî, ji bilî tekoşîna netewî ya hemdem encam û çarenûsên hemû serhildanê sedsala bîstem wekhev in. Nola serhildanê sedsalê berê encam têkçûn û xwespartin bû. Di nav rêxistinê jorîn û endamên wan de du ramanê cuda yên bingehîn xuya dikin. Serxwebûnî an xudmuxtari! Cemiyeta İstîqlalî Kurdistan (Azadî), rêxistina Xoybûn û beşek endamên Cemiyeta Tealî ya Kurdistan alîgirê serxwebûnê ne. Rêxistinê din û endamên wan xudmuxtari dixwastin. Carna rama-neke zelal û siyasi ya rêxistinan diyar nîn e.

## ENCAM Û REWŞA İRO

Hejmara raperîn û berxwedanê kurdan bi sedan e. Bi milyonan Kurd ji bo azadiya gelê xwe mirine, bi mîlyonan koçber û aware bûne. Encam dîsa bindestî, pergendeyî û wela-tekî mêtîngeh bû. Gelo sedem çî ne?

Sedemên têkçûna van serhildanê û berxwedanê gelek in. Pêwist e li sedemên tekçûna hemû serhildanê yek bi yek bê kolandin. Sedemên têkçûnan yên gelemerî ev in:

1- Ji aliyê aborî û civakî ve perçebûn. Nakokiyênavxweyi destûra tevgereke netewî û niştimanperwerî nedan. Dubendî, eşirtî, axatî û nakokiyê alî sedemên girîng bûn.

2- Nebûna çînên hemdem û rêxistinê wan.

3- Taybetiyê serokatiyan: Pêşeng û serokê serhildanê serekîl, mîr, axa, beg yan jî şex bûn. Weka tê zanîn ew nûnerên

çîna vetûrî ango feodalî ne. Gelek caran berjewendiyêwan yên çînî, eşîrî û malbatî ji berê yên neteweyî dihatin. Ji rama-neke hûrbîn û dûrbîn dûr bûn. leyistikên dijminê xwe nedîtin.

Ji bilî van her sê xalan: Li ser Kurdistanê berjewendiyê Ewropiyan, dek û dolabê dewletê emperialist û yên dagirkeren herêmî, ji aliyê dagirkeran ve parçebûna Kurdistan a siyasî sedemên din in.

İro dem û merc hatie guher-tin. Rewşa Cîhan û Kurdistanê ne weka sedsalan berê û ya destpêka sedsala bîstem e. Ji aliyê rêzanî û rêxistinî ve Kurdistan

gelek ga'ven girîng avêtine. Ke-fen êdî hatiye cirandin, veger û mirin, di nav pelê tarî yên dîrokê dê li paş man. Rojeke azad bi tîrêjên xwe ronî dide sseran-serê Welatê Rojê. Lîbelê hêj li pêş riyek ze-hmet û dirêj heye.

Cend pirsgirêkên girîng li hêviya çareserkirina pêşawa û pêşengê Kurdistan e. Damezrandin û xurtkirina sazgehê netewî, pêkanîna yekîtiya gel û hemû parçeyan, ji wan pirsgirêkan in. Ji rêzanî bigrin heta zanyarî û huner Kurd hewcayê pisporê (qedroyê) xurt in.

Bi bawerî û hêviya pêşerojê azad û serbixwe.

## Ç A V K A N İ

- 1- Aegleton William; Komara Kurd ya Mehabadê Weşanên Koral, Reşemî 1976
- 2- Ehmed Mesûd; Di belgeyîn İngîlîzde Kurdistan 1918-1958 Weşanên Doz, Gulan 1992
- 3- Avyarov; Kurd û Şerîn Rûs-îran û Osmaniyan, 1801-1900 Weşanên Sîpan, 1955
- 4- Aytar Osman; Ji Alayê Hemûdî Ta Cerdevanî Gundan, Weşanên Medya Günesî, 1992
- 5- Beşîkçi İsmail; Lî Rojhîlatê Enedolê Eşîren Kurd Yen Koçer, Weşanên Yurt, çapa yekem, 1992
- 6- Beşîkçi İsmail; Lî Rojhîlat Guhîn û Pirsgirêkê Sazî (Eşîra Elîkan a Koçer). Weşanên Yurt, çapa yekem, 1992
- 7- Bruijnessen, Martin V.; Axa, Şêx û Dewlet. Weşanên Öz-ge
- 8- Celîlê Celîl; Dî sedsala XIX.de li Şehînşahiya Osmani Kurd. Weşanên Özge, Reşemî, 1992.
- 9- Dêrsimî Nuri; Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim. Weşanên Dilan, çapa çarem, 1992.
- 10- Eickstedt Egon Von; Ji Serdemê Seratayî ta İro Tirk, Kurd û İranî. Weşanên Fırat, Rezber, 1993
- 11- Gökpal Ziya; Li ser Eşîren Kurdish Lîkôlîneke Civakî. Weşanên Sosyal, çapa yekem, Avrîl, 1992.
- 12- Göldas İsmail; Cemiyeta Tealî ya Kurdistan. Weşanên Doz, çapa yekem 1991
- 13- Goyunç Nejat; Di sedsala XVI. de Sancaxa Mîrdinê. Weşanên Saziya Dîrok a Tirkiya, 1991
- 14- Kalman M.; Bi Belge û şahîdan Berxwedanê Dêrsimê. Weşanên Nûjen 1995
- 15- Karabekir Kazim; Pirsgirekâ Kurdan, Weşanên Emre, 1994
- 16- Kılıçbay Mehmet Ali; Terza Hilberîna Osmaniyan ya Vetûrî û Feodalîte. Weşanên Teori, çapa yekem, 1985
- 17- Kohler Wilhelm; Di Seyhetnameya Ewliya Çelebi de Bidîs û Gelê Wê. Weşanên Alan, 1985
- 18- Kutlay Naci; İttihât Terakkî û Kurd. Weşanên Beybûn, çapa seym, 1992
- 19- Miroğlu İsmet; sancaxa Kemah û Navçeya Erzîngan. Weşanên Saziya Dîrok a Tirkiya, 1990
- 20- Olson Robert; Hilatîna Neteweperweriya Kurd û Serhildana Şex Seid 1880-1925. Weşanên Zankoya Teksalasî, 1991
- 21- Qasemlo Evdirahman; Kurdistana Îranê. Weşanên Belge, Rezber, 1991
- 22- Polatyan Arşak; Ji Sedsala VII an heta ya X Ermenî û Kurd.
- 23- Surma Xanım; Bergerîna Nînowa. Weşanên Avesta, Avrîl, 1996
- 24- Şeref Xan; şerefname. Weşanên Hâsat, 1990
- 25- Tûku Ömer; Li Kurdistanê Pîsesaziya Tîrkan. Weşanên Doz, Sermawez, 1991
- 26- O'Ballence Edgar; Tekoşîna Rizgariya Kurdistana Iraqê 1961-1970. Weşanên Yöntem, 1977
- 27- Hesreytan M.A.; Li Tirkîye Pirsgirêkâ Kurdan (1918-1940), Berg-1. Weşanên Instituto Kurdi, Reşemî, 1995
- 28- Xemgiñ E.; Di Dema Osmanî û Safewiyan de Dîroka Kurdistanê, Bergê III em. Herawsgeber, Agri Verlag, 1991.
- 29- Zekî M. Emin; Dîroka Kurdistan. Weşanên Beybûn, 1992.
- 30- Di belgeyîn Koma Miletan de Pirsgirêkâ Mosul-Kerkük û Pervekirina Kurdistanê. Weşanên Med.
- 31- Di Çavkaniyê Serleskeriya Giştî de Serhildanê Kurdan. Weşanên Kaynak, 1992
- 32- Zagonnameyî Osmanî; Salê 1589-1603

**MEHMET CAN YÜCE**

(Ji Tırki: Hasan Kaya)

**K**onferansa ku bi mebes-ta nîqaşa pirsgirêkên dîroknivisiya kurdan yên metodî hatiye lidarxistin pir bi wate ye û girîng e. Em vê weke pêşveçûnêke girîng dinirxînin û xwediyêvan gavan ji can û dil pîroz dikan.

Em hemû beşdaran, bi hurmet slav dikan. Daxwaza me ew e ku ev konferans, di warê dîroknivisiya kurdan de bibe xwedîye şûneke nemir û bi serkeftin bibore. Di derbarê

Xaleke girîngtir a bi qasî gengeşiyê bi xwe heye. Ew jî eve: Divê ku ev xebat bi awayekî zanistî, bi seviye, encam girtin û afrandêr were kirin û bi rève birin. Em dixwazin balê bikşînin ku ev dabaşeke ewqasî giring e ku divê nebe malzeme ji bo nîqaşa şexsî. Hêviya me ji ronakbîr, dîrokvan, dîroknivisan ew e ku di derheqê dîroknivisiya kurdan de xebatê hêja biafirînîn.

Ez nivîseke xwe ya ku di

zelal.

Helbet yên ku li ser azînê li hev nekin, ne mimkun e ku li ser hêmana dîroknivisiyê ji li hev bikin. Dîroknivisi beşek ji ideolojiyê ye. Ji ber ve sedemê, Kurdênu ku ji çin û dîtinê ideolojîk yên cihê pêk têne mimkun e li ser yek dîroknivisiyê li hev bikin. Her çin wê li gorî rewşa çînîtiya xwe, li gorî feraseta xwe, dîtina xwe ya dîrokê bi pêş bixe. Bê sik têkoşîn ku di vî warî de were jiyîn bi sûd e. Ev nîqaş û têkoşîn wê bibê sedema pêşveçûna dîroknivisiyeke çaktır.

Em ji dîtina dîroknivisiyeye zelal û rast, dîtineke şoresser, welatparêz û enternasyonalist fam dikan. Bi gotineke cihê, dîtina me ya dîrokê, pêkanîna sosyalîzma zanistî, li gorî mercen me yên rastî (reel) ye. Ev pêkanîn bi awayekî afrandêr e.

Piştî ku mebal kêşand ser van çend xalan, êdî ji bo ku gengeşî çaktır û adantir were kirin, em dixwazin dîtina xwe ya di derbarê dîroknivisiyê de û têgisitina me ya ji teoriya netewê bi kurtî bînin zimên. Piş re jî em dê bîborin mijara binyada kurdan û bê em çawa li "derketina kurdan" dinêrin, pêwistî bi kîjan metodê (azînê) heye.

II

Ji bo pêşxistina dîroknivisiya Kurdan de, ya ku di rojnameya Demokrasiyê û kovara Özgür Halkê de hatibû weşandîn, li jîr didim.

Bi dîtinek rast li gerdûnê nêrîn, ferasteke dîrokê ya rast û teoriyeke netewê ya rast û

Bi dîtina me, "... dîroka derbasbûyi, em nîrê kevnare deynin cihekî, têkoşîna di navbera çinan de ye..." (F. Engels, berhemên bijarte-3, rûpel: 159)

Dîrok, çêkirina dîrokê, têkoşîna çinî pêwist dike. Têkoşîna çinî jî, zanîna civa-

# Hinek Notêni Li Ser Metoda Dîroknivisiya

*K u r d a n*

dîroknivisiya kurdan de hinek gengeşiyênen nûjen çedîbin. Ev gengeşî di cihê xwe de ne. Divê ku ev gengeşî bêne xur-tirkirin û bi pêşvebirin. Qene, ji bo ku dîroka kurdan a ku bi salan e di nava tariyê de bi qesta hatiye veşartin, derkeve holê û bi awayekî rast were nîvîsandin, em yan gengeşîyan girîng û di cihê xwe de dibînin. Ji bilî van jî em difikirin ku ev gengeşî dê bando-reke erêni li ser pêvajoya netewibûnê bîhelin.

kîyê, zanyarîyê û serokatiyê bi xwe re tîne. Lewma gelê ku dîrokê diafirîne; bê şik gelêkî, xwedîzanîn, rîxistin û seroketiyeckak e.

Dîrok, rîyeke rast û erwaz naşopîne. Xeteke tekamûlê ya çarenûsvan naşopîne. Li gorî çarenûsê, form û şemayên ku ji berê de kîfş in jî nameşe. Pêdiviyêncivakî yêncerekîn ên dewrê (qirnê) û şerê ji bo bidestxistina van pêdiviyân, pevçûnê berjewendî yêncîbê hejmar, mora (nîşan) xwe li çebûna pêvajoya dîrokî dixe û bandorê lê dike.

Dîroka Kurdan a ku digihîje heta salêñ 1970yan, têkçûna netewî ya yek alî ye. Baş e, kî ev dîrok çêdikir? Kê dinivîsî?

Yêñ ku dîrokê çêdikin, serdarêñ pêvajoya dîrokî, bê şik ew dîrokê dinivîsin jî. Di navbera dîrokçêkirin, bîr û baweriya dîrokê, û dîroknivisiyê de têkiliyê rast û rîhe ne. Yêñ ku dîroka têkçûn û qirkirina me ya netewî çêkiriñe, dîroknivîsî jî di bin destêñ xwe de hiştin. Em ji bîr û baweriya dîrokê bê par û mehrûm kirin. Ango em bê hiş kirin. Bi ser de jî feraseta xwe ya dîrokê, feraseta nîjadprerest, kelkotî kirine serê me. Xwestin, me ji me dûr bixin, me ji rastiya me dûr bixin. Di vê biyanibûna netewî de, pişavtin bû çekeke xwirt (zexm).

Cîn û dezgeha ku di dîrokê de rola xwe bi kar tîne, bê şik wê di nivîskariya dîrokê de ji gorî dîtina xwe ya îdeolojîk bitevgere. Ev zagonike hêzê û serdestîyê ye.

Nivîskariya dîrokê katego-

riyeke îdeolojîk e. Demxeyeke (moreke) netewî û çînî hil-digire. Ji ber vê yekê, dîrokni-visiyeke bê alî, raserî çînûn û dijî îdeolojiyan tune ye û nikare bibe ji. Di derbarê vê mijarê de dîtinêñ "Ali Fîrat" em dikarin bi vî awayî berbiçav bikin: "Bîr û baweriya dîrokê, ravêja îroyîn û pêşerojê ye."

Heta salêñ 1970'yan Kurd, nesneya dîrokê bûn. Pişti salêñ 1970 yan xwestin ku dîroka xwe, bi xwe çêbikin; gihaştine vê vînê û gavê û hêdî hêdî bûne kirdeyê dîrokê. Kurd gihaştin qonaxa dîrok çêkirinê. Gengeşiyêñ ku iro di derheqê dîroknivisiyê de têne

dike, li gorî ci pîvanê biryar têt dayin? Em di vê mijarê de bi gorî kîjan pîvanê li gorî biryar didin? Em di vê mijarê de bi gorî kîjan pîvanê bitevgerin? Bi kîjan pêwendiyen ve girêdayî bimînin? Gengeşî li ser van pirsan dom dike. Hînek hemû şarezatiyêñ ku li Mezopotamyayê jiyanê weki "bav û kalêñ" kurdan dipejirînnin. Li gorî vê dîtinê, bîr û baweriyeke dîroka kurdan pêş ve dibin. Kesin jî bî dîtineke cihê nêzîkdayînê didin. Baş e, dema gelêñ ku li ser vê xakê jiyanê bi û kurdan re dan û stendin kirine, têkili danîne; yêñ ku van têkili û danûsten-

*Di derbarê dîroknivisiyâ kurdan de binek  
gengeşiyêñ (nîqasên) nûjen çedibin. Ev gengeşî di  
cibê xuwe de ne. Divê ku ev gengeşî bêne kûrtirkirin û  
bi pêşvebirin. Qene, ji bo ku dîroka kurdan ya ku bi  
salan e di nava tariyê de bi qesta hatiye veşartin,  
derkeve bolê û bi awayekî rast were nivîsandin, em  
van gengeşîyan girîng û di cibê xuwe de dibînin. Ji bili  
van jî em difikirin ku ev gengeşî dê bandoreke erêni  
li ser pêvajoya netewibûnê bibêlin.*

kirin bi wê dîrokçêkirina ku li jor me qala wê dikir ve girêdayî ye. Têkiliyeke rast û rî de navbera van mijaran de heye. Yêñ ku vê nîqaşê dikin, xwedîyê-îdeolojîyê cihê bin jî, dive mirov çavêñ xwe li ber vê rastiya ku hatiye kirin negre (miç neke).

### III

Kurd ji kîjan nîjadî hatine, ji kîjan medeniyetê hatine? Mirov dîroka kurdan ji ku deverê bide destpêkirin? Dema mirov pêşiyêñ kurdan tesbit

dinan dinirxînin li gorî ci pîvanê, bi bîr û baweriyeke çawa ditevgerin."

Berî "delîlêñ zanîstî" bêne rîzkirin (ristin), ji bo me azîn, dîtin û rewşa îdeolojîk girîng e. Kî, ci ji teza xwe ya zanîstî re bike qalik (qilif), bila bike di encamê de mecbûre ku kîrû û danêran li gorî bîr û baweriyeke diyar şîrove bike û ji nû ve rave bike. Heke were gotin ku "em dixwazin dîtineke di ser îdeolojîyê re biafirînnin" ev ji xwe xapandinê pê de ne tu tiş e. Di çareserkiri-

na pirsa “eslê kurdan” de, pêwist e kîjan pîvan û pêwendî weke bingeh bêne girtin? Bersiva vê pirsê, di nézîdayîna teoriya netewê de veşartî ye. Weke mînak, dîtina ku derketina qewmî weke beşekî cihêrengiya netewî dide nîşan, tiştekî xwezayî ye ku di

navbera Kurdan û bav û kalên wan de li pêwendiyekê bigere. Ji bo ku vê yekê îspat bike, wê dest bi lêkolînên zanistî bike! Lê, dîtina ku di navbera kurdan û bav û kalên wan de ne li pêwendiyên qewmî, li pêwendiyên din digere wê pirsgireka binyadî bi awayekî din dayne holê û şrove bike.

Di navbera Sumeriyên ku berî hezar salan li vê xakê ji-yîne, gelek şarezayî afirandîne û ji bo mirovahiyê pir ked dane û kurdan de pêwendiyên çawa, têkiliyên bi ci rengî dikare bêne sazkirin. Hinek ni-vîskarênen Kurd, sumerian weke bavû kalên kurdan dipejirînin. Di gîhîstina vê encamêde, benê qewmî, pîvana bingehîn tê girtin. Bêje hema gelekî ku berî niha bi deh hezar sal jiyaye û gelekî ku iro gav ber bi pêvajoya netewîbûnê diavêje çawa ji yek çiqlê darê tênen. Ev tiştekî dûrî aqilan e. Dîtineke ji bo fikara îdeolojiyê ye.

Di navbera gelên ku li ser vê xakê jiyane û kurdan de pêwendiyek heye. Ev rast e. Lê, ma ev pêwendiyek qewmî ye? Dîsa, li gorî qenaetekê giştî, Medan B.Z (Berî zay-hinê) 1000 salî ji bakûrê ewrupa koçberî navbera Gola Wanê û Urmiye yê bûne. Medan li vê herêmê sêsed salî şerê wargirtinê û bi gelitî li ser piyamayînê kirine. Em dipirsin, meden ku sêsed salî têkoşîna gelbûnê dane û meden ku hêj nû ji ewrupa hatine, ji hêla xisûsiyeten xwe ve, ji hêla naveroka qewmî ve weke hev in?

Em dixwazin vê yekê bibêjin: Teoriya netewîbûnê û gelbûnê yên ku pişta xwe

dane teoriya “binyada qewmî” çewt in, bê biñgeh in. Me nagihîjinin bîr û baweriya rast, şoresger, welatparêz û internasyonalist. Helbet, tarîfa hemû ol, qewm û gelên ku li Mezopotamyayê jiyane û dijin kurd in nabe karê me. Ev nîjadperestîyeke bê bin geh e. Ji xwe xapandinê pê de bi kêrî tu tişti nayê.

Berî ku em biborin, em bêjin; xwe xapandin li nik kurdan bûye “xisûsiyetek netewî”. Bi ser de jî “mekanîzmayeke xweparêstîne” ye.

Em didomînin, baş e ya rast ci ye? Di vê mijarê de teoriya Stalin ya netewî ya herî zexm, dikare karê me hêsan bike. Her çend em teoriya Stalin ya netewî kêm û qels bibînin jî, dema ku netewê tarîf dike, teza wî ya ku dibêje; “civaka bi istikrar ya ku di pêvajoya dîrokê de çêbûye” li gorî me rast e. Dema ku dîtina dîrokê ya kurdan bête çêkirin, mutleq dive ku em vê teoriyê bidin ber çavê xwe. Netew di himbêza berbanga kapitalizmê de derketin. Lê belê, beriya wê jî heye. Dîroka berî netewê, pêvajowoya dîrokê ya bi istiqrar neyê dîtin; têgîhîstin û tarîfkirina netewan ne mimkûne.

Di paşa dîrokê de, di navbera gelan de “qolonyalîz-mek xwezayî” ango “pişavtînek xwezayî” hatiye jiyîn. Di pêvajoya ku qewm, êl û gelên ku bi sedem û teşeyen cihêreng têkilî bi hev re danîne de, di bin bandora hev û din de mane. Her çiqas di vê têkiliyê de faktora “zorê” hebe jî ev danûstendinek xwezayî ye; vê pêvajoya ku bi salan domkiriye, bûye bênderbûna

**Pêdiviya kurdan bi îdeolojiya “Türk Tarîh Tezi” û “Güneş Dil Teorisi” ya ku demekê kemalistan afirandîya ya şoven-nîjadperest tune ye. Berevajiyê vê, kurd nêrîn û dîtinêni wiba çewt, li gorî pêvajoya xwe ya dîrokî weke kirîyek nakokî dipejirînin. Vê yekê, ji netewîbûna xwe ya rojane re weke astengiyekê dibînin. Kemalist, mecbûr bûn ku îdeolojiyên bi vî rengî biafirînin; an na dê çawa kurd ïnkar û ïmha bikirana; dê çawa kurd di nav netewîbûna Tîrkan de bîbelanda, îspat û delîlên bi ci awayî bidita. Li gorî wan gelên Mezopotamyâ û Enedolê tev Tûranî bûn. Heta hemû gel, ji tûraniyan derketibûn (zêde bûbûn). Ev nêzîdayîna şovenîst, ji bo ïnkarkirin û ïmha Kurdan ya netewî bû.**

gelan. Yêñ zexm bêtir bandor kirine û hindiktir di bin bandorê de mane. Di encamê de her çiqas yêñ zexm bûne xwendî rengên dewlemend jî, sentezek nûjen derketiye holê.

Ci bi wan qewman, êl û gelên ku, nayêñ hejmartin yêñ ku negihîştine heyama îro hat? Helbet birek (beşek) ji wan hate qirkirin. Lê yêñ din? Ev "yêñ din" di pêvajoya dîrokê de ji ber sedemên cihêreng bi gelên din re "pişavtineke xwezayî" jiyîn. Reng û xisûsiyeten wan bi nasnamî, û rengên cihê re heliyan. Jî xwe ev pêvajoya xwezayî ji bo Mezopotamya hîn bêtir derbas dibe. Mezopotamya ya ku dergûşa şarezayîye ya ku ji êl, qewm û gelên bê hejmar re mazûvanî kiriye; dikare ji kê re bibe mal, ji kîjan qewmî re bibe gemardan. Ji heyama kevnare heta îro pir hindik jiyana xwe domandine. Li ser xaka me, Ermenî, Asurî, Kurd û hwd... Mirov dikare bibêje ku di rabidüya van de tu pirsgirêkên xwezayî, têkilhevbûna gelan ya xwezayî û helandin çenebûye. Kî dikare vê yekê îspat bike û çawa?

Berî nîrê kapitalizmê di rastiya qewman de, pêwen-diyyêñ qewmî, heta dereca yekê bibe faktor jî, em dikarin bibêjin ku ev ne girîng in. Li herêmên ku hêj hindiktr dan û stendin bi hev re dikirin, di-be ku pêwendiyêñ qewmî bûne faktorêñ cihêtiyê. Belê li Mezopotamya û Enedolê li ser xaka kevnare ya ku ji şarezayî û gelên bê hejmar re mozûvanî kiriye, gel di nav hev de, li nik hev û bi têki-liyêñ bê hejmar mecbûr mane

bi hev re bijîn, hinekî bi xwezayî û hinekî jî bi zorê pişavtin pêk hatiye. Li ser vê xaka kevnare, mirov, gelbûnê û îro jî netewîbûnê li gora binyada qewmî şirove bike, ji şirovekîrina dîrokê ya qewmî û nijadperestî pê de ne tu tiş e. Tu hêjayiya van nirxandin û şirovekirinê zanistî tune ye. Lê dive em bibêjin ku ev bîr û bawerî, ev dîtin ji gelên herêmê re xetereke potansiyel e.

Pêdiviya kurdan bi ideolojiya "Türk Tarîh Tezî" û "Güneş Dil Teorisi" ya ku demekê kemalîstan afirandiya ya şo-

ven-nijadperest tune ye. Berevajiyê vê, kurd nêrîn û dîtinêñ wiha çewt, li gorî pêvajoya xwe ya dîrokî weke kirûyek nakokî dipejirînin. Vê yekê, ji netewîbûna xwe ya rojane re weke astengiyekê dibînin. Kemalîst, mecbûr bûn ku idêolojiyêñ bi vî rengî biafirînin; an na dê çawa kurd ïnkar û ìmha bikirana; dê çawa kurd di nav netewîbûna Tîrkan de bîhelanda, îspat û delîlên bi çi awayî bidita. Li gorî wan gelên Mezopotamya û Enedolê tev Tûranî bûn. Heta hemû gel, ji tûraniyan derketibûn (zêde bûbûn). Ev nêzîk-dayina şovenîst, ji bo ïnkarkirin û ìmha Kurdan ya netewîbû.

Lê ji kurdan re çi pêdevî bi van teoriyêñ koteñ û çewtî heye? Heke gelbûna Kurdan dê bi, pejirandina wan ya li ser vê xakê bi cih bûn û Medan were destpêkirin, ev pêvajoyeke ku sêsedsal dom kiriye ya ku li hemberê Asûriyan bi hevalbendi, dostanî û yekîti bi pêşve çûye ye. Ango gelbûna Kurdan, ne bi bindest xistina (dagirkerina) gelên din, ne bi ji holê rakirina gelên din pêk hatiye. Gelbûna kurdan, bi yekbûna gelên din re pêk hatiye. Îro jî netewîbûna wan ne bi awayekî ku dijminatiya gelên din bikin; bi bîr û bawerîya biratiya gelan, bi hevalbendiyâ ku li hemberê zaliman bitêkoşin tê holê. Tu wateya wê tu ne ku, mirov kurdêñ ku di gelbûn û netewîbûna wan de haveynê internasyonelsteyeke bê serûbin heye, têxe çarçoveyeke teng, çavkaniyêñ wan yêñ dîrokî û çandî feqîr (qels, hêjar) bike.

Helbet di navbera Kurdan

*Yêñ ku dîrokê çedikin,  
serdarêñ pêvajoya dîrokî,  
bê şik ew dîrokê dînîvisin  
jî. Di navbera dîrokçêkîrin,  
bîr û bawerîya dîrokê, û  
dîroknîvisiyê de têkiliyên  
rast û rî bene. Yêñ ku  
dîroka têkçûn û qirkirina  
me ya netewî çêkirine,  
dîroknîvisi jî di bin desten  
xwe de biştin. Em ji bîr û  
bawerîya dîrokê bê par û  
mehrûm kirin. Ango em bê  
biş kirin. Bi ser de jî  
feraseta xwe ya dîrokê,  
feraseta nijadperest,  
kelkotî kiriye serê me.  
Xwestin, me ji me dûr  
bixin, me ji rastiya me dûr  
bixin. Di vê biyanîbûna  
netewî de, pişavtin bû  
çekeke xwirt (zexm).*

û gelên ku li ser vê xakê jiyîne yên herî qedim de pêwendiyek heye, lê belê ev pêwendiyek xeñîmî, qewmî, nîjadî nîne. Kurd xwedîyê mîrata hemû şarezayîyen ku li ser vê xakê jiyane. Kurdan li ser van gelan bandor kirine, hatine bandor kîrin. Bi gelekan re pêvajoya pişavtinek xwezayî jiyîne. Sedan sal in ku Kurd li ser vê xakê dijîn; ev kirûyeke dîrokî ya bê nîqaş e. Heman dem, Kurd di pêvajoya dîrokî ya hezar salan de hatine holê û heta îro hatine.

Dews bêhn, reng û bando-ra kîjan komika gel ya ku li ser vê xakê jiyaye, li ser sazbûne gelî ya kurd tune ye? Bi ser de jî, têkilhevbûneke wiha li holê ye ku, mirov ji hev dêr-naxe, ka kîjan xêzik ya kî ye. Dê çawa ji hev were veqetandin?

Belê, di navbera gelên ku li ser vê xakê jiyane û Sume-riyan, Kasîtan, Hurîyan, Goti-yan, Kardûkan, Medan û yên din de têkiliyek, pêwendiyek heye. Lê ev pêwendiyek çawa, bi ci awayî ye? Ne rast e ku mirov bi yek carê bibêje ev gelên ku li jor hatin hejmartin hemû Kurd in. Her çend' mirov zorê bide jî tu hêjayî û rûmeta vê nêzikdayînê tune û ev ne nêzikdayîneke zanistî ye jî. Baş e, pêwendî û têkiliyek çawa heye? Her weke ku li jor me got, ev têkiliyek dîrokî û çandî ye; heman wext têkiliyek erdnigarî ye. Têkiliya pişdariya heman xakê ye. Bi vê wateyê, Kurd xwedîyê mîrata dîrokîya Sumer, Kasit, Hûri, Gotî, Kardûk, Med û gelek gelên din in!

Pewendiya dîrokî û çandî li gorî teoriya ku netewê "ci-

vaka bi istikrar a ku di pêvajoya dîrokî de hatiye holê" bilêv dike musaît e. Li gorî dîtinâ me pêwist e ku bi vê şeveyê, nêzikdayîn çêbibe derbarê pirsgirêka binyada Kurdan, gelibûn û netewibûna Kurdan de. Li gorî teza pêwendiyâ dîrokî û çandî Kurd, ne bê (kok) binyad in; ne li ber hêtê (diwar) mizgestê hatine dîtin û ne jî ji ailiyê leylegan ve hatine anîn.

## V

Bîr û bawariya me ya we-latparêz û şoresser û internas-yonalist, me dibe kaniya, kû-rahiya gelên Mezopotam-yayê. Heke miçiqandin û hişkkirina vê rayê ne sedema xizankirinê be, ci ye? Bîr û bawariya me ya welatparêz ya ku rengên gelên Mezopotam-yaya qedim li rengên xwe zêde dike, dîroka wan weke dîroka xwe dipejirîne, hêjaiyyîn wan weke yên xwe dibîne, ji hemû bîr û baweriyênetewî yên teng dûr e. Ev dîtina welatparêz, xwedî nave-rokeke dewlemend û dorfireh e. Tu wateya ku em xwe stêwr û beyar ango teng bikin tune ye.

Di gel hemû tadeyî, qırki-rin müşextkirinê dîsa jî ev gel slogan "bijî biratiya gelan" qîriya be, sedema bingehîn têgihandina hebûna serokati-yeke ku dîrokê, internasyonil-zîmê û welatparêziyê rast û di cihê xwe de bi kar tîne ye. Ev xeta serokatiyê, ji bo yekîti-yeke internasyonalist ya gelên rojhilata navîn fersen-deke hêja ye. Dive ev fersend neyê berdan. Ev fersend, ji rewşa Kurdan ya siyasi tê.

Kurd ji xweliya xwe

dizên. Rêberiyê ji têkoşîna Mezopotamya dîrokî ku bi a-wayekî hemdemî were afiran-din re dîkin. Di vê mijarê (babetê) de, hêzeke pîrxurt ji dîroka xwe ya hezar salan digrin. Bila neyê ji bîr kîrin, ev hêz ji ber xwe ve dernakeve holê, beriya her tiştî, ji rast-xwendina dîrokê tê.

Weke encam em dikarin bibêjin: Beriya her tiştê, dive ku nîqaşâ bîr û baweriyêke dîrokê ya rast, azîneke (metodeke) dîroknîvîsiyê ya rast were kîrin (çêbibe). Di vê mijarê de zelalbûn û safibûn çêbibe. Dîsa em dixwazin balê bikşînin ku, di navbera dîrokçêkirin û dîroknîvîsiyê de pêwendiyek xurt heye. Dîroknîvîsi û dîrokçêkirina Kurdan ya azad, coşê û heyecanê dide mirov. Çiqas xweş e ku mirov vê şanazî û heyecanê di dilê xwe de his bike!..

*Bîr û bawariya me  
ya welatparêz û  
şoresser û  
internas-yonalist, me  
dibe kaniya, kûrahiya  
gelên Mezopotam-yayê.  
Heke miçiqandin û  
bişkkirina vê rayê ne  
sedema xizankirinê be,  
ci ye? Bîr û bawariya  
me ya welatparêz ya  
ku rengên gelên  
Mezopotam-yaya  
qedim li rengên xwe  
zêde dike.*

# “Zulûm 38 î ra dima kî kêm nêbî”

**MUNZUR ÇEM**

*Ayê de cîranê ma  
Mamî veng fist ra  
xo va, “Hêga  
mekuyê, korek  
xirave mekerê.” Na  
çekuyî eskeran ra  
vatî. Eke hen vat,  
dot ra eskerê kî  
vat ke, “Lazê  
kutikî, derdê canê  
xo nê cêno, kewto  
derdê hêgây.” Na  
qesî ra dima,  
eskerî bayê mi pê  
guret û nêvinet, da  
piro. Eke da bayê  
mi ro, ma  
zirçayme, vaz da  
kewtîme zerre. Di  
kutikê ma bî,  
Subayê Tirkî na  
pira, ben verê  
linganê ma de yê  
kutikî kîstî.*

**M**ünzûr Çemî, 1937-38î ser o, İ. T.ê Dêsmizî de qesey kerd. Ma na röportaj wendoxonê xo rê amade keme. Ci turî ke wendoxî kî vînenê, röportaj de temamê tayê naman nê, herfê ke pê dest kenê ci, eve îne nusiyê. Na, wastena İ. T. ve xo ya.

● **M. Çem: Namê to çiko, namê xo vana?**

Namê mi l... o. İ. T. vanê mi ra.

● **M. Çem: Sima kameci dewe ra yê?**

İvis: Ma Pezgewran îme. Dewê aşîra ma dormê Pulurî (Vacux) der ê. Tirkan nika name Pulurî vurno, kerdo “Ovacik.” Dowa ke kalikê mi te de bîyo, Kişi wo. Ci ra Topizlî kî vajîno. Hokmatê Vacux verê coy Qişle de beno. Uza ra vurîno ra sono Zeranîge. Zeranîge ra kî sono Pulur.

● **M. Çem: Namê piyê to?**

İvis: S. Axa. Esas eslê ma Meletîya ra yêno. Sêyid Şixhe-sen Meletîya ra yêno Dêrik. Dêrik wertê Vacixe û Pilemurîye de dewê ra. Namê xo yo bîn kî Bodig o. Waxtê ra têpiyâ uza ra tayê bar kenê, yêne Mircan; dodima benê vilay sonê, nazahaza ca cênê. Kalikê kalikê mi yêno Qisla, uza de nano ro. Hama pêyê conî uza ra kî sono Merxo, Merxo de maneno.

● **M. Çem: Serra 37-38 î ci turî éna ra to virî?**

İ. T.: Dêdê mi B. İ. Ağa bî, o sire de dewlete dedê mi zaf rêu berd-ard, ci ra persî pers kîrdi. Eke hen kerd, dedê min ê qızî, va “Bê gos ro mine ma vaz dîme birremîme. Nêtê dewlete rind nêaseno. Nê ma qir kenê.” Hama êy qewil nêkerd, va “Çayê biremîme? Ma se kerdo ke biremîme? Ma ke nika vaz da, zav-zêcê ma qir kenê.”

● **M. Çem: O ra têpiyâ?**

Rindek êno ra mi virî, endî pêniya amnanê 38î ya, rozê ma nîayada ke esker nawo qere-velix dot ra vêjîya. Hetê Qozanû ra, yanê hetê Boxazî Alî ra yêno. Ga û malê Qozanan o ke kewto ra dest, çî-miyê dîne wo ke talan kerdo, o kî têy ro. Hen sano xo ver anê, raye ro vîyarr-nenê ra benê. Toz-duman o, alamet û qîyamete zaf a. O wer-te de tayê esker kî birrya ra, dot ra kewt dewa ma. Dowa ma raye ser o wa, xêlê girs a. E ke kewt dewe, cîranê de ma bî, ci ra Mamê Kewî vatêne, vengê xo kî berz bî, êy veng da, vat “La lawo Zêyno, Zêyno o çiko, çiva wo, ci vengo yêno?” Zêynî dot ra veng fist ra xo vat, “Metersê Mamo metersê, eskerî ma danîme arê.” Yanê eve na vate-ne ano o mane ke, “Nêtê eskerî rind nîyo, mevindê, vaz dê.” Wastena êy a bîye ke ma biremîme. Ci esto ke, nayonê hetê



ma, yanê pîyê mi, mordemanê ma fam nêkerd ke qesê êy ênô ci mane. Tenê vêrd ra, ma nîyada ke kutikî şî ra ci. Se ke kutikî şî ra ci, ma esker dî. Ma nîyada ke esker nawo dot ra xo ro bananê ma gureto, yêno. Hem kî zaf o.

Ayê de cîranê ma Mamî veng fist ra xo va, "Hêga mekuyê, korek xirave mekerê." Na çekuyî eskeran ra vaşî. Êke hen vat, dot ra eskerê kî vat ke, "Lazê kutikî, derdê canê xo nêcêno, kewto derdê hêgây." Na qesî ra dima, eskerî bayê mi pê guret û nêvinet, da piro. Eke da bayê mi ro, ma zirçayme, vaz da kewtîme zerre. Di kutikê ma bî, Subayê Tirkî na pira, hen verê linganê ma de yê kutikî kîstî.

Cîranê de ma wo bîn bî, esas namê xo Usê bî, ma ci rê Boz vatêne. O, hetê Erzinganî ra amevî. Waxto ke eskeran bayê

*Xeverê bîrê-çar rojî  
ra dime amê ke îyê  
berdê, Derê Semkû de  
qir kerdê. Tavî kes  
nêtoreno çiyê pers  
kerô kî. Ma kam  
cesaret keno,  
mordemo ke eskerî  
berdo, kuno ra êy  
dime, êy pers keno?  
Îyê ke merdê merdê,  
îyê ke dirvetin ê,  
vîndbiyayê, ê kî bona  
nêosenê.*

mi guret, o lewê ma ra şî kewt gorra malî, wertê biz û mîyan de dard we. Hama o werte de rîyê ust ra, bayê mi de nîaya da ke hala eskerî piro se kenê, eve ci şêkil danê piro. Se ke ust ra xo ser, eskerê dî, hama nêvinet şî guret. Hem guret, hem kî veng da vake, "Qumendarê mi, juyo de bîn nawo ita ro." Êy dot ra vat, "Bîyarê." Na qesî ra dime eskerî Boz fist ra xo ver berd. Ma nîyada ke qorû de gonî sona. Pêy ra sungî sano qîneste, tede gonî rijina.

Aye de heto zu ra kî tayê çîmîyê ma eskerû da arê berd. Yamçiyê bî, Îran ra amevî, qumasêde henê bî ke qe pers me ke. Zê pardesoy guretêne pira, ya kî estêne hermonê xo ser.

Na werte de eskerî ma kî têde pîya dayme arê, cun de ardîme têlewe. O ra dima kî cuwamerdi birrnay ra, day arê berdi.

O sire de eskerê ame, hem berba, hem kî daya mi ra vat ke, "Metersê, iyê ke nifisê xo estê pêyser çarnenê ra, iyê ke nifisê xo çinê kî, benê kisenê."

● M. Çem: Sarê dewe eve o to  
re benê kotî?

Ivis: İne benê Qisle, uza kenê banê, a sewe uza de manenê.

Ciranêde ma bî, ci ra Sêy Riza vajiyêne, mordemêde baqil bî. Tavî Sêy Rizawo pîlê Avassone ke 37 de eştibâ dare, o nîyo, mordemêde bîn o. Esker çi turî ke vêjiyavî, êy vazdavî xo dere de dardîvî we. Se ke esker

çêver ranêbeno. Tavî Sêy Riza ke biwazo, çêver sikneno hama maya mi ra nê toreno. Maya mi ci rî vat ke, "Niyade çêverê ma siknenê S. axa ke ame ci rî van." S. axa wo ke vanâ kî pîyê min o.

Sê Rizay kilit wast hama maya mi ci nêda. Şî xo kuya çêver ra, ard-berd, bese nê kerd rakero.

Henî o xuros-purosê ma de bî sodir. Ma a sewe qe ranêkewtime. Ma rî hewn çîne bî.

A emin de, Alîyê Mizurî vatêne mordemê bî, Vîyalike ra bî, o ame Mezela Çaxılı, uza ra

● M. Çem: Kameci dewe ra bî o?

Ivis: Burnaxe ra.

Lazê Hesenê Muxtari raye ra vano ke, "Eskero zêde lewê ma de nîyo, zafê xo tenê dûrî kewtê. Ez kardî erzen ra ci, sicim birnen, sima biremê, Na eskerê ke nêjdiyê ma der ê, senik ê, îne ra xo xelesnayêne zo re nîya. E ke ma ra nê kî, ju-di tenê ma ginenê ro ci, iyê bînî xelesinê." Tavî destê xo zuvinî ra girêdayê.

Rastî kî bese kerdê ke xo bi xelesnê. Ci ke bir hen six o ke, mor werte ra besenêkeno, ravêro. Ret râyînê ra.

Dewa ma ra pîrê yê Lazê Hesnê Muxtari Sêy Bira ci turî ke o quesê dêy hen hesneno, dust de vêjîno, vano, "Pîrê mino destonê to sero wo, çîyo henêne meke. Ma rî tawa nêkenê."

Eke hen vano, o kî dot ra vano ke, "Pekî, ti zana pîrê mi."

Raye ser o Bonê Cemê Çirkû vajîno, banê esto, ïnû ve o torebennê uza. Di eskerû kî kenê ver. Ju serê bonî de, ju kî verê çêverî de beno.

Lazê Hesenê Muxtari a sewe uza vano ke, "Çêverê na bonî rehet şikîno. Ez çêver siknen, ma di tenî vazdame ra eskerû ser, eskerû pê cême, ayê bînî biremê. Eskero bîn hata dot ra bêro ke, ma rememe xo keme vîndî."

O pîrê xo têpiya yêno lewe vano, "Hezretî Elî destonê to ser o wo, ti nêbo çîyêde henê bi kerê. Ni ka ke sor ame, ma verdanê ra, esker tawa ve ma nêkeno."

Aye bînî kî terefê layîkî nê cêne. Mecbur maneno vindeno. Hama tavat kî ci nêkuno. Zerrê

*Na pêyê conî ma misayme ke, o layeko ke vaz  
davî bînê gonî de xelesiyavî, birayê dêy bîyo,  
yanê birayê Six i. O, Sixî ra pîl bî û wendîv.  
Cawo ke kîst kî serê tumêde kemerin bî. Uza  
kerd dirvetin, wesa wes kas kerd ard cêr. Têpiya  
ma na o ra têpiya misayme ke, subay amê ser,  
qeleme cêv de dîya, ci ra pers kérdo vato,  
"Wendîsê to esto, ti na kawûn ra se kena?"*

şî kî pêyser ame. Ame çardaxa ma, lazê xo Sêydalî endî pîl bî, xort hesavîyêne. Sêy Rizay êy ra vat, "Ez domonû cên, remen son." E ke hen vat, daya mi cêrê vero vat, "Wertê ma de ju cuwamêrd tî ya. Ti kî ke şêrê, ma hermetî têyna maneme. Esker yêno ma qir keno. Ti ke ita bê qe ke nê pîya vaz dame. Ti rawû rind zonena. Meso."

Êy qewil nê kerd. Lazê xo rî vat, "Zerre kuyê, maya xo îne bize bê şîme, endî son o."

Çi esto ke lazê xo ci turî ke kewt zerrê çardaxe, çêver sero dîya ca, kilit bî. Na ra se kenê

veng da, vat, "Lawo Merxizêne, nifisê kamî estê, arê dê bîyarê." Alîyê Mizurî Erzingan de wendîv, mektevê Ruştîya qedenavî. Uzay ra gore kî Elîf bayê Erevkî ra wendene rindek zonêne.

Naye ser o, nifisê ke estê, kerdî topî bêrdî day ci. Zêde nêmend, sarê dewe ra iyê ke wayîrê nifise yê, verday ra, vêjîyay amay.

Ê mordemê ke nifisa xo çîne bîye, Qisle ra day arê gureti berdî Derê Semkû. Raye ra Lazê Hesnê Muxtari vatêne mordemê bî, zaf cesur bî.

bonî ro yêno-sono. Eke hen fetîlo çimê xo gineno ra Zengenî, na ra kî vano, "Eve zengen ez dês de lone ken ra, tek tek ci ra tever bê, wertê birrî kuyêne. Esker qe ferq nê keno. Zu serê bonî ro wo, zu kî verê çêverî der o. Dêsê yanî ra xevara xo çîna."

Na ra dês lone kerdene rasti kî zore nîya. Ci ke dêse yê bonî kolîyû ra yê, yanî darî êşte pêser, hen viraşte.

Pîrê xo ancîya sono zenge dest ra cêno. Eke henî keno, Lazê Hesenê Muxtarî vano, "Temam endî ma qir kenê, ti bîya sebebê ma. Xizir canê to bicêro."

Uza darê da moze esta, zaf girs a. Sor ra beno, tîj ke erzena, eskerî têdîne benê aye ra girêdanê. Rêyê surrê eve sici-mû pi ra gîrêdanê, o ra têpîya qorêde bîn anê ïnan ver, eve o qeyde têdîne a dare ra gîrêdanê.

Se ke tifongonê maknelîyû anê saz kenê, o Lazê Hesenê Muxtarî, oncîya vano, "Lawo ezû kardî erzen sicîmû, kulî birnen, sima birremêne. Tayêde ma ginene ci, tayêde ma rîyenê ra." Ayê bînî, "Temam, berze ci" vanê. Nêvindeno kardî erzeno sicîm û vaz dano. Herkeşî ra ravêr, vaz dano hama herkeşî ra avê kî o gineno ci. Êy ra dime na ra kî birayê xo gineno ci. O werte de tayê vaz danê, xelesinê hama tayê nêşkînê. Vajîme ke dewa ma ra Muzirê Mamê Kekoy, Şîxê Sîyedê Gulû, Rizê Hesê Mamê Kekoy rîay ra amay. O pîro ke ma vanîme, pîyê Axa Dedî Sîy Bira ve Usêno ka mi ci ra Boz vatêne, yê hurdî kî rîayavî ra. Usê bîvî dirvetin.

Xeverê hîrê-çar rojî ra dime

amê ke iyê berdê, Derê Semkû de qir kerdê. Tavî kes nêtoreno çiyê pers kero kî. Ma kam cesaret keno, mordemo ke eskerî berdo, kuno ra êy dime, êy pers keno? iyê ke merdê merdê, iyê ke dirvetin ê, vîndbîyayê, ê kî hona nêosenê. Vajîme ke Muzirê Mamê Kekoy, Şîxê Sîyedê Gulû ve Rizay ra panc-ses rojî ra têpîya vêjîyay amay. Herzu zu hetê ra amay, pîya nê bî. Ze ke mi vat, tayê dirvetin kî rawan ra merdi.

Maya Sîy Biray leqema xo Çope bîye, cênikêda zaf ci ra a-mayîye bîye; a şîye, ero lazê xo pîye, mîyît dî ard dewe de dard we. Tayê mîyît maknalî ra nêjdî ginavî ro ci, têsrî germîye ra vêsavî. Mesela birayê Muzirî Gewrê Mamê Kekoy hen vêsavî. Mîyît ardî verê goze de navî ro sutêne, ma şîme ser, dî, zaf vêsavî.

Eke o 60 mordemê ma hen Derê Semkû de qir kerd, ma kî endî vaz da, terkitime şîme Vîyalike; uza ra kî tayê remayme şîme Koyê Ecipixarî.

Seva werdene ma têyna nan kerdo çuwalon xo de gureto hama simitene rî tawa çîno. Na ra ma domonî nan wenîme, beme têsanî, berbeme. Ma ke hen keme, na ra kî ma benê kenê mixara, ver de videnê. Hen kenê ke vengê ma meşero, gosê kêşî de. Sewe ke bena nême, yêni-me hêni de awke wenîme, têpîya gineme ci sonîme ko.

Rozê Bayê mi pusila ra nîya da vat, "Esker ame." Rêyna ke Ecipixarizû ferq kerdo ke tayê mordemî hayê uzawonê, şiyê ixbar kerdo, vato "Qocizû nayê amê ita." Dormê Alî Boxazî de aşîra Qozanû esta, hen zono ke ma îne ray me. Rew ra wertê i-

ne û Qozû de lez beno, dismenayêni kuna werte, coka îxbare kenê.

Na ixbarî ser o, esker ame binenîya ma de deşte de pusu guret. Bayê mi ma dayme arê kerdime mixara, vat, "Qe kes qafa xo mevezo." Ma kerdime mixara, hama mixara qiskek a, taway rî nêbena. Verê mixara de kemerî ardî têleve, nay ro pêser, pusila sanê çimanê xo ver, esker sêr kerd.

Tenê ke sêr kerd vat, "Ya nê ve xo yênenê ma qir kenê, ya kî pêyê ma de ko ra esker esto, xevere danê ïnû, ê yênenê." Eve o to re, di-hîrê saatî ero ci pît. Pêy dona vat, "Juyo astorî ser o wo, juyo sîvîl kî hawo Ecipixar ra ame lewe, têy qesi keno." Tabî mordemo ke astorî ser o wo, subay o.

Rêyna ke subay aye de uza ê Ecipixarizî ra pers kerdo vato,

**Xeverê hîrê-çar rojî**  
ra dime amê ke iyê  
berdê, Derê Semkû de  
qir kerdê. Tavî kes  
nêtoreno çiyê pers kero  
kî. Ma kam cesaret  
keno, mordemo ke  
eskerî berdo, kuno ra  
êy dime, êy pers keno?  
iyê ke merdê merdê, iyê  
ke dirvetin ê,  
vîndbîyayê, ê kî bona  
nêosenê.



*“Vanê Ítawû Qozû estê, rast a?” Sîvîlî kî vato ke “Zurû kenê, Qozû-mozû ita çînê. Malê de-wa Jîyare ardo ita, mal bir ra mendo, şuyanêy amê ro ci pi-yo, şiyê. Zovîna kes nêamo itawû.”*

Mordemo ke amo quesêy ker-do, o kî Ecîpixar ra Muzir Axa bîyo. Muzir Axa o werte de hêşîyo pê ke Qozan nîyê, ma yîme şîme uzawû, coka amo hen vato.

Subay o quesê dêy rê ïnam beno. Naye ser o esker guret şî. Ma a roze kî uza mendîme. Roza bîne esker na ra kî cor de koyê Hêyder Bavay de vêjîya. Kotî ra vêjîya, çivawo çiko, kes nêzoneno. Hetê Egînî ra êno.

Hêyder Baba dustê Koyê Morûn der o.

Na ra o het de Kurêşû estê, aşîrê bînî estê, têdîne vaz do, Birrê Çaxîlî vajîno, uza der ê. Birrê Çaxîlî kî senkek o. Zovî, erazî rût-rûpal o. Cor de o mileto ke hen wertê ê birî der o, eskerî o sana xo ver, na pira, cêni û cuwamêrd û domanî têde qir kêrdî amay kotî deste. Zaf milet uza de qir kerd. Lazê Bertê Kurêşizî ve Lazê Axayê Usiv Axay ra, di mordemêke ke a roze uza kîşiyay û namê xo kî yênê ra mi virî, îne - di tenê.

Bayê mi pusila ra nîyadêne, eke se bîyêne-çi turî bîyêne, ma ra vatê. Rêyê kî vat, “La-

**Hemed sono ke**  
zerrê çeyî de zele-  
mele wa. Réyna ke 3  
eskerî kutê zerre,  
wazenê ke Kamorri  
berê, tever ra bikîsê  
bama besenêkenê.  
**Kamorri mordemê de**  
gewetin bî. Ustine pê  
gureta, bîremêna piya  
nêşkîyê ke aye ra dûrî  
fiyê, berê.

yenê hawo destê eskerî ra vêjîya, vake çirp û vaz da. Eskerî kî na ro dima. Layek hawo şî kewt binê gonî, xo dard we.”

Aye de ma kî nîyada. Cêr goligî belu bîyêne. Suyarî dorme ro amay şî, fetelîyay, çerexiyay hama nê dî. Endî ke zonayêne ra hen kerd, xo ra raştî kî nêdî, nêzonen. Eke nêdî kî pêyser cêray ra amay. O layeko ke uza eve o tore xo rêuyna ra hona wes o, namê xo kî Şix o.

Reyê kî bayê mi vat, “Hawo zu kîst.” Tenê senikek mend na ra kî vat, “Hama nê, dirvetin o; nêmerdo wes o. Hayê di eskerî bî piro kas kenê anê.” Hama zêde ranêverd, o uza merd.

Na pêyê conî ma misayme ke, o layeko ke vaz davî bînê gonî de xelesiyavî, birayê dêy bîyo, yanê birayê Şix i. O, Şixî râ pîl bî û wendîv. Cawo ke kîst kî serê tumêde kemerin bî. Uza kerd dirvetin, wesa wes kas kerd ard cêr. Têpiya ma na o ra têpiya misayme ke, subay amê ser, qeleme cêv de dîya, ci ra pers kérdo vato, “Wendisê to esto, ti na kawûn ra se kena?”

Tatîlê amnanî bî, layek amewî çê xo.

Bî roza bîne, bayê mi va, “Bêrê ma ita ra ravurriime.” Ma guretime pesewe amayme Ecipixar. Uza şîme çê Muzir Axay, Ma rê nan, mast ard, ma nonê xo werd, xo kerd mird. Ma davîstê mordemî bîme.

#### ● M. Çem: Cenî ve domononê qizû ra kî lewê sima der ê?

Nê nê, sirf cuwamêrd ê. Cenî û domanê qizî têde Vîyalike der ê, lewê ma de nîyê.

O ra têpiya kewtime ra raye ke bêrime Vîyalike. Raye ser o çimê hêni esto, eke kewtime u-

za, dot ra maqara vêjîye. Maqara, komê goligône ke eskerî rê çî kirrisnêne, îne ra vajiyêne. Se ke dot ra ma de vêjîyay, ma va çirp û vaz da. Se ke ma vaz da, îne veng fist ra xo, kerd hayleme vat, “Haydutû vaz da.” Hama ma zêde nêşîme, pesewe tarî ya, pêyê çimî ro tenê şîme, kewtime wertê kemerî, tede viñetîme. Aye de İvrâyîm Axay vaz da kemere, vat “EZ nan nînû ra, nînû qir kenû.”

Bayê mi dust de vêjîya, vake

*Siro ke ma kerde  
tole, Merxo vêsnâ. Xo  
ra o werte de dewê  
Dêrsimî zêde vêsnay,  
kerdî memnu  
mintiqâ. Kes  
nêşkîyêne ke şero  
uzawû, yasaq bî.*

*Retîye çika bira  
bira? Miletî ci waxt,  
kotî retîye dîye ke, ma  
kî bivênimî? Zulüm  
38 i ra dime kî kêmî  
nêbî.*

“Heq çê to ve şen kero, to ke nika veng fist ra çeke, cêrenê ra, dewe de cêniyû, domanû keşî wes nêvardanê, têdîne qir kenê. Meke raverê şêrê.”

Endî o qarsê ci nêbî, ê vêrdî ra şî.

Ma uza terk kerd amayme pêyê bonê Kamorri. Fikir keme ke şîme çê Kamorri, Kamorri era ma ver kuyo, ma bero dewe.

#### ● M. Çem: Kamorri kamecî de-we der o?

O kî Vîyalike der o.

Hama ci turî ke amayme uza, ma nîyada ke çê Kamorri de alametê esta. Kamorri, mordemê zaf cesûr û cira amaye bî. Dewlete o, 38 ra têpiya, 1940'de berd Xozat de kîst.

Bayê mi nêvinet, Hemedê Bavgû rusna, vat, “Lawo so çê Kamorri de çiyê esto, hala ci ko? Ya esker o, ya kî dismen mismenê xu yê kutê zerre. Eke ci esto bimise, xevere bide ma.”

Hemed sono ke zerrê çeyî de zele-mele wa. Rêyna ke 3 eskerî kutê zerre, wazenê ke Kamorri berê, tever ra bikisê hama besenêkenê. Kamorri mordemê de qewetin bî. Ustine pê gureta, hîremêna pîya nêşkîyê ke aye ra dûrî fiyê, berê.

O werte de ke se beno, cêvê Kamorri ra hîrê-çar zernî gi-nenê warro. Naye ser o eskerî yê zerrnû cênenê, benê tever sônê. Eke sonê, Hemed aye de kuno zerre. Kamorri ke Hemedî vênero pers keno vano “Nê lawo Hemed ti kotî ra yêna?” Hemed ci rê mesele qesî keno, vano “Hal-hereket nîya, S. Axa nawo amo cor, to pîno.”

Rêyna ke Kamorri ses-hewt saatî eskerî de sare onto, zahmetêde zaf giran dîyo.

Tayê mend, xafsla ma sér kerd ke nawo vêjîya ame. Tarî yo hama bêlû beno ke zaf do piro, Kamorri qefelno. Pirên û tumano verra bî.

Uza tenê qesêy kerd, bayê mi halê ma ci rê vat, êy va, “EZ ver son, sima mi dima bêrê.”

Cawo ke some kî xendek o, dormê xo birr o.

Qozan ra tayê remê, raye ra rastê eskerî amê, o ra dime kî vaz do, ginê ro o dere. Uza xe-

**Bayê mi nîyada ke wes nêvardanê, vat “Nîya nêbeno, ma gere na mordemû bixelesnîme.” O ra dime kî cêni day arê, têy qesêy kerd vat, “Çêver bisiknê zerre kuyê, dest de bicêrê.” Ìnan çêver sikit, kewtî zerre, muxtar ve bekçî ra dest ra gureti. Hen davî piro ke hal tede nêmendîvî.**

vere vêjîye vat “Esker nawo a-me.” Ci turî ke a xevere gurete, ma kî vazda. Tayê ca şîme, gos na ro ser, ma nîyada ke tawa vengê eskerî çîno. Rêyna ke eskerî nê, î Qocanê ke remê î yê.

Ma endî şîme alîyê Încixe, uza de bî sodir. E ke bî sodir kî Kamorri kewt ra me ver, ma verê çêverê xo ro vîyarnayme ra, ardîme Vîyalike.

Ma demê Vîyalike de mendîme, payîz ame. Xo ra na hâdisêy kî, néjdiyê payîz de bî.

O sire de Hokmatî guvis da dedê mi Bira Îvrayîm Axay ke endî şero têy qesêy bikero. Hama binê destî ra mordemê kî ci rî xevere rusneno, vano “Meşero, kisenê.” Ci esto ke êy gos pa nêkuya, o ve dedê mi P... ra pîya terkitî şî Zeranîge. Zeranîge, o waxt nahya bîye. Alisanê Kekî kî têy beno.

Eke sono uza, Başçavuş risvet wazeno, hama aye de ser o perêy çîne benê, besenêkenê ke bidê. Se ke qereqol ra benê tever, dedê mi P..., Alisanê Kekî ra vano, “Mevinde vaz de bîrayê mi” û remenê. Lewê Zeranîge de derê esto, dedê mi P..., ê derî misneno ra dedê mi I. Axay, vano “Ti na dere ro ravêre so Kundere, uza vinde.” Çê vaya xo Kundere de beno. Ci esto ke dedê mi I..., tenê ca ke sono, cêni rastê ci yênenê, na ye ser o sermayêno nêremeno, pêyser cêreno ra yêno, mîyda-

ne Zeranîge de vindeno. Tavî o eskerô ke tayîn bîyo ke pêbijêro bero, o kî uza ro. Daye de assubayê ve çar-panc eskerû ra dorme ro ci cêne. Dedê mi ve Alisanî ra kunê pêyê çêverê dêy. O ra dima dedê mi kuno ra dest.

Beno sodir, dedê mi Îvrayîm Axay benê Qere Dere ke bikisê hama eke se beno nê kisenê, cêne pêyser anê. Hen kenê ke risvet cido raverdê. Terknene yênenê Xanû, eke yênenê Xanû, dedê uza pers keno vano “Îv çê der o?” Vanê “Nê, çê de nîyo.” Îvê Naze mordemêde pêt bî, rîndek Tirkî zanêne. Dedê mi Îvî pers keno ke birrusno, perû ardene do, risvet bidone.

Ma Vîyalike de vaye ser o ronîstî bîme, eskerû dedê mi uza de vet. Usivê Alî kî uza ro, dedê mi ci rî vat, “Lawo Usiv so vêyva mi rî vaze mi rî nun bîyaro.” Vêyva ke vano kî maya xu ya. Ý maya xo ra “vêyve” vatêne. Usiv şî, tayê nan guret ard. Se ke ard kî vat “Sayeke mi nun wast!” O qesê dêy hen zê nikayênenê mi vîrî der o. Tavî ëy waxto ke Usiv rusna, mexsedê xo o bî ke perû bîyaro. Çê de zerrî zafî bî.

Uza ra guret, vor de berd. Çê Kamorri raye sero wo, o ke vîyarna ra, na ra kî bonê Tetî yêno. Tet kî wayîrê perey bî. Esas namê xo Sêydalî bî, hama ma ci ra Tet vatêne. Dedê mi na

ra kî uza venga cêniya Tetî da-no, vano “Axcê Axcê!” A vana “Çiko Îvrayîm Axa?” Vano “Mi rî tenê do bîya.” A çapika çapê do kena ci cêna yêna. Eke yêna, vano, “Axcê Tet çê der o?” A vana “Nê, çê de nîyo” Naye ser o, “Hêy wax!” vano. Endî uza ra kî kenê rast benê. Eke hen berd, dewe de xêlê mordemî bî topî. Bayê min o, dedê min o, tayê cîranê mayê bîn ê. Hona ke wertê xo de hen qesi kenê, Kamorri vêjîya. Ci turî ke ame kî vat, “Tifang cê son, dere de kun virenîye, di ta-nû nan eskerû ra, dest ra cê, ênû.”

Bayê mi, dedê mi razî nê bî, vat, “Ti sona bena sebebê şî, iy kisenê” û tayê çiyê henên ê bî-nî vatî. Eke hen va Kamorri en-di texelîya, nê şî.

Nêjdiyê dewa ma de Bîçin vatêne cayê bî, eskerî dedê mi benê uza, kolî nanê ta, adir kenê we, êy erzenê adir, hen e-ve weşîye vêsnenê, kisenê.

Kistena êy ra têpiya dedê mi P... şî, dilekça dê valî va, “Çê ma çaremîne birawû surgin kerê.” Waxtê ra têpiya emir a-me vake, “Temam sima rusne-me surgin.” Naye ser o bayê mi şî dilekça dê vat, “Birayê mi xo ver ra dilekça da, ez nêson surgin.” Înê vat “Ti nêsona?” Ý vat “Nê, ez nêson.”

#### ● M. Çem: Sima o sire de kotî bî, dewa xo Merxo de, ya cayêde bîn de?

Îvis: Siro ke ma kerde tole, Merxo vênsna. Xo ra o werte de dewê Dêrsimî zêde vêsnay, ker-dî memnu mintiqa. Kes nêşkîyêne ke şero uzawû, ya-saq bî.

- M. Çem: Naza de wazen  
çiyêde bîn pers kérî. Dedê to  
î. Axa çinay ser o kist?  
Dustê dewlete de karêde xo  
bî, çiyê kérdiv?

İvis: Nê nê. Wertê xo û dewlete zaf rind bî. Ci dust de vêjî yayêne, ci çeke estene!

Çê dedê mi P..î, a dilekça ra dima rusnay surgin.

- M. Çem: Dedê to şî, sima de-  
wa xo de mendî?

İvis: Ya.

- M. Çem: Ma o ra dime se bî?  
Dêrsim'de hêyatê sima ci turî  
vêrd ra? Sima retîye dîye?

*Nêjdiyê dewa ma de Biçin vatêne cayê bî, eskerî dedê mi benê uza, kolî nanê ta, adir kenê we, êy erzenê adir, hen eve weşîye vêsnanê, kisenê.*

İvis: Retîye çika bira bira? Miletî ci waxt, kotî retîye dîye ke, ma kî bivêniye? Zulüm 38 î ra dime kî kêmî nêbî.

Vajîme ke, Muxtarê Viyalike bî, lazêde xu yo xort 38 de amevî kîstene. Vengê yê Muxtarî zaf wes bî, her tim seva lazê xo berbêne, kilamî estêne ser. Mordemî ke o gos dêne, zerrîya xo bîyêne letêy.

Vacuxe'de qumendarê bî, 38 de rutba xo çike bîye nêzonen, hama namê xo Bekîr bî. O, rozê ame Viyalike, muxtarî ke lazê xo amevî kîstene, vengê xo kî wes bî, o ve bekçi Silemanî gureti ardî, vat, "Vanê ke dewe de çekî estê, sima zo-nenê. Çekî kotî yê hurêndî

vazê." Îne vat, "Xebera ma çekan ra çîna. Dewe de çekî çînê?" Naye ser qumendar Bekîrî hurdemêna ardî zere, hem ve xo, hem kî cendermû da piro. Hen da piro, hen da piro ke, hama hama kîstî.

Bayê mi nîyada ke wes nêvardanê, vat "Nîya nêbeno, ma gere na mordemû bixeles-nîme." O ra dime kî cêni day arê, têy quesey kerd vat, "Çêver bisiknê zerre kuyê, dest de bicîrê." Înan çêver sikit, kewti zerre, muxtar ve bekçi ra dest ra gureti. Hen davî piro ke hal tede nêmendîvî.

Vîyalê ternî birrnavî, ardîvî, pê dîne da piro, mora mîyanî ya muxtarî kérdivî ve şiyaye.

êy ra vanê ke "Bê ma şîme çê Sêydalîyê Topizî." yanê çê ma. Eve o tore muxtar fist ra xo, hetê ma ser amay. Se ke amay kewti verê çêverî, çawîşî emir da eskerû vat, "Sungî tifong ra kerê, tifang pirr kerê." (Süngü tak, silah doldur). O ra dime kî dormê bonû guret. Eke hen kerd, zaf tersayme û ma vaz da. O werte de tayê eskerî kî kewti zerre, çê ma kerd saye. Heve ve heve her çî de nîyada. Têpiyâ axure ve mereke ra kî kerdî saye, tawa nêdî. Dedê min o ke surgin der o, êy ra mektuvê ama, eve herfanî Erevkî ya, a ve tayê resmonê virênu ra gureti berdî. O sire de kî herfê Erevkî o werte de zu Aliyê Mûzirî wendêne.

A mektuve rusnavî Anqara, uza amevî wendene, ser o qesi kérdiv, eke nêjdiyê asmê vêrd ra, ma rê pêyser rusnê. Hama resmî ma nêday. Piyê mi şî dime feteliya, çiqaşî wast ke pêyser bijê ro, ci nêday. Vatîv "Nî resmî gawurû kotî ra çê sima der ê?"

Resmî kî qiçkekî bî, ipeg qat kérdiv, kérdiv wertê ipegî. Resmî be xo kî kaxite nêbîye, qu-masêde rind ra amevî virastene. Mordemî hen zonêne ke zern ra yê.

- M. Çem: Ma çê sima çinay rê kerd sayê?

İvis: Vatena îne ra gore gerrê ma bîyo. Gerrekerdoxû seva ma vato ke "Nî Rusya de mu-xabere kenê. Haziriye vênenê ke Dêrsim newe de sare wedaro."

A roze a saate de, dedê mino ke surgin der o, çê dêy kî kerdo saye.



ZEND

# **FORMA XWASTINÊ**

**NAV  
PAŞNAV  
NAVNIŞAN**  
**TAX/NAVÇE  
BAJAR  
WELAT  
KODÊ POS  
TÉLEFON  
FAX  
İNTERNET**

Piştî ku we berdêla kovarê avêt bankê, bi dekonta xwe re vê formê bi postê an jî faxê bigihînin navnîşana me.

**Navنیشان:** Atatürk Bulvarı, Ceylan Palas Apt. No: 154/12  
**Aksaray/İstanbul Tel:** 527 19 11 **Fax:** 527 61 49

**DEM** ..... / ..... /

Min berdêla kovarê razand hesabê Turabi Şen ê bi nimroya 1002 30000 1050300 i yê  
Turkiye İş Bankası'ye sâba Aksaray a Stenbolê.

**Ligor welatan buhayê Zendê :** Almanya 8 DM, Amerika 6 \$, Australia 6 \$, Austriya 22 S, Belçika 150 BF, Danimarka 25 Kr, Finland 21 Mk, Frans 24 F, İngiltere 4Pound, İran 1000 Rls, İtalya 6000 lire, Holland 7 Fl, Kanada 5 \$can, Lubnan 500 LL, Norveç 25 kr, Sweden 26 Kr, Suri 110 SL, Swisre 8 SFR, Yünanistan 750 GRD, Rûsya 5500 Ruble



**ZEND**

# **FORMA XWASTINÊ**

**NAV  
PAŞNAV  
NAVNIŞAN**  
**TAX/NAVÇE  
BAJAR  
WELAT**  
**KODÊ POSTÊ  
TELEFON**  
**FAX  
İNTERNET**

Piştî ku we berdêla kovarê avêt bankê, bi dekonta xwe re vê formê bi postê an jî faxê bigihînin navnîşana me.

**Navnışan: Atatürk Bulvarı. Ceylan Palas Apt. No: 154/12  
Aksaray/İstanbul Tel: 527 19 11 Fax: 527 61 49**


**DEM** ..... /..... /

Min berdêla kovarê razand hesabê Turabi Şen ê bi nimroya 1002 30000 1050300 î yê  
Turkiye İş Bankasıvî sûba Aksaray a Stembolê.

**Liger welatan buhayê Zendê :** Almanya 8 DM, Amerika 6 \$, Australia 6 \$, Austriya 22 S, Belçika 150 BF, Danimarka 25 Kr, Finland 21 Mk, Frans 24 F, İngiltere 4Pound, İran 1000 Rls, İtalya 6000 lire, Holland 7 Fl, Kanada 5 \$can, Lubnan 500 LL, Norveç 25 kr, Swêd 26 Kr, Sûri 110 SL, Swisre 8 SFR, Yûnistan 750 GRD, Rûsya 5500 Ruble

# AVA WELATÊ

*Bêxwedî*



Dîmenek ji çemê Dîcle.

## FELAT DILGEŞ

**A**bî hayat, ava jiyanê, ava ku giyan û geşiyê, xweşî û hêşînahiyê, firehî û dewlemendiyê tîne. Av, ev peyva ku di zimanê me de ji du herfan pêk tê, hema bibêje bi jiyanê re bûye cot. Av jiyanê, jiyan avê bibîr tîne. Av hebe jiyan geşî, av tune be mirin û reşî ye.

Bêavî mirin e; dera ku av lê tune hişkî û mirin heye. Av kaniya jiyanê ye. Hemû giyandaran xwe li avê girtine; derên ku av lê hebûye ji bo xwe kirine war û sitar. Hemû medeniyetên kevin yên dinyayê li der û dora avan çêbûne; gund û bajar li rû avan hatine avakirin.

Ger ku mirovan hê ji mêj ve xwe li çemên wek Dîcle, Ferat, Nîl û Şerîayê girtibin, ev ji pêwistiya nêzikbûna li avê hatîye. Îcar ku der û dorê van çemân di dîroka mirovatiyê de rolekî pirr girîng leyistibin, bêguman ev jî bi hebûna avê bûye.

Av her gav di jiyanâ mirov de xwedî rolek pirr girîng bû. Ev yek wê di pêşerojê de jî weha be. Bi zêdebûna nifûsê re rola avê dikare bêtir bibe û çawa ku iro ji bo petrolê şer derdikevin wusa jî di demeke nêzik de, dikare li ser avê jî pevçûnên mezintir çêbibin, heta şer derkevin.

Hêdî hêdî li dinyayê tunehî û tengasiyek avê xwe nişan dide. Iro li tevahiya dinyayê 22 dewletên ku tengasiya avê dikişînin hene. Di roja me de 1.3 milyar mirovên ku ava vexwarinê, 1.7 milyar mirovên ku tengasiya ava xebîtandinê dikişînin hene. Di 50 salên dawî de zihêkirina

(mezaxtin) avê, bi zêdebûna nifûsê, bajarîbûn, endustrîbun û modenbûna çandiniyê re ji %400 zêdetir bûye.

Gava ku li welatekî, ava ku salê ji serê mirovekî re dikeve ji 1000 metrekûpî kêmter be, hingê li wî welatî tengasiya avê heye. Ji 22 dewletên dinê yên ku tengasiya avê dikişînin 14 heb li Rojhilata Navîn in; yanî Rohilata Navîn a ku dewlemendê petrolê ye, dikare bê gotin ku ji aliyeke ve jî hejarê avê ye.

Li Rojhilata Navîn welatek ku hem dewlemendê avê û hem jî dewlemendê petrolê ye, hebe, belkî ew jî kurdistan e. Lê rewşa kurdistanê ya siyasî li ber çavan e.

Her çiqas diçe av, di qada navnetewî de, nemaze li Rojhilata Navîn dibe problem û dimîne. Di şerîn navbera Ereban û İsaîlê de av sedemek girîng bû. Bêguman iro di pêvajoya li hevhatinê û beyankirina sînoran de jî av hêmanek esasîn e. Herweha ji serê demekê ve ku di têkiyîn Tirk û Ereban de jî av rolekî bingehîn dileyize.

Di sistema heyî ya Rojhilata Navîn de, çemên Nil, Dîcle, Ferat, Asî û Şerîyê (Çemê Ur-dunê) ji sînorêñ çend dewletan derbas dibin. Ji ber ku di huqûqa navnetewî de li ser avê ku sînoran derbas dikin qaydeyîn giştî tunin û ev yek ji însiyatîfa dewleten ku ji avê istifade dikin re hatiye hîstîn, cem bi vî awayî bûne problem. Îcar ji xwe di huqûqa navnetewî de “avê navnetewî” û “avê ku sînoran derbas dikin” ji hevdû pirr cihê ne. “Avê navnetewî” bi pirranî a-liyekî wan ji dewletekê re, aliyê

wan ê din ji dewleteke din re ketine û têñ parîkirin. Çemê Merîçê yê ku Tirkîyê û Yûnanîstanê ji hev diqetîne û çemê Arpaçayê, ku Tirkîyê û Gürçistanê ji hev diqetîne di statuya çemên navnetewî de hatine hesibandin.

Pirsa ava çemên navnetewî cara yekem di sala 1911an de ji alî Enstituya Huqûqê ya Navnetewî ve li Madrîdê hatiye peyivîn û di civînê de pêşniyariya di xebitandina avê de zerar nedayîna hevdû hatiye kirin. Eynî Enstituyê di sala 1956an de li ser pirsa xebitandina riya avê navnetewî komîsyoneke ava kiriye û li gor xebatên vê komîsyonê di sala 1961an de, di civîna Salzburgê de hin biryarêñ tavsiyeyî sitandiye.

Komela Huqûqa Navnetewî di sala 1958an de, di civîna xwe ya 48an a li New Yorkê, dîsa pirsa avênu ku di sînorêñ çend dewletan re derbas dibin disitîne dest û pêşniyariya niyeta baş û xesarnedayina hevdû ya dewleten ku ji avê istifade dikin, tîne. Di civînê de niyeta baş bi mercen bûyerêñ ku rû didin ve hatiye girêdan.

Bi kurtî avênu ku di sînorêñ çend dewletan re derbas dibin ji huqûqa navnetewî zêdetir, li ser niyet û însiyatîfa wan dewleten ku ji avê istifade dikin maye. Li gor vê yekê;

a) Dewleta ku kaniya avê di nav sînorêñ wê de ye xwe bi tevahî xwedî û serwerê avê dibîne û bi dewleten din re vê yekê na-ke mijara bazar û munaqesê.

b) Dewleta ku kaniya avê ji sînorêñ wê dertê, di xebitandina avê de bi dewleten jêri avê re

disêwire û ji bo xesarê negihîne wan dilive.

c) Dewleten (an dewleta) ku li jêri avê dimînin jî xwe xwe-diye avê dihesibînin.

d) Dewleten (an dewleta) jêri avê xwe xwedî “mafê xebitandina dîrokî” dibînin.

Li Rojhilata Navîn, hê beriya ku ava çemên kurdistanê di navbera Tirk û Ereban de bibe problem, li ser dabeşkirina ava Çemê Şerîyê (Çemê Ur-dunê) di navbera Lubnan, İsaîl, Ur-dun û Suriyê de gengeşiyê dest pêkiriye. Di gel ku seredanêñ pişî Şerî Cîhanê yê Duwem tu encam nedan jî, di nav dewletan de pirsa parîkirina avê heta sala 1955an ajot. Di sala 1955an de bi navberiya DYB (Dewleten Yekbûyi yê Amerîka)ye ev

dewlet li hev rûniştin û ava Çemê Şerîyê ku salê di nav hev de 1213 milyon mitrokûp e, lihev parî kirin. Li gor vê li hevkirinê wê 35 milyon metro-kûpê avê bi alî Lubnanê ve, 132 Mm<sup>3</sup> bi aliyê Suriyê ve, 720 Mm<sup>3</sup> bi aliyê Ur-dunê ve û yê mayî (375-450 Mm<sup>3</sup>) bi aliyê İsaîlê vebihata xebitandin. Lê belê ev peyman, ji ber ku Ereban hebûna dewleta İsaîlê bi awayekî fermî nas nedikirin nehat teyîdkirin. Peyman di parlamentoya İsaîlê de jî derbas nebû.

Herçiqas dewleten Ereb û İsaîlê bi awayekî fermî xwe nedabin ber vê peymanê jî di kîrinê (fîiliyatê) de mercen peymanê anîne cih û her kesî bi qa-sî ku jê re dikeve ji ava Çemê Ur-dunê istifade kir. İsaîla ku li gor Çemê Şerîyê welatê jêri avê bû (ango li biniya avê di-

ma), bi şerên 1967 û 1973an û pişt re di sala 1982an de bi da-girkirina Başûrê Lubnanê re bûye welatê jorî avê. Bêguman iro di çareserkirina pirsa Filistînê de meseleyek girîng jî pirsa avê ye. Ev pirs ne bi tenê pirse-ke Filistiniyan û Îsraîlê, herwe-ha meseleyek girîng a nav Ereban bi xwe ye jî.

Dîsa li Rojhilata Navîn ave-ke ku li ser dabeşkirina wê gen-geşî tê kirin Nîl e. Li gor lihev-kirinek ku di sala 1959an de di-navbera Misir û Sudanê de çêbûye 55000 Mm<sup>3</sup> ava Nîlê bi ser Misirê ve 18 500 Mm<sup>3</sup> av bi ser Sudanê ve diçe. Ji xwe Mi-sir û Etyopya hê jî li ser bikaranâna ava Nîlê li hev nakin. Mi-sira ku li gor Etopyayê welatê jêrî avê dikeve xwe disipêre mafê "bikaranâna dîrokî"

Li herêmê çemekî din ê nav-dewletî jî Asî ye. Asî ji Lub-nanê dertê, 40 kilometre di nav-sînorê Lubnanê de, 120 km jî di nav Suriyê de diharikê û di bajarê Hatayê de dikeve Tirkiyê. Asî, piştî ku 88 km di nav "sî-norê" Tirkiyê de herîkî, digî-hije Derya Sipî. Du barajên Lubnanê li ser Asiyê hene. Su-riye jî di gel barajên Restan û Maherdê, bendê Cîsr el Şugurê li ser ava Asiyê çêkirine. Lubnan û Suriye ji bo avdanê ji Çemê Asî istifade dikin û di pirsa parîkirina avê de dengek ji wan dernakeve. Lê Tirkîye bi vê yekê nerazî ye. Her dema ku Suriye qala avên çemên Dîcle û Feratê dike, Tirkîye jî Asiyê tî-ne rojevê. Asî di bazarê de ji bo Tirkiyê qozek baş e. Ji ber ku Suriye doza Hatayê dike û vî bajarî di nexşen dewleta xwe de

nîşan dide, naxwaze Asiyê bike mijara munaqesê. Çimkî gava ku ew bi Tirkiyê re bazara ava Asiyê bike, hingê tê wê manê ku dev ji Hatayê berdaye û qe-bûl dike ku ew bajarekî Tirkiyê ye.

Bi kurtî Asî jî, li benda roja xwe ye. Niha nebe jî wê di pêş de serêşanê mezin bi xwe re bîne.

Di pevçûna li ser avê Çemên Şerîa û Nîlê de alî zelal û diyar in. Qet nebe mirov dizâne kî doza çi dike. Lê ya rast di şerê li ser ava Dîcle û Feratê de hê jî xwediyê avê yê esasî Kurd, ew ên ku divê gotina da-wî ji devê wan derkeve wek a-liyê esasî nayêñ dîtin. Tişte xerîb ev e ku riya vê yekê jî ji alî wanêñ ku şerê avan dikin ve hişk (zift) hatiye girtin.

Dirêjahiya Feratê 2800, ya

Dîcleyê 1900 km ye. Ji tevahiya Çemê Feratê 971 km, ji Dîcleyê jî 523 km. di sînorêñ bin serwe-riya dewleta Tirk re derbas di-bin. Ferat û Dîcle li Kurnayê (I-raqê) digîhîjin hev, li wir navê Şattulereb disitînîñ û ji wir, piş-tî 200 km. yî diherikin Kendava Basrayê. Ferat û Dîcle di nav hev de ji %28ê kaniya ava Tirkiyê pêk tînin.

Havza Çemê Feratê yê ku ji Murat û Karasûyê pêk tê 444.000 km<sup>2</sup> ye. Ji %28ê vê havzayê di nav sînorêñ Tirkiyê de, ji %17 di sînorêñ Suriyê de, ji %40 di sînorêñ Iraqê de û ji %15 jî di sînorêñ Suudi Erebîstanê de tê hesibandin. Ava ku ji Çemê Feratê salekê diherike di navbera 16-50 milyar m<sup>3</sup>î de ye. Ev di nav hev de 32 milyar m<sup>3</sup> tê hesibandin. Çemê Feratê ji %89ê hecmê ava xwe ji Tirkiyê, ji %11î ji Suriyê bi dest dixe. Li gor pîvana Stasyona Pîvanî ya Belkiskoyê ku di sînorêñ Tirkîye û Suriyê de ye, di nav hev de debiya çem di sa-niyê de 909 m<sup>3</sup> e.

Bêguman ev debî li gor zu-wahî û şiliyê, havîn û zivistanê diguhure. Debiya çem carna havînê tê ser 100 m<sup>3</sup> (di saniyê de) û zivistanê dertê 7000 m<sup>3</sup> î (di saniyê de).

Havza Dîcleya ku ji Çiyayê Madenê dertê 111.655 km<sup>2</sup> ye. Ji %12yê vê havzayê li tirkiyê, ji %0.2 li Suriyê, ji %54 li Iraqê û ji %34 li Iranê cih distîne. Ji Çemê Dîcleyê salê di nav hev de 42 milyar m<sup>3</sup> av diherike. Ji %21 havza vê avê li Tirkiyê, ji %39 li Iraqê û ji %10 li Iranê dimîne. Di nav hev de debiya ava Dîcleyê 629 m<sup>3</sup> (di saniyê

*Di sistema beyî ya  
Rojhilata Navîn de,  
çemên Nîl, Dîcle, Ferat,  
Asî û Serîayê (Çemê  
Urdunê) ji sînorêñ  
çend dewletan derbas  
dibin. Ji ber ku di  
buqûqa navnetewî de  
li ser avên ku sînoran  
derbas dikin qaydeyên  
giştî tunin û ev yek ji  
însiyatîfa dewleten ku  
ji avê istifade dikin re  
batiye biştin, çem bi vî  
awayî bûne problem.*


de) e.

Dîroka gengeşiyên li ser ava Ferat û Dîcleyê gellek kevin e. Hê di demên berê de sedemek pevçûna Asur û Babîliyan jî li ser ava Dîcle û Feratê bûye. Ji dema Sumeran, ji Berî Zayinê 3000 sal vir mirovên herêmê ji bo avdan û ragihandinê ji herdû çeman iştifade kirine. Bi taybetî di dema Asûriyan de (BZ 2000-612) bi kelekên ku têñ pifdan û li ser avê diçin, di warê ragihandinî de ji Dîcleyê hatiye iştifadekirin. Kelek hê ji wê demê ve gihiştiye roja me.

Li rû avdan û ragihandinê hê ji demên pêşî ve Dîcle û Ferat di warê bazirganî (ticarî) de jî dihatin xebatindan. Bazirganiya di navbera Asya û Ewrûpayê de bi du riyên bingehîn, bi riyên Baharat û Îpekê dihatin kirin.

“Riya Hevrîşmê (Îpekê)”, Ji Çinê dest pê dikir, di Asya Nâvîn re derbas dibû, li bakûrê Deryaya Hazarê, bi lîmanên Azak û Qirimê li Trabzonê dawî lê dihat. “Riya Baharatê” bi pirranî ji Hîndîstanê, heta ji Çinê dest pê dikir, milek wê ji Derya Sor digihîst Derya Sipî; milê wê yê din jî ji bakurê Kendava Basrayê digihîst lîmana Basrayê, ji wir bi Şattulerebê (Dhicle-Fîrat) hildikişa Bexdayê. Li Bexdayê rê li ser du milan ji hev diqetiya. Riyeq ber bi Dîcleyê ve derdiket Musûl û Enedol û Îranê; ya din ber bi Feratê ve hildikişa Lîmana Suriyê û Deryaya Sipî, an bi ser Enedolê ve digihîst Stenbolê.

Malên ku bi riyên “Hevrîşm” û “Baharatê” digihîstîn Derya Reş û Derya Sipî ji wir bi keşti û deryavanê İtalyayî ber bi




Ewrûpa ve diketin rê. Ji ber vê yekê di bazirganiya ku bi riyên “Hevrîşm” û “Baharatê” dihatin kirin de rola Kendava Basrayê û Dîcle û Feratê ne hindik bû.

Di dema İmparatorê Bîzansê Justinian (527-565) de -ku dema herî xurt a İmparatoriya Bîzansê bû- bazirganiya ku bi Çinê re dihat kirin û malên ku ji Çinê dihatin bi riya Kendava Basrayê û Dîcle û Feratê digi-

hîstîn Stenbolê.

Pîşti ku di sala 1498an de Vasco de Gama di Pozê Hêviyê (Cape of good hope) re derbas dibe û riya Deryaya Hîntê kifş dike, hingê riya firotana malên Hîntî dikeve destê Portekiziyen. Di sala 1515an de gava ku Hurmuza Kendava Basrayê jî dikeve destê Portekiziyen, riya “Baharatê” girîngiya xwe hunda dike û riya ku bi ser Efrikaya Başûr ve diçe Ewrûpa cihê wê di-



sitîne.

Osmanî bi şêrê Mercîdabikê yê sala 1516an û bi şerê Ridâniyê yê sala 1517an Suriye, Mîsir û Hîcâzê bi ser axa' xwe ve berdibin. Bi sefera 1534an Osmanî Iraqê û di vê navê de Kendava Basrayê dîkin destê xwe ku Dîcle û Ferat jî diherikê. Bi vî awayî di navbera Osmanî û Portekizîyan de di salên 1538-1553an de tekoşînek serweriya Kendava Basrayê çêdibe.

Di salên 1577-1639an de tekoşînek serweriya herêmên Dîcle, Ferat û Basrayê di nav Osmanî û dewleta Safaviyan de tê dayin. Bi Peymana Qesîr Şîrîn a sala 1639an İran Bexda û Musulê bi Osmaniyan ve berdi-

de û bi vî awayî cara yekem Kurdistan jî bi awayekî fermî di nav du dewletan de tê parveki-rin.

Di sala 1580an de Portekîz ji alî İspanyayê ve tê dagirkirin û ji vê demê bi şûn de hêdî hedî Holandî, dû re Fransiz û İngilîz li herêmên Asya Başûr û Okyanûsa Hîntê çalakî nîşan didin. İngilîz ji 1611an vir ve li herêmê tê dîtin û li qeraxên Hîndîstanê bi cih dibin. Bi alî-kariya İngilîzan di sala 1622an de Portekîzî ji Hurmuzê tê derxistin û girav di destê Sefaviyan de dimîne. Li herêmê İngilîz û Holandî li hember Fransiziyan yekîtiyekê pêk tî-nîn. Di dema Şerîn Heft Salan (1756-1763) de, di sala 1757an de İngilîz Hîndîstanê bi dest dixin, Fransizan ji vir dûr dixin û serweriya herêmê dîkin destê xwe.

Piştî ku Hîndîstan bi tevahî dikeve bin serweriya İngilîzan, êdî di hemû hesabêni li ser herêma Dîcle, Ferat û Basrayê de İngilîz wek aliyekî esasîn cihê xwe disitînin. İngilîz li herêmê xebata xwe ya bazirgani pêş ve dibin. Hê di sala 1760an de li Basra û Şattulerebê bazirganiyek wan a xurt çêdibe.

Bi destpêka sedsala nozdehan xebatê deryavaniyê pêş ve diçin û hêdî hêdî İngilîz serweriya deryayan dîkin destê xwe. Di sala 1818an de, cara yekem keştiyek ku bi hilme (buharê) dixeble di Okyanûsa Atlasê re tê derbaskirin.

Êdî hîndîstan û pirraniya bazirganiya dinyayê ketiye destê İngilîzan; lê çûn û hatina Hîn-


distanê dûr û dijwar e. Ji ber vê yetê hê di sala 1830an de li ri-yek kurt a ku diçe Hîndîstanê tê gerîn û planêni vê riyê tê çeki-rin. Di vê salê de xebatê teknîkî yên vekirina Qanala Suveyşê dest pê dîkin. Riya ku wê di ser Suveyşê de here Hîndîstanê, ji riya ku di Pozê Hêviyê de vedi-gere sê caran kurttir e.

Pêşniyariya vekirina Qanala Suveyşê ji alî Wezîrê Karê Der-ve yê İngilîztanê yê wê dem Palmerston ve rast nehat dîtin. Li gor nêrîna Palmerston riyek Hîndîstanê ya ji Suveyşê kurttir hebû, Derya Sipî, Ferat û Basra. Ragihandina bi çem berê li ser Ren û Tunayê jî hatibû kirin û encamek baş hatibû bidest xistin. Di ragihandina bi çem re xetera ba û bagerê jî kêm bû. Hem ji xwe di vê demê de li ser Çemê Feratê ragihandina bi qa-yik, şayka, grap, firqate, mavna û kelekan tê kirin.

Li ser vê yetê İngilîz serî li dewleta Osmanî dixin û di 16ê Tebâxa 1838an de Peymaneke Bazirganiyê bi Osmaniyan re çêdikin. İngilîzen ku ji berê ve dest bi xebata xwe kirine, ji bo ku li ser Feratê Keştiyên (gemiyên) bi hilme bidin soveberkirin, karê paqijkirina Feratê li dar dixin. İngilîz bi du gemiyên ku çêkirina wan diqedînin di sala 1836an de li ser Feratê dest ceribandina seferê dîkin. Ji van herd gemiyên ku ji Bîrecikê tê rakirin yek heta Basrayê tê, ji wir di Dîcleyê re derbas dibe û digihîje Bexdayê.

Dû re İngilîz planekî din çêdikin. Ev plan bi qenalekê bi hev ve girêdana Çemêni Asî û Ferat e. Bi rastî jî gava ku Asî û

**Bazirganiyê bi**  
*Osmaniyan re çêdikin.  
 İngilîzen ku ji berê ve  
 dest bi xebata xwe  
 kirine, ji bo ku li ser  
 Feratê Keştiyên  
 (gemiyên) bi hilme  
 bidin soveberkirin,  
 karê paqijkirina Feratê  
 li dar dixin. İngilîz bi  
 du gemiyên ku  
 çêkirina wan  
 diqedînin di sala  
 1836an de li ser Feratê  
 dest ceribandina seferê  
 dîkin. Ji van herd  
 gemiyên ku ji Bîrecikê  
 tê rakirin yek heta  
 Basrayê tê, ji wir di  
 Dîcleyê re derbas dibe  
 û digihîje Bexdayê.*



Çemê Ferat bi hevdû ve bê girêdan, hingê bi gemiyê ji Derya Sipî çûyina Kendava Basrayê derdest (mumkun) dibe. Li gor wê demê ev pelanekî gellek mezin e. Lê Osmanî li hember vê projê derdi kevin.

Çawa ku dû re Qenala Surveyê li ser jiyan Ereban û Misirê bandûrek gellek mezin nîşan da, ez bawer im ku pirojeyek weha pêkbihata, hingê bibê nebê wê li ser jiyan û pêşeroja gelê Kurd jî tesîrek mezin nîşan bida.

Di gel vê yekê dîsa jî Îngilîz dev ji Ferat û Dîcleyê bernadin. Bi gemiyên xwe yên li ser Ferat û Dîcleyê jiyan xwe ya bazir-

ganî berdewam dikin. Osmanî jî, ji bo ku bi Îngilîzan re reqabetê bikin di sala 1870an de “İdareyî Nehriyê” ava dikin.

Almanyaya ku di sala 1871an de yektiya xwe pêk anîye, pişti sala 1888an siyaseta kolonyalîzmê û dinyayê vebûnê dide ber xwe. Berê Almanya li Rojhilata Navîn e. Almanya di sala 1888an de mafê xebitandina Rêhesiniya Heyderpaşa-Îzmîtê û çêkirina xeta Rêhesiniya Îzmît-Enquerê ji Osmaniyan distîne. Dû re, di sala 1899an de Alman û Osmanî li ser çêkirina Rêhesiniya Heyderpaşa-Bexdayê li hev dikin. Bi vî awayî wê Alman li herêma Dicle,

Ferat û Basrayê tesîra xwe nîşan bidin û bikaribin riya ku diçê Hîndîstanê jî kontrol bikin.

Bivê nebê ev yek Alman û Îngilîzan tîne hember hev û di şerê Cîhanê yê Yekem de dibe sedemek girîng. Çimkî herdu dewletan jî hê ji mêt ve li heremê bîna petrolê sitandine.

Pişti ser jî wê hê Îngilîz li heremê xwedî soz û bandûrek mezin bin. Heta di beyankirina sînoran de jî rolekî esasî bileyi-zin.

Di dema nêzîk de, gengeshiyen li ser ava çemên Dîcle û Feratê wê bi avakirina barajan dest pê dike. Di sala 1921an de di navbera Tirkîyê û Fransayê (hingê Suriye di bin serweriya Fransayê de bû) de li ser avênu ku ji sînor derbas dibin peymanek tê çêkirin. Lî belê di vê peymanê de mijar ne li ser xebitandin û parâkirina avê, li ser pîrsên teknîkî ye.

Di sala 1946an de di navbera Tirkîye û Iraqê de; Peymana Dostanî û Cîraniya Baş tê imzekerin. Girêdayî vê peymanê “Protokola Bi Pergalkirina Avê Dîcle, Ferat û Milê Wan” (Resmî Gazete, 12 Îlon 1974) tê çêkirin. Li gor vê protokolê, wê Tirkîye ji xebat û barajen ku li ser van çeman çêbi-ke agahdarî bide Iraqê.

Di sala 1964an de, bi xebatêni avakirina Baraja Kebanê re, cara yekem bi awayekî esasî parâkirina avê kurdistanê di navbera dewletêni Tirkîye, Suriye û Iraqê de bûye mesele. Keban di sala 1973an de temam bûye û di eynê salê de xebatêni avakirina Karakayayê dest pê kirine. Pişti Kebanê Karakaya

di sala 1987an de temam bûye.

Bi poroja Kebanê re, di Îlona sala 1964an de Tirkîye û Suriye li hev rûniştine û xwestine ku li ser xebitandina avê bigihîjin encamekê. Di sala 1965an de Iraqê pêşniyariya li hev civîna hersê dewletan kiriye. Li ser vê yekê Tirkîyê, pêşniyariya ne bi tenê li ser avên Ferat û Dîcleyê rawestinê, herweha li ser rawestina hemû avên ku hersê dewletan girê didin, anîye. Armanca Tirkîyê ew e ku li ser ava Çemê Asiyê (Orentas) raweste û bi vî awayî Suriyê di bazarê de qels bike. Çimkî Çemê Asiyê ji Lubnanê dertê, di Suriyê re derbas dibe û di Hatayê de digihîje deryayê. Suriya ku Hatayê di nav sînorêñ xwe de nîşan dide xwe nade ber vê pêşniyariyê û ev civîn pêk nayêñ.

Di zivistana 1974-75an de gava ku Tirkîye ji bo Kebanê, Suriye jî, ji bo baraja Tabkayê pêşî li avê digere, hingê Suriye û Iraq dikevin pêşira hev, qirîzek wusa di navbera wan de derdikeye ku dîkin şer bikin. Li gor îdiaya Iraqê, bi girtina avê re sê mîlyon cotkarêñ Iraqî ketîne xesareke mezin.

Ji bo Suriyê kaniya avê ya sereke Ferat e. Suriye ava xwe ya vexwarinê, ava avdanê; heta hewcedariya xwe ya enerjî û elektrîkê ji ava Feratê bi dest dixe. Herweha girîngiya Dîcleyê jî, ji bo Iraqê zêdetir e. Iraq jî pirraniya hewcedariya xwe ya ji avê re bi Dîcleyê bi dest dixe. Ango Dîcle û Ferat ji bo Suriye û Iraqê jî abî heyat, ava jiyanê ne. Bi birrîn an çikîna avê re jiyan pê re dikare li van herdû welatan zuwa bibe û giyan hêşî-

nahîya xwe hunda bike.

Suriye û Iraqê derba herî mezin a ji avê bi Proja Başûrê Rojhilatê Enedolê (GAP) xwarine, an wê bixwin (!) Proja Başûrê Rojhilat di salê 1980î de dest pê kir. Proje bi armanca avdan û enerjî bidestxistinê hatiye lidarxistin. Bi pêkanîna vê projeyê re wê li ser çemên Dîcle, Ferat û milen wan 22 baraj û 19 navendêñ hîdro-elektrîkî çêbin. Bi temambûna projeyê re

dikevin nav projê 73.863 km<sup>2</sup> tê hesibandin. Ger ku rûpîvana kurdistanê 530 000 km<sup>2</sup> bê hesibandin, ev dera ku di nav vê projê de dimîne, hema bibêje ji heftan yekê Kurdistanê ye.

Bi xebatêñ li ser Proja Başûrê Rojhilat ve Suriyê û Iraqê pê re dengê xwe bilind kirine û bi tundi li hember vê yekê derketine. Bi seredana Suriye û Iraqê re, Banka Dinyayê, krediya ku wê ji bo pêkanîna vê projeyê bida Tirkîyê da rawestandin. Bi birrîna krediyê re bañê vê proja ku maliyeta wê 32 milyar dolar tê hesibandin bi tevahî li ser Tirkîyê ma.

Li ser reaksiyon û nerazîbûna Iraq û Suriyê, di sala 1980an de di navbera Tirkîye û Iraqê de Komîta Teknikî ya Hevbeş hatiye avakirin. Suriye di sala 1983an de besdarî Komîta Teknikî ya Hevbeş bûye; lê di van civînan de hersê dewletan li hev nekirine û negîhiştine encamekê.

Di Temûza sala 1987an de serokwezîrê Tirkîyê Turgut Özzal Suriyê ziyaret kir. Naveroka vê ziyaretê li ser avê û pirsa kurdistanê (bi taybetî PKK) bû. Bi vê ziyaretê re di navbera Tirkîye û Suriyê de Protokola Hevkariya Ekonomik hat imzekerîn (Li gor hin beyanan protokolek avê û protokolek ewlekarîyê hatibû imzekerîn).

Bi protokolê re Tirkîye ji Çemê Feratê sozê di saniyê de 500 m<sup>3</sup> av berdanê dide. Mehêñ ku di binya 500 m<sup>3</sup> ì de av diherike wê bi zêdeberdana mehêñ din bê telaffikirin. Bi vê protokolê re Tirkîye li ser berdانا ava Çemê Dîcleyê tu soze-

*Li rû avdan û  
ragibandinê hê ji  
demêñ pêşî ve Dîcle û  
Ferat di warê  
bazîrganî (ticâri) de  
jî dibatin xebatindan.  
Bazîrganîya di  
navbera Asya û  
Evrûpayê de bi du  
riyêñ bingebîn, bi  
riyêñ Baharat û  
Îpekê dibatin kirin.*

wê 1.8 milyon (li gor hin çavkaniyan 1.6, hinan jî 1.7) hektar erd bikaribe bê avdan û salê 23 (li gor hin çavkaniyan 27) milyar kîlovatsaet elektrîk bê bidestxisitin.

Proja Başûrê Rojhilat, ji biniya çemên Dîcle û Feratê, ji rojhilat, ji Semsûrê (Adiyaman) û Entabê dest pê dike, ber bi rojava ve bajarêñ Riha, Mêrdîn, Diyarbekir, Şırnak, Batman û Sêrtê digire nav xwe. Derêñ ku

kî nade.

Piştî ku Tirkîye û Suriyê di nav xwe de ev protokol çêkirin, di sala 1990an de îcar Suriyê û Iraqê peymanek bi hev re îmze kirin. Li gor vê peymanê ji ava Feratê ya ku bi ser wan ve dihat wê ji %42 ji Suriyê re bima, ji %58 jî wek para Iraqê bihata berdan.

Gava ku Tirkiyê di roja 23.11.1989an de diyar kir ku ewê ji bo dagirtina baraja Ataturk herikîna ava Feratê di navbera 13ê Çiriya Paşîn û 12 Sibatê de biguhêrê, hingê hem ji alî Suriyê û hem jî, ji alî Iraqê ve rastî reaksiyonek xurt hat. Krîzek wek sala 1975an di nav dewletan de hat jiyan.

Dewleta Iraqê di sala 1993an de ji bo çareserkirina pirsa avê alîkarî ji Yekitiya Ereban xwest. Suriye û Iraq parîkirina avê Ferat û Dîcleyê wek mafekî xwe yê dîrokî dibînin; lê Tirk xwe nadîn ber vê yekê.

Dewletê ku di parîkirina Kurdistanê de li hev kirine û ji bo perçiqandina gelê Kurd milên wan di milên hevdû de ne, li ser av û talana Kurdistanê li hev nakin.

Li gor beyanênu ku çend meh berê Necmettin Cevheri dan, temamkirina Projeya Başûrê Rojhilat bi vê çûyiñê di sed salan de jî nabe. Lî dîsa jî Suriye, Iraq û Tirkîye di pêşîra hev de ne, pev diçin û şerekî dikin; lê ev şer ne şerê iro, şerê sibê ye.

Hem Suriye û hem jî Iraq çemên Ferat û Dîcleyê wek "avê navnetewî" dibînin û li ser van avan doza mafêx xwe yên dîrokî dikin. Li gor Tirkîye

ev çem ne "avê navnetewî" ne; "ji sînor derbas dibin" û nikarin bêñ parîkirin. Heta Tirkîye pêşniyariyêñ parîkirina avê wek têkiliyek li hember mafê xwe yê serwerî dibîne û "doktrîna serweriyê" derdixe pêş. Tirkîye di vê yekê de "doktrîna Harmon" jî wek referans nîşan dide. Gava ku di sala 1895an de di navbera DYAYA û Meksîkayê de li ser Çemê Rio Grandeyê mesele derket, hingê Wezîrê Adaletê yê DYAYA Harmon diyar kir ku ew çawa bixwazin ewê wusa ji ava çem ê ku li aliyê wan dimîne istîfade bikin. Di pirsa Çemê Rio Grandeyê de wek welatê ku li jorî avê dimîne DYAYA yê xwe xwediyê çem hesiband.

Qet şik tune ye ku şerê avê

perçeyek ji şerê dabeşkirina welatekî ye. Esasen Tirk bi Projeya Başûrê Rojhilat, dixwazin statuya heyî ya welatê dagirkirî herheyî bikin. Ji ber vê yekê qet texsîr nakin, dewlemendiyêñ dîrokî yên Kurdistanê talan dikin, di bin avê de dihêlin û bi hovhitî dilivin. Ji niha ve bajaren dîrokî yên wek Samsatê di bin avê de man û derêñ wek Hesenkêfê li benda roja xwe ne. Bi hundabûna van bajaran re kultura me, dîroka me û nîrxêñ me yên mirovî di bin avê de dimînin, pira me ya pêşeroj û peşerojê hildiweşe. Ne tenê welatek û dergûşek medeniyetê di bin avê de dimîne, em jî di bin wê avê de difetisin.


Ma ev av û ev welat bêxwedî ye?

## C A V K A N İ

- Fisher, W. B, "Suriya", The Middle East and North Africa, 1994, London, Europa Publications, 40th Edition, 1993  
 Fisher, W.B., "Iraq" The Middle East and North Africa 1994, London, Europa Publications, 40th Edition, 1993  
 Beschirner, Natasha, "Water and Instability in the Middle East, Adelphi Paper, No. 273. 1992  
 Jansen, Godfrey, "Euphrates Tussle" Middle East International, 1990  
 Irani, Rustam, "Water Wars", New Statesman and Soviaty, Vol. 4 No. 149, May 3, 1991  
 Held, Colbert C. Middle East Patterns, Places, People and Politics, London and San Francisco, Westview Press, 1989  
 Heyderman, Steven, "Yeni umutlar, yeni umutsuzluklar", Görüş Dergisi, Sayı 10, Temmuz 1993  
 Arı Tayyar, "Basra Körfezi ve Amerikan Politikası" Su Sorunu, Türkiye ve Ortadoğu, Yay. Haz. Sabahattin Şen, İstanbul, Bağlam Yayınları.  
 Uçarol Rifat, "Tarihte; Dicle-Fırat Nehirleri Basra Körfezi ve Çevresinde önemli gelişmeler", bhd. (berhemâku navê hat dayin)  
 Versan, Rauf, "Güneydoğu Anadolu Projesi ve Hukuk Açısından Türk-Arap ilişkileri" bhd.  
 Candar, Cengiz, Türkiye İçin Bir "supopolitik" olabilir mi. bhd.  
 Alacakaptan, G. Aydin "Sınırı Aşan Akarsularımız ve Fıratın, Arap Komşularımızla Büyük Sürüşmelere Neden olmaları Beklendileri Abartılıdır" bhd.  
 Kut, Gun, "Ortadoğu, Su Sorunu: Çözüm Önerileri" bhd.  
 Kut, Gun "Türk Dış Politikasında Su Sorunu" Türk Dış Politikasının Analizi, Der. Faruk Sönmezoglu, İstanbul, Der. Yay. 1994  
 Aytar, Osman, Kürdün "Makus Talihî" ve Güneydoğu Anadolu Projesi (Sorunlar ve Gerçekler) İstanbul, Medya Güneşi Yay.

# Hunermend berpirsyar e belam lêre kesî le hunermend napirsêtewe!

Enwer Qeredaxî mamostay mûsîqa  
 û ahengsazî, le salî 1936 î zayînî le  
 şarî Helebçe çawî le be dinya  
 helêhawî. Yekemcar le  
 peymangayî mamostayan xoy  
 amûxtey mûsîqa deka û dîvra  
 qelemrewî çalakiyekey  
 deguwazêtewe bo qutabhanekanî  
 şarî Silêmanî. Salî 1971, debê  
 lêpirsrawî beşî mûsîqa le zankoy  
 Silêmanî û paşan le salî 1981,  
 debête berpirsê beşî mûsîqay  
 hunereciwanekan le Silêmanî ke ta  
 êstaş berdewam e. Enwer Qeredaxî  
 hawrê le tek komelêk le hawrê kanî  
 bo yekem car le salî 1964, tîpî  
 mûsîqay Silêmaniyan damezrand,  
 ziyad leweş qelemêkî şîrinî heye bo  
 nûsînî babet le mer mûsîqa û  
 mûsîqay neteweyî û le zôr biwarî  
 hunerî dîke da destêkî balay heye.  
 Bêguman hogiranî mûsîqa aşînayî  
 dêrînî berhemekanî em  
 mamostayen û şiwêni destî ewîş  
 le biwarî mûsîqa da yekcar  
 sirincrakêş e. Ca bizanîn xoy le  
 barey mûsîqa be giştî û mûsîqay  
 kurdî be taybet çî delê.



**■ Naznawtan Qeredaxî ye û le dayîkbûwî Helebçen! Xotan le eslen xelkî kwê?**

Ême baw û bapîrman le Helebçe bûn. Bawkim piyawî ayînî bû. Ew serdeme, piyawî ayînî egara bo şiwêni mamosta herçende biraderekanman le Helebçe şerî eweman legel da eken û elên to le Helebçe le dayîk bûwî, ebê bilêy Enwer Helebçeyî, nek bilêy Enwer Qeredaxî. Be herhal ême eseelman le Qeredax berdewam bûwe wekû eşiretiş le tayîfey Merdûx in.

**■ Pênasey êwe bo hunermend û yariwange û boçûntan le barey hunermendewe çon e?**

Huner, hemû kesî tiwanê mumarelsey bikaw bibête hunermend. Belam be kê elên hunermendî heqîqî?! Aya hemû kes hunermend e? Reng e hindê kesî le karî hunerî da bibine pêsewa. Aya însanêkî asayı ye? Aya însanêkî sîyasî ye? Însanêkî a-yînî ye? Belam hemû kesêk hunermend e, lêreda nişaney pirsyar daenêyn?

Hunermend bew kese elên ke xemxorî netewekey bê, lew sûcvey karî têda eka. Le astî ferhengî û hunerî beramber be netewekey xoy be berpirsyar bizanê. Wate hunerekey bo xizmetî netewekey xoy bê. Rengdanewey qeltûr û hesret û dax û eşkencye netewekey bixate naw karehuneriyekeyewe. Zor hunermend heye be astêkî hîsî karê hunerî ekat, belam aya çî (îdafî) hekît bo netewekey, birwa nakem bitwanê lîre hîç (îdafî) bikat. Kesanêkîs heye sûtawê bo karî hunerî xoy. Însanî hunermend, piley dereceyek weregrê le xizmetî netewekey da. Eger be rastî û rastgoyî bit-

wanê karekey epcam bidat, lîre pêwîstî be çend kolekeyek heye. Pêwîstî bewe heye ke xoy rûşenbîr bikat, ziyad le hed le tengûçelemey netewekey şareza bê, bizanê le ci sûçkewe xizmet bikat û le sûçi xoyewe dest pê bikat. Be fîkr û bîrkirdînewey xoy, boye elên bînayî hunermend hest be azarî mîlletî le hemû kesî ziyatir eka û etwanê ta radeyekîş çareserî ew çermeseriye le naxya bikat û rengî boy bidatewe. Bew kese bilîyîn hunermendî rast ke legel xetî netewekeyayeti.

**■ Exlaqî hunerî çî?**

Min ke em base elêm renge hemû xistibête naw camûlkeyekewe. Komelgay ême kolmelgayêkî diwa kewtûwe le zor rûwewe, belam çon hez lay ew xelke dirust bikeyn ke wa ebê ême bibîn beş, ebê hunermend (mûwasefey) têda bêbêcke le karetêkîyekey, ebê şarezay rewşî berz bê, bizanê çon müamele legel hunermendîtir legel xelkîtir û legel çînekanîtir eka. Hunermend ebê le naxî mîlettekey tê biga ke be ci şewe xelk rabikêşê bo lay xoy û karehuneriyekeyan legel encam bida. Ke wate mesayili exlaqî û mesayilêkî pileş yekem le komelgay ême da ebê reçawbikirê ke dab û nerîti ême dab û nerîti komelgayekî rojhelatiye, komelgayekî a-yînîye, le ber ewe ebê ême legel ew xalane da pêk bêyîn.

**■ Be pêy boçûnî xot ew aste ta ci hedêke?**

Min ekarim zor hukum le şarî Silêmanî bidem. Le şarî Silêmanî karî hunerî zor başroyştuwe, lew aste xelk rêzi hu-

nermend zor egrê û zor be gewreyî seyrî berhemekanî eka. Ew hunermendaney ke basman kird, bew şewekeye ke elên hunermendî heqîqîn û hunermendî rastin. Le zor cêgey Kurdistanîkes min ew new'e hunermendanim bînewe û peywendîm heye le gelyana. Renge le Kurdistanî êran, le Kurdistanî turkiya û heta tenanet le hen deran, le ewrûpa, belam kasanêkîş hen bedaxewe lew astane nayan bînim.

**■ Xotan pêwertan çiye?**

Ême zor kesî rûwî tekirdîn dengî xoş bûwe, belam lew birwayedam ke taqîbman kirdûwe, seyr ekeyn reftar û silûkî başî nebû, dûrman xistûtew. Gerçi dengyan xoş bû, renge ew dengxoşîye le paşeroj şikaneweyek le ser ême bika, le ber ewe nekeyn bastire, nek le diway da wazî lê bênin. Çunke tecrûbeman bûwe lew biwarane da, zor goranîbêj hatûwe, ême singman bo kirdûtew, belam be daxewe hunermendîkî bedreftar derçûwe sûdbexşî nebûwe bo komalga, êmeş wazman lê hêname.

**■ Barûdoxî mûsîqa lay xotan çon heldesengînin?**

Le pêş raperîne goşar zor bûwe le ser hunermendî kurd dest be seriyêk le ser hunermendî kurd hebû, belam komelgakeman ke tirûskay le hunereke da ebînê ziyatir be demiyewe erwa ke berhemêkman saz ekird, xelk zor be tewsewe bo hunerekey xoy bibînêtew. Le hunerekeya astî netewayetî kurd bibînêtew ke tipî mûsîqa sed kesî, sed û penca kesî le ser şano-yeck bê, fexre bo ême ke çûwêñ

bo mîhrecanêk le Bexa (Bexdad), le astî ser ta serî Êraq ye-kemman hêna. Heta tenanet tî-pî duwemîş ke derçû her le Kurdistan bû, yekem le Silêmanî bû, duwem le Hewlêr bû, yekem le Dehok bû, duwem le Hewlêr bû. Hestêkî neteweyî palî pêwe enayîn bo ewey briroyn karêkî hunerî bikeyn le goqarekan, soçêkman edoziye-we basî mûsîqay kurdîman e-kird, basî folklorî kurdîman e-kird, tehlîlî mûsîqay kurdîman ekird. Belam dabeşbûnî îmkanat le layen mîriyewe zor ciyawazî hebû! Yanî ême ta êsta le Silêmanî stodyoy hunerî wa-man nebûwe yaxud, daîreyekî hunerî wa nebû ke bawes bo huner bikrêtewe. Eger bikraye ebwaye be ser şan û balî rijêmî hel bidaye, ewe bo ême nadigonca ne eçoyme jêr barî ew işane. Renge deyan car teklîfyan kirdibaye; werin ba botan beyn bo ewrûpa, bo ew cîgaya-ne. Belam ême eman zanî be çi mebestêke ne eçûyn. Hunermendî kurd huşyar bû lew şitane, ne eçûwe jêr ew barane. Zor car bang ekrayin; filan awaztan bo kirdûwe, filan sirûdtan bo kirdûwe, be çi mebestêk ewetan kirdûwe! Zor hunermend tûşî teng û çeleme ebûn. Belam duway raperîn zemîney azadî hate pêşewe, ew xelkey ke waşti le naw dîlya helgirtibû ney etwanî derî bibirê, belam ke raperîn hat, destî kirde goranî wûtin. Înca le naw emanê ke-sanê dengxoşîş têda derekewt. Yanî haletek le (Fewda)dirust bû. Wirde wirde ew kef û kuleye damirkawetewe. Înca awatexwazîn le dahatûda em işane ziyatir bê, karî hunerî ziyatir bê le naw peymangay hunereciwanekana, êsta basî mêtûwî mûsîqay kurdî exwênen, miqamî

kurdî exwênen, ew şitane exwênen ke peyweste be mûsîqay kurdî.

Boye min le rîgay em çawpêkewtiñe dawa le hemû ew dilsozane ekem ke çiyan heye, zanyarî le ser mêtûwî mûsîqay kurdî, le ser hunermendanî kurd bo peymangay hunereciwanekanî Silêmanî û lay xoman rewaney biken bo ewey ke bitwanin programa daybinen bo şarezabûn le hunermendan û karî hunermendan lew meqamaney ke wa hen lew karehuneryane ke hen. Bo ewey ke tewawî hunermendekan şarezay hunerî nawçekanîtîrî Kurdistan bin.

**■ Le basî mêtûwî mûsîqay kurdî ewey ke ême eybînin wekû kar û barî rojnamewanî lem beşeya, kurd zor lanewaz e. Pêtan waye hoyekanî çiye û be çi şeweyek ekrê çareser bikrê?**

Hoyekanî wa bizanim me'lûm e! Çunke kurd xawenî xoy nebûwe û neytîwanî le ferhengî xoya biçête binç û binewanî tarîxî xoy. Nimûneyekî biçcole dênimewe!

Le salekanî heftîyekan da ême programêk pêşkesî kird be zankoyî Silêmanî. Wûtman, bi-gerîn be diway goranî folklorî û koyan keynewe be kasêt. Serokî zanko zor pêy başî bû, parey başî bo terxan kira, belam ke dayane dezgay <emin>, ewan refizyan kird û wûtyan; êsta lem barûdoxe nagirêt û eme karêkî zehmet e. Ke wa bû, xeterekeyan ezanî çiye!

Min ferhengî xom ko ekeme-we. Rûşenbirî xom, goranî folklorî xom, keleporî xom, çon ebê ko bibîtewe? Ewan deyan kurd nehêlin. Em kare karêkî zor girîng e. Karî bo ne-

kirawe. Ew kares ke kirawe hindê astî takrewiye. Ême ne-manewîst ew şitane darwirdî bikeyn. Ew dezgaye bibîte ewe ke wa bitwanin <tehlîl>îş kirdînewey keleporî kurdî le gorani-ya, le şitî hunerîda têyda encam bideyn.

Bo xom le barey şarî Silêmanî basêkim heye ke goranî kurdî çon hatûwete şarî Silêmanî. Silêmanî şarêkî tazeye, nizîkey 200 sal e temeniyeti. Le dewr û berî şarî Silêmanî grûhî hunerî çon dirust bûwe; inca diway wirde wirde çon hatûwete şarî Silêmanî? Danıştiwanî ew ha-kimaney ke lêy bûn, çon yar-meti hunermendyan eda? Yaxud çon dijyatiyan kirdûwe? Lew basaney hênaawmane wirde wirde emanewê em base têr û tesel keyn, bêyîne nawçekanîtîr. Bo ewe ke wa le her nawçeyek şiklî biçük le mêtûwî ewey bûwe dirust keyn û bikeyn be programêk ke qutabî huner bixwênet mêtûwî netewekey çiye! Le wane waye zor kesî hebê le Kurdistanî ême aşîna nebê ke Xwa lêxweşbû Seyid Elî Esger kê bûwe? Ezanî be naw heye, goranîbêjêkî nawdar û gewreye, belam jiyanî nezanî çiye. Le kwê le dayîk bûwe? Çi kirdûwe, goraniyekanî çiye? Berhemekanî çiye?

Ême tewawî berhemekanî gwêman lê bûwe û etwanîn tehlîlî keyn, belam şinasnamey tewawî xoy niye. Şinasnamey ew zewiyeman niye ke Seyid Elî Esger i têda dirust bûwe. Pêwîstman bem karane zor e. Eger akadîmîyêkî gewreman hebê, ew şitey têda firawantir key, <Îxtîas> i wergirê, profi-sorî wergirê, wa bizanim şitêkî baş e lew biwareda. Ême debê kar, huner dabeş bikeyn bo karî praktîkî. Hendê bo karî tojî-

newe, hendê bo lêkolînewe bo dahatûwî mûsîqay kurdîman, lêre xetêk dête pêşewe ewîş e-weye; ême bîr bikeynewe ke komîteyekî hunerî bo mûsîqay kurdî dirust keyn le Kurdistana, bitwanîn programî karî mûsîqay dabinêyn le pisporan. Basî barîk lew barane bikeyn ke wa le mûsîqay kurdîman da heye ya basî mûsîqay folklorîman ciye? Mûsîqay danrawman ciye? Yaxud, ew amîre mûsîqayane çîn, ke le mûsîqay kurdî be kar ehênen? Tesîrî mûsîqay erebî, farisî, turkî û ermenî û çenêk heye le ser mûsîqay kurdî kame ye? Mûsîqay kurdî kame ye, rû-hiyeti mûsîqay kurdî emane hemûwî girîng in û çend basîtir.

■ Be têbinî ewe ke ziyatir le sê deye ye le zemîney mûsîqa kar eken, radey nasyarîtan legel mûsîqay nawçeye ciya ciyakanî kurdewarî ta ci hedêk e?

Aşinayetim legel hendê mûsîqay Badînî, Hewreman û Lôristan heye û heta karî hunerîşman bo kirdûwin, belam müşkîley ême le ciyaye? Ew huner-mendey ke le şarî Silêmanî goranîman legel elê, renge wek lehçe û şêwazekan netiwanî şêwazî Badînan ya şêwazî nawçey Xaneqîn wekû <fonetik>bihêne. Zorî legel hîlak ebîn ta şêwazekey wergirî. Xo eger goranîbejeke legel man bê, zor karêkî asan e û le yek nêzîk ebênewe, çunke mûsîqay kurdî ciyawazî nîye û qewmêk nîn ciyawaz bin le yek, şêwaze lehçeye. Şêwazî Hewramî, şêwazî Şarezorî, Şêwazî Silêmanî û Şêwazî Hewlêrî û ...

Emane legel yektir ciyawaz nîn, belam teng û çelemeyeke gewrey ême le wê daye ke

hendê karman wekû pêwîst na-gate encam. Meselen; elên goranî hore çone? Elê; hore ho ho ho ho waye. Çon hatûwe nazanîn, natwanê bot bas bikat.

■ Ewe le mûsîqay kurdî da dahênanêktan kird, ewîş e-we bo le pal orkêstrî mûdirnî wek Viyalon û baqî sazekanîtir, dehol û zurnatan dana, yanî saz û deholî kurdî hate pal Viyalon û le pal baqî sazekan da xoy ni-wand û karekeş karêkî zor ciwan bû. Eme karêkî baş e. Bêcke lewîş karî zorman bîstîwe le cenabit, hawre-kanit, ew ahenge sazane ke le êrana xerîkî karî mûsî-

ebê xizmetî mûsîqay kurdî biken, <be wûtey xotan a-waz dirust biken> bo goranî. Her ew awaze konaney ke bû, dîsan eyhînen û lê edenewe. Îfir hîç alogorêk niye egerîş bitwanin a-wazêkî dirust biken, zortir awazekan eçîtewe bo lay melodiye farisiyekan, le kurdistanî êraq eçêtewe bo lay melodiye erebiyekan, le Kurdistanî turkiye bo lay melodî turkekan. Eme ebê çî bikeyn? Ahengsaz ebê çî bika ta bitwanê goraniyêkî kurdî kon, meselen, wekû (Diwêne ta direng ta di-reng). Eme karêke hîç wext le bîr naçtewe, belam a-

*Goranî folklor ew goraniyanen ke wa le baw û bapîrewê boman mawinetewe demaw dem wek awaz, wek kelîmat, wekû şî'r, wekû bunrawe, wek rûbîyetî goraniyeke, eşê le nauçeve bo nauçeyekî ke bigorê, eme daxilî babetêkî qultir ebîn ke wa ebê eme dirasetî goranî folklorî bikeyn.*

qîn, ewanîş her kame be norey xoyan be pêy zanist û agadarî xoyan xerîkin xizmet be ferheng û goranî kurdî eken, helbete emîş bilêyn bêckekurdekeş xeyre kurdiş xizmetî kirdûwe, yekêk wekû mamosta Hennane kurd nebû, bes pêy xoş bû xizmetî mûsîqay kurdî bika. Le êran da mûsîqi şîtekî xoşewîst e bo kurd, bo faris bo gişt millet. Bextewerane kurdiş tiwanî lem meydane be çakî û be başî xoy nîşan bida. Mûsîqay kurdî êsta nawbangî heye û xelk eynasin û cêy xoy kirdûtewe. Belam şîtek heye ahengsazekan ke

hengsazî êsta bo natwanê karî aweha bika bo şîti wa naxulîqêne?

Belê, ême eger seyrî komelegay xoman bikeyn komelegayekî rojhîlat ìn. Eme, eger zortir qûlbênewe lewe ebê daxilî hendê biwarî siyasî bîn. Kurdistan nawçeyekî gewreye. Beşêkî Kurdistanî êran e, beşêkî Kurdistanî êraq e, beşêkî Kurdistanî turkiye ye, beşêkî Kurdistanî Sor e û her cêgayek lem cêgayane şarista-niyeti ew welata be ser komel-gay kurdewariya destî dirêj bû-we. Le êraq şaristaniyetî ereb be ser kurd da dest balaye. Le

êrana şaristaniyetî farisi û her weha.

Bem şewane gumanî têda niye, eme peywend e legel biwarî rewşenbirî û bîrkirdinewe, tenanet biwarî rageyandin û emane dewrêkî karîger ebînê le hatûçûkirdinî emane mûsîqay le Kurdistanî da, ême ta radeyek erebî karîgerî le ser ew hûnermende ahengsazane dana-we ke eyanewê lew kolane xo-yan bigeynîne derewe. Ew ne-waraney ke gwêt lê bûwe, ya-xut ew berhemaney le êzgey kurdî Beğâ tîpêkî mûsîqa hebû ke hindê le goranîbêjekan, nek hemû roystûn goraniyan tescîl kirdûwe. Tîpemûsîqake hemû-wî her ereb bûn, lê ser şêwazî erebî mûsîqeyan lêdawe. Belam ew berhemaney Tîpî Mûsî-qay Silêmanî pêşkeşî kirdûwe, ziyatir le erebî %9 kurd bûn. Be nîsbet êranewe renge le êzgey Tahran zor car şaheng-man gwê lêye, gruhêkî mûsîqî lêye eda, renge karî farisi tesîri hebê le ser mûsîqejenekan.

Her wiha le turkiya xoy bo zor ho egerêtew, belam yekê lew hoyane eweye ew ahengsazane ke hen, ya ew mûsîqaney ke hen le rûhî mûsîqay kurdî şareza nîn, her weha ûttan zor car goraniyekan elênewe! Min be şitêkî baş nabînim, belam útinewey goranî folklorî, renge şitêkî baş bê.

Min xom le seretay mûsîqay erebim gwê lê bûwe. Radyom ekirdewe hemûy mûsîqay erebî bû... Mûsîqay erebim zor lêdabû. Goraniyekanî Umkelsûm û Ebdulwehab û emanem lêda, belam ke hestim kird min kurd im, ebê goranî kurdî lêbidem. Başe çon goranî kurdî lê edey? Gwê le goranî folklorî egrîn, le goranîbêje milliyekan, ci elên bo rûhiyetî goraniyekan le naw



derûnman dirust ebê, bo wêne, gwêm le goranî birayanî zizîye, gwêm le dengî Xwa lêxwesbû Elî Merdan e, gwêm le Hesen Zîrek e, gwêm le Seyid Esger e, gwêm le Mela Kerîm e. Emâna goranî kurdîyan wûtûwe ke wate elên şitêk heye. Elên nawî goranî kurdiye. Goranî kurdî le çiya min diyarî ekem?! Le folklor da? Ew şêwaze le folklor da destnîşan ekrê.

Goranîyêkî wekû (Lorkê lorkê lorkê xatûney..) erebêkî lay ême wûtûyetî: (Lorkê lorkê lorkê lorîk..) Goranîkey kuştûwe. Goranî kurdî lay ême kirj e, üley têdaye, xwê ecûlênen, belam ew lewê xwêneke mirdar ekatewe, xwêneke xaw ekatewe...

Ême kirje jiyanêkî hereket-man heye, ebînî yekê le Kurdistan da le şaxekan dête xwarewe û be gurc û golî erwat goranî xêla elê, hore ekat. Goranî siyaçemanê elê, Goranî bezm elê, eme qaîdey goranî êmeye <hereket>, belam cêyêkî biyanban e, ebînî ke goranî elê, giya-

nî xaw ebêtew, giyanî sil bû-wetewe meqamî xaw elê (wele wîlax..) Yanî sil ebêtew. Emâne <Tabîî> goranî nawçeve wer egrîn. Min le lam waye ewey ke dête dunyay goraniyewe, eger le biware zanistiyekan nebêt, ebê le dunya folklorekewe bê, çunke folklorî ême yekê pir ekat le rûhiyetî kurdî, ew şitane ke dirust ebê le naxa ke goraniyekî elêtew le ser ew şêwaze goranîbêjman heye.

Bo nimûne Heme quto ke Mihemedî Brayîm Ebdûle (sewzey kal mî û ho sewzey malekem..) Elê; hendî hestî têdaye naxî goranîbêjekeye şêwazîş Şarezoriye, nek Hewramî yaxud elê (kilimil bawanîm..), eme Hewramî tewawe, belam goranîbêjekanman çenê gwê egrîn le mane yaxud awaz-danerek, ahengsazekan çenê gwê egrîn le mûsîqay kurdî be giştî mûsîqayêkî folkloriye, wate mûsîqay daner karêkî tazeye lay ême. Le salanî şeste-kanewe destî pê kirdûwe min ke xom awazek daenêm, birwa ke le iqa'êkî kurdî, mîlodiyêkî kurdî, le her şitê kurdî bê, le naxî kurdîyewe ke kelk wereg-rim, eger yekê lew şitaney têda nebê, bêguman renge awazêkî kurdîm danenabê. Belam ew awazaney ke daenrên eger carêkitir bûtrînewe ebê huqûqi goraniyekey bo goranîbêjeke parêzrabê. Reng e ew goranîbêje nezanî ew goraniye çon hatûwe? Aya folklor e ya folklor niye?!

Belam eger şarezayêkî şaristani hebê, şarezayî zanistî tay-betmendî goranî folklorî, diya-re ezanê goraniyeke ûşekanî sûwke le awazêkî sûwkeleye, ritmêkî sûwkeleye. Hemû le çend notêk da ye, mewadî den-gekanî çend dengêk e, belam

ke goraniyeke be namey hunerî têdaye ebînî goraniyêkî danrawe ke wate xawenêkî heye. Helbete lêre eçite babetî goranî folklorî û goranî danrawe, wate goranî ladê û goranî şar, ew hunermendaney ke astêkî rûşenbîriyan heye le naw şarekan in, zortir karî huneryan heye, şit daenê, ahengsazî eken, belam ew hunermendaney ke le derewey şar in, reng e ew aşinayeyan legel zanistî mûsîqa nebê, le ber ewe le xoyewe goranî elê folklor e û goranî millî ye. Goranî folklor ew goraniyanen ke wa le baw û bapîrewê boman mawinetewe demaw dem wek awaz, wek kelîmat, wekû şî'r, wekû hunrawe, wek rûhiyetî goraniyeke, eşê le nawçeve bo nawçeyekî ke bigorê, eme daxili babetêkî qultir ebîn ke wa ebê ême dirasetî goranî folklorî bikeyn. Goranî millî renge kesanêk dayenê şarezayiyan niye le zanistî mûsîqa. Goranîbêjêk le<not> û le dirasetî mûsîqî şareza niye awazêk daenê le xoyewe, elê goraniyêkî danawe, goraniyêkî millîye, le waneye paş maweyek xawenekey le bîr biçêtewê ebê be folklor, belam awazêk ke daenê ahengsazî bo ekeyn le ser binemayekî zanistî û rîkûpêk eme bêguman <not>î bo daeynên. Gruhî mûsîqî bo damezrênîn, karame ehêniye pêşewe wekû kursî bê, wekû mûsîqî bê, hemû encamî edeyn, eme karêkî tezeye encamî edeyn.

Le naw kurdewarîman da, min be karêkî baş nazanim eger her kesêk helsê goraniyêk bêjî û le heman kat da goranîbêjekanman eger biyanewê ziyatir le mûsîqay kurdî têbigen, ebê ziyatir gwê bigrin le folklorî kurdî ke le ser ew binemayane-

we daenîşê diraset bo xoy bika û astî rûşenbîrî xoy ziyan bikat. Çunke ahengsazî babetêkî taze-ye.

Min le goraniyêk le goraniyekanîm gwêm le dengî dehol û zurnaye, elêm <dum-tek, dum-tek, dum-tek>, le ahengsaziyêkî taze ew rîtme daxîlî ekem le gelya yaxud le şêwazî wûtina kelk wergirîn le goraniyêk bo wêne ahengsaziyêkîm kurdî kelkim le meqamî <Allahweysi> wergirit, teqrîben 20 deqîqe goraniyek gruhêkî gewre eylîn ke teqrîba 110 kes e. Em ahengsaziyek le wê da kirdûme kelkim le meqameke wergirtûwe. Belam le diwayî da gewrem kird.

Eme le mûsîqay cîhanîş da heye, emîş Bethovin, Çawîskî. Em mûsîqedane gewrane kelkyan le folklorî milletekey xoyan wergirtûwe, ew sîmfoniya û karegewraneyan kirdûwe. Eme ebê bizanîn mîjûwî mûsîqay cîhanî em milletane çiyan kirdûwe û ême kelk lew tecrûbane wergirîn, wate goranîbêjêk ke wa le astî rûşenbîriyewe nayête pêşewe û yekser dêt dest ekat be goranîwûtin, rûşenbîrêkî hunerî niye, e-kewête helewe, ha le çiya? Goraniyek dubare wûtûwe, kê elê, ba bilê min away elêm! Nazanê em goraniye <not>î heye, eme dezgay taybetî ewî pê bûtrê, ewe niye. Ya min goraniyêk daenêm bo orkêstr damnenawe bo dehol û zurna ya awazêkim danawe dehol û zurnay bo lê bida, dam nenawe bo ewey orkêstr lê bida ebê ew heq û hiqûqane biparêzrin.

### ■ Pêşniyarî xotan bo parastînî ew melodyane çiye?

Erkî gewrey dezga dewleti-

yekane ke wa gruhî mûsîqî şareza dirust biken bo kokirdine-wey ew keleporane û le naw kitêb da tehlîlis bîgrêtewê, basî bikrêt û binemakanî ûrd bikrêtewê, înca newekanî dahan-tûman etwanin kelkî lê wergirin, le ahengsazî da bê, le tûjî-newe da bê, le pîsandanî <not>î kurdî dabê. Le biwarêk lew biwaraney mûsîqay kurdî têdaye, gewretirîn erk ke le ser şanî hunermendanî kurd e, folklorîyekanî kom bikeynewe be kasêt û le diway ewe tehlîli emîş pêwîstî be pispor heye. Kesanêk ebê karame bin. Bixwênin lew biwarane da şareza bin, yanê hemû kesêk ew karey pê nagirê karêkî zehmet e. Ebê xoy bo terxan bikat û bûdcay taybetî bo dabînrê, îmkanatî maddî bo dabînrê.

### ■ Ewe xotan be kam beşewe mandû kirdûwe?

Eme mûsîqay kurdî wekû <ixtisas> neman tiwanîwe zi-yadî bikeyn, bawesman bo hemû layek kirdûtewe. Bo nimûne le salî 1974 legel zor le hunermendanî xoman da, ziyatir le du hezar û heştse goranî folklor man kokirdotewê.

### ■ Gewrey goranîbêjekanî râbirdû legel êsta zor ciyawaz e. Hez ekeyn bizanîn hokanî çiye? Aya mesailî zemâne yaxud meseley mûsîqay kurdî pêwîstî be goranî heye, yaxud îmkanat be şêwey boçûn û riwangey însanî em esre?

Du sê ho heye bo em şîte.

1-Astî rûşenbîrî.

2-Astî nebûnî.

3-Biwarî siyasî.

Eme le hemû şitêkman üsey

siyasetî têda be kardênen ci bitewê û netewê daxil bûwe legel jiyanî komelegay kurdewarî da.

Ew goranîbêjaney ke wa lem ser deme da goraniyan ûtûwe helkewtûn, wekû Xwa lêxeşbû Seyid Elî Esger, Mela Kerim, Elî Merdan. Emane le naw komelegay kurdewarî da ewene goranîbêjêkî zor nebûwe ke bêñ û bïkene hedî munafese kirdin, yaxud eger heşbûwe kesanêk firyay ewe kewtûn zebtî berhemekey ne kewtûwe û gwêman lê nebûwe, nezanîn ême êsta wa elêyn; kê elê le ser demî xoya deyan goranîbêjî dengxoş nebûwe le pêş Seyid Elî Esger û le pêştirîş da! Belam dengekanyan pêman negeyiştûwe. Mêjûnûsêk niye <not>î goraniyekan û ya berhemekanman pê bigeyênen, eme piçranî legel rabirdû xoman elê zor rûwewe. Meselen renge zerdîxezan, çen kesî ûtûyetî, hem merhûm Xwa lêxweşbû Seyid Esger ûtûyetî, eme yekem.

Duhem; Lew serdemane e-veye dengxoşî bobê diyar bû le naw komelgay kurdewarî da nawî zorî wergirtûwe û belaw bûtewe. Bo nimûne Hesen Zîrek le navçekanî Kurdistan gerâwe nek bo hunerekey bo jiyanî xoy gerâwe ke bo jiyanî gerâwe naçarîse wekû huner-mendêk. Bo nimûne goranîxoşî ûtûwe be ser helperkê kerekân û be ser xelkekeya. Emane bew new'e nawyan derkirdûwe ke ta êstaş mawetewe. Legel e-veyeş da rastgowî têdaye, çunke goranîbêje yaxud ew huner-mende le nawçey kurdewarî neçûte derewe, yanê wekû ême nebû ke ta Besre birwîn, yaxud takû Meşhed û takû ewserî êran biga.

Yekî wekû Seyid Elî Esger tiwanûyetî bigate Taran. Baše, to lew birwayey goranîbêjêkîtir nebûbê lew wexte da? Hebûwe belam neytwaniyewe bigate Taran, ta ewîş dengî <zebit> bika. Her weha Elî Merdan lew serdeme da le Kurdistanî êraq û her weha Kawîs Ağa û çendîn hunermenditir le wane, em goraniyaney ke wa bem şêwaze eman eylin û bew new'e pêman geyiştûwe, belam emro goranîbêj zor e û zor ekewîte ber gwiçkey, le ber ewe xirab û çak têkel bûwe.

Selîqey xoy û herçî ew şitane goranîbêjî baş yaxud ahengsazî baş ciya ekatewa emro deh goranîbêjî lêye, belam bîst sal le-mew pêş du goranîbêj hebûwe, emro gwêt le penca goranîbêje, nazanî kamyan sozî dilî to edat, sert lê eşîwînê emyan ya ewe-yan, nazanî kamyan resen e, çunke nûsravêkî mêjûwîman niye ke goranî kurdî çiye, le kwê hatûwe, çon serî hilhêna-we, çon perey sendûwe, şêwazekanî çîn? Eme erkî hunremdanî emroy êmeye ke wa ew kare bînine encam. Le ber ewe ebînê dengî kal û pûxtê têkelaw ebê, dengî xoş û naxoş têkelaw ebê, bîcke lew dezgay hunerî <zebit>kirdin emro zor pêşkewtû bûwe. Wate şarista-niyeti jiyan le îqaeki xîra erwa. Le rîçkeyekî gurca erwa, eger firyay sit nekewî be cît ehêlê, karûkat be cît ehêlê. Ebînî dez-gay (zebit), hendî dengî nizim xoş eka, hendî dengî naxoş xoş ekaw... Bûnî eka be sera, le ber ewe kesêk tozêk le xoyra ebînî raekat goranî tescîl eka le kwê da bitwanî goranî xoy elê.

■ Ew şite konaney ke êsta le serî kar ekey le hendî ze-mîneya wekû dahênanî ti-

ya da berçaw nakewê, hoy çiye?

Axir goranî folklorî xoy le xoy da dahênanî, çunke le naw komelga ebisrit, be tenha şexsêk dirustî nakat, le naw komelga dirust ebît û demawdem egate lay ême. Bo nimûne goranî Xwa lêxweşbû Seyid Elî Esger ke ûtûyetî û heman goranî birayanî zîzî dubareyan kirdûtewe, aya bûn û berame û çêjî her wekû ewey Xwa lêxweşbû Seyid Esger e? Bêguman ne, ciyawazî heye, hendî layen heye goranîtirîş ew bistîtewe bew şite tazanewe û hendî sit heye îcbarî goranîbêjeke ekat ke way bilê.

■ Ke wate êwe legel harmonîze kirdinî em goraniyane dan?

Legel barûdoxî êsta le ahengsazî taze ebê bikrê û şitêkî ciwan e.

Le hendî biwar da ebînim serkewtûwe, belam le hendî bi-warîfir da renge wek pêwîst neyete ber çaw, belam eger kelk wergirtin bo xizmetî kareke bê, be giştî ciwantir e, wate karî müsiqa eger dubare bikrîtewe ciwantir e, wekû xoş le xoya karêkî tazeye, Mûdirne, yanî şêwazêke lew şêwazane ke wa emro zor le lawekanman, ahengsaz e tazekanman lew bi-warane da iş eken, ême zor car hewl edeyn şitî taze dirust bikeyn, belam kelk le kelepor werbigrin û nabê deşkarî bikrî, ebê wekû xobî bê, yanî ême etwanîn le ser goraniyêkî folklorî kurdî semfoniyek dirust bikeyn, ême wa nezanîn goranî kurdî her dehol û zurna ye û baleban e yaxud etwanî bew ştane orkestrekî gewre karekî

hunerî ciwan pêşkêş bika. Bonimûne li elmanya parçeyekî musîqay minyan pêşkêşî kurdawa, wayan guncandûwe bo çarîneyekî mûsîqa, wate kutînîng du keman û fialûnîk û piyalentînînk. Am kareyan durust kurdawa lenaw holîka. Xa-keke zor zor pê pesend bo we û tu yane eme lekraî mozar û ewane eçê. Kar karî ê me ye belam goncîn rawe legel curhi ka-reke û zor asen kirawe. Bo wêne ew karek girayanakî kamkar kurduyane bo ku niwê karêk wistuyane le melodiye-kanî xwa lê xweş bû. Elî esger bi ken be işkî taze em cure işa-ne xizmetî komelkayî kurde-warî man tara deyek eka lem warî ehng sazî tezê da belam e-ger lebwarî folklorhi dabê. Bi warî folklorî qonaxî xoy heye. Kenlekî xoy heye her wek bi-warî aheng sazî taze... hemû eme dergay tê da ye û ewe niye ême girûhêkî gewre bibînî ya-xût dahul û zurnayek betâfî ten-ya bibînin bileyn musîqay kur-dî lewda ye! Min mûsîhqaye-kem heye "hore" lê horeyi na-çey xomanim wergirtûwe. Bela legel piyano da pêşkîşî kurdawa birduwane li Ewrûpa pêşke-yan kurdewe tiştekî zor ser-kewtû bûwe hereketek wekû mûsîqay sîgan heye waye. Notek le mûsîqay sîgan. Kewa bû ême etwanî we ku binemay mi-letê xwe man lewhoreye xanu-yekî gewre durust biken. Lew-kolane biçkoley hemane quesrekî gewre durust "bonî nekey" ba hewl bidey ledahatuda a-heng sazî çekman bibe wate amîrê nû aheg sazî taze balam ebê lebwarekî zanistî ya we seyri key nek her lexumanewe iş bikey.

■ Em lawe kudaney dil soz û

**hogirî mûshihqay kundî lebwarî folklor çî bike?**

Karekî takrewî biçcole xiz-metek bike egeynî balam wekû karekî akadêmîk niye giriftiki-man eweye lê redaêmes ema-newî mûsîqay xoman wekû mûshiqay şirastanî lem hewce-xe û lem dunya taze biduzîne-we û her çend ekey binemayek man niye.

Erkiserekî ême ewe ye rû bi-kenîne zanistî mûsîqa keroman kirde biwarî zanistî wate mûsî-qa bi ilmekî bixwêne lew bir-waye dan herkesî erkî serşanî xo ezanê ke goranî folklorî der-key çon karî legel da bika aya wek folklor biley ya wek awazekî taze biley. Yaxut çon goranî bêjêk karî legel bika û hewl bidat ew amîraney kegoncawin legel goranî kurrdî da ba fêri bê bo ew fêrbûneş ebê layenî za-nistîyeke bigrên eger benot fêr nebînin. Tenya beguwêcke astekî mehdûd e. Lebel ewe best nîşan kirdinî amîre miliyekanî kewa lenawa mûsîqay kurdîna bekarî ehînin û ew awaze folkloraney kewa ême pêyan elên goranî folklor pêwiste bimîni newe bala ewê peymangayekî hunerî man hebe ta mûsîqa besêweyekî zanistî bixwînin e-gîna natwanin mêjuyek bo da-hatuyî netewekeman durust bi-ken.

■ Datanûn mêtuyek bo sere-tay karê orkestrî kurdi be-how beşî xotan diyarî bi-ken herweha ew ezmûne ta kuwê gustuwe?

Eme egerî tewe bo basî mûsî-qay silêmanî ême wextî ke xwêntkar bûn gê man legoranû kurdi ebû. Ema not ewaney te-mû sîqa û lê eden hemû erek in.

Leseretay salî 1964 û zayînî le-gel ew biradaraney kewa legel ma fêrû mûsîqa bûn tîpêkî mû-sîqa man durust kerd. Kebereti bû liheşt kes. Hendekyan ke-man yan lê eda. Filûn yek yan ûdî lê eda. Yekekî amîri şimşa-li lê eda. Yekî akardiyon lê eda. Ew amîrane hebûn leber destan û tepil keême pê elên iqa ew tî-peyman durust kerd bes mûsî-qay kurdi man lê eda. Goranî kudî man ewêt. Eme way kir yawaş yawaş mujûl may kird ta salê 1967 yek du xolû mîsîqa-man kurdewe.

Tîpi mûsîqay silêmanî lema-ne ziyyadî kird. Hendî biraderiş-man lepeymangay hunereciwa-

**Herkesek bê krud  
binasê ebê le rûwê  
ferbenghi binasê lê ruyî  
huerî ye we. Le ruyî  
edehî yewe, le ruyî  
bunermendantiyewe  
saîrantiyewe  
nuseraniyewe yekem  
car dê pirsî ewe eta na  
pirsê çend çekêt heye  
çiya lederbirhînî  
euştane. Kewate huner  
çawî milet e wekû elê  
huner simayî bînînî em  
neteweye netwanê  
birayarbidat le sek ew  
netewe ke aya  
neteweyekî bewcerxe  
peşkewtuwe  
duwakewtuwe le  
bunerekeyda etwanê  
biryar bidat.**

nekanî bexa der dûç. Hatin le gel man têkelaw bûn tîpeke ge hişte nêzîkey bist kesek. Le salî 1988 tîpekî mûsîqa le Bağda we hat. "Tîpî hunerî mîlî Re şit" kewa mûshiqay kurdi û e rebî teqdîm ekerd lew huner mandaney kelegelya hebû hunermendî nasraw xa lê xwşbû. Hesen Şiblî ke hunermendêkî mezînî Iraqî bû. ûtî hesekem ê weş besdar bin ew zor handere yekî gewre bû bo culanewey karî mûshiqay ê me. Salî 1969 le başa bo yekem car tîpî mûsîqay silêymanî dawet kira bo ahengî yadî newroz le holî xuld. Bo yekem car lewê ûtyan mîwanekî zor le dewletan dên

bebûney newrozewe ebê ahengekî çak saz bikey kak Enwer toçiman bo ekey ûtman ê me tîpekî mûsîqeman heye û nêzîkey 30 kesek man amade kird.

Ew ahengeman sazkird le wê taqhikirdiniweyekî zor serkewtûman bi encam hêna. Ew kare way lê kirdin kewa hengawî baştir binî salekî nebird beyannamey 11 hê azar belaw kirayewe. yekser nardiyan besû wên ême em careyan tîphi hunerîtir le Misir û le Bexda û Suriye û lemcigayene hemû hatin le başa hunerî xoya pêşkêşî kird. Tîpî mûsîqay silêymaniş yek

bek bû lew tîpane û erkisenekî le ser şanî ême bû. Paşan le ruwî zanistîyewe bayaxman da. Ba tîpehunerîyekeman lew asteda kewa ême bîrkeynewe huner çon pêşkêşî bikey?

Aya le safî hunerî mîlî da bimînê yaxut aheng sazî bo bikey?

Ewe bo bîr kirayewe ke ahengsazê tazey bo bikrê. Awazî taze bo hunermendekan dabin rê salî 1969 heta yesta legel ew kare berdewamî. Axir berhemîş kepêşkes man kird ya dî Helebçe û yadî enfalekan bû. Kenêzîkey 120 kes bûn. Bekoral û kors û goranî bêj

**■ È we tenya bas û nawçey silêmanî tankird. Başa kanî dîkeçî?**

Culanawey hunerî û ferhengî le şarî silêmanî zor zor ziyatir e. Leşanakanîtir Guirûhî hunerî heye. Li hewlîr. Balam renge lew aste nebe. Herçend awanîş hewl eden û karî ciwaniyan zor heye herweha le Dehok balam wa bizanim esta lebihok karî hunerî kiz buwe. Çunke zorbê hunermendekanî pirş û bilaw bûn û çûne derewe balam ême kûlman ne dawe û herberdewamî çunke bi erkî neteweyî ezanim. încâ le şarî silêmanî bê li Hewlîr bê li kirmaşan bê li sinne bê li herkuwê kurdistan bê divê hewl bide bo ewey wa hunerî kurdi bero pêş tir biria.

**■ Giriftekanî êwe lem qonaxeda ka manen? Betêbinî ew keşû hawayey keesta hakime le ser mesaîli hunerî?**

Min birwan beyekşit heye



xwa însanî durustkurduwa fikrî dawetê fikrêş çep û xirab heye. îsan ci rîgeyek bigrê bo ewey kewa xizmet bikat balam ewey kewa lêpirsrawî dewletîye çend bedem emteng û çelemaney ême we dê debê ewîş bîrkirdinewey hebê! Aya çend lêman tê ega ewe lay xoyanê rastikey bilên wekû pêwist tê maneken. Çendî piya wekî siyashi ya alimekî ya piyaekî ayînî karî xizmetguzarîye benetewekey xoy hunerîş karekî waye û hîç kêmtür niye. Belku ziyetir e. Çinke çawî milet e. Herkesek bê krud binasê ebê le rûwê ferhenghi binasê lê ruyî huerî ye we. Le ruyî edebî yewe, le ruyî huner men d a n i y e w e şâîraniyewe nuseraniyewe yekem car dê pirsî ewe eta na pirsê çend çekêt heye çiya lederbirhinî ewstane. Kewate huner çawî milet e wekû elê huner simayî bînînî em netewekey netwanê birayarbidat le sek ew netewe ke aya neteweyekî hewçerxe peşkewtuwe duwakewtuwe le hunerekeyda etwanê birtyar bidat.

Le duwayî koreweke le şarî silêanî êma ahengekî gewreman saz kird. Niwênerî UN hate ser şano roportekî pêşkêş kird ûti min nem ezanî em milate ewende zinduwe le diwayî em hemû nihatîyeke besevay hat hêsta zinduwe eweye manay eweye ke emînê.

**Ew orkestrey silêmanî kele yadî salhatî karesatî Helebçe bernamey pêşkêş kird çima eweyek temrînî kird û le layen kêwe pişti wanî kira?**

Wa bizanim teqrîben 15-20

roj bû. Hunermendanê silêmanî hunerekeya xoş dewê. Lewbirwaye dan (mubaleğe) nakem ke karêk bête pêşa we pêş dirkey bo ewey kê bête pêşewe da nîşê û besdarbê. Eger bi man wisa we hunermendanî silêmanî hemû ahatin. Belam ême komeleyek man lê hilbijartın li her tîpek çend kesek man helbijart bo ewey ke hawgeşî bê lenêwan hemû tîpe hunerîyekan da tenya xerç bo hendê dîkor bû. Egîna wekû yarmetî malî yarmetî nedira. Yanî xelkeke baxa hiştî xoy û ेrkî xoy zanî besdarbê. Huner le şarî silêmanî wa pêşkeş ekrê. Lewbiwaraneda eger ci heqê xoşiyetî yarmetî bidrê belam yarmedî ne dirawe.

**Hindê karî telewizyonîşdan kirdiwebe taybet di wayraperîn ji mareyan çende?**

Estanetuwanim bilê çende. Bela ziyatir li desut ta sêzed berhem e. Weate karekan man ewey kele duway raperîn kirdumane karekî here zore aya le astî müsîqa we le astî şexsî xo kele mala we kirdume la legel peymangay hunereciwanekan kirdume ya legel hunermendanî şareke û lederewey şareke karekî zor heye.

**Kame yanit zortir be dile?**

Karêkim heye pêşkêşim nekirdûwe, ewem zor be dil e, belam koralekanim zor be dil in. Hendî babeti sirûdî mîştîmanîsim zor be dilime, ew koraley ke kirdûme panûramayek le jiyanî kurd 35 deqîqeye, ahengeke basî jiyanî

kurd ekat le mîjûwî Şêx Seîdi Pîranheta raperîneke û diway raperînekewe. Karêkî zor gewre bû le rîy xwêndkaranî peymangayhunereciwanekane we kirdman.

**Gewretirîn giriftî lay xoman êsta ewe goraniyaniyi ke le ser watay şî'rekanî natîwanin istafadey lê bîkeyn. Babeti şî'rekan, ewaney ke mesayılfî exlaqî têdaye le hendê komelga be taybet le Êran danatiwa-**

*Min xom le seretay  
mûsîqay erebîm gwê lê  
bûwe. Radyom ekirdewe  
hemûy mûsîqay erebî  
bû... Mûsîqay erebîm  
zor lêdabû.*

*Goranîyekanî  
Umkelsum û  
Ebdulwebab û emanem  
lêda, belam ke bestim  
kird min kurd im, ebê  
goranî kurdî lêbidem.  
Başe çon goranî kurdî  
lê edey? Gwê le goranî  
folklorî egrin, le  
goranîbêje milliyekan,  
ci elen bo rûhiyeti  
goraniyekan le naw  
derûnman dirust ebê,*

*bo wêne, gwêm le  
goranî birayanî zîziye,  
gwêm le dengî Xwa  
lêxweşbû Eli Merdan e,  
gwêm le Hesen Zîrek e,  
gwêm le Seyid Esger e,  
gwêm le Mela Kerîm e.*

nîn pêşkeşî bikeyn. Ewe mi'yartan bo helbijardinî şî'r, yaxud rawboçûnî taybetî xotan lem barewe ciye?

Min ke ahengêkî taze saz e-kem eger şî'rêkî ber çawim bikewê ciwan bêewe eykem be karêkî hunerî, belam lem qonaxey êstaman da çunke şairî başman heye û tiwanayan heye. Înca şî'rîş ebê qurs bê. Manakey le bîrkirdiney xelkî êstaman da bê. Ye'nî hendê şî'r heye ke wa le mesayîlî exlaqî tecawez eka, ewane minîş îmanim pê niye û hazî lê nakem. Xizmetî mesayîlî komelgaman-naka wekû şitêke astî desnîşan-kiraw le jîyanî milletekey ême pêşan eda. Be rastî le qonaxêk da ew şitane ûtrawe manay ewe niye ême berdewam bîn le serî. Eger bizanîn pêwîst be goran e-ka eygorîn û eger neka naygorîn, ye'nî Hesen Zîrek hendê goranî heye kelimatekanî ke eylê kelîmatî zor zor narêk û napêk e, xoş niye le guwêçkey min da, çunke dab û nerîfî komelgay îslamî ye, ême be'zê şit heye nabê le sinûryan bitraziyên, le heman kat da etwanrê le ciyat ew wuşane ya ew şî'rane ya ew dêrane şîfi ciwantir dabînrê. Renge heman mana û xoştîş bê, belam be şêweyekî tir. Zor carîş le goranî folkloren kan da tûşî ebê, çunke zor lew wuşane ke le goraniye folkloren kane emîş astêk pêşan eda le jîyanî kurdewarî xoman, ewe pêwîstî be lêkolînewe û baskirdin û tûjîneweye.

■ Legel mûsîqay kurdî le êran û hunermandanî ta ci radeyek aşînan?

Têkelawîman le gel hunermandanî êran keme. Be taybetî

hunermandanî nasraw û be tiwanekan. Min ewende delêm; xuzge biman tiwaniyaye hunermandanî êran bihatnaye bo layê me, ê me bêyn bo layan. Hendê waqi' bibînin, le wewe peywendi durust bikeyn û le merr mûsîqay kurdî basî bikeyn. Çunke natiwanim le zemîney mûsîqay kurdî le Kurdistanî turkiya ya êran wekû pêwîst basî bikem, çunke tenha kasêtîm pê ekat, belam eger têkelawî hebê renge bitwanim ziyatir le mûsîqay kurdî be iştî têbigem, mûsîqay kurdî le êran wekû çon lay xoman hendê karîgerî mûsîqay erebî heye le serî, lêrêş karîgerî mûsîqay farîş heye le serî. Belam ebêème le gel gorankarî şaristaniyetîş da bigorîn, le Kurdistanî êran hendê karî ciwan hatûte ber guwêçkem, belam le rûwî ewe-ye ke wa tehlîlî bikeyn ew şarezayiyeman niye wekû pêwîst biçîne naxî mûsîqakewe, herçend ewey ke be guwêçke guwêman lê dilxoşî kere.

■ Le naw sazekanî êweke-mançê û tembûr nabînrê, hoyî ciye?

Hez ekeyn be karyan bênîn, min xom taqîkirdineweyekim kird serkewtû bû, berdewamîş hat ta êsta. Baleban û Sentûrzuor be kar ehînrê, em amîre millîyaneman kokirdewe tîpêkî ciwan dirust bû, lew biwarane hewl edeyn, belam biwarî ta-zeşman heye.

■ Esta le mûsîqay kurdî sazî Rojawayî be kar ehînrît, ci sinûrêk bo em kare heye?

Eger le rûyêkî zanistîyewe be kar bê şitêkî ciwane, belam eger le rûwî nezanînewe bê mû-

sîqay kurdî eşêwênen. Evey ême eybînin şewandine, em şitane ke be karî ehînen hendêkyanbe şewandinî ebînim, çunkebirkir-dinewey têda niye, wext birine sere û hîçî dî, le ber ewe min ew mûsîqayane be mûsîqay şewandin ezanim, belam bonî heye natiwanin ême men î bikeyn, çunke qonaxêke ebê birwa be serî.

■ Be birway êwe le dirêj ma-we çon ebê?

Manewey ewe peywîste be mûsîqa resenekanman, ewane bitwaninkarî çakman bo biken etwanin zal bin be ser biwarane da û neylêñ ewane ser derbênen û egerîş neyken be şêweyekî si-ruşti ewan zal ebin be seryanda be taybetî karî <Arşadî> rolêkî gewre ebînê, radyokan, telefizyon-ekan eger bayex biden bew core berhemane zortir belaw ebêtewê, belam eger bayexî nedrêtê le hemû dunya ew core mûsîqayane heye le mîsr heye, le ewrûpayîş heye, belam asane û hazir be deste, belam roli râgeyandin nabînê ye'nî îrşadî bayexî nadenê. Ba birwat le ahengî şayî mûsîqa lê bida, belam naylêñ le ser teyefizyon, nayhêne ser radyo, mûsîqay sunnetî xoyan û mûsîqay rêkûpêk ehênneser telefizyon uradyo bilawî ekenewe.

■ Mûsîqay kurdekanî kur-mancî jorû le gel kurdeka-nî kurmancî xwarû ferqêkyan heye, le kur-mancî serû goranî hemîse pirre le hemase?

Ewe egerêtewê bo dabûnerîti ew komeleyke têda ejî, jîyanî kurdewarî le hendê cêga tirûskawî têda derkewtûwe û kuja-wetewê, jîyanî kurdî jorûman,

berdewam le jêrdest da bûn, e-bînê wekû heyran basî mêtûwî xoyan ekat ke wa çon zûlimyan lê kirawe û çon berhelestyan kirdûwe û çon azayetî têda enwênê. Lay xoman tozêk dab û nerîti komelayetî kirawetre, basî corawcor eka, Ye'nî tebî'etî komelgakan tehdîdî ew şite eka, le dab û nerîti komelayetî hendê şit heye asayîye û le hendê komelegawele hendê komelgay asayî niye, ewîş e-gerêtewe bo mêtûwî ew komele. Belam be pêy naçekan her

Ew şitane minîş le bîrime. Le minalî heta le Helebce û le Silêmanî salekanî zû hebû, belam êsta nemawe, min dâykim Xweda efû bika, salî 1984 umrî xway kird be def birdyan bo ser qebran, ewe axir şit bûke dîm, çunke le salî pencakan da bîrime ke bawkîsim umrî xway kird le şarî Helebce her be def birdyan bo ser qebran, ew du şitem le bîre, belam le Şarezûr da <Kotel> hebû, be def eyan bird le nawçey Hewreman da heman şit hebû, belam ûrde ûr-

kurdî bikeyn biwarî zor e, sere-tay mûsîqay kurdî le mizgewt da le bone ayîniyekan da destî pê kirdûwe. yekêk ehat quranî exwênd.

Be dengewe eyût, selay ekird be dengewe eyût. Sitayışî ayînî ekird be dengewe eyût, em denge xoşane ke le melawî icazey weregirit. Mêzeyan ekirde seri-yewe, diwanze ilmî tewaw e-kird, gewretirîn ahengyan bo e-kird, baştîrîn dengxoşyan bo ko ekirdeye.

Şitî dengxoş seydirust ebû şimşalyan be kar ebird, defyan lê eda, hore xoy ser çawey bi-warî ayînî ye, înca le biwarî ayînî da ke zemawend ekra hef-teyek dehol û zurna lê edra, emane ekra, Ye'nî biwarî zorî têdaye le katêka kirêkarêk ya-xud werzêrêk eşûwe ser karekey işî ekird goranî dirwêney ewüt, dayik ke le malewe daenîşit laye laye bo minalekey e-kird, emane hemû goranî ye, em hemû biwarî goranî ye eger ciyayan bikeynewe. Le naw hemû milletan daem şitane heye.

### ■ Esta çend grûhî hunerî le Silêmanî da xerîkî çalak in?

Grûhî hunerî zore. Tipî mûsîqay Silêmanî heye, le salî 1964 dirust bûwe, Tipî mûsîqay Mewlewî tazeman heye le heftakanewe dirust bûwe, Tipî mûsîqay komelî hunereciwanekan heye, ewîş le salî heftakanewê dirust bûwe, tipî mûsîqay folklorî kurdîman heye, ewîş lem yek du saley diwayî da dirust bûwe.

Peymangay hunereciwanekan le salî 1980 dirust bûwe, besî mûsîqay têdaye ke wa mûsîqa be dirasey ekadîmî dexwêni.

**Le bendî biwar da ebînim serkewtûwe, belam le bendî biwarîtir da renge wek pêwîst neyête ber çaw, belam eger kelk wergirtin bo xizmetî kareke bê, be giştî ciwantir e, wate karî mûsîqa eger dubare bikritewe ciwantir e, wekû xoş le xoya karêkî tazeye, Mûdirne, yanî şêwazêke lew şêwazane ke wa emro zor le lawekanman, abengsaz e tazekanman lew biwarane da iş eken, ême zor car bewl edeyn şitî taze dirust bikeyn, belam kelk le kelepor werbigrîn û nabê destkarî bikri, ebê wekû xobî bê, yanî ême etwanîn le ser goranîyekî folklorî kurdî semfoniyek dirust bikeyn, ême wa nezanîn goranî kurdî ber debol û zurna ye û baleban e yaxud etwanî bew ştane orkestrekî gewre kareki huneri ciwan pêşkêş bika.**

yen ixtîlaf û ciyawazî heye, nawçey Silêmanî le gel Hewlîr, Hewlîr le gel Sine, Sine û...

■ Le zor şiwêni Kurdistanî êran da eger kesêk be rehmetî Xwa biçwaye ya genc biçwaye ya le xurbet da bimirdaye ya kesêk hêsta zemawendî nekirdibê û bimrê û... Ewe be defe e-kewtine berî ta şiwênek ke defnî biken, ser çawey eme le çî da ebînin û çon bîrî lê ekenewe?

de şaristaniyet way kird hendê şit şarayewe, gum bû.

■ Katî xoy her wext şêxe gew-rekan eşûn bo xaneqa derwêş be defewe eşûne pêşwaziyan şimaney heye le ayinde yewaş yewaş ewîş bew derde biçê?

Lay êmeş heye, êstaş derwêş heye le naw mizgewtî gewre da enîşin, le diway niwêjî heynî dest eken be def lêdan û zîkr kirdin, ême eger basî mûsîqay

# NIRXANDINA EDEBIYATÊ

## LOKMAN POLAT

**B**eriya 1980î berhemên edebî yên kurdî kêm bûn. Nivîsên li ser edebiyata kurdî pirr kêm -car carna- dihatin weşandinê. Lê piştî 1980'yi û bi taybetî jî di salên nabeyna 1985 û 1995an de gelek berhemên edebî -li welêt û li derveyê welêt- hatin afirandin, bi sedan nivîsên li ser edebiyatê û bi taybetî jî edebiyata kurdî hatin weşandin.

Z i m a n ,  
çand û ede-

biyata neteweyek hebûna wê neteweyî ye. Neteweyek ku zimanê xwe, çanda xwe, edebiyata xwe wenda bike, ew bi xwe jî wenda dibe, di nav neteweyê din de dihele, asîmîle dibe. Yênu neteweyan li ser lin- gan dihêle  
 z i m a n ,  
 çand û e-  
 debiyata  
 wî ne-  
 tewe-  
 y î



ye.

Edebiyata kurdî a bi devkî gelek xurt e, dewlemend e. Edebiyata nivîskî qelse, lê di van salên dawîn de, edebiyata nivîskî jî ber bi pêş dikeve, pêşve diçe, dewlemend dibe.

Edebiyat di jiyana gel û netewyan de bûyerên ku li ser jiyana civakî bandora xwe dike, bi hawayekî hîzn, hest û bi sîmgeyan, bi taswîran, bi gotinan yan jî bi nivîskî tête pêşkêskirin. Di edebiyatê de ziman bingeh e; ziman nebe edebiyat nabe. Lî, dewlemdiya zimên jî bi têkiliyên bi edebiyatê ve girêdayî ye. Bi bi karâniña zimanê edebî, ew ziman hîn pêş dikeve, bi goşt û xwîn dibe, bi ruh û can dibe, jîndar dibe. Pêş ve diçe.

Yênu ku di berhemên edebî de ziman bi hostatî bi kar tîne û bi zimanekî dewlemend bûyeran li hev dihone, nivîskarê/a berhemên edebî bi xwe ye. Nivîskarêna berhemên edebî di her demî de, bi kultur û zanyariya xwe zanayêna dema xwe ne.

Di hemû berhemên edebî de tezek heye, mesajek heye. Kî dikare bibêje ku berhema nemir ya netewa Kurd, Mem û

Zîn bê mesaj e, bê tez e.

Çalakiyên edebî bi afirandina berhemên edebî xwe dide xuyakirin. Di her demî de yên ku bi hêzên tarî re şer dîkin, têdikoşin rewşenbîr û hunermendêne pêşverû ne. Di vê têkoşînê de, di gelek welatande bi sedan nivîskar û rewşenbîr dikevin zîndanan, hinekên wan jî têne kuştinê. Berhem û jiyana wan nivîskaran ji neslên dahatû re, ji pêşerojê re dibe mînak.

Di nirxandina edebiyatê de tiştê herî bi xeter sektarîzm e. Sektarîzm şîweyekî nihilîzmeye. Hemû tiştên berê încar dike û dixwaze dîtinên xwe bi zorê bide qebûlkirin. Rasteqînî bi încarê dernakeve holê. Rasteqînî bi yekîtiya nakokian tê fêmkirin.

Doxmatîzm li pêşberê pêşveçûna edebiyatê asteng e. Di doxmatîzmê de guhartîn û xwenûhkîrin tûne ye. Kesên doxmatîk di nav lêgerînê de nînin.

Di edebiyatê de ala herî ber bi pêş realîzma modern e. Realîzma nûjen yek alî nîne, paşîf nîne, aktîf e, bi tesîre, fêr dike. Realîzma nûjen xwe ji doxmatîzmê û demagojiyê di-

parêze. Realîzma nûjen, başiyê, rindiyê, bedewiyê derdiye pêş. Ew her tim hêviyê dijîne. Di edebiyatê de realîzma, bûyerê, mewziyê, wakîyê wek xwe, di nav herikandina bûyerê de dayîn e.

Hinek berhemên edebî hene, ku ji bo mirovîn di dema xwe de hatine nivîsandin. Lî, ev berhemên nemir him ji bo wê demê, him ji bo dema me û him jî ji bo dema pêşerojê ji berhemên edebî ne. Mem û Zîn, Don Kişot, Şer û Aşîtî û hwd, berhemên weha ne.

Edebiyat; ji helbestê hetanî çîrokê, ji destan û menqîbeyên oli hetanî romanê têt avakirin. Ev hemû şaxêna edebiyatê bi hevdu ve girêdayîne û bingeha wan li ser hunera çîrokkîrin - hîkayekîrin - ava dibe. Helbest jî, roman jî, Şano-tiyatro jî, senaryo jî, hîkayetkîrin e - çîrokkîrin e. Ji xwe hunera edebî, qalkîrin e, hîkayekîrin e. Cudahîbuyîna wan di teknika hîkayekîrin de ye. Edebiyat bîriqandina -yansitma- jiyana jîndaran e. Di edebiyatê de tip û qarekter cîhekî girîng digire.

Di nav şaxêna edebiyatê de ya herî kevn helbest e. Helbest wek nesîr dûz nîne. Bi pîvan e, bi wezn e. Helbest bûne kilam û stran, bi muzîkê hatine xwendin û gotin.

Roman hêj nûh e. Sê asir berê hatiye avakirin. Di esra 18 û 19an de gîhiştiye kemala xwe. Roman hêj jî ber bi pêş ve diçe, bi teknîkên nûh dike-mile. Di roman de têkiliyên mirovan -însanan- yêna bi hevdu re û bi xwezayiyê re bi hawakî berfireh û bi teferuat têt qalkîrin, bi hunerî tê hîkayekîrin. Di nav van têkiliyân de;

*Di roman de têkiliyên mirovan -însanan- yêna bi hevdu re û bi xwezayiyê re bi hawakî berfireh û bi teferuat têt qalkîrin, bi hunerî tê hîkayekîrin. Di nav van têkiliyân de; ji pîrsên rubî betanî rewşa aborî û gelek munasebeten din bene. Di hîkayekîrina evîndariya du ciwanan de munasebeta civakî ya wê deverê, wê beremê heye. Roman vekîrin û derketina bolê ya munasebeta civakî ye. Roman keşîfekî nûb e, îcatekî nû ye. Teknika avakîrina wê tim tê guberandin, tê nûbkîrin.*

pirsên ruhî hetanî rewşa aborî û gelek munasebetê din hene. Di hîkayekirina evîndariya du ciwanan de munasebeta civakî ya wê deverê, wê heremê heye. Roman vekirin û derketina holê ya munasebeta civakî ye. Roman keşfekî nûh e, ictatekî nû ye. Teknîka avakirina wê tim tê guherandin, tê nûhkîrin. Firqa di navbera roman û çîrokê de nîçel nîn e, nîtel e, wesf e. Herçiqas hinek kurte-roman jî hebin, lê di esasê xwe de roman dirêj e. Di çîrokê de bûyerek an jî hinek bûyer he- ne, lê di romanê de gelek pirr

bûyer hene û ev hemû bûyer dikevin nav hev û li hevdû têne honandinê. Çerçeweya çîrokê bi sînor e, teng e, lê ya romanê fireh e, bûyer di gelek cihan de derbas dibe. Di çîrokê de şexs hindik in, di romanê de şexs pirr in. Di çîrokê de aliyekî şexsan tê danasîn, di romanê de şexs bi piralî têne danasîn, taybetiyen wî yên pirr alî tê xuyakirin. Li gel van hemû ferqan jî, di esasê xwe de roman şêweyekî dirêjahiya çîrokê ye. Bûyerên ku di romanê de tête qalkirin li ser çîrokê ava dibe. Roman, tiştên ku bûne, yan dê bibe, yan jî mûmkûne ku dê bibin qal di- ke.

Taybetiyeke roman û çîrokê ev e ku; bi meraq tê xwendin. Meraqa girîng jî, gelo dê da- wiya wê çawan bîbe ye? Di edebiyatê de meraq cîhekî pirr girîng digire. Yê ku çîrokê di- de xwendin meraq e. Çîrokê devkî jî ji ber meraqê têt guh- darîkirin, çîrokê nivîskî jî ji ber meraqê tê xwendin. Çîrokê “Hezar û Yek Şev” ji ber meraqê hatiye guhdarîkirin.

Di çîroknivîsê de bi karanîna metoda meraqê herî baş ji alî nivîskarê Amerîkî Jak London ve hatiye bikaranîn. Destpêka çîrokê Jak London li ser meraqê hatine avakirin. Xwendevan ji bo ku di seriya- destpêka- çîrokê de meraqa bûyerê dike -û gelo dê dawî çawan be?-, loma jî hetanî da- wî wê çîrokê dixwîne.

Wek mînak: Çîroka Jak London a bi navê “Yê Meksîkî” de di serî de meraqeq gi- rîng heye. Xortekî 18 salî-Rî- vera- diçe dikeve nav rêxistin- ekî şoreşger. Di wê rêxistinê

de tu kes Rîvera nas nake, ke- sek bi derbasbûyina jiyana wî nizane. Wexta ku pere -diraf- ji rêxistinê re pêwîst-lazim- dibe, ev xort-Rîvera- pere tîne dide rêxistinê. Berpirsiyarêñ rêxistinê ji vê xortî şûphe di- kin, dibêjin qey ev xort ajanê dewletê ye û hatiye ketiye nav wan.

Xwendevan jî gava vê çîrokê dixwînê di serî de meraq dike; gelo derbasbûyîna vê xortî çawan bûye? Ev xort çîma ewqas bi rêxistinê re alîka- rî dike? Gelo ev xort van pere- yan ji ko tîne? Ev xort bi rastî jî ajan e, yan na?

Di bûyerên çîrokê de metod ev e; xwendevan di seriya bû- yera çîrokê de meraq dike, paşê jî ew meraq di nav pêva- joya bûyera çîrokê de têt piş- kavtin û ew meraqa xwendevan bi rohnîkirina çîrokê têt fêmkirin û wê gavê xwendevan gava sedema meraqê fêm dike, dibêje ahan... dêmeg ev bû.

Di çîroka “Yê Meksîkî” de jî xwendevan pêşî meraq dike ku ev xortê aligirê şoreşgeran wê pereyî ji ko tîne, paşê fêm dike ku, ew xort diçe maça boksoriyê dike û pereyê ku ji wê qezenç dike, tîne dide rêxistinê.

Di edebiyatê de rexne, ba- betekî girîng e. Ez bawerim li ser rexnegiriya edebî herî pirr nivîs di kovara Helwestê de hatiye weşandin. Edebiyat bi rexneyêñ edebî pêşve diçe.

Di analîza berhemek edebî de, di hûr lénérîna berhemê de, divê mirov ji ko dest pê bi- ke? Ji hunermendê berhemê, yan ji berhemê ve? Yan jî, ji şert û şûtêñ dîrokî û civakî ya

**Di kurteçîrokê de merheleya jîyanê û bonandina bûyerê bi zanebûnî, bi kurtî, lê bi gotinêñ girîng ku cibê xwe digire ji alî nivîser ve têt qalkirin. Nivîserê kurteçîrokê bûyerek digre destê xwe û di çend rûpelan de - bêyî ku qet mane û naveroka bûyerê xirab nebe- dide qalkirin. Kurteçîrokek rastî bi xwe nebe jî, nirxandin û şîrovekirina wê ji rastiyê ye. Di kurteçîrokê de bingeba estetikîyê -rîndiyê, bedewiyê- rîtma gotinan e, bevokan e, kelîman e. Çîrok bi kelîme, gotin û bevokan ava dibe.**

wê derdorê ve?

Divê mirov bizanibe, huner-mend-nivîskar- jî wek her mirovî, mirov e-însan e. Ji bo vê jî mirov berhema edebî li gor şexs û qarekterên nivîskarî divê nenirxîne. Divê rexnegir çêker be, xirabker nebe.

Kovara Helwestê, dê bi ber-firehî cih bide nivîsên li ser pirs û pirsgirêkên edebî, ni-vîsên rexnegiriya edebî û ni-vîsên fêrbûna teoriya edebiyatê. Wek ku me di hejmara sêyem de jî gotibû; kovara Helwest ji bo pêşveçûna çand û edebiyata kurdî pêngavek e, divê ev pêngav bê xurtkirin.

### KURTEÇİROK

Li gor hostayên kurteçirok-nivîsê Mapusant û Çexov, Kurteçirok, kurtedemên jiyanê ye. Dîmenek ji kurtedemên jiyanê yên ku têñ û diçin e. Re-alîzma nûh jî girîngiyê dide kurteçirokên ku li ser bûyerên rasteqîn yên rojane hatine avakirin.

Ez wexta kû piçûk bûm, ba-pîra min, ji min re gelek xebroşk -çîrçîrok, çîrvanok- digot e. Gelek ji wan çîrçîrokan di nav pirtûkên M. Emîn Bozarslan de hene. Xebroşk anku çîrçîrokên ku bapîra min ji min re digot hemû jî li ser heywanan bû. Wek mînak; Kêzzatûn, Gur û heft karik, Roviye fîlbaş û yd. Di van xebroşkan de, heywanan -wek insan-an bi hevûdu re xeber didan. Dinya-yek wan yên taybetî hebû. Bûyer di wê dinya-yâ wan de derbas dibû. Hinek xebroşk gelek balkêş bûn, mesela "Bivir û Dar" xebroşkek ku mirov dikare di jiyanâ civatan de wek

nimûne bigire. Hinek xebroşkên mîrxasiyê hebûn, geleken wan yên lehengiyê(qehremaniyê) bûn, ku mirov hemû bizanibe her yek bi serê xwe dibe novelek an jî romanelek temam.

Xebroşk û çîrokên ku bapîra min ji min re digot, yên gelêrî bûn, çîrokên klasîk bûn. Ew edebiyata kurdî ya devkî bû. Niha ez baş fêm dikim ku


edebiyata kurdî ya devkî çiqas dewlemend e.

Di Kurdistanê de tradisyonâ edebiyata kurdî ya gelêrî, bi devkî hêj jî dom dike. Lê, di ev bîst-sîh salêñ dawîn de gelek nivîskarêñ kurd bi nivîskî û bi kurdî xebroşk û çîrokên kurdî dinivîsînin. Ev gelek ka-rekî hêja ye ku xebroşk û çîrokên gelêrî bête berhevkirin, bê nivîsîn û bê weşandinê.

## MELA KULÎ



**M. EMÎN BOZARSLAN**



Helîm Yûsiv  
**MIRÎ RANAZIN**

*Ziman ji sîmgeyan pêk tê. Bi saya sîmgeyan mirov dikare zimên ji bo navberiyê pêk bînê. Bi riya sîmgeyan ziman mane digire. Hebûna fonksiyona sîmgan di nav sîstemê de bi tekiliya hebûnan ve beylû dibe. Ji bo vê jî; berbemên edebî di nav xwe de organîkekê temam in.*

Di hêla berhevkirina xerboşk, çîrok û destanê gelêrî yên kurdî de birêz M. Emîn Bozarslan û Z. Abîdîn Zinar karê gelek hêja kirine û dikin. Ew xebroşk û çîrokên gelêrî berhevdikin, ji nûh ve dinivisînin, ruh û can, şekl û şemal didin xebroşk û çîrokê û wê ji nûh ve diwejînin, jîndar dikin.

Min wek ku li jor jî gote, min di piçûkatiya xwe de gelekk guhdariya xebroşk û çîrokên ku bapîra min ji min re gote, kiribû. Lê, min wexta ku dest bi nivisînê kir, min qet ew xerboşk û çîrokan nenivîsand, lewre M. Emîn Bozarslan ji xwe gelekên wan nivisîbû û

weşandibû. Kurteçîrokênu min nivîsiye, li ser heywanan nîn e. Hemû jî li ser însanan in û çîrokê civakî, netewayî ne. Hinek ji wan serpêhatî ne, gelekên wan ji ber bûyerên rasteqîn hatine honandin. Wek stîla edebî jî min her tim ekola rasîya civakî paraste.

Kurteçîrok şaxekî edebiyatê ye, şîweyekî edebî ye. Li ser hîmîn jiyanê têt avakirin. Bingeha wê zanebûn e. Di kurteçîrokê de merheleya jiyanê û honandina bûyerê bi zanebûnî, bi kurtî, lê bi gotinê girîng ku cihê xwe digire ji alî nivîser ve têt qalkirin. Nivîserê kurteçîrokê bûyerek digre destê xwe û di çend rûpelan de - bêyî ku qet mane û naveroka bûyerê xirab nebe- dide qalkirin. Kurteçîrok rastî bi xwe nebe jî, nirxandin û şîrovekirina wê ji rastiyê ye. Di kurteçîrokê de bingeha estetikîyê -rîndiyê, bedewiyê- rîmta gotinan e, hevokan e, kelîman e. Çîrok bi kelime, gotin û hevokan ava dibe. Çîrok organîzmeke ku ji hevokan pêk tê. Ew bi hevokê dijî, bi hevokê mezin dibe û bi hevokê dimire. Deriyê cîhana çîrokê bi hevokê vedibe. Her hevok deriyek digire û deriyekî nûh vedike. Çîrok bi vê te-wîrî dest pê dike, berfireh di-be, dînyayek bi serê xwe ava dike, em di wê dînyayê de dijîn û di hevoka dawîn de jî em ji wê dînyayê -ji dînyaya çîrokê- vediqefîn. Cawan ku bi saya hevoka pêşin em dikevin nava dînyaya çîrokê, bi saya hevoka dawîn jî em ji nav wê cîhanê-dînyayê- derdikevin.

Hewisandin anku fêrbûna xwendina çîrokê bi pêwistiya

fêrbûna hevokê ve girêdayiye. Di çirokek baş de, tiştê baş û xweş bi tenê naveroka bûyerê nîn e. Detayekî basit, navek, sîfatek, an jî gotinek bi mirov xweşiyek e, bo mirov başiyek e.

Ziman ji sîmgeyan pêk tê. Bi saya sîmgeyan mirov dikare zimen ji bo navberiyê pêk bînê. Bi riya sîmgeyan ziman mane digire. Hebûna fonksiyona sîmgan di nav sîstemê de bi têkiliya hebûnan ve beylû dibe. Ji bo vê jî; berhemên edebî di nav xwe de organîkekê temam in. Taybetiya wê jî bi vê ve girêdayiye. Ahenga di nav berhemê de mukemeliya wê nîşan dide.

Di kurteçîrokê de qarekter nav e, honandina bûyerê jî fîl e. Mirov wexta ku vê baş bîzâne, hunera gotin û nivîsîna kurteçîrokê jî dizane. Çirok pradîgma ye. Bi fikirandina mekanîk pirrtir bi hest û zanebûnê, bi taybetiya hevokan divê çirok bê fêmkirin. Çirok bi riya îdarekirina hevokan dikare mirov bibe nav merhaleylek jiyana rasteqînî jî û dikare bibe nav rewşekî qastî jî. Di çirokê de her hevok maneya hevoka berê, ya çûyî temam dike û hevok bi heve girêdayîne. Li hevûdu girêdana çirokê maneya çirokê dihonîne. Mirov bi bêjeyê dikeve nav cîhana-dinya- çirokê. Ev bêjeyen ewil ji bo cîhana çirokê agahî dide.

“Di pêsiya min de, bi ber a-liyê jêr ve gelek kuçe-sûk- he-ne. Di rojekê ne germ de, di bin rojê de li dirêjahiya wan dinêrim.”

Di vê hevokê de yênu ku qala-behsa- sûkê dike-kî ye? Ji

bo ku nivîskar izin-îcaze- nedaye, xwe eşkera nake. Ev mirov liko sekiniye û li sûkê mîze dike? Û gelek pirsên din. Li ser vê hevokê gelek pirs û şîrovekirin dikare bê kirin. Livir a muhîm destpêka pêvajoya mêzekirina-temaşekirina- li sûkê ye.

Di kurteçîrokan de rîzdariya gotinan gîran in û bi maneyâ xwe jî sift in. Nivîskar li gor qaîdeyê rîzmanî wan di çerçeweyek de rîz dike. Bi rîzdariyek weha di kurteçîrokê de rastî û mekanîkî bi hev ve têr girêdan. Di her çirokî de ev herdu dîmen hene. Lî ji van herdu dîmenan yan ew, yan ew bi ser dikeve. Rîtma, ahenga kurteçîrokê bi gîranî, siftî, rastî û bi mekan pêk tê. Van tiştana -yanî ev rîtm- tesîra xwe li ser xwendevanan jî dike.

Çirokek çawan dest pê dike û çawan diqede -dawî dibe-, bi pişkavtina hevokan tête zanînê. Bêje, kelîme, gotin, sîmgeya dîtinan in. Rîzdariya gotinan dîtina mirovan tîne zimên. Di kurteçîrokê de di demekî ku ji tûnebûnê çêbûye de, di mekanek ku bi hawayek edebî hatiye avakirin de, mirov ji dîmenek bi jiyana xwe ve di ber çavê mirov de derbas dibin û diçin.

Di kurteçîrokê de bi hev ve girêdana imgeyan - xeyalan-zor û zehmet e. Di kurteçîrokê de taswîr kirin tûne ye, avahîkirin heye. Di kurteçîrokê de hevok organîzma ye. Hevok wek organîzmayek bi rih û can tevdigere. Çirokek radan nîşan dide, hareket dike. Lî ev aliye-kî wê ye. Hinek çirok li pey xwe ronahî dihelin. Di hinek

çirokan de mekan beylû nîn e. Lî di hinekan de jî mekanên cografik pêşberê xwendevanan têt kîrin.

Kurteçîrok, xwendevan ji dema ku ew tê de ye digre di-be dixe nav dema xwe, dixe nav dema ku di çirokê de hatiye afirandinê. Di vê dema hafti afirandin de merhaleyek ji rasitiya jiyanê pêk tê. Kurteçîrokê wek ku ji toxim gulek çê bibe û mezin bibe ye. Lewra wexta ku kurteçîrokeq diqede, wek destpêkê nîn e. Wek hebûna însan e; çedibe, mezin dibe, pêşve diçê, dikemile. Însan -mirov- hêza xwe ji xweyî kirinê distîne, kurteçîrok jî hêza xwe ji hevokan dis-tîne û li gor avahiya zimên pêk tê û dibe morfolojiyek para-digmatîk.

Li gor min, çirok qalkirina rewşa însanan - mirovan- û dî-menek ji jiyanê ye. Çirok bîr-qandina jiyanê ye. Çirok lînêrîna li jiyanê ye. Çirok avahiyekî estetik e. Çirok di pêvajoya jiyanê de cihê gihîstina hevûdu ya rastî û xeyalê ye. Çirok bi sadetiya xwe, bi ziman û kurguya xwe şêweyek taybetî ya edebiyatê ye. Çirok ji mirovek, ji jiyanek, ji rewşek dikare pêk bê. Çirok hune-ra qalkirinê ye. Ev huner berê bi devkî pêk dihat in, paşê bi nivîskî pêk hat. Nivîsandin bi serê xwe belgeyek e ji bo mirovahiyê. Çirok jî belgeya ji-yandina jiyanê ye. Çirok tîr bûn e, sift bûn e. Mirov bi ramân û hesteyen xwe bangî girseyan (kîtle -xelk) dike. Çirok serpêhatiyênu ku di jiyanê de têne serê mirovan e. Werhasil, bi kurtahî; çirok şaxekî edebiyatê ye û gelek girîng e.



Pêwîst e di  
xewn û xeyalên  
hunermend da  
afirandêri hebe



M uhammad Salayî sala 1962an li bajarê Ker-kûkê ji dayîk dibe. Sala 1987an li bajarê Hewlêrê Fa-kulta Kişt û Kal a Zankoyî Selahaddîn diqedîne. Berpirsiya-riya hunerê ya wezareta çandê ya Başûr kiriye. Endamê Yekitiya Nivîskarên Kurd û Desteyî Balayî Komelayî Hunermendanî Kurdistan e. Ji hemî kovar û rojnamên kurd ên li Başûr der-dikevin ra nivîsan dinivîse. Heta niha, li Îraq û gelek we-latêن biyanî pêşangeh vekirine. Ïtalya, Almanya û Kanada ji wan welatan çend heb in.

■ **ZEND** We fakulta kişt û kal qedandiye. Lê hûn wêne çêdikin. Ji bo çi wêne û we kînga dest bi wênekêşiyê kir?

Ji piçûkatiya xwe da min ji wênekêşiyê hez dikir. Ez li quatabxanê (medrese) gelek zîrek bûm. Tu carî ji ber xwendin û nivîsandinê mamostan li min nedan. Lê ji ber ku min li ser rûpelên defterê hemî dersan wêne çêdikirin, mamostan li min dixistin. Digotin “çimia tu defterê xwe pîs diki” Ji wan rojan vir da ez hemî tiştên ku li ser min bandorekê dikin, dikim resim. Yênu ku ez nikanim bikim resim jî, karikaturên wan çêdikim. Min pêşangehên xwe yên yekem jî li qutabxanê vekirin.

### ■ ZEND Ji xeynî resmê hunerên din ên ku hûn pê ra têkildar in, hene?

Ez tablo, karîkatûr û resmên ji bo zarakan çêdikim. Li Başûr me ji bi zarakan kovareke bi navê Heng derdixist. Ez çîrokên zarakan dinivîsim û resmên wan çêdikim. Sala 1990î li Bexdayê ez beşdarî Festîwala Karîkatûran bûm. Di nav hemî hunermendên Iraqî yên ku beşdar bûbûn da min xelata diwem wergirt.

Di sala 1993an da min filmekî kartonî yê bi navê Kurdo çêkir. Ev film ji alî UNESCOyê ve jî hat ecibandin û ket bernama wan.

### ■ ZEND Hûn kanin ramanê xwe yên di derbarê rewşa hunerî ya wêneya kurd da bînin zimên?

Mixabin ez bi giştî rewşa wêneya kurd a li Başûrê Rojava û Bakur baş nizanim. Belam ji Rojhilat û Başûrê Mezin agahdar im. Bi taybetî li Başûr hunera wênekêşan zor pês ve cû-

ye. Li wir gelek hunermendên mezin ên Kurdistanî û Iraqî he. Hunera wênekêşan ji pêşveçûna rewşa politîka kurd ra xizmetek giranbiha kiriye. Bi kurtahi ez kanim bibêjim ku deng-vedaneke hunera kurd a li cîhanê jî heye. Hunermendên kurd li derveyî welêt jî gelek pêşangeh vekirin.

### ■ ZEND Gelek rîbazên hunerî hene, hûn hunera xwe di çarçova kîjan rîbâzî da dibînin?

Belê zor rîbaz hene. Bes, ez bi xwe ji çand û dîroka xwe sûd werdigirim. Dîroka xwe di gel rîbazên cîhanî bi taybetî bi rîbaza realizma nû ve girê dim. Ji vê tiştekî nû derdikeye. Bi vê rîbazê ez dixwazim hem bîna kurd, hem jî giyanek cîhanî bi resma xwe derxînim holê. Bi rastî, ez ji hunera abstract hez nakim. Cûnkî ew nikane ji rewşa politîk û cîhana kurdan ra xizmet bike.

### ■ ZEND Li gor we têkiliya huner û mirov ci ye?

Bê guman têkiliya hunerê ya digel mirov tiştekî girêdayî ye. Em li mirovên kevn dînihêrin, li dîwarêne şikeftan wêne çêkiri- ne. Ew wêne jiyan û bîna wan tînin zimên. Ez bi vê bîrkirdi-neweyê karê xwe dikim. Hunermend bê gelê xwe ne tiştek e, nikane tu tiştekî bike.

### ■ ZEND Her hunerek li ser jiyanâ civakiya gel xwedî bandorekê ye. Hûn kanin ji me ra bandora wênekêşiyê ya li ser çînê civakî bînin zimên?

Huner her dem li gel şorişvanan bûye. çawa ku pêşmergeke têkoşeriya xwe ya ji bo şoreşê li çiyan dikir, hunermendan jî li bajaran bi hunera xwe ev kar dikirin. Rastgoyî divê hunermend rastiyen bîne zimên, derewan meke. Ew hunera ku alîgiriya zahmetkêşan neke, hunerek rastgo nîne. Min naxoşiyêni bi serê welatê min da hatine di resma xwe da anîne zimên. Di resma min da rûxandin û şewitandinê gundêne me,



qirkirina li Helepçê, enfal û êşen bi ser serê gelê me yê li her çar parçen welatê me da hâtine bi zimanê wêneyî xwe di-din der.

**■ ZEND Li gor we pîvanê hunerî di resmê de çi ne? Li gor van pîvanan hûn kanin di derbarê resma kurdî da dîtinê xwe ji me ra bî-nin zimê?**

Pêwîst e di xewn û xeyalên hunermend da afirandin hebe. Her kes ê ku resim çêbike nabe hunermend. Di hunerê da teqlid tune ye. Her kes nabe afirandêr. Mirovê ku dixwaze bi-be afirandêr, pêwîst e rewşen-

bîriya xwe mezin bike.

**■ ZEND Bi dîtina we afi-randêri çi ye?**

Ez dibêjim hunermendê afirandêr gereke gelekî zîrek be; jiyan û rewşa gelê xwe baş nas bike, di derbarê hemî rîbazên hunerî yên cîhanê da şareza be. Rexnegîrê mezin ê Rûs Bel-lînskî di derbarê afirandêriya hunerî da dibêje ku; "Afirandîna berhemêke hunerî weke meleke (teyrekî) dubalayî ye, balékî ji wan cîhanî, balê din netewî ye. Hîç hunermendek nîne ku ji wan balan bi yekî tenê kâ-nibe bifirre.

**■ ZEND Têkiliya di navbera**

wênekêşî û hunerên din çi ye? Di derbarê vê da hûn kanin ji me ra çi bibêjin?

Bê guman hemî hunerên ciwan wekî zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Mirov kane di şanoyê da hemî hunerên din bibîne; muzîk, makyaj, dekor, muzîk û muzîka wênekêşan di rengê harmonik da heye.

Gelek şairan, çawa ku Apollinaire ji tabloya ressam ê bi nav û deng a Leonardo de Vinci ya bi navê Mona Lisa peyam girtiye û li ser wê helbest nivîsîne, ji tabloyen resaman peyam girtine. Victor Hugo peyama nivîsandina romana xwe ya bi navê Bênewaya (Les Misérables) ji tabloya Dela croix girtiye. Min jî li ser vê tabloyê nivîsek nivîsand. Di vê tabloyê da jinika ciwan serbestî û azadiyê hîma dike.

Di sala 1921î da dema ku tabloya Mona Lisa hat dizîn, polisê fransiz Apollinaire ê şair girtin û jê ra gotin ku te gelek helbest li ser nivîsîne, te ew di-zîye. Ev mînak jî têkiliya di navbera hunerên ciwan da dide nîşan.

**■ ZEND Ji xwendevanê me ra mesajek we heye?**

Ez dixwazim kurd li zimanê xwe yê dayîkza (maderî) xwedî derkevin. Dîroka xwe baş nas bikin. Çunkî her netewek bi sê tiştan dibe netewe. Ev sê tişt ji ziman, ax û dîrokê pêk têن.

**■ ZEND Em ji we ra zor spas dikin.**

Ez jî, ji we ra spas dikim. Hêvidar im ku hunera kurd di nav kurdêñ bakurî da jî pêş da biçe.



# DI KURMANCÎ DE GUHERÎNA DENGAN

## ZANA FARQİNİ

**E**m pêşî sînor û tixûbên çarçoveya xebata xwe diyar bikin. Armanc, di zavayê kurmancî de zelal-kirina guherîna dengan e. Gelek zimanzan, devokên kurmancî dîkin sê bes: Botî, silîvî û mehmîdî. Lî ev jî heye ku, ji bilî her sê devokên mezin, devokên din jî di kurmancî de hene. Em dikarin van devokan jî, bi navê devokên herêmî binavînin.

Di zimanê hemû gelên dînayê de rewşeye wiha heye. Zimanek hem xwediyê zaravayan e û hem jî xwediyê devokan e. Lî belê gelên ku yekîtiya neteweyî pêk anîne, di warê zimên de gelsên xwe safî kirine. Ligel vê yekê dîsa cihîtiya di navbera zimanê devkî û nivîskî de, ji navê ranebûye.

Lî belê rewşa zimanê me ji yên wan gelek cudatir e. Parçebûna wêlêt û gelê me li aliyeke, hîna em kurd ne xwediyê alfabe û zimanekî pişkar (muşterek) in. Her çiqas 60 sal berê kurdên bakur û başûrê rojavayê welêt, bi tip û kîpêñ latîni dest bi nivisîna kurdî kiribin û rîziman û alfabe xwe amade kiribin jî, hîn bi awayekî dorfîreh, zimanê nivîskî di nava gel de belav nebüye.

Ji ber vê rewşê, em dijwariya

nivisînê dikişîmin. Peyvek dikare ji awayekî zêdetir bê nivisan din û bilêvkirin.

Dijwari û çetînahiya me ew e ku, em dê kîjan teşeya (şekl) peyvî bi kar bînin. Em dê an li gorî berhemên klasik mîna Nûbara Biçûkan, Mem û Zîn, Mewlûda Kurmancî, dîwanên Meleyê Cizîri, Feqiyê Teyran, Eliyê Herîn û hwd. binivîsin an jî em dê li gorî qaydeyên rîzman van peyvan bi kar bînin?

Ziman jî mîna organîzmayeke jîndar, di qonaxa dîrokê de diguhere. Hem bi hilberîna civakî re, ji aliye gencîneya peyvan ve dewlemend dibe û hem jî, ji aliye teşeyî ve (guherîna wateyên wan deynin aliyeke) peyv diguhere. Ziman, bi saya nivisînê standart dibe. Bi bilindbûna hejmara kesen xwende re, di civakê de, bi taybetî di warê nivisînê de (ev yek bandora xwe li zimanê devkî jî dike) zimanekî standart çêdibe û cudadîya di navbera zimanê devkî û nivîskî de, bere bere kêm de.

De içar, ku em li civaka xwe binerîn, em dev ji gengeşî û gelmesyeyen di zimanê devkî de berdin, di zimanê nivîskî de jî hîn ev gelş û pirsgirêk nehatine çareserkirin. Mirov di berhemekê de bi hêsanî dikare rastî peyvekê were ku, bi du-sê awayî tê nivisîn.

Sedemên van yekan hene.

Ew, di ziman de, bi guherîna dengan re têkildar in. Deng bi tena serê xwe nayêne vekolîn. Ancax deng di nava yekîneyê mîna peyv û kîteyên ziman de dikare bê vekolandin.

Deng ku kîte û peyvan pêk tînin, ji aliye jêderk (yanê cihê derketinê) û awayê derketinê ve ji hev cihê dibin. Her yek bi serê xwe xwediyê taybetiyan e. Deng ji devê me di encama liv û lebtan de derdikeve. Gava ev liv û lebt li ser hev têne kirin, bandor li dengan dibe û heta wesfîn wan jî diguhere. Ji bo vê yekê çîvanok (tekerleme) ni-mûneyên balkêş in:

*heft hirç, heft hirç  
her heft heft hirç  
navmil bi pirç*

Eger em li ser hev çend caran, li bêhnekê vê çîvanokê bibêjin, em dê bi awayekî zelatir ji guherîna dengan serwext bibin.

Deng, bi qonaxa demê re di pêkaniya xwe ya hevedudaniyê de diguherin û dibin sedemên guherînen di peyvan de. Ji lew re di fonetikê de deng, ji du aliyan ve têne vekolandin:

- 1) Li gorî jêderkê deng
- 2) Li gorî awayê derketinê deng

Ji bo ku mijara me wekî teorîk ne denganî (fonetik) ye, em dê bi tenê ji hin qaîdeyên wê çel (behs) bikin. Li aliye din, di kurmancî de mijara fonetikê nehatiye helkirin. Senifan'ina dengan li gorî jêderk û awayê derketinê, ya kesî naşibi hev. Ji ber vê yekê em li ser fonetikê ranewestin û em dê tenê dengen ku jêderka wan eşkere û diyar e bidin xuyakirin. Fonetika kurmancî, bi tena serê xwe hêjwa-hî xebateke taybet e.

Her wiha deng, di dawiya liv û tevgerên li ser hev û li dû hev jî, li hev bandor û hîkariyê dîkin. Bi kurtasî sedemên fizyolojik bandoreke mezin li guhe-

rînêng dengan dike.

Bi vî awayî, bi heng û demê re peyv ji hêl û layên teşe û dirûv ve diguherin. Ji bo guherîna dengen ku bi hev re têne bikananîn, carinan pêwistî bi heyameke dirêj dibe û carinan jî na-be. Li aliyê dinê ev guherîna dengan, hem di navbera dengen ku jêderka wan yek e çêdibe û hem jî yên ku jêderka wan ne yek e, diqewime. Ji bo nimûne:

*deng deyn  
heng heyn*

Ev peyvîn li jorê ji aliyê wateyê ve tu cudahî di navbera wan de nîn e, lê belê ji layê teşe û şewe ve cihetiyeke berbiçav heye. Ev yek bi "qanûna hewla herî hindik" (least effort) tê rave û izzahkirin. Ev meyla guherînî di hemû zimanan de tê dîtin û ev rewş bandoreke mezin li guherîna dengan dike. Bi vî awayî hêsanîya gotina peyvê dertê holê. Em di bin sernavande, hinek der barê guherînê dengan de agahiyan pêşkêş bikin.

#### *Asîmilasyon*

Asîmilasyon (assimilation); di liv û lebta ji bo derxistina deng de guherîn çêdibe. Terîfa wê em dikarin wiha bikin: Ji aliyê jêderk an jî ji aliyê awayê derketinê ve, guherîna dengekî li dengekî din, an jî şibîna wê li dengekî din e. Bi vê yekê hêsanîya gotinê rûdide.

Çar cur û celebêñ asîmilasyonê hene, em bi nimûneyan li ser wan bisekinin. Lê em nadîn xuyakirin ku ka jêderka dengan û awayê derketina wan ci ye. Me berê da xuyakirin ku di vî warî de hevnegirtinek a senifandina dengê kurdî tune ye.

#### *a) Asîmilasyona tam*

Asîmilasyona tam (assimilation totale), bi kurfi, tarif wiha

dikare bê kirin: Ji her aliyî ve dagerîna dengekî li dengekî din, şibîna dengekî li yê din e. Li vir jêderka dengan ji hev cihê ye.

Ev yek di zimanê me de hem ji bo dengdér û hem jî, ji bo dengdaran heye:

mêjî	mejî
nan	non
hez	hej
alîkar	arîkar

#### *b) Asîmilasyona nîv*

Asîmilasyona nîv (assimilation partielle), di asîmilasyona nîv de, deng ji aliyê hin wesfîn xwe ve dişibe dengekî din.

Penbe	pembe
tenbel	tembel
anbar	ambar
zenbil	zembil

Di van mînakan de dengê /n/yê li /m/yê dageriyaye. Dengê /b/yê kiriye ku du dengen ku jêderka wan yek e, bêne cem hev. Bi gotineke din /b/yê dengê /n/yê li /m/yê dagerandiye, ku /m/ ji koma wê ye.

#### *c) Asîmilasyona pêşketiyî*

Asîmilasyona pêşketiyî (progressive assimilation), di peyvê de bandora dengê pêşin li ya dû wê ye. Yanê dengê ku di peyvê de beriya dengê din cih stendiye, bandor û tesîra xwe li ya ku di pey wê re hatiye, dike.

şalwar	şalwal
semсиye	şemşîye
şikestin	şikeştin

#### *ç) Asîmilasyona paşketiyî*

Asîmilasyona paşketiyî (regressive assimilation), li vir, berrevajiyê asîmilasyona pêşketiyî, bandora dengê paşî li yê pêşin e.

defter	tefter
jêrzemîn	zêrzemîn

#### *Vajiyê asîmilasyonê*

Vajiyê asîmilasyonê (dissimilation), di peyvekê de dage-

rîna du dengen mîna hev an jî du livên gotinê yên wekî hev, bi dengen din, bi lebtêñ din e. Ji bo çêbûna vê yekê, tersî qanûna hewla herî hindik, pêwistî bi hewla mezin heye. Nimûne:

mîdar	mindar
kehrîbar	kehrîban
bajar	bacar
tebsî	temsî

Eger em dîsa bizivirin ser encamên ku ji bûyera hêsanîya gotinê derketine, divê em li ser bûyerîn windabûna kîteyê, kelijîn û veguhezîna deng jî râwestin.

#### *Ketin an windabûna kîteyê*

Ketin an windabûna kîteyê (haplography), em vê dikarin wiha rave bikin: Di peyvekê de ji du kîteyên ku dengen wan dişibin hev an jî wekî hev in, nego-

#### *Deng bi tena serê xwe nayêne vekolin.*

*Ancax deng di nava yekîneyen mîna peyv û kîteyên ziman de dikare bê vekolandin.*

*Deng ku kîte û peyvan pêk tînin, ji aliyê jêderk (yanê cibê derketinê) û awayê derketinê ve ji hev cibê dibin. Her yek bi serê*

*xwe xwediyê taybetiyan e. Deng ji devê me di encama liv û lebtan de derdikeve. Gava ev liv û lebt li ser hev têne kirin, bandor li dengan dibe û beta wesfîn wan jî diguhere.*

tin an jî ketina yek ji wan kîteyan e.

eczaxane	eczane
tragico	comedie
comedie	tragi comedie

### Kelijîn

Kelijîn (contraction), ev jî taybetiyeke girîng a zimanê qertafdar (eklemeli) wekî zimanê tirkî ye. Du kîteyên ku xwedî dengdêr in, gava têne ba hev, yek yekê dixwe.

cumaertesi	cumartesi
sütlüas	sütlâç

### Veguhezîna deng

Veguhezîna deng (metathesis), di peyvê de, bi hev guherîna dengan, bi taybetî yên dendar. Di wir de meyla hêsan-kirina bilêvkirina peyvê heye.

derwêş	dewrêş
karwan	kawran
qerwaş	qewraq
memleket	melmeket

Li vir em li ser guherînê ku bi piranî ji ber sedemên fizyolojîk diqewin, rawestîn. Hin ji wan guherîn di dem û kateke kurt de û hin jî di demeke dirêj de çêdibin. Mirov di hemû zimanan de rastî van yekan tê. Yanê ev awayên guherîna den-gan ne tenê xweserî zimanekî ye.

Zimanê devkî ji ber sedemên cihê cihê ji guherîn û şibînan re guncan (musaîd) e. Li hemberî vê yekê, di zimanê niviskî de giraniya bandora kevneşopî pir xuya ye.

Guherîna dengan, tenê beşek e ji guherînê di ziman de. Ziman bi pêavajo û qonaxa demê re û ji ber eger û sedemên cuda, hem ji aliyê deng ve, hem ji hêla teşe (sekî) ve û hem jî ji layê sentaksê ve (çendî ku ew hindik be jî) diguhere. Her wiha divê ku em guherîna vatinî û erk (wezîfe) û wateya peyvan jî bi bîr bînin.

Di pey van daxuyaniyan de

îcar em dixwazim bi mînakan dengê ku di zaravayê kurmançî de bi hev diguherin destnîşan bikin. Ji aliyê dinê ve, gere bê gotin ku em li ser wan dengê ku me ew peyitandine, radiwestin. Dibe ku hinê din jî hebin.

### Guherîna dengê kurmançî

Wekî me berê jî daxuyand, dengê ku jêderka wan yek e, pir bi hêsanî bi hev diguhelin, ligel vê, dengê jêderka wan ne yek e jî bi hev diguhelin, an jî cih didine hev. Ji bo daxuyakirina mijarê em dê li gorî rêza alfabetî, bi mînakan dengê ku di kurmançî de bi hev diguhelin, pêşkêş bikin.

/a/ û /e/

pan	pehn
tat	teht
tal	tehl
fam	fehm

Li deverinan, hin kes /pan/ dibêjin û hin jî /pehn/ dibêjin. Ev yek ji bo mînakên din jî, derbasdar e. Di vir de dema /a/ li /e/yê biguhere, dengê /h/yê jî tê pêşiya wê.

/b/ û /v/

bab	bav
ab	av
şeb	şev
neqeb	neqev

Dibe ku şêweya kevn /b/ be. Lewre hin peyvîn me yên hevdudanî bi me didin nîşan ku, dengê /b/yê bi /v/yê guheriye. Mînak: Şebab, yanê ava ku bi şev bi ser bexçe û zeviyan de tê berdan. Ku em vê peyva hevdudanî ji hev verîskînin (verîsînin):

şebab: şev+ab

Xweş xuya dibe ku, çawa dengê /b/yê li yê /v/yê dageriyyaye. Em mînakeke din jî rapêş bikin:

şebnem: şev+nem

Dengê /b/ û /v/yê ji eyñî jêderkê ne.

/b/ û /p/

tebsî	tepsi
bîçük	piçûk
seleb	selep
kebab	kebab

Ji bo her du dengan em nikarin tiştekî bibêjim. Yanê qerareke mîsoger (qethî) em nikarin bidin ka kîjan li kîjanê dageriyyaye. Ev heye, /b/ û /p/ ji jêderkekê ne.

/c/ û /d/

caş	daş
ca	da
ciyarbekir	diyarbekir

Bi piranî dêrikî di şûna "diya min" de "ciya min" bi kar tînin. Her wiha li Farqînê em ji "kuriyê" kerê re dehş dibêjin. Ên ku dibêjin daş jî hene. Li aliyê din, em dibînin ku ev peyv no-la "çaş an jî cehş" jî tê bilêvkirin; ku ew û cehş eyñî ne. Digel vê yekê ev peyv di lîteratûra me ya siyasî de xwediyyê cihekî tay-betmend e. LDi mînaka 'çaş û daş' de, dengê /c/yê li /d/yê da-geriyyaye. Ji ber ku peyva daş an jî ças bi erebî ye. Kurdiya vê peyvî 'kuri' ye.

Ev her du dengdarê hanê, /c/ û /d/, ji aliyê jêderkê ve ji hev cihê ne.

/c/ û /j/

bacar	bajar
qicik	qijik
kevcar	kevjar
hêja	hêca

Di vir de jî tê xuyan ku, /j/ li /c/yê guheriye. Jêderka van her du dengdaran yek e.

/b/ û /m/

tebsî	temsî
busulman	musulman
bumbarek	mumbarek
selab	selam

Di van peyvan de tê dîtin ku, bi piranî dengê /b/yê li /m/yê dageriyyaye. Bi qasî ku em dizanîn, peyva tepsi ne tê de peyvîn din bi erebî ne. Her wiha jêderka van dengan yek e.

/ç/ û /k/

çefî kefi

Di zaravayê kurmancî de guherîna van her du dengan bi hev pir kêm e. Li Di zaravayê kirdkî de zehf e. Mînak:

çê kê

çênik keynik

/ç/ û /t/

çu tu

çik tik

çêjik têjik

Ev rews zêde nayê dîtin. Lî mirov dikare bibêje ku /t/ bi /ç/yê guherîye. Jêderka wan ji hev cihê ye.

/d/ û /t/

dîk tik

xerad xerat

ferad ferat

ewlad ewlat

Dibe ku dengê /d/yê bi yê /t/yê guherîbe. Lewre her du deng guncan (musaîd) in ku cih bidin hev.

/d/ û /z/

qedâ qeza

mirad miraz

cadû cazû

qadî qazî

Peyvîn cadû û mirad ne tê de, yê din bi erebî ne û dengê /d/yê li /z/yê dageriyane. Ev dengê hanê, dengê diranî ne. Her wiha di kurdî ya kevn de meyala guherîna van her du dengan bi hev heye. Weki:

dil û zer

Bi kurmancî /dil/ û bi kirdkî (zazakî) zer eynî ne. Tê dîtin ku çawa' guherîn di dengê /d/ û /z/yê, di dengê /l/ û /r/yê û di dengê /e/ û /i/yê de çebûye.

/e/ û /ê/

mejî mêmjî

kengê kêngê

enî ênî

dersim dérsim

Ji bo pevguherina her du dengan tiştekî teqezi (mutleq) em nikarin bibêjin.

/e/ û /i/

hem him

weha wiha

merov mirov

wenda winda

Ji bo van jî em biryarekê nikarin bidin.

/ê/ û /î/

bîn bêhn

dîn dêhn

şîrîn şêrin

nîv nêv

Bi piranî Hérêma Botan di şûna dengê /i/yê de dengê /ê/yê bi kar tîne. Mînak di devoka kurmanciya silîvî de "bîn" di devoka botî de dibe "bêhn."

/ê/ û /o/

hênik honik

şêlî şolî

Ji peyitandin û selmandina

guherîna navbera van dengan pê ve tiştekî ku em bibêjin nîn e.

/f/ û /v/

tifing tiving

hifdeh hivdeh

defdan devdan

mofik movik

Di vir de jî zehmet e mirov biryarekê bide, lê ihtimala ku dengê /f/yê bi dengê /v/yê guherîbe. Mînak: heftdeh û hivdeh, di vê nimûneyê de dengê /f/yê li yê /v/yê dageriyaye. Her du deng jî, ji eynî jêderkê ne.

/g/ û /k/

kepeng kepenk

hege heke

çog çok

gew kew

Ev her du deng, ji heman jêderkê ne. Dibe ku her du jî bi hêsanî bi hev biguherin.

/h/ û /w/

hoste weste

hun win

honandin winandin

hundir windir

Der barê guherîna van dengan de tiştekî weki mîsoger ku em bibêjin filan deng li bêvan dengî dadigere, nîn e.

/h/ û /x/

hine xîne

hîm xîm

dehl dexl

ehlaq exlaq

Ev her du deng ji eynî jêderkê ne. Em nikarin biryarekê bidim ku, kijan bi kijanê guherîye an jî, cih daye ya din.

/i/ û /o/

win hon

meriv mirov

Em zêde leqayî guherîna van her du dengan nehatin, lewma ji em nikarin tiştekî weki encam derbibin.

/î/ û /û/

xwîn xûn

**Zimanê devkî ji ber sedemên cibê cibê ji guberîn û şîbînan re guncan (musaîd) e. Li bemberî vê yekê, di zimanê nîviskî de giraniya bandora kevneşopî pir xuya ye. Guberîna dengan, tenê beşek e ji guberînen di ziman de. Ziman bi pêavajo û qonaxa demê re û ji ber eger û sedemên cuda, hem ji aliyê deng ve, hem ji hêla teşe (şekl) ve û hem jî ji layê sentaksê ve (çendî ku ew bindik be jî) digubere. Her wiba divê ku em guberîna vatinî û erk (wezîfe) û wateya peyvan jî bi bir bînin.**

bîk bûk  
rî rû  
dîrok dûrok

Ev jî weke mînaka dengê /û/ ê/yê ye. Ji devokan pêk tê. Mînak botî nabêjin “bûk” dibegin “bîk.”

/j/ û /s/  
jidandin şidandin  
gij giş  
jixwe şixwe  
kujtin kuştin

Her du deng jî, bi hev diguerin. Bi ya me biryadayîn hînek zor e. Her çiqas ihtimala guherîna dengê /j/yê bi /s/yê zêde be jî.

/j/ û /z/  
jîr zîr  
jeng zeng  
jendî zendî  
jehr zehr

Dengê /z/ û yê /j/yê, ji pevguherînê re pir guncan e. Jêderka van dengan, ji hev cihê ye.

/l/ û /n/  
livîn nivîn  
limêj nimêj  
ling ning  
listin niştin

Em dikarin bibêjin, ku dengê /n/yê bi yê /l/yê guheriye, lê em nikarin vê biryara xwe bi giştî bikin. Ji bo peyvîn “nimêj”, “nivîn” û “ling” ev biryar di cihê xwe de ye. Lî ji bo peyva “listin” em nikarin vê biryare gelempêri bikim, çendî ku jêderka wan yek e jî.

/l/ û /r/  
alîkar arîkar  
zêlû zêrû  
selep serep  
lawir rawir

Her du deng pir bi hev diguerin. Biyadayîn, ji bo her duyan, ku ka kîjan cih daye kîjanê zor e.

/m/ û /v/  
selam selav  
dehmdan devdan  
temsî tevsî

Ku mirov li ser peyva selamê biryare bide, dikare bibêje ku dengê /m/yê bi yê /v/yê guheriye, lê ji bo yê din na. Peyva “selamê” ne bi kurdî bi erebî ye û di kurdî de bi awayê “silav” û “selab” ê jî tê bikaranîn. Kurdiya wê “pate” ye.

/n/ û /r/  
kanîn karîn  
kehrîbar kehrîban  
mindar mirdar

Ji van her du dengê hanê, ku ji koma dengê diranî ne, bêhtir dengê /r/yê li yê /n/yê di-guhure.

Nimûne ji bo “mirdar û mindar”; peyv hevedudanî ye û ji “mir” û “dar” ê pêk hatiye. Mir, raweya lêkera fermanî ya “mirin” ye û “dar” jî parkit e. Eşkere ye ku dengê /r/yê li yê /n/yê dageriyaye.

/s/ û /ş/  
pisik pişik  
serjekirin şerjekirin  
semkiye şemsiye  
şikestin şikestin

Dengê /s/ û /ş/yê ne ji eynî jêderkê ne. Dengê /s/yê pidiyî ye û yê /ş/yê ji ezmandevî ye. Di van nimûneyan de, di ya “pisik û pişik” de /s/ li /s/yê dageriyaye, li di her duyên din de /s/ li /ş/yê dageriyaye.

Peyva pişik, pisik, pişing, pişing tev hevedudanî ne û ji “piş” an jî “piş” hatine çekirin. Gava mirov pisik diqewitîne dibêjin “piş an jî piş.”

/o/ û /û/  
sor sûr  
bandor bandûr  
serok serûk  
honandin hûnandin

Bi ya me dengê /o/yê li dengê /û/yê dadigere. Mînak: Serok; ku peyveke hevedudanî

ye; ser+ok, bi parkîta (pasgira) /ok/ ê hatiye çekirin. Di kurmançî de parkîteke me ya bi navê /ûk/ ê nîn e. Di nimûneya me de qenc diyar dibe ku dengê /o/yê li /û/yê dageriyaye.

/o/ û /w/  
olçek welçek  
ordek werdek  
ojdan wijdan  
olaq welaq

Ger mirov karibe bingeha van peyvan derxe, ancax biryarekê kare bide. Di vê rewşê de em tenê dikarin bibêjin ku her du deng jî bi hev diguherin.

/s/ û /z/  
derbas derbaz  
xinis xiniz  
nas naz  
qise qeze

Bi taybetî dengê /s/yê cihê xwe dide dengê /z/yê. Mînak: ez te nas dikim, ez te naz dikim.

/v/ û /w/  
sev şew  
govend gowend  
rave rawe  
sevbuhêrk şebuhêrk

Di vir de mirov dikare biryareke teqez (mutlaq) bide ku dengê /v/ bi yê /w/yê guheriye.

/w/ û /y/  
ziwa ziya  
siwar siyar  
qawiş qayış  
teware teyare

Em dibêjim qey ev yek ji devokan tê. Lewre di eynî herêmê de jî cudahî heye.

Di dawiya xebata xwe de em dikarin vê bibêjin ku me li gorî zanebûn û derfetên xwe heta ji destê me hat, me xwest ku em rewşa guherîna dengan di kurmançî de raxin ber çavan.

Her wiha dibe ku biryaren me yêñ der barê guherîna hin dengan de, şâş bin. Ji rexneyê re vekirî ne.

# Çend Gotin Di Warê Rêformkirina Alfabêta Kurdî Ya Latînî De

## I. NASSO

**A**lfabêta Kurdî, ya latînî, ya ku ji aliyê zi-manzanê nemir ve, Mîr Celadet Bedir-Xan, hatiye amadakirin, cihê xwe di zarava Bakur û Rohava de, ya ku bi navê Zarava Kur-mancî tê naskirin, haş girtiye û hatiye çespandin. Ew di Zarava Kirdikî (Zazakî) de jî tê bikaranîn. Zarava Başur û Rohilat jî, ya ku bi Zarava Soranî tê naskirin, dema ku alfabêta latînî bi kar tîne, alfabêta Celadet Bedir-Xan bi hin nîşanên taybetî dike bingeh.

Mirov dikane bêje, ku alfabêta Kurdî ya latînî dê kanibe bibe alfabêta zimanê Kurdî, yê Yekgirtî, heke hin mereên bingehîn pêkbêñ.

Pêwîst e neyê jibîrkirin, ku zimanê Kurdî tucarî nabe yek, heke alfabêta Kurdî ya Latînî di Zarava Soranî de jî neyê bikaranîn.

Li vê derê ez naxwazim vê pirsê kûrtir bikim, jiberku

mijara me tenê li ser rîform-kirina alfabêta Kurdî ya Latînî ye.

Bê guman nivîsandin bi alfabêta Kurdî ya Latînî, ci bi dest û ci bi tîpnivîsê, ne hêsan e. Mirov rastî pir dij-wariyan tê. Hin sedemên ku bikaranina alfabête asteng dîkin ev in:

1. Zimanê Kurdî, wek endamekî Malbata Zimanê ïndo-Ewropî, taybetî di alfabêta wî de, ya Latînî bêtir in, wek tîpêñ ê, î, û, ç, s.
2. Nebûna awayên têknîkî (kompûter, tîpnivîs, çapxane...), ku kanibin bi şeweyekî hêsan alfabêta Kurdî di xwe de binimînin.
3. Ji dema afirandina alfabêta Kurdî ya Latînî, ji aliyê Mîr Celadet Bedir-xan ve, heyâ niha, tu lêko-lînên ber bi çav di warê alfabêta Kurdî de nehatine kirin. Bîr jî lê nehatiye ki-

rin, ka ev alfabêt dê çon di warê têknîkî de û ligor daxwaza rojê bê bikaranîn.

4. Heke mirov alfabêta Kurdî ya Latînî bide ber alfabêtên zimanê Ewropî, mirov dê bibîne, ku hejmarâ tîpêñ alfabêta kurdî ji yên Ewropî bêtir in. Ev tişt jî dihêle, ku problêmên alfabêta Kurdî hêñ dijwartir bibin.

Tê diyarkirin, ku pirs-girêka alfabêta me, ya Latînî, pêwîstî bi hin çaresêriyan heye. Lê divêt bê zanîn, ku mirov nikane hemû problêmên tîpan di zimanê Kurdî de, di çarçewa alfabêtê de, çareser bike. Ji aliyê din ve, divêt neyê ji bîr-kirin jî, ku zimanê Kurdî ji Malbata Zimanê Erebî û Tirkî zor dûr e. Rizgarkirina zimanê Kurdî ji bandora van herdu zimanîn mercekî se-reke ye, ji bo xebatêñ lêko-lînvan û zimanzanêñ Kurd. Ji ber ku zimanê Kurdî en-

damê grûpa Zimanên Îndo-Ewropî ye, divêt mirov di warê pêşvebirina zimên û rîformkirina alfabetê de sûdê ji dîroka pêşveçûna wan zimanan û rewşa alfabetê wan werbigire. Ji bo vê yekê ez dixwazim van pintê (xalê) jêrîn bînim ser zimên:

1. Tipêng dengdêr, yên bi bilindek, di alfabetâ Kurdî de (ê.i.û) taybetiya alfabetâ me nîşan didin. Pêwîst e awayê têknîkî, li ser tanga netewî, bêni afirandin û avakirin. Li ser tanga navnetewî divêt bê hewildan, ku fontê Kurdî jî cihê xwe di naveroka fontê cîhanî de bigirin.

2. Tipêng dengdar (k.p.r 1) di zimanê Kurdî de, Zarava Bakur û Rohava, bi du şêweyan tênil bilêvkirin. Ev jî taybetiyek zimanê me ye û pêwîst nake, ku mirov wan tîpan, di nivîsandinê de, ji awayekî bêtir bi kar bîne. Bilêvkirina wan di hevakan û kontêkst de, di mebesta nivîskar de, tê zelalkirin.

3. Hebûna herdu tipêng dengdar (ç,ş) hejmara alfabetâ me bêtir dikin û di warê nivîsandinê de, bi awayê têknîkî, dijwariyê mezin pêde dikin. Ev herdu tip dê tim wek asteng bimînin, ku fontê Kurdî cihê

xwe di nav fontênav netewî de bigirin.

Tê gumankirin, ku tipa "ç" "û" "ş" ji alfabetâ Tirkî ketine alfabetâ Kurdî ya Latînî. Ji ber ku tu pêwendiyê Malbatiya Zimanî di navbera Kurdî û Tirkî de nîne, pêwîst dibe, ku em alfabetâ xwe Kurdî-Latînî ji van herdu tîpan pak bikin.

Heke em li alfabetê zimanê Ewropî temaşe bikin, emê bibînin, ku piraniya wan zimanan problêma tipêng wisa li derveyî alfabetâ xwe zelal kirine.

Da ku em jî alfabetâ Kurdî, ya Latînî, standard bikin, ez dixwazim pêşniyaz bikim,

ku em tipa "ç" "û" "ş" ji alfabetâ xwe derxin û pirsa wan li derveyî alfabetê bi vi awayî çareser bikin:

- Li şûna "ç" emê "ch" bi kar bînim.
- Li şûna "ş" emê "sh" bi kar bînim.

Bi vî awayî emê kanibin

- alfabetâ xwe bêtir nêzîkî alfabetê zimanê Ewropî bikin,
- alfabetâ xwe ji 31 tîpan bînin 29 tîpan,
- alfabetâ xwe nûjen bikin û
- bikaranîna alfabetâ Kurdî di warê têknîkî de hêsanter bikin.

#### Nimûne: Bikaranîna "ch" û "sh" li şûna "ç" û "ş":

Di Tevgera Rizgariya Netewî ya  
Kurdî de pêwîst e, ku soreşa  
cekdarî û soresa çandî mîna  
cêwiyeî digel hev bicin  
Koloniyalistiya ku Kurdisan têde  
ye û zordariya ku Netewa Kurd  
di bin de dijî pêwîst dikin, ku ev  
herdu sores digel hev bicin.

Rewşenê caya bê sekir da  
Azad. Ev tîst li xwesiya

Azad nehat

Azad got:

Tu rind dizanî, ku ez ji caya  
bi sekir hez dikim. Te cîma  
caya bê sekir cê kir?

Rewşenê jêre got:

Dema tu ji bazarê hatî, te sekir  
ji bir kiribû. Min jî caya bê sekir  
ji te re cê kir!

Di Tevgera Rizgariya Netewî ya  
Kurdî de pêwîst e, ku shoresha  
chekdarî û shoresha chandî mîna  
cêwiyeî digel hev bichin  
Koloniyalistiya ku Kurdistan têde  
ye û zordariya ku Netewa Kurd  
di bin de dijî pêwîst dikin, ku ev  
herdu shoresha digel hev bichin

Rewşenê chaya bê shekir da  
Azad. Ev tîst li xweshiya

Azad nehat

Azad got:

Tu rind dizanî, ku ez ji chaya  
bi shekir hez dikim. Te chima  
chaya bê shekir cê kir?

Rewşenê jê re got:

Dema tu ji bazarê hatî, te shekir  
ji bir kiribû. Min jî chaya bê shekir  
ji te re cê kir!

# DERHEQÊ KİRMANCKÎ (KİRDKÎ) DE KOMBIYAYİŞÊ II. Ê STOCKHOLMÎ

**R**oja 28ê aşma (menga) adare de, Stockholm de, kirmancî (kirdkî, dimilkî, zazakî) ser o kombiyayışê diyine dest pêkerd û çar rojî (28-31 ê adare) ramit. Nê kombiyayışê diyine de nê heştêş kesî amade bîy:

Osman Aytar (Sêwregi)  
Yıldırı Beyazgül (Gimgim)  
Çeko (Gimgim)  
Münzûr Çem (Dêrsim)  
Hûmanê Çiyan (Depe)  
Haydar Diljen (Sêwregi)  
Nîhat Elî (Sêwregi)  
J. Espar (Piran)  
Cemîl Gündoğan (Dêrsim)  
Lerzan Jandîl (Gimgim)  
Huseyîn Kulu (Dêrsim)  
Seyîdxan Kurîj (Çewlig)  
M. Malmîsanij (Piran)  
Selîm Mûrat (Pali)  
Robîn Rewşen (Lîce)  
Kamer Söylemez (Dêrsim)  
Harun Turgut (Pali)  
Şukrî Urgun (Hêni)

Nê kombiyayışı de amedebiyayoxî nê meselanê cêrinan ser o vindertî, munaqeşe kerd û meylê xo tesbit kerdî:

## I- Name

- 1) Nameyê lehçeya ma
- 2) Nameyê hetan (cîhetan)
- 3) Nameyê mengan (aşman)
- 4) Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî

## II- Zemîr

Zemîre kesî (zemîre şexsî)

## III- Sifet

Rengî

## IV- Hûmarî

Şima nê nuştî de netîceyanê nê munaqeşeyan û meylan wanenê. Netîceyê ke ze meyl tesbit bîyê, fikrê vêşaneyê (zafaneyê) nê kesan ifade kenê. Nê, ze tewsiye û teklifi yê.

Tanî çeku (kelime) yan zî formê çekuyan ê ke ma no nuşte de ze nimûne nuştê, tanî mintaqayan de ciya yê.

## I-NAME

### 1) Nameyê lehçeya ma

Kurdê ke bi lehçeya ma qisey kenê ca ra ca xo ra vanê "kirmanc", "kird", "zaza" yan zî "dimili"/"dimli"; lehçeya xo ra vanê "kirmancî", "kirdkî", "zazakî" yan zî "dimilkî"/"dimili"/"dimli".

Meylê kombiyayışî nê çekuyan (kelîmeyan) ra "kirmanc" û "kirmancî" ser o yo.

### 2) Nameyê hetan (cîhetan)

kirmancî (kirdkî) .....	tirkî
rojawan .....	batı
rojhelat .....	doğu
vakur .....	kuzey
başûr .....	güney
vakurê rojhelatî .....	kuzeydoğu
vakurê rojawani .....	kuzeybatı
başûrê rojhelatî .....	güneydoğu
başûrê rojawani .....	güneybatı

### 3) Nameyê mengan (aşman)

Kirmancî (kirdkî) de him çekuya "mengi" him zî "aşme"/"aşmi"/"aşm" vajiyêna. Tanî cayan de "mengi" yena mena "mois" a ziwanê frenskî (30 roj), "aşme" yena mena "lune" a frenskî (bi tirkî "gökteki ay"). Tanî cayan de zî çekuya "mengi" nêvajiyêna, "aşme" him mena "mois" him zî "lune" a ziwanê frenskî dana.

### kirmancî (kirdkî).....tirkî

1. çele .....	1. ocak
2. sibate, guçige .....	2. şubat
3. adare .....	3. mart
4. nîsane .....	4. nisan
5. gulane .....	5. mayıs
6. hezîrane .....	6. haziran
7. temmuze .....	7. temmuz
8. tebaxe .....	8. ağustos
9. êlule .....	9. eylül
10. októbre .....	10. ekim
11. teşrîne .....	11. kasım
12. kanûne .....	12. aralık

Nê nameyan ra "çele" nerî (masculin) yo, nameyê bînî makî (féminin) yê. Nameyê mengan bi herfa hurdi (wurdî) dest pêkenê.

**4) Nameyê şaristanan (bajaran) û qezayanê Kurdistanî**

Goreyê idareyê dewletan tanî nameyê cayan nê yê:

*kirmancî (kirdkî).....tirkî*

dewe .....	köy
nahiye .....	nahiye
qeza .....	ilçe, kaza
şaristan, bajar .....	il, vilayet; şehîr, kent

Meylê kombiyayışî nê panc çekuyanê corînan ser o yo, labelê formê bîni zî estê. Nimûne:

<i>meylê kombiyayışî.....formê bîni</i>	
dewe .....	dewi, dew
şaristan .....	şahrestan, şehir, şehir

sûke: Tanî cayan de çekuya "sûke"/"suki"/"sûk" menayanê "şehir, kent, il merkezi", "ilçe merkezi" yan zî "çarşı" yê tirkî de vajiyêna. Ma vajî Diyarbekir, Erzingan û Sêwregi ra "sûke" yan zî "suki" vajiyêno. Ziwanê erebkî de "sûq" mena "çarşu" y de ya û tanî nuştoxî vanê ke eslê na çekuye ziwanê berberkî ra ameyo.

**Şaristan û qezayê Kurdistanî**

Ma nê kombiyayışî de nameyanê tanî şaristanan û qezayan ser o vindertî. Tiya de ma derheqê nê nameyan de meylê kombiyayışî nusenê. Ma wext nedî ke nameyanê şaristanan û qezayanê bînan ê Kurdistanî ser o vinderê.

*nameyo kirmancî*

*nameyo ke dewlete panawo*

**1) Bidlîs**

1. Elcewaz .....
2. Hîzan .....
3. Motkî .....
4. Tûx .....
5. Xelat .....

**1) Bitlis**

1. Adilcevaz
2. Hizan
3. Mutki
4. Tatvan
5. Ahlat

**2) Çewlîg**

1. Azarpêrt .....
2. Bongilan .....
3. Çêrme .....
4. Dara Hêni .....
5. Gêxi .....
6. Kanîreş .....
7. Xorxol .....

**2) Bingöl**

1. Adaklı
2. Solhan
3. Yedisu
4. Genç
5. Kiğı
6. Karlıova
7. Yayladere

**3) Dêrsim, Mamekiye**

1. Çemîşgezek .....
2. Mazgêrd .....
3. Pêrtage .....

**3) Tunceli**

1. Çemîşgezek
2. Mazgirt
3. Pertek

4. Pilemuriye .....
5. Pulur .....
6. Qisle .....
7. Xozat .....
4. Pülümür
5. Ovacık
6. Nazimiye
7. Hozat

Dêrsim eslê xo de nameyê yew mintqa yo. Nameyê şaristanî bi xo Mamekiye ya, ci ra Kalan zî vajiyêno.

**4) Diyarbekir**

1. Bismil .....
2. Çermûg .....
3. Cinar .....
4. Erxenî .....
5. Gêl .....
6. Hezro .....
7. Hêni .....
8. Karaz .....
9. Licê .....
10. Pasûr .....
11. Pîran .....
12. Silîvan .....
13. Şankuş .....
1. Bismil
2. Çermik
3. Çınar
4. Ergani
5. Eğil
6. Hazro
7. Hani
8. Kocaköy
9. Lice
10. Kulp
11. Dicle
12. Silvan
13. Çüngüş

**5) Erzingan**

1. Ciminî .....
2. İllîç .....
3. Kemaliye .....
4. Kemax .....
5. Mose .....
6. Refahiye .....
7. Têrcan .....
1. Üzümlü
2. İliç
3. Kemaliye
4. Kemah
5. Çayırlı
6. Refahiye
7. Tercan

**6) Erzirom**

1. Aşqele .....
2. Çat .....
3. Gogsî .....
4. Hesenqeple .....
5. İspîr .....
6. Narman .....
7. Oltî .....
8. Olur .....
9. Ortılı .....
10. Tatos .....
11. Xinûs, Kela .....
12. Xoresan .....
1. Aşkale
2. Çat
3. Karayazı
4. Pasinler
5. İspir
6. Narman
7. Oltu
8. Olur
9. Şenkaya
10. Tekman
11. Hinis
12. Horasan

**7) Mûş**

1. Gimgim .....
2. Kop .....
3. Milazgir .....
1. Varto
2. Bulanık
3. Malazgirt

**8) Riha**

1. Bêrecûg .....
2. Curnê Reş .....
3. Hewenc .....
4. Serê Kaniyê .....
5. Sêwregi .....
6. Sirûc .....
1. Birecik
2. Hilvan
3. Bozova
4. Ceylanpınar
5. Siverek
6. Suruç

7. Wêranşar .....  
8. Xelfeti .....

**9) Semsûr**

1. Aldûş .....  
2. Bêsnî .....  
3. Çelikan .....  
4. Kolik .....  
5. Semsat .....  
6. Serê Golan .....

**10) Sêrt**

1. Berwarî .....  
2. Dih .....  
3. Hewêl .....  
4. Misriç .....  
5. Şêrvan .....

**11) Xarpêt**

1. Axin .....  
2. Baskîl .....  
3. Depe .....  
4. Keban .....  
5. Meden .....  
6. Miyaran .....  
7. Pali .....  
8. Qowanciyân .....  
9. Sivrice .....  
10. Xulaman .....

7. Viranşehr .....  
8. Halfeti .....

**9) Adiyamran**

1. Gerger .....  
2. Besni .....  
3. Çelikan .....  
4. Kahta .....  
5. Samsat .....  
6. Gölbaşı .....

**10) Şiirt**

1. Pervari .....  
2. Eruh .....  
3. Baykan .....  
4. Kurtalan .....  
5. Şirvan .....

**11) Elazığ**

1. Ağın .....  
2. Baskil .....  
3. Karakoçan .....  
4. Keban .....  
5. Maden .....  
6. Arıcak .....  
7. Palu .....  
8. Kovancılar .....  
9. Sivrice .....  
10. Alacakaya .....

**II. ZEMİR****Zemîrê kesî (zemîrê şexsi)**

Kirmanckî de di grûbî zemîrê kesî estê. Ma tiya de goreyê meylê kombiyayîşî nê di grûban nusenê:

**Grûba yewine**

1. ez  
2. ti  
3. o  
3. a

1. ma  
2. sima  
3. ê

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

*meylê kombiyayîşî*

2. ti2. ....  
3. o .....  
3. a .....  
2. sima .....  
3. ê .....

*formê bînî*

to, tû  
3. ew, aw, we,  
wi, ay, yo, yû, wo  
3. ya  
2. sima  
3. yê, yi

**Grûba diyine**

1. mi  
2. to  
3. ey  
3. aye

1. ma  
2. sima  
3. ïnan

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê.

*meylê kombiyayîşî*

1. mi .....  
2. to .....  
3. ey .....  
3. aye .....

aya, ay, a, ja

1. ma .....  
2. sima .....

3. ïnan .....

îne, înê, înû,  
aynan, eyna, ayno

*formê bînî*

1. min  
2. tu  
3. yi, yê,  
hîjey, ê, êy,  
êyî, ay

3. yê, ya, yay,

1. man  
2. şiman,  
sima

3. yîn, yînî,  
yîne, jînî, ïna,

Yew zemîro kesî zî "xo" yo. Frenskî de nê zemîrî ra "pronom personnel réfléchi" vajiyêno. Meylê kombiyayîşî formê "xo" yo, labelê tanî cayan de herûnda "xo" y de nê formî zî vajiyênen: *xwe, xwi, xu, ho, hu*.

**III-SIFET****Rengî***Kirmanckî (kardkî)*

sipî, sis .....  
sûr .....  
siya, qer .....  
şalên, qeweyî .....  
kewe .....  
hewz, kesk, zergûn .....  
zerd, çequer .....

*tirkî*

beyaz, ak .....  
kîrmîzî .....  
siyah, kara .....  
kahverengi .....  
mavi .....  
yeşil .....  
sarı .....

Meylê kombiyayîşî formanê corînan ser o yo, labelê tanî cayan de formê bînî zî estê. Nimûne:

*meylê kombiyayîşî*

sipî .....  
sûr .....  
siya .....  
qeweyî .....

*formê bînî*

sipe, sipê,  
sipyê .....  
sur .....  
siya, şâ .....  
rengê .....  
qehwî, .....  
rengê qawî .....

kewe .....	kewo, kiho, kuhe, kûhe
hewz .....	sewz
zerd .....	zer, zerk

Mena tanî rengan ca ra ca ciya ya. Nimûne:  
**kewe** (*kewo, kiho, kuhe, kûhe*): Tanî cayan de yeno mena "yeşil"ê tirkî.

**zergün:** Tanî cayan de yeno mena "hewzê zerdînî" yan zî "zerdbiyaye" yî (bi tirkî "sarartî").

**zerd:** Tanî cayan de yeno mena "altın sarısı" yê tirkî.

#### IV-HÛMARI

Meylê kombiyayışî nê hûmaran ser o yo:

11 yewendes

12 diwêş/ duyes

13 hîrêş

14 çarêş

15 pancêş

16 şiyêş

17 hewtêş

18 heştêş

19 newêş

20 vîst

30 hîris

40 çewres

50 pancakes

60 şeşti

70 hewtay

80 heştay

90 neway

100 se

200 di sey

300 hîrê sey

400 çar sey

500 panc sey

600 şeş sey

700 hewt sey

800 heşt sey

900 new sey

1000 hezar

1000 000 milyon

1000 000 000 milyar

Meylê kombiyayışî formanê corînan ser o yo, labêlê zewbîna (sewbîna) formî zî estê:

*meylê kombiyayışî*

11 yewendes .....

12 diwêş/ duyes .....

13 hîrêş .....

14 çarêş .....

*formê bîni*

des û jû, des

û yew, yondes

des û didi

des û hîrê

des û çar,

15 pancêş .....	des û çihar des û panc, ponceş, pûncêş
16 şiyêş .....	des û şes des û
17 hewtêş .....	hewt, hotês des û heş, heyştêş
18 heştêş .....	des û new
19 newêş .....	hîris çewres,
30 hîris .....	çores, çoras
40 çewres .....	poncas, pûncas
50 pancakes .....	şest, şest, şêşti, şest, şeyşti
60 şeşti .....	hotay, hawtay, hotayê
70 hewtay .....	hêştay, hêştayê, heyştay
80 heştay .....	newayê, noway
90 neway .....	pan sey, ponc sey, pon sey, pûn sey
500 panc sey .....	hot sey heyşt sey, hêşt sey
700 hewt sey .....	no sey
800 heşt sey .....	henzar, hînzar, honzar, hûnzar, hazar
900 new sey .....	mîlun
1000 hezar .....	mîlar
1000 000 milyon .....	
1000 000 000 milyar .....	

#### Nimûne:

1925 hezar û new sey û vîst û panc

1938 hezar û new sey û hîris û heş

1997 hezar û new sey û neway û hewt

1567849 yew mîlyon û panc sey û şeşti û hewt

hezarî û heşt sey û çewres û new.

# Alfabe û Rastnivîs

**HÜSEYİN KARTAL**

## Ziman û Zarav

Ziman, ne tenê bi zaravên xwe re hin cudanivîs nîşan dide. Her zarav di nav xwe de jî, cudadî nîşan dide<sup>1</sup>. Her ziman, zarav û devokêñ herî bîçûk jî, di nav xwe de, cudadî dihewînîn. Ev ji bo ziman rewseke sirûst e. Li ser rastnivîsê zelalî û pêşketina herî gîring, yekîtiya alfabeteyê ye. Pirhejmariya alfabeteyê zimanê Kurdî astengeke giran e, li hember hevtêgîştina gelê Kurd di nav xwe de li aliyekî, li aliyê din jî, sedema pêşne-

çûn û ji hevdûrketina zaravan e<sup>2</sup>. Çareserkirina vê rewşê li pêş hemû tiştan e.

Pêşvebirina rastnivîs bi yekîtiya tîpan, pêwîstî bi yekîti û tevlîhevkirina ziman nayne pêş. Yekîtiya ziman li ser bingeha zaravên Kurdî derenca duyemîn, sêyemîn e. Zaravê Kurdî yê ku pêş<sup>3</sup> ketibe jî, ji ber ku bi tîpêñ Erebî tê nivîsandin, asteng û pirsgirêkîn li pêsiya yekîtiya ziman bi zelalî şanî me dide. Tîpêñ Erebî ji aliyê Kurdêñ Bakûr, Başûra Biçûk û Sovyeta berê nikarin bêñ xwendin. Tîpêñ Latînî bêñ wergirtin, ji bo Kurdêñ ku bi tîpêñ Erebî hînbûne jî, zeh-

1 LÖFFLER 1990, r.2-6

2 "Pirsgirêkîn ku iro derketina pêsiya zimanê Kurdî, pircure ne. Ew ne bi tenê bi nivîsına bi tîpêñ latînî, lê belê bi pirsên têvel yên zimannasîye ve girêdayî ne. Pirsgirêkîn ku bi nivîsına latînî ve girêdayî ne, di nivîsına kurdî ya bi tîpêñ erebî de nahêne pêş. Ji ber ku bi latînî nivîşîn, mirov mecbûrî hin qaîdeyîn bi hev re yan jî ne bi hev re nivîsandînî dike. Lê, ji ber ku alfabeteyê erebî ne alfabekeye fo netîk e û ew xwedî pêkhatineke movîkiye, çû qaîdeyeye wê ya bi hev re yan jî ne bi hev re nivîsandînî tune ye. Ew ji aliyê bikaranîna nîşandekan (interpunktion) ve jî, wek zimanêñ din, ne xwedî qaîde û tecrubeyen kevneşopî û rûnişti ye." ZILAN 1989, (Bergeh 1) r. 85.

3 NEBEZ 1975, r.108

4 NEBEZ 1975, r. 120

5 "Kurdêñ Kurdistana Tirkîyê (welatîn Diyarbekirê, Mêrdînê, Hekarîyê, Bitlisê,

metî nadî pêş, ew ji xwe pîranî bi ferbûna zimanê biyanî mîna Ingilizî, Fransî ûwd. tîpêñ Latînî dikarin bixwînin û binivîsinin<sup>4</sup>.

Piştî rastnivîs di zaravekî de, ber bi zelaliyê biçe, mirov dikare zaravan, ber bi zimanekî yekgirtî bimeşîne. Di vir de, pirsa politika ziman ci be, xwe dixe pêş cav. Politika ziman ji aliyê zimanzanistî her tim asankirina ziman e. Ziman ciqas asan û zelal be, ramananîna ziman, hevtêgîştin jî, ewqas baş pêk tê. Pêşveçûna raman, pêşketina insan zûtir tê cî. Perwerde bingehêke gîring, di nifşen civakê de digre. Mirov karibe ramana xwe asan bîne ziman, zûtir diğîje, civak zûtir fîr dibe û kultur bi bingehîn ciyê xwe digre.

## Kurmancî

Rastnivîsa zimanê Kurdî zaravê Kurmancî<sup>5</sup> roj bi roj ber bi rûniştineke bingehîn ve diçê. Gava mirov cudanivîsen nivîskar, rojname û kovaran dide ber hev; bêşik newekhevi<sup>6</sup>, lê pêşketin<sup>7</sup> jî, têñ dîtin. Zimanek neketibe dibista-

serê xwe bi ziman êşandine, lê ne mîna pisporêñ, ku bi metodik li ser ziman xebat kirine, mîna kesen xebatê ji kêmûnâ zimanzanîn mîna hobî girtine ser xwe. Ev rewş li ser pêşketina nivîskarêñ zimanê kurdî tesîreke negatîf kiriye û dike jî.

7 Lêkolînvanêñ Kurd yên ku bi metodîn zanistî dixebeitin kêm in. Bi taybetî di zimanzanistî de berhemîn nû piranî ducarkirina karê berê ne. Her du birayê BEDIRXAN (bi giranî Celadet) bingeha zimanê Kurdî danîne, ger mirov bixwaze li ser ziman bixebite, divê berhemîn nû-jentir, pêşketîr bide. Di salêñ dawî de hin xebatêñ pêşketî hene, lê têr nakin, mîna: HAJO 1982, r. 152-294, Xebatêñ Mamoste NEBEZ, hin nivîşen R. ZILAN, rojname WELAT ûwd. Divê em li vê derê navê Ferhangâ İZOLÎ 1987 jî, bînîn ziman ku ji aliyê firebûna ziman de xizmeteke giranbihâ ye.

nan<sup>8</sup> û di ser hin nifşan de derbas nebûbe zimanê kulturî û siyasi zelalbûn û yekbûna wî li anegora vê rastiyê de-reng dikeve.

Kîjan zarave dibe bila bibe ku em bînin ber çav û li anegora pêşketina zimanê dewletî lê binêrin, pir kemasî diyar in. Lê em zimanê Kurdi çi zarava be jî, bidin ber hev, bi hin zimanê ne dewletî ya jî, yên ne fermî, nemaze gelek yên fermî û dewletî jî<sup>9</sup>, emê pêşketineke mezin di zaravê kurdî de bibînin.

Ziman, bi jiyanê ve girêdayî ye. Têkiliya ziman heta ku bi jiyanê ve girêdayî be, ew ziman dikare bijî. Rewşa pêşketina zimanê kurdî bi hemû zaravan, dewlemendî ber bi çav dixe, ev jî, deyndarê hêz û daxwaza gelê Kurd bi jiyanê ve ye<sup>10</sup>.

Herçiqas kemasî û nezelalî, di zaravê me yên din de he-ne jî, emê xwe li ser zaravê Kurmancî<sup>11</sup> kûr bikin. Zimanê Kurdi zaravê Kurmancî, di nav xwe de, ji aliye rastni-vîsê zelalî şanî nade. sedema vê yekê ne ziman bi xwe ye, lê ew kesen kulturî ziman di-

afrînin, bi xwe ne<sup>12</sup>. Gava em bixwazin ber bi zelalîyi biçin, yekbûna ziman, bi kemasî di nav zaravan de, ber bi pêş bi-xin, hin berbihevhatin pêwîst dixuyên. Ziman jiyan e, jiyan dimeşe. Em bixwazin nexwazin bi vê meşê ziman xwe zelal dike. Girîngî ew e, ku em rî li ber zelalbûnê hê bêtir ve-kin<sup>13</sup>. Peşketina ziman bi kultur û pêşketina teknik ve girêdayî ye. Rola rewşenbîri xwe li vê derê şanî dide. Rewşenbîri, di besê xwe de kûr bi-xebite, karê xwe baş pêk bîne, kultur firetir dibe, xwe bi peyvîn nûjen dixemilîne. Ni-vîskar berî herkesi ji xwe re wezîfe bibînin, dikarin bi ni-vîsandina Kurdi ziman fire bikin, pêş ve bibin. Ziman ne tenê bi xebatê zimanzanistî pêş ve diçe, piranî bi xebatê jiyanâ kulturî pêş ve diçe.

Di zaravê Kurmancî de, rastnivîs bi du awayî xwe dide pêş me:

- 1) Awayê Celadet  
Bedirxan,
- 2) Awayê din.

### 1) Awayê Bedirxan ji aliye

gelek Kurdan pêk tê. Mirov dikare bi hin pêşniyazên li gora pêşveçûna demê, Bedir-xan mîna bingeh bigre. Eger Bedirxan ji bo zaravê Kurmancî bingeh bê girtinê, nêzîkbûn û zelalî ber bi wî be, paşê jî, Kurmancî û zaravê din dikarin ber bi yekbûnek biherikin.

**2) Awayê din:** Ew kesen ku ne bi awayê Bedirxan dini-vîsin jî, di nav xwe de, ne yek in; bi gelek cureyan bes dibin, lê bi bingehîn, ji aliye rastni-vîsê ve, di bin tesîra alfabeaya erebî û kirîlî<sup>14</sup> de, mane. Di navbera wan hemûyan de, bi Bedirxan re, cudadî mîna ku di nav wan de, bi xwe heye, ne mèzin e. Cudayî ne tenê ji aliye tîp û rastnivîs e, lê ji aliye rîziman e jî. Her çiqas ew cuda binivîsin dîsa jî, di bin tesîra Bedirxan de ne. Tesîra Bedirxan xwe ne tenê ji aliye tîp, lê ji aliye rîziman jî, şanî dide.

Rastnivîs, di hemû ziman-an de, pirsgirêkeke herî me-zin e. Ji ber ku rastnivîs ne tenê rastnivîsa peyv e. Ji bilî peyv rastnivîsa tîp, lêker, he-vok, bi her awayî rîziman,

<sup>8</sup> Ji dervayê zaravê Soranî, Kurdi li ser bingehêke rast nebûye zimanekî dibista-nî. Perçebûn û bindestiya Kurdistan rî ber pêşveçûna gel û ziman bi hemû zaravan girtiye.

<sup>9</sup> Zimanê Tirkî, zimanekî fermî û dewletî ye, lê gava mirov bi Kurdi dide ber hev qelsî û kemasîyen wî yên têgîştinê ji yên kurdi zedetir in. Ev rews ji bo gelek zimanen ûn jî, mîna yên Kaftakî, Efrîkî ûwd. derbas dibe. Zimanen Kafkazî ji aliye gelkemî û teknikê, yên Efrîkî jî, mîna Kurdi ji ber kolonyalîzmî ji pêşketineke xurtur bi paş ve mane.

<sup>10</sup> Gel û jiyan gelek nêzîkê hev in, bi hev re girêdayî ne. Gelê Kurdi jiyan bi xwe ye. Xurtbûna çand û ziman li aliyejî, lê daxwaza jiyan û pêşketin ji aliye gel ve, ziman heta roja me daye jîkîrinê.

<sup>11</sup> Rastiyeye jiyanâ Kurd heye, ew jî, ev e ku dem bi dem hin zaravê Kurdi ji

yên din pêşdetir dikevin (NEBEZ 1975, r. 108-120): Ev jî, bi têkoşînê ve girêdayî ye. Rewşa dema tê de yî, zimanê Kurdi zaravê Kurmancî pêş dixe. Pêwîstî ji aliye zanîstî, pêşvebirina hemû zaravan Kurdi heye. Divê im li ser hemû zaravê xwe bi çandî û lêkolînî bisekinin, binixnîn, pêş ve bibin.

<sup>12</sup> Di Kurdan de, sazî pey kesan tê. Kes xwe ji sazî girîngîr dibînin û dixin pêş saziyan. Ev rews rast e ji bindestiyê tê, lê bingeha xwe dide eşîparastin û xwespartinâ eşîri. Bindestî û pelixandina netewa Kurd, aliye ji eşîran xwe bi xwe, ji aliye din jî, dijmin kesayeti li ba kurdan biçuk hîştiye; nehîştiye ku kesayetiye netewi yên mezin zêde derkevin û xweparastin pişî sazî û dezgehênet netewi bi ci' bidin girtinê. Ji dêvla sazî û hebûnê netewi, hebûn û otorîteya eşîran û kesen eşîran xwe dana pêş. Kesek serê xwe bi tiştek eşandibe, li ser xebitibe, xebata

xwe -rast ê bi asanî pêk nehatiye-xistiye rwşa parastineke teng. Xwe ji rexnan re vekirî nehîştiye, girtiye. Berbihevçün û sazîdanîna netevî, di nav "otorîte" ya ke-sane de wîda bûye. Pir caran, ew kesen ku xwe otorîte hesibandine yan jî, hatine hesibandinê, bi xwe jî, ne pisporê karê ku kirine, bûne.

<sup>13</sup> Hin "zimanzan" xwe pispor dibînin û naxwazîn ji gotinê xwe dakevin jér. Gava mirov wan rexne dike, xwe ji mirov dûr dixin û nêzîkê karê xurtkirina berbi-heviye nayen. Bi avakirina saziyên netewi-wî, pêwîstî bi guhertina pozisyonen şexsi heye. Pozisyonen şexsi baş in, ger amede bin xwe di nav yên netewi de bihe-lînîn.

<sup>14</sup> Tesîra alfabeaya erebî xwe di kêmki-rina tîpan de, ya kirîlî jî, xwe di zedekiri-na tîpan de, şanî dide. (Binêre: SAGNÎC I-1991/II-1991, KURDO 1981/1990).

niqteşanî ûwd jî, pêwîst e zelal bibe.

Kurmancî, di dîrokê de, ci-yekî taybetî digire. Li ser bingeha devoka Cizîra Botanê gelek berhemên bi nirx hatine nivîsandin. Pişti yekemînserê cîhanê, Kurmancî hêdî hêdî li ser bingeha xurt rûnişt: Ji aliye kî zimanê fermî yê kraliya Berzencî bû, ji aliye din jî, kovar û rojname bi vî zaravî dihatin nivîsandin. Rojnama Kurdistan ku di sala 1898 an de, li Kahîrê dest bi weşana xwe kir, bi zaravê Kurmancî devoka Botanê bû. Dema pêşveçûna nûjen, mirov dikare bêje bi Celadet Bedirxan dest pê dike. Di dema yeke-mînserê cîhanê de, Bedirxan dest bu çêkirina alfabe yekê Kurdi, tîpê Latînî kiribû. Alfabe, ji 31 tîpan pêk hatibû. Pişti ku kovara Hawarê bi tîpê Latînî bingeha xwe xurt kir, hin kovar, rojaname û nivîskarê din jî, bi vê alfabe yekê nivîsandin. Bi vî awayî Bedirxan bi bingeh ji bo zimanê Kurdi zaravê Kurmancî<sup>15</sup>. Lê

ji aliye din jî, zaravê Kurmançî li Sovyetê, bingeha xwe li ser alfabe yekê Latînî û Kirîlî li gora devoka Kurdêr Ermenistanê ava kir. Pişti Şoreşa Oktobrê, di sala 1928 an de bi alfabe yekê Latînî rojnameya "Riya Teze" derçû. Pişti du-yemînserê cîhanê ev alfabe bi alfabe yekê Kirîlî hate guhertin. Sebeb asanbûna çapê dihate şanîdan<sup>16</sup>.

### Rastnivîsa Peyvan

Li ser rastnivîsa bêjeyan zû bi zû zelalî çenâbe, ji ber ku gelek cûrbecûrnîvis ne ji şas-bûnê, lê ji devokan tê. Devok, peyvan li anegora xwe bi lêv dîkin<sup>17</sup>. Lê hin gotin hene ku mirov dikare bigijîne zelaliyê<sup>18</sup>.

Peyv, di Kurmancî de, dikarin cuda bên nivîsandin, lê mane nayê guhertin. Kurdî zimanekî nerm e, dengê wî mîna musikê ye; ji ber vê yekê jî, tîp dubare nayê nivîsandin. Tîpê dubare<sup>19</sup> ziman dişidînin, ev jî, nermiya Kurdî

dîşkîne<sup>20</sup>. Peyvên dubaretîp, bi piranî biyanî ne<sup>21</sup>. Pircaran peyvên biyanî jî, di Kurdî de, xwe nerm dîkin û tîp dubare-bûna xwe winda dîkin. Lê hin devok peyv hişk bi lêv dîkin. Di peyvê de hişk bê ziman jî, divê di nivîsandinê xwe winda dîkin. Lê hin devok peyv hişk bi lêv dîkin. Di peyvê de hişk bê ziman jî, divê di nivîsandinê de xwe nerm bike, bi yek tîpî bikeve nivîsê. Hin kes "pirr"<sup>22</sup> bi du "rr" bi lêv dîkin. Ger mirov bixwaze "pir(ah)" ji "pirr" cuda bike, divê ew ji maneya hevokê derkeve, ne ji zêde û kêmkirin li gora dilê xwe mirov nikare çêbike; wisa be, ne tenê gotinek, gelek gotinê din jî, divê bêz guhertin<sup>23</sup>.

Di Kurdî de li ser rastnivîsa peyvan<sup>24</sup> kaosek heye. Ev kaos hem ji nivîskaran hem jî, ji zêdebûna devok û zaravan tê. Her yek ji me li herêmek, bi zaravek yan jî, bi devokek mezin dibe. Mirov carek bi

15 MATRAS 1989, r. 4-5

16 KURDO 1981, r. 146/MATRAS 1989, r.6/BALI 1992, r. 28

17 Mînak... (jîn/jîyan, ciya /çîya). Eger tîpê "î" û "ê" pişti tîpa: "y" bêne, dibin "î", xwê tenik dîkin. Mînak: "jîn/jîyan", "ci / ciye min-cihê min", "Kurdî / Kurdiya Botanê" ûwd. Ger tîpa "î" veqatandî bê nivîsandin, dikare mîna xwe bîmîne: "ev gundi ye", "tu rîwî yî" (b. BEDIRXAN 1986, 1994).

18 Di zimanê Kurdî de, ci zarav be jî, bi dîrokî tenê tîpê "st" û "sp" bi hev re tê nivîsandin. Weki din hemû peyvân din "î" dîgirin nav xwe. Mînak: "zman" / "ziman", "jmar" / "jimar", "gran" / "giran", "brîn" / "birîn" ûwd. Hin nivîskar û zimançan tevîhev nivîsin. Sedemân nivîsandina wisa ji bîli tesîra Erebî, ji min re ne diyar e. Peyvên bi "st" û "sp" dikarin di pêşketiyê de tîpa "î" nehewînîn, ev form ji aliye dîroka etimolojî rast e. Mînak: "spas", "spar(tîn)", "stîn", "stan(din)", "stêrk", "stûn", "stran", "stîri" ûwd. Li gora min mirov dikare tîpa "î" bixe nav tîpê "st" û "sp" jî, daku ji aliye

form di rastnivîse de zelalî bêtir bê ci.

19 Mînak: "pir / pirr, ker / kerr, xurtir / xurttir".

20 zarave, bi taybetî devok, li gelek ciyan mîna zimanê kesen nezan, zimanê gundiyan hatiye ditin û "ronakbir" nextawîne xwe nêzîkê devokan bikin. baweriyeke newşenbîriya hin welatan li ser devok û zarave ew bûye ku kesen gundihi ziman hişk tînîn ziman. Rastiyeke sîrûstî jî, di vî warf de xwe dide pêş ku ferq di navbera axtaftîne gundiyan çiyayen bilindî û deştan de hene. Rewşa jîyanê tesîr li ser ziman jî, dike. (LÖFFLER 1990, r.37-39.)

21 Mînak: "fiil / fîl, saat / saet, ciddî / cedi" ûwd.

22 b. Rojnama WELAT, kovara NÜDEM ûwd.

23 Mînak: "here / herre!", "pirtük / pirrtük", "pasîv / paşşîv", "yekite / yekkîte", "tt" / "kk" / "rr", "ss" / "ll" ûwd. (BEDIRXAN 1994, r. 22). R. ZILAN pêwîst dibîne ku tîp dubare bibin, piranî jî, di kempirandinê de. Ew, "tîr" mîna formanseke bi serê xwe dibîne û kêmkirina wê qebûl nake. Di vî warf de dixwaze BEDIRXAN "rast" bike, lê bi baweriya min

rêzimanê Kurdî ne ji aliye fonetik, ne jî morfoloji heq nade ZILAN. Binêre: ZILAN 1989-I, r. 86-87.

24 "Ji aliye rastnivîse de, divê her perçeyeke daçekên ku ji yekê bêtir peyvan pêk dîhen, cihe û bi tena serê xwe bêne nivîsandin. Ji ber ku her perçeyek jê xwedî mane û naverokêk ye û peyvên ser-bixwêne. Ji lewre; "ji bo, ji ber, ji rex, ji nik, ji bi, ji hev, ber-bi, li ba, li ser, li bin, li hev di gel" (ZILAN 1989-II, r.75). Ev bêjeyen han û geleken din dikarin bi hevre bên nivîsandinê: "nemîr / serjin / fêmker / binavkirî / berbihev / bêbask / bêbext / bindestî / hevber / hevreg / du-car / dubar / tukes / tutist / herkes / hevbend / hevbes / hevpar / pirkes / hertiş" lewre / daku / binav / bênav ûwd. Hê gelek bêjeyen din hene, ew jî, dikarin bi vê metode bên nivîsandinê. Mana wan cuda û ew bi serê xwe bin jî, ger bêje mîn nav be, bi hev re tê nivîsandinê: "Zehmetkêş, nivîskar, karker, çotkar, pirejin, kalemîr, dilxwîn, cîgerxwîn, dilperî, sahmaran, guhtar, balkêş..." Ji bo etimolojiya nav û bêjeyen binêre: KARTAL 1992, r. 59-126.

devokek hîn bibe, xweguher-  
tin<sup>25</sup> zor e.

### Rastnivîsa Hevok

Hevoksazî, di bin tesîra hin zimanê biyanî de maye. Cararan gava hin kurd dipeyi-vin, mirov dibêje qey ew ne kurdi lê zimanekî biyanî dipeyi-vin. Ger ev, ji guhertin kultura civakanbihata, wê tu gotina me li hember tunebûya; lê rewş ne wisa ye. Rewş ew e, ku gelek kurd bi zimanê xwe baş nizanin û bi rêzimanên zimanên din dipeyi-vin. Pircaran formen devokî yên herêmî ji aliyê nivîskar û zimanzan pêk tê<sup>26</sup>. Mînak hevoka "min kurek heye"/"min keçek heye"/"min bira hene"/"min pere heye" ûwd. Ev form devok e, ne pêwîst e ku mirov bixe nav nivîs û zimanê "bilind". Bi nivîs: "kurekî min heye" / "keçeve min heye" / "birayê min hene" / "perê min heye" ûwd.

Ji aliyê daçek û paşdaçek<sup>27</sup> (Pre -und Postposition) ji, zelalî pêwîst e. Hin nivîskar<sup>28</sup> û zimanzan bi hev re, hin jî, cuda dinivîsinin. Hinek jî, tevlîhev in, hem cuda, hem bi hev re dinivîsinin<sup>29</sup>. Hevoksazî di ziman de ciyekî taybetî digire. Hevok baş saz nebe, giyana ziman nede; raman jî, zelal nayê ziman. Hevoksazî bi xwespeyvîn û xweşnivîs jî,

girêdayî ye. Xwespeyvîn û xweşnivîs (Rhetorik) ji bo têgiştineke asan, raman û ferbûna zelal pêwîst e. Hevoksazî, ne bi form tenê girêdayî ye, bi neqandina bêje û naveroka peyvê jî, ji nêzik ve girêdayî ye. Hevok çiqas kin û zelal be, lihevhatî be, raman ewqas ji têgiştinê re ve-kirî dibe. Di gelek zimanan de, xwespeyvîn û xweşnivîs mîna beşekî zanistî ciyê xwe girtiye. Ji ber ku em hîn di destpêka zelalkirinê de ne, dikarin bingehêke xurt ava bikin.

### Rastnivîsa Tip û Lêker, Pêşneyar ji bo Guhertina Tipan

Diyar û zelal e ku 31 tipen latînî yên ji aliyê Bedirxan, bingehâ wan ji bo zimanê Kurdî hatiye danîn, ci zarav dibe bila bibe têr dike. Ziman tenê bi tipan nikare bê bilêvkirin. Tip tenê ji bo alîkariyê ne<sup>30</sup>. Deng (Phonetik) mîna mirov bixwaze bi tipan nayê ziman, divê mirov ziman guhdarî kiribe daku mirov baş tê bigije. Em bi vî awayî li ziman û fonetika zimanê Kurdi binêrin, emê bibînin, bibihîstîn ku deng û tip gelek mîna hev in, lê ne yek tişt in<sup>31</sup> tipen latînî ji bo hemû zaravê Kurdî gelek baş têr dîkin. Divê mirov tipan kêm bike, lê zêde neke. Zêdebûna tipan ziman giran û teng dike, ferbûna zi-

**Pêşvebirina rastnivîs**  
*bi yekîtiya tipan,  
 pêwîstî bi yekîti û  
 tevlîhevkirina ziman  
 nayne pêş. Yekîtiya  
 ziman li ser bingeba  
 zaravê Kurdî derenca  
 duyemin, sêyemîn e.  
 Zaravê Kurdî yê ku pêş  
 ketibe jî, ji ber ku bi  
 tipen Erebî tê  
 nivîsandin, asteng û  
 pirsgirêkên li pêsiya  
 yekîtiya ziman bi zelalî  
 şanî me dide. Tipen  
 Erebî ji aliyê Kurdên  
 Bakûr, Başûra Biçûk û  
 Sovyeta berê nikarin  
 bêñ xwendin. Tipen  
 Latînî bêñ wergirtin, ji  
 bo Kurdên ku bi tipen  
 Erebî hînbûne jî,  
 zebmetî nade pêş; ew ji  
 xwe piranî bi ferbûna  
 zimanê biyanî mîna  
 Ingilîzî, Fransî ûwd.  
 tipen Latînî dikarin  
 bixwînin û bînîvîsinin*

<sup>25</sup> b. LÖFFLER 1990.

<sup>26</sup> b. WERZEL 1992, KURDO 1983 û 1987, ZILAN 1989-I, II, (UZUN, zimanê wêjeyî bas pêk tîne, lê dîsa jî ji aliyê rêziman û rastnivîs gelek tevlîhevî û kêmasiyan dike, pir caran dvok ciyê kurdiya nivîskî digre, b.: 1984, 1989, 1992-I, II, 1993 ûwd.), Li ser nivîskarêñ din divê bi taybetî bê rawestin. Ji ber ku di warê rastnivîs de, nivîskar piranî ne zalal in.

<sup>27</sup> Termen rêzimanî ne zelal in, herkes bi awayek pêk tîne, ji ber vê yekê ji bo têgiştinê carna termen Latînî pêk tînim.

<sup>28</sup> LÖFFLER 1990, r. 12-13, di zimanen din de jî, ne tenê di zaravan de, nivîskar, bi zimanê bilind jî, pir caran ne mhina hev dinivîsin.

<sup>29</sup> "di...re/de/ve", "bi...ve/re", "ji...de/re/ve". KURDO, SAGNÎC hin nivîskar

bi hev re / BEDIRXAN, HAJO, BALI, ZILAN, TORI, BIÇÜK û gelekîn din cûda dinivîsin lê hinek ji dêvla "e", "a" dinivîsin, "di/bi/ji... ra/da/va".

<sup>30</sup> LÖFFLER 1990, r.72/95.

<sup>31</sup> KURDO 36 heta 38 tipan dihesibîne. Ew hin işaretan li ser tipan zêde dike. Mirov tesîra alfabeaya Kirîji aliyekî, ji aileyî din jî, tesîra tipwergera (Transkription) zimanê zanistî dibîne.

man zor dike.

Ji bo kêmkirina tîpan pêşneyara birêz Ismet Cherif Vanly li ser 5 tîpan heye. Ez pêşneyara birêz Vanly rast dibînim lê bi ferqek: Mirov nîkare bi carekî ve 5 tîpan biguhre, paşê ew her 5 tîp ji hêla teknikî pirsgirêkên mîna hev şanî nadin; pêwîstî bi guhertina 2 tîpan heye ku ew ji hêla teknik û fonetikî pirsgirêkên mîna hev şanî nadin; pêwîstî bi guhertina 2 tîpan heye ku ew ji hêla teknik û fonetikî gelek astengan di xwe de dihewînîn. Ev her du tîp ev in: "s" û "ç" ne. Em dikarin ji bo van her du tîpan çareserî di nav alfabea Kurdî de bibînin: dêvla "ş" "sh" / dêvla "ç" "ch". Bi vî awayî 2 tîp ji alfabea me kêm dibin bê ku di nivîs de guhertinê mezin pêk bê. Ji aliye teknik tu astengî li pêş nivîsê namînin û ji aliye fonetikê ji, 2 tîpêni ji morfolojiya Kurdî re biyanî ji holê radibin. Ji bo tîpêni ku cot têr nivîsandin mîna pirr, kerr, terr ûwd. Zêdekirina tîpan ne pêwîst e, mirov dikare di nav alfabeyle de li çareserîyan bigere. Mînak: kh/th/ph/rh ûwd. Yanî ji dêvla zêdekirina tîp, girtina

tîpekî ji alfabea Kurdî.

Lêkeren kurdî zaravê Kurmancî dikarin bi sê awayî bêr nivîsandin:

a- Lêker mîna lêker, di kîşindina deman de cuda têr nivîsandin, eger hevedudanîji gotineke bi mane ji nav, ya ji, dîrokî pêk hatibe<sup>32</sup> : "ez kar dikim", "ez hînî zimanê kurdî dibim", "em dest pê dikin", "ew dest jê berdidîn" ûwd.

b- Lêker mîna nav bi hev re têr nivîsandin: "destpêkirina karê sibê", "karkirina te", serjêkirina zarok û jinan", "serhildana gel"

c- Lêker, di demêr pasîv de, bi hev re têr nivîsandin û "ê"<sup>33</sup> lê zêde dibe. Mînak: "av tê vexwarinê", "ders hatiye belavkirinê", "gund hatiye valakirinê"

Lêkeren Kurmancî hîn tevlihev<sup>34</sup> dixuyêni, ji ber ku ji gelek devokan pêk têr. Di hin devokan de, lêker mîna hev nayêni nivîsandin, ji ber vê ji, cudanîvis xwe dixe pêş. Lê ev rewseke normal e. Bi zelalbûna ziman wê lêker ji ber bi yekbûnê ve biçin. Lêker gelek cuda ne, hem ji aliye naverok hem ji aliye hevoksazî (Syntax) hem ji, ji aliye formzanî (Morphologie). Wekî din di nav xwe de bi gelek curî beş dibin<sup>35</sup>, lê bi bingehîn mirov dikare bike çar beş:

Lêkeren bingehîn, (Vollverb)

Lêkeren kawzatîf (Kausativ),

Lêkeren rewşê (Modalverb),

Lêkeren alîkar (Hilfsverb).

Ew ji, di nav xwe de beş dibin, mîna têper (Transitiv), têneper (Intransitiv), hevedudanî (Kompositum), veqantandî, (trenbar) neveqetandî (nicht-trenbar) ûwd. Lêkeren hevedudanî ji dîsa bi gelek cûreyî beş dibin. Lêkeren daçekên wan pêşkîtelêker (Verbalpartikel) bin, pêşkîten<sup>36</sup> wan pê re têr nivîsandin. Wekî din di lêkeren hevedudanî de daçekên pêşkîte ji nav, daçek û paşdaçek ûwd. pêk hatibin, hemû cuda têr nivîsandin<sup>36</sup>.

### Rastnivîsa "Rêziman"

Rastnivîsa rêziman, rastnivîsa hemû beşen ziman e. Li vê derê ji "Rêziman" mebest bi giranî formzanî (Morphologie) ye. Rêzimanê Kurmancî heta develekî zelal bûye. Dîsa ji, gelek nezelalî tê de hene. Ev nezelalî pircaran ne di rêziman de, lê di kesan de ye.

Rastnivîsa form, "di/bi/ji...re/de/ve" be. Divê lêkara bûn cuda bê nivîsandin<sup>38</sup>. Eynî tîp hîc dubare nebe, ne di kempirandinê (Komparativ) de, ne di bilindkirinê (Superlativ) de, ne ji, di for-

<sup>32</sup> KARTAL 1991.

<sup>33</sup> KURDO û kurdêni Sovyeta berê ji, piranî tîpa "e" di pasîv de lê zêde dikin.

<sup>34</sup> Li ser form û naveroka rastnivîsa lêkeran: "çûn/çûhîn/çûyîn", "xwendin/xwandin", "xwestin/xwastin", "peyivin/peyivîn", "boğrîn/bihurîn", "gîştin/gîhiştin", "westîn/westîyan/westîhan", "bişâftin/bişâftin", "şûştin/şîştin/şostin". Lêker, ji aliye form û navekorê ve pircure ne. Ji aliye rastnivîsê mirov dikare giraniya xwe ber bi zelaliya awayek bibe, lê yên ku naveroka wan cudamane ne, divê

mîna xwe bimînin, Mînak: "revhin, revyan, revihan, revandin". Lêkeren "revîn", "revyan, revihan" yekmane ne, lê "revin" mîna "revyan" di demêr bilhûr de rast pê nayê; "revyan û revihan" dikarin cî biguhrin, ji ber ku ji aliye mane yet in. "Revandin" manekî cuda di naveroka xwe de dihewîne, lê ji eyñî kokê ye. Ji aliye formzanî ji, nezîkî lêkeren din e.

<sup>35</sup> Ji bo agahdarî li ser lêkeran b. HAJO 1982, BEDIRXAN 1986, KARTAL 1991, ZILAN 1989-1991 (I-VI), KURDO 1981, 1990 ûwd.

<sup>36</sup> Hin pêşkîten rastîn ev in: "ve-, ra-,

der-, da-, we-, hil-" ûwd. binêre: HAJO 1982, r. 82.

<sup>37</sup> Mînak: "ez ... veđixwim, tu... venaxwî, /der/ veke, veneke / em radibin, hun rabûn, / ew... hildidin, we ... hilda / ew derketin, rojname derket...."; "min kar kir, tu kar dikî / ew bar radike, hun bar li kerê dikin / dijmin serf zu jê dike / dersa Kurdî dest pê dike, em dest bi dersa xwe dikin / te lambê pê xist / Kurê Kuto li me dixe, em ji lê (bi)xin / em hîn dibin / hun fer dibin" ûwd.

<sup>38</sup> "ez im / tu yî / ew e / em in / hun in / ew in / ker e / kur e ... ûwd.

mekê din de. Pasîv<sup>39</sup> divê tîmî bi kişandina lêkara “hatin” ê bê nivîsandin. Bi devkî mirov dikare “wer(in)” jî, bi kar bîne, le ne bi nivîs. Zelalî çêtir li ciyê xwe rûdinê, ger tîpa “h”<sup>40</sup> ku di devoka Botanê, di gelek peyvan de heye, neyê nivîsandinê. Li tîpan işaret zêde nebin, yên hene bes in. Gava mirov Kurdi nûjen dike, li ser bingeha giyana zimanê Kurdi, rêziman û etîmolojiya ziman çêbike.

Tewandina navên nêr<sup>41</sup> ne pêwîst e. Wek tê zanîn, gava di navên nêr de “a” û “e” hebin, di tewangê de dîbin “ê” (hin devok: “î”). Lê mirov dikare bê tewangê jî, bi lêv bike û ne şaş e.

Hemû formên pevgirêk (Kopula/ û cînavên paşdanî (enkl. Pers. Pron.) ger ne bi lêkaran bin, cûda têr nivîsandin. Di kişandina lêkeran de hemû paş û pêsekên rêzimanî bi lêkeran re têr nivîsandin, çi rêziman, çi pevgirêk (Kopula) di hemû deman de bi lêker û tê nivîsandin<sup>42</sup>.

### Niqteşanî

Di niqteşanî<sup>43</sup> de, tiştê gi-ring dabir (,) e; ji aliyê pir kesan dabir rast nayê bikaranîn. Pêşneyara min ew e ku dabir (,) her tim piştî “jî” pêk bê. Mînak: “ez jî, têm” / “ûn jî, diçin”. Piştî “jî” her tim bînek tê danê, dabir hebe xwendin

zelaltır dibe. Pir caran pêş û paş: “ji/di/bi...de/re/ve” dabir pêk bê, ji hevxistina hevokê asantir dibe. Pişt û paş “ku” / “û” dabir pêk neyê çêtir e.

(;) Niqedabir; gava hevok naqede û naverokeke nû li pey bê, tê xebitandin. İşaretên ku li ser gotin û hejmaran bilind

dibin, wan ji hev ji hev diqetînin, di zimanê kurdî de, ne pêwîst in<sup>44</sup>. Serenav bi tîpêñ mezin dest pê dikin. Peyvîn navên taybetî, mîna navên pirtûk, kovar, rojname, nivîsîn pankartan ûwd. bi tîpêñ mezin dest pê dikin û nayêñ tewandin<sup>45</sup>.

### C A V K A N İ

- BALI, A. (1992), Rêzimana Kurdi, Türkçe, Açıklamalı Kürtçe Dilibligisi, İstanbul.  
 BEDIRXAN (1986) Celadet, LESCOT, Kurdische Grammatik (Kurmancî-Dialekt), Bonn.  
 BEDIRXAN (1994) Celadet, Bingeja Gramera Kurdmancî, Stockholm.  
 BEDIRXAN (1971) Kamran, Destpêka Xwendinê-Rêzana Zimanê Kurdi (Perçeyen Bijarte), Paris  
 BIÇÜK, Selim, (Xebatên neçapkirî)  
 DUDEN (1963) Das Herkunfswörterbuch (Eine Etymologie der deutschen Sprache), Mannheim.  
 HAOJ (1982) Zaradached, Indo-Iranische Sprachstudien (Inaugural-Dissertatio), Berlin.  
 IZOLI (1987) D., Ferheng (Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî), Den Haag.  
 KARTAL (1991) Hüseyin, Das Kurdische Verbüm, Eine Kontrastive Darstellung mit dem Iranischen, Berlin (unverl. Arbeit).  
 KARTAL (1992) Hüseyin, Navên Kurdi, Kurdische Namen, Osnabrück.  
 KURDO (1981) Qanatê, Zimanê Kurdi, Frankfurt/M  
 KURDO (1990) Qanatê, Gramera Zmanê Kurdi, Kurmanci-Sorani, Stockholm.  
 LEXIKON (1988) Sprachwissenschaftlicher Termini, Leipzig (2. unveränderte Auflage, Hrsg: Rudi Conrad).  
 LÖFFLER (1990) Heinrich, Probleme der Dialektologie-Eine Einführung, Darmstadt (3. durchgesehene und bibliographisch erweiterte Auflage).  
 MATRAS (1989) Yaron, Probleme der Sprachstandardisierung-Am Beispiel der Orthographie des Kurdischen (Magisterarbeit), Hamburg.  
 NEBEZ (1975) Jemal, Die Schriftsprache der Kurden, in: Acta Iranica Leiden (Monumentum H.S.NYBERG).  
 NEBEZ (1976) Jemal, Zimanî Yekgirtûy Kurdi, Amberg.  
 SAGNIC (1991) F. Huseyn, Hêmana Rêzimanê Kurdi, İstanbul.  
 SAGNIC (1991) F. Huseyn, Pêşeriya hewisina zimanê Kurdi, İstanbul.  
 SEMO, Ereb, Dimdim 1983-Stockholm, Jiyana bextewar 1990-Stockholm, Şivanê Kurd 1990-Köln.  
 TORI (1990) Rêziman, Leuven.  
 UZUN, Mehmed, Tu 1984-Stockholm, Siya Evînê 1992-İstanbul, Rojek ji Rojîn Evdalê Zeynikê 1992-İstanbul, Destpêka Edebiyata Kurdi 1992-Ankara, Hêz û Bedewiya Pêñûsê 1993-Stockholm  
 WENDT (1987) F. Heinz, Sprachen-Fischer Lexikon, Frankfur/M.  
 WURZEL (1992) Petra, Kurdisch in 15 Lektionen, Köln.  
 ZILAN, Reşo, Reformek Pêwîst e (di: BERGEH 1-6, 1989-1991)

<sup>39</sup> ZILAN navê pasîv daniye “raweye negerokî”, 1990-V-

<sup>40</sup> Mînak: “Bohtan, çahv,bihn, gihiştin, hanîn/hênan, hajotin, havétin, kahñî, histêrk” ûwd.

<sup>41</sup> “bajar/bajîr, nar/nêñ” ûwd.

<sup>42</sup> “ez ketim/ ketime / diketim / dike-

vim / bikevim / nakedim / biketama” ûwd, “ez im / tu yi / ew e / em in...”

<sup>43</sup> BEDIRXAN, K. 1971 3nşandek” r.33

<sup>44</sup> Mînak: “1994 an de”, “ez ji Amedê me”, 21 ê meha 4 an”, “ez Azadê Miho me”, Binêre: ZILAN 1990-V-

<sup>45</sup> Minak: “Berîvan, Zelal, Ehmedê

Xanê, Bîjî Serxwebûna Kurdistan, Bîjî Tevgera Azadi” / “Pirtiya Karkerê Kurdistan” (ne Partiya Karkerê Kurdistanê), “Roja Welat” (ne Roja Welêt), “Riya Azadi” (ne Riya Azadiyê), “Dengê Yekîti” (ne Dengê Yekîtiyê), “Kûrê Ehmed” (ne Kurê Ehmed) / Ehmedi) ûwd.

# Bi Zarawayê Xwe Ve

## K U R D I

### TORI

**D**i navbera zimanê ji ripinekî hatî an jî zimanê xwediyê hev de pêşî zimanê dêmakî heye. Zimanê ji ripinek hatî û zimanê di malbatekê de ji wî zimanî derdikeyî holê. Herwekî, ji dîroka kevin ve, di nav qeflîn zimanê gerdûnî de, zimanê Îndo-Ewrupî heye. Ev ziman di erdnîgareke gelek firah de di hate axaftin. Ji vê sebê ev ziman di nav xwe de diveqetiya

gelek liqan. Liqa zimanê Îndo-Îranî şaxek ji qefla zimanê Îndo-Ewrupî ye. Ev liq di nav xwe de diveqetî beşa zimanê Dardic (Dard), Îndic (Sanskrit) û Îranî. Kurdî bi zimanê Pashto, Baluchî, Sogdian, Avestan û Persiya kevin ra dikevî nav liqa zimanê Îndo-Îranî (1).

Ji vir dema ko em dakevine ripinê Kurdî, pêşî têkiliya Kurdî û zimanê Îndo-Ewrupî derdikeyî ber me. Pişt ra em Kurdî di nav liqa zimanê Îndo-Îranî de, zimanekî bixweser dibînin. Ji vê jî danasiyekê Kurdî derdikeyî holê. Ev danasîn di awayê, Kurdî navê zimanê kurdan e. Bi damezrîna xwe ve dievî nav zimanê Îndo-Ewrupî û bi rûçikên xwe, xwe ji zimanê qefla tê de bi xetine sitûr diveqetêni.

### Têkiliya Kurdî-Zimanê Îndo-Ewrupî

Cihgirtina Kurdî di nav qefla zimanê Îndo-Ewrupî ne pîşadî (tesadufî) ye. Kurdî bi damezrîna xwe di nav vî zimanî de cih digî û bi rûçikên damezrîna xwe digihêne hevdu. Ev rûçik:

**1-** Kurdî zimanekî tawangbar e. Ji vê, hin wûşeyen Kurdî, xesma yên rakişayî, bi standina lêkan di damezrin. Lêkên peşgîr, navgir û paşgir têne paş, nav û paş wûşeyen hêsan, bi

wan wûşeyan ve dibin. Ji wan wûşeyan wûşeyine nû radi-kişenin. Di Kurdî de sêzdeh (13), lêkên peşgîr, dido (2) lêkên navgir, bîst (20) lêkên paşgir hene.

**2-** hin wûşeyen Kurdî, ji vê tawangbariya xwe, dengê bin-yada xwe diguherenin. Herwekî, wûşeya (dê), di erka banaşan de dibî (da). Nîse:

**- Dayê tu di vî warî de qet mitale neke.** Bixweser di awayê (dê) bixweser de xwe na-guherenî. Nîse:

**- Dê û bavê wê li malê ne.** Di vegetanan de di awayê (di) de tê gotin. Nîse:

**- Diya wî gava din ji tanurê dihat.**

**3-** Wûşeyen Kurdî, layî wûşeyen zimanê din Îndo-Ewrupî, bi piranî bi tîpêng dengdar **b,d,f,g,k,p** dest pê dikin. Wûşeyen ko bi dengdarên **I,r,s** dest pê dikin, di pay wanen de tê. Ev neh (9) tîp ji tîpêng din dengdar bêhtir di serê wûşeyen Kurdî de cih digirin. (2) Di vî warî de me ji xwe ra deh (10) hazar wûşe ji xwe ra enbaz girt. Ji van deh hazar wûşeyen **b=750, d=550, f=150, g=350, p=550, r=600, s=di** serê 250 wûşeyî de cih digirin. Hejmara van wûşeyen ko bi tîpêng jor dest pê dikin 3830 wûşe ne. Di deh hazar wûşeyî de 7170 wûşe bi 22 tîpêng din yên dengdar dest pê

*Ji aliyekejî ev têvelî  
dibine rûçikên wan  
koman û eşîrên di nav  
wan koman de ji  
diberdine ser hevdu. Ji  
vê em di lêkolînên xwe  
de Hurrityî û eşîrên  
Hurrityî, ango Mittaniyî,  
Nabriyî, Urartuyî,  
Luluyî, Gutiyî, Kassiyî,  
Mannaiyî û Medîyan di  
yekîteyekê ziman, bir û  
bawerî de dibînîn. Ev  
rûçik bi taybetî  
ragibana Kurdan û  
wanan gibaştandine  
roja me.*

dikin. Tê vê yekê ko piraniya wûşeyên Kurdî layî wûşeyên Îndo-Ewrupî bi tipêñ dengdar yên jorîn dest pê dikin.

**4-** Heyina gelek kîten bergirtî rûçikeke din ya zimanêñ di qefla Îndo-Ewrupî ne. Di van zimanen de hege wûşe yekkîte bî, teqez ew yekkîte, kîteyeke bergirtî ye. Anglo bi tîpeke dengdar diqedî. Ev rûçik di Kurdî de jî heye. Herwekî, di deh hazar wûşeyên Kurdî de 700 wûşeyên yekkîte yên bergirtî hene. Nişe, dohn, nerm, birk, werz, baq, dar, çav, gav, av, ax, ol, êl, ûyd.(3)

### Kurdî Di Nav Zimanêñ Îranî De Zimanekî Bixweser e.

Herêmêñ ko, di roja me de Kurd lê dijîn bi rûçikêñ xwe yên sirişti û kulturî de di tevayî- yekê de ne. hege em bivêñ tu-xûbêñ van navçeyan xêz bikin, welatekî ji rojava çiyayêñ Amanus, ji rojhîlat, rojavaya bakura ïran, ji bakur, navçeyen bakura çiyayê Agirî, bakura bajarê Malatya, ji başûr, bilindcîhêñ (plato) Sûri, nêzîkî kendawa Basra derdikeyî pêşberî me. (4) Di nav van navçeyen herî farah de, layî ko ger belgeyên kevnare (ärkeolojîk<sup>7</sup>) yên berî dîrokê, ger yên heyama dîrokê nîse dîkin, zimanêñ wanen Îndo-Ewrupî, eşîrên Arî dijîn. îsa li goravan belgeyan, di navçeyen cîran de, dîsa zimanêñ wanen Îndo-Ewrupî geline din dijîn. Lî di navbera ger damezrîna ziman, ger bîr û beweriya olî, pergala herdu alî gelan, angô di navbera eşîrên Arî û cîranêñ wan de têveline girng hebûn. Dema ko li van herdu koma ge-

lan hate lêkolîn ev têvelî van koman bi xetine situr ji hev di- veqetîni. Ji aliyeke jî ev têvelî dibine rûçikêñ wan koman û e- şîrêñ di nav wan koman de jî di- berdine ser hevdu. Ji vê em di lêkolînêñ xwe de Hurriyî û e- şîrêñ Hurriyî, ango Mittaniyî, Nahriyî, Urartuyî, Luluyî, Gutiyî, Kassiyî, Mannaiyî û Medi- yan di yekîteyeke ziman, bir û bawerî de dibînîn. Ev rûçik bi taybetî ragihana Kurdan û wan- nan gihaştandine roja me.

### Têveliya Di Navbera Eşîrên Arî û Gelêñ din Îndo- Ewrupî, Nêzîkayiya Eşîrên Arî û Kurdan

Ripînê gelan bi ziman, ango bi damezrîna ziman tê nasîn. Nexwe dema ko me damezrîna zimanê ripinê Kurdan eşîrên Arî û xesma zimanê Sumer û Hî- titiyan da ber hev, emê bi hêsa- ne bibînin ko ew herdu qeflê gelan ko zimanêñ wanen di nav koma zimanê Îndo-Ewrupî bûn, zimanine ji hev cida ne. Herwekî,

bin jî, seba ko bi hev ra, di nav hev de dijîn, gelek wûşeyên su- merî di zimanê gelê samî ango zimanê ereban de têne dîtin. Tê vê yekê ko smerî ne eşîrêñ arî, gelê samî xistine bin bandura kultura xwe. Persî jî bi riya Ele- miyan ketina bin bandura Su- mer û Elamiyan. Herwekî, jî nezikî du hazar wûşeyên Sume- rî ko di ber destê me de ne, zî- zîkî pêncih wûşeyên Sumerî, di erebiya roja me de têne bikara- ñîn. Nişe:

elû=elî=berz, bilind, a- hu=ahî=bira, sûqo=soq=se- qem, matû=mewt=mirin, nû- rum=nur=ronahî,zîma=sî- ma=rudeyn, qarnu=qirn=siti- ri, rêsû=ras=ser, erbettu=er- bea=çar, abu=abu=bav, ba- bu=bab=derî, imeru=ih- mar=ker, kullatu=kullu=tev, marrumirra=tehl, kima=ke- me=layî, kalbu=kelb=sa.(5)

**2-** Nêr, mî û dulayenî di wû- şeyê Sumerî de nîne. Pêwanê vegetandekêñ Sumerî dawîne nedisandin. Herwekî,

giş=dar, haşhur=sêv, tûg=kevot, pêş=hêtir.

gişaşhur=dara sêvê, giş- tug=dara kevotê, gişpêş=dara hêtirê.(6)

Di mijara vegetadekan de, di destê me de ti nîse ji Hurriyî nî- nin. Li hember vê, emê nîseyê seba ko zarawayek ji Hurriyî ye, ji Urartuyî bidin.

**Hal-dî-î-e / e-û-rî-î-e / Me- î-nu-uû-a-se / Îş-pu-û-î-nî-hî- nî-şê=Xaldiyê efendiyê kurê Îşpunî, Menua.(7)**

Vegetandeka jor, layî ko bi Kurdî hatî nîşekirin, vegetande- kîke rêsda ye. Layî ko di vege- tandekê de tê dîtin navêñ xaldî, efendî, Menua û Îşpunî dawne- ya (e) sitandise. Ev dawîne di

Sumerî	Hurriyî	Urartuyî	Kurdî
Şamu	êza	êşa	azman
akulu	at	at	xwarin
abu	at.aj	at.aj	bv
zîkaru	tara	tara	nér
waladu	han	han	zayîn
ummu	zîzzî	zîzzî	de

Herçend eşîrên Hurriyyî de- weletên xwe nedamezrîna bin jî di heyamekî de, li kêleka hev de jiyyîyan. Lî layî ko di nîseşeyâ jor de hatî diyarbûn, ti nêzî- kayî di nav wûşeyên herdu zi- manan de nîne. Li hember vê, ew zimanêñ wanen ji hev cida

veqetandekêن Kurdî de (ê) ye. Bu vê wekheviyê Hurrî-Urartû-yi-Kurdî derdikevî holê.

Têvelî di navbera Hîtîtî û Hurriyî jî hene. Ev têvelî, Kurdî û Hîtîtiyê jî ji hev diveqetêni. Herweki,

**1-** Navê Hîtîtî yêñ hêsan dawîneya (a) disitênin. Em vê rûçikê di Fransî de jî dibînin.

**2-** Navê Hîtîtî yêñ serenav û hevenav dawîneya halê navan (s), (Ş) disitênin.

**3-** Wûşeyêñ Hîtîtî, layî wûşeyêñ Grekî û Ermêni, bi dengê (r) dest pê nakin.(8)

**4-** Di wûşeyêñ Hîtîtî de lêka pirhejmarî tê serê wûşeyê. Nîşe, bînu=law, zuh=fotik, wûşeyêñ Hîtîtî bi lêka (le) pirhejmar dibin. Pêwanê “lebînu” û “lezuh” pirhejmariya wan wûşeya ne. Layî ko di nişeyan de tê ditin, lêka pirhejmar tê pêş wûşeyan û bi wanen ve dibin. Ev rûçik ne di Hurriyî û jî di Kurdî de heye.

**5-** Di veqetandekan de Hîtîtî û Hurriyî ji hev diveqetin. Herweki, Hepat navê xwedaya Hurriya ye. Ev xweda ji aliyê Hîtîtiyan jî dihate pîrozkirin. Navê kurê xweda Teşsup û xwedaya Hepat di nav Hîtîtiyan de Şarruma bû. Dema ko Hîtîtî viyan navê kur û dê xwedayan bi hevra bibêjin, di wayê Hepatşarruma de digotin. Lê dema ko keç an jinêñ Hurriyî navê xwedaya Hepat bi ser navê xwe ve bikin, navê Xepat dihate pay navê wanen. Bi gotineke din, di veqetandekan de navê veqetandî di pêş navê veqetanê de cih digirt. Nîşe: Pudu Hepat, Đadu Hepat, Muşu Hepat, Gilhu Hepat. Evveqetandek yêñ Hurriyî ne. Layî ko me li jor Nîşe kir, ev rûçik di Hîtîtî de nî-

ne. Lê dema ko em bivêñ veqetandekêñ jor yêñ Hurriyî bi Kurdî bibêjin, navê veqetandî dawîneya (a) bisitenî. Bi vê dawîneyê ew nav layena xwe ya mî jî diyar dikî. Bi vê ew veqetandek di awayê Puduya Hepat, Daduya Hepat, ûyd. de têne gotin û nivîsandin.(9)

**6-** Hîtîtî, layî Sumeriyan, di destpêkê de hespî nas nedekirin. Sumerî ji dêla haspan keran di karêñ xwe de bikar dianîn. Ji vê, navê (ansu kur-ra), ango kerî kuvi di Sumerî de cih girtî bû. Ev nav ji aliyê Aqqadiyan buhurte Hîtîtî. Ew jî layî Sumeriyan navê ansu-kur-ra bikar dianîn. Bi têne, di sala berî mîladê 1500'an, bi têkiliya Mittaniyan civaka Hîtîtî hasp nas kîrin. De xwedîkirina haspan fêri wanen bikî, di navê Kikkuli de, kesekî Mittaniyî birine welaletê xwe. Ev kes Hîtîtiyan fêri xwedîkirina haspan kir. Nivîsareke Kikkuli di navendiya Hîtîtiyan, bajarê Hattuşaş de derkete holê. Kikkulî di vê nivîsara xwe de, karêñ ko di rojan de, di xwedîkirina haspan bê kîrin, nivîsandiye. Di vê nivîsara xwe de Kikkulî hejmara rojan di awayê (eka), (tiera), (panca) de

bikar aniye. Ev nav di Kurdiya roja me de di awayê (ek=ye), (panc=pênc) de ye. Dawîneya (a) ya di dawiya hejmarêñ Mittaniyan de, dawîneya Kurdî ya rîzda ye. Nîşe: yeka, diduwa, sisiya, çara pêncâ ûyd. (10)

Eşîren Arî hasp û şeref yek digirtin. Pêwanê kesêñ navdar navê hasp dianîn pay navê xwe. Ji vê, du qiralêñ Hurriyî yêñ bajarê Kummux di navê Kundaspî û Kuştaspî de ne. Wûşeyê (aspî) di Kurdî de di awayê hasp an jî asp de ye.

### Hurriyî Ripinê Kurdî ye

Bi berhevanîna damezrîna Hurriyî û Kurdî ji ailyekê wê têkiliya Kurd û Hurriyî biçespêni, ji aliyê din, seba ko ripinê gelan bi ziman, bi terxandina damezrîna ziman tê nasîn, wê ripinê Kurdan ragihêñi Hurriyan û eşîren Hurriyî.

Di berhevanîna Hurriyî û Kurdî de damezrîna wûşeyan wê ji me ra bibine enbaz. Lê di vê berhevanînê de ger neyê jibirkirin ko di navbera destpêka Hurriyî ya heyamên dîrokê pênc (5) hazar sal buhurîne. Ev pênc hazar sal gelek tişt bixw-

*Di berhevanîna Hurriyî û Kurdî de damezrîna  
wûşeyan wê ji me ra bibine enbaz. Lê di vê  
berhevanînê de ger neyê jibirkirin ko di navbera  
destpêka Hurriyî ya heyamên dîrokê pênc (5)  
bazar sal buhurîne. Ev pênc hazar sal gelek tişt  
bixwerekirine. Di jiyana civakan de gelek guberin  
bûyîne. Ev guberinbi teybeti we ra wûşeyine nû  
anîne. Ev wûşe bûyîne mebesta derketina  
zarawayan. Lê azînêñ damezrîna ziman nebatîne  
guberin. Ew azin xwa parastine û bi Kurdî ra xwe  
ragibandine roja me.*

rebirine. Di jiyana civakan de gelek guherîn bûyine. Ev guherînbi teybetî we ra wûşeyine nû anîne. Ev wûşê bûyîne mebesta derketina zarawayan. Lê azînên damezrîna ziman nehatîne guherîn. Ew azin xwa parastine û bi Kurdi ra xwe ragihandine roja me.

Hurriyî belayî tev navçeyêن Eşaya Pêşîn ya kevin bûyiye. Ji wir Enedoliya kevin, bakura Surî, çiyayêن Med xistiye bin bandure xwa, bûyiye ziman kultureke herî kevin û bixweser. Bi nasîna vî zimanî wê ew kultur jî bê nasîn.

Di van salêن talî de belgeyek di kolan û vedanan de derketiye holê. Ev belge ji qiralê Mittaniyan Sauşsattarê yekemîn mayîye. Nivîsara vî qîralî di şeşsad (600) rêzî de ye. Li gora lêkolanzan Porckes, zimanê ko di vê belgeyê de cih girtiye, zimanekî tawangbar e û di nav koma zimanêن Indo-Ewrupî de cih digrî. Dîsa ev ziman yê milê Zagrosê hatiye nîşekirin. Em ji vê jî tê dgihin ko zimanê milê Zagros, di nav zimanêن Indo-Ewrupî de cihek bixweser digrî.

Di belgeyêن di ber destê me de, di derbareyî dengsaziya Hurriyeî de bitenê nîşeyek heye. Ev nîşe, dendêra kurt (u) û ya dirêj (û)ye. Herwekî, di nivîsareke Hurriyan de hevoket heye. Ev hevok di awayê (Te-e-eş-şu-u-up      gu-lu-u-u-u-şa= Xweda Teşsup got.)ye. Layi ko di nîşayê de tê dîtin (u) di wûşeya (Teşsup) de kurt, ya di wûşeya (got) de dirêj e. Bu van herdu dengdêran Kurdi xwe radiğihêنî Hurriyî.

Di warê wûşesaziyê ango damezrîna wûşeyan de çend wek-

hevî hatine çespîn. Herwekî:

**1- Têkiliya di warê yekhejmarî, pirhejmarî de.**

Wûşeyêن Hurriyî layî yên Kurdî bixweser pirhejmar na-bin.

Wûşê di hevokê de, di erka veqetanê, tîrker û pêger de pirhejmar dibin. Di rewşa pirhejmariya lêkera hevokê de wûşê dawineya pirhejmarî nasitênî. Lê dîsa pirhejmariya xwe girêdayî lêkerê diyar dikî.

Di Hurriyî de, layî Kurdi sê (3) dawîneyêن pirhejmar hene. Ev dawîne (na), (la), (ar/er) in. Wûşê bi sitandina yek ji van dawîneyan pirhejmar dibin. Dido ji van dawîneyan, di rawşinande, di erkeke de têne bikaranîn. Di rawşînan de jî di erkine têvel de têne bikaranîn.

### Nîşe:1

**1- taş=dıyarî, tîwe=gotin, paşîthe=qasid. Pirhejmariya van wûşeyêن, taşena=diyariyên, tîwena=gotinêن, paşşît-hene= asîdîn in.**

**2- duruhhî=xwedayêن nêr, duruhhîna=xwedayêن nêr. enna Şamuhahîna=xwedayêن Şamu-hayî.**

### Nîşe:2

antî=ev, ul=hin, şuanna=ew. Pirhejmariya wanana antîla=e-van, ulla=hînin, şualla=ewan in.

Di pirhejmariya wûşeya ul=hin de, di navbera wûşeya kurdî de têvelî heye. Pirhejmariya Kurdi (hin) bi zelalî ne diyar e. Pêwanê dawîneya (in) di sitêni. Lê layî di nîşeyê de tê dîtin, di Hurriyî de wûşeya (ul) ko di ramana (hin) de ye, layî wûşeyan din dawîneya pirhejmarî (la) disitenî.

### Nîşe:3

(tee-ir-ra Tesup-iv-na da-i/parşîa= Nanê xas tixine (te-e)'yên xweda Teşup.)

Layî ko di hevoka jor de tê dîtin, ger wûşeya (tee) bê pirhejmarkirin. Lê di hevokê de navê (Teşup) bi standina dawînya (na) ne xwe, wûşeya pêş xwe (tee) pirhejmar kiriye. Di Kurdi jî ev rûçik heye. Di hevokê de ne peywiste ko tev wûşê dawîneya pirhejmarî bisitênin. Wûşeya talî, bi sitandina dawînya pirhejmarî, wûşeyêن ber xwe jî pirhejmar dikan. Nîşe: - Şal, şapîk û goreyêن xwe dane hev. Di nîşeyê de wûşeya (gore) bi sitandina dawîneya pirhejmar (ên), wûşeyêن (şal), (şapîk) jî pirhejmar dikî.

Di Kurdi de layî Hurriyî, di Kurdi de jî sê (3) dawîneyêن pirhejar hene. Ev dawîne (ên), (an) û (in/ina) ne.

**2- Têkiliyadi warê lêkên ko ji navan nav didamezrînen.**

Bi sitandina dawîneya (hî) di Hurriyî de ji navan nav didamezrin. Herwekî, papa=çiya, papahî=çiyayî. Kîzwatna-hî=Kîzwatnayî, Kubuş-na=Kubuşnahî=Kubuşnayî, İştir Luptuhî=İştara Luptuyî.

Layî ko di nîşeyê de tê dîtin hemberî dawîneya (hî) di Kurdi de (yî) ye. Hege wûşê bi tîpeke dengdar biqedî, ew dawîne di Kurdi de di awayê (i) de ye. Di-yarbekîri, Mêrdînî, Deşti üyd.(11)

### Zarawa - Devok

Guherîn rûçikeke bingehê ziman bixwe ye. Çawa ziman di nav xwe de sereqet di guhertinê de bî, komek ji civaka ko wî zi-

manî diaxivî, ji mebestine têvel, di navçeyinan an jî di tevayiya welat de, ji zimanê giştî diveqetin, zimanênen xwe diguherênin. Ev veqetin, guherîn çarina ewqas mazin derdikevine holê ko, di daxwîyana zimanêne têvel de di dabin. Hege hin zarawa bi xetine sitûr xwe ji zarawayen din diveqetênin, ji vê sebê ye.

Zarawa, awayekî têvel yê zimanekî ye ko di navçe an wela-tan de, ji aliye kesan, dîsa di ye-kîtiya wî zimanî de, tê axaftin e. Ji vê, di navçeyen gelek nêzî-kî hev de zarawayine têvel têne axaftin. Herwekî, navçeyen Bohtan, Bahdînan, Metînan û Soran çend ji van navçeya ne. Ev navçe li rex hev in, lê di van navçeyan de zarawayine têvel têne axaftin. Di van navçeyan de, di bajar an çend gundan de têvelîne din biçük hene. Ev têvelî ji devok in.

Bi lekolîna guherîna wûşeyan, dengen û wûşesaziyan tu-xubêñ zarawayan têne danîn. Di taliya lêkolîneke di wan mijaran de zarawa û devok derdikeviñe holê. Lê mixabin hêj ev lêkolîn di nav Kurdan de neha-tiye kirin.

Zarawa bê goman di taliya hin bûyeran derdikevine holê. Ev bûyer di van awayan de hatine çespandin.

**1-** Veqetana zarawayan bi pi-ranî di warê wûşê û dengen de têne dîtin. Di tawanqbarî û wûşesasiyê de, di zimanê giştî de ev guherîn gelek nayêñ dîtin. Nêxwê daxwîyana zimanê giştî ne wûşê û deng in. Tawangbarî û wûşesazi yekîtiya ziman ra-ber diki. Hege tawangbarî û wûşesaziya zarawa û zimanî giştî yet bin, ew zarawa di ye-

kîtiya wî zimanî de ye. Seba ko heyam têñ mitêl ji aliye mirovan hew têne bikaranîn. Bi rabûna vê mitêlê ji jiyana civakê, wûşeya ko navîtiyê ji wê mitêlê ra dikir jî hew tê bikaranîn û piştî midekê ew wûşê winda dibî. Ji dêla wê mitêline din bi navê xwe ve dikevine jiyana ci-vakê. Lê ne ew e ko mitêla bi navê xwe ra ji jiyânê rabû, ji te-vaviya welat dirabî. heye ko ew mitêl li navçîne din welat, ji aliye mirovîn wê navçeyê hêj wê bi salan bê bikaranîn. Di taliya wê de jî wûşeya hemberî wê mitêlê hêj wê bijî. Bêgoman ev bûyer di zimanê gelêrî de têveliya wûşê û dengen bi xwe ra têni. Ev tevelî ji mebestek derketina zarawayan ye. Lê dîsa wûşeyen ziman bixwe bi hêsanî winda nabin. Wûşeyen ziman bixwe enceq di hezer salî de ser

*Hurriyî di  
Mezopotamyaya jorîn  
de dewlet, navçeyine  
kulturî damezrandin.  
Li gel kultura Babil û  
Misir, bi kultura xwe  
cib girtin. Bi vê  
kulturê di dîroka  
rojhilata navîn de,  
guherînîne giring pêk  
anîn. Di nav van  
guherînêñ ko Hurriyî  
pêk anîn de  
damezrîna dewleta  
Mittanî ji heye.  
Piraniya gelê dewleta  
Mittanî eşîrîn Hurriyî  
bixwe, bindik ji  
wanan ji ji eşîra  
Mittaniyan bûn.*

sadî bîst (%20) winda dabin.

Wûşeyen ziman bixwe, wûşeyen yekbûyî ne. Wûşeyen yekbûyî jî, wûşeyen ko bi yekbûyina wûşeyen têvel in. Herwekî, wûşeyen ser, dil, ber, der bi wûşeyen din re yek dabin, wûşeyen yekbûyî didamezrînin. Nişe: serketin, dilxwazî, bermelin, derketin ûyd.

hen wûşê di ziman de gelek têne bikaranîn. Ev wûşeyen ko gelek têne bikaranîn, wûşeyen ziman bixwe ne. Ev wûşê di texlitê cihnavêñ kesin de ne. Herwekî, cihnavêñ kesin ez, tu, ew, em, win, ewan, min, te, wî, wê, me, we, wan, xwe. Ji cihna-va girekî (ko) cihnavêñ pirsı-yarkî (kî), (çi) cihnavêñ işarkî (ev), (ew), (ewan), (yê), (yên), (ya), (yan), cihnavêñ nebinav-kirî kes, tukes, filan, bêhvan, hemû, gişt, tev, ûyd. ji van wûşeyen ziman bixwe ne. Wûşeyen di texlîta gehînek de jî ji wûşeyen ziman bixwe ne. ev wûşê di saline gelek dirêj de heyinêñ xwe di zimanê gelerî de diparêzin. Ev wûşê (bi), (li), (di), (ji), (ra/re), (va/ve), (da/de) ne. Dema ko me li tev zarawayen Kurdi lê kola, emê heyinêñ wan wûşeyen ziman bixwe bi hêsanî bibînin. Li hember vê, wûşeyen din, ji me-bestêñ ko li jor hatine derpêski-rin, têne guherîn. Li gel vanan di nav zarawayan de dengen wûşeyen xwe diguherênin. Herwekî, diran bûyiye didan, berbûyiye befr, bêvil bûyiye poz, difn, kepo.

**2-** Di têveliyen ziman de bû-yerîn civakî û dîrokî cihekî ge-lek giring digirî. Bi qelsketina dewletê hejmara zarawayan bêhtir dabin, bi xurtbûyina dew-

letê hejmara zarawayan kêm dibin. Dema ko doliwa dewletê gihaştâ pergaleke navendî zara wa ji hev naveqetin.

**3-** Mercên erdnîgarî jî di tevayiya ziman de cihekî girîng digirî. Devokêñ navçeyêñ bilindcihan têkîlî pêşveçûyina devokêñ rastnaviyan nabin. Ew û pêşveçûyîna xwe ya teybîtî bixweser dimînin. Cihêñ ji navvendiyan dûr, li raserî an paş çiyayêñ herî bilind, cihêñ ko rê û rîçik naçinê jî di vî awayî de dimînin. hege ev der gelek bin, bêgoman wê hejmara zarawa û

qelaçen rojavaya çiyayê Zagros bûn. Milê din eşîrên Hurriyî di bakur û nîvroja çiyayê Zagros de bi navê Gutî û Lûlû de dijîn. Hîtîti di sala berî mîladê du hazzaran de ji rojhilat ve ber bi Enedoliya navendî, dest bi koçê kir. Di vê koçê de, eşîra Kassî, ji navçeyêñ li rajora robara Dicle rakir. Kassiyî di ber pêşawatiya qirala xwe Gandaş (1732-1717) de koçî navçeyêñ başura çiyayê Zagros kirin. Li wir di navçeya Luristan de bi cih û war bûn. Berî ko Kassiyî koçî navçeya Luristan de bi cih û

di navbera robarê herdu Zapan, ber bi bakura Mezopotamya, bakura Surî, ta Hatay, Endolê, ta navçeya Kizzuwatna (Çukurova), ji wir ta neqebla Gulek koçeke giran ya eşîrên Hurriyî dest pê kir.

Koça Hurriyan ne bi carekê, hino hino û bi qeflan dibûn. Di navçê û welatêñ ko Hurriyî koçî kirin gelên Hattiyî, Luviyî, Palayî û gelê Samî dijîn. Hurriyî di van navçeyan û welatan de bi wan gelan ra di aşitîyê de, li rex hev bi cih û war bûn. Seba ko dest nedane mafêñ wan gelan, di navbera wanân de, di ti heyamî de şer nebûye.

Hurriyî di Mezopotamyaya jorin de dewlet, navçeyine kültürî damezrandin. Li gel-kultûra Babil û Misir, bi kultura xwe cih girtin. Bi vê kulturê di dîroka rojhilata navîn de, guherînîne giring pêk anîn. Di nav van guherînîn ko Hurriyî pêk anîn de damezrîna dewleta Mittanî jî heye. Piraniya gelê dewleta Mittanî eşîrên Hurriyî bixwe, hindik ji wanân jî ji eşîra Mittaniyan bûn. Tuxubê dewleta Mittanî ji rojava bajarê Qergamêş, navçeyêñ derdora robarê Belh û Xabur, ji başur Mezopotamyaya jorîn ta bajarê Nisêbîne, ji rojhilat dirêjî ta çemê Bedlisê dibû, Di navçeyêñ din de, angô li başura navçeyêñ çiyayê Toros, navçeyêñ rajora Dicle, Ferat, navçeyêñ derdora gola Wanê, ta rojavaya Gola Urmiye de eşîrên din Hurriyî, angô eşîrên Naîri, Urartuyî dijîn.

devokan gelek bin.(12)

De mijar hêj bi awayekî zelal bê halîbûn, em wan bûyerên dîrokî û mercên erdnîgarî hej ve bikin.

Hurriyî di pergala eşîrtiyê de dijîn. Eşîrên Hurriyî ji destpeke ve veqetiya bûn du milî. Milek ji wanân di sêcikî robarê Xabur, Diyala, gola Wanê de dijîn. Hin ji van eşîran jî li derdora vê sêcikê de bûn. Ev der, navçeyêñ, rajora robara Dicle, bakura çiyayê Ararat (Agirî), navçeyêñ rojavaya gola Urmîye û

war bûn. Berî ki Kassiyî koçî navçeya Luristan bikin, li wir hin eşîrên Gutiyî û Luluyî dijîn. Bi koça Kassiyân ev eşîr tevlû Kussiyân bûn. Kasisiyî ji wan eşîran fêrî hesinkerî fer bûn. Destpêka bronzen Luristan ew hesinkerî ye.

Di heyama qiralê Aşşur Şamsî Adad (1748-1760), qiralê babîl Hammurabî (1728-1686) û di heyama qiraltiya bavikê 12'an yê Misirî, ji navçeyêñ derdora gola Wanê, rojavaya çiyayê Zagros, ji navçeyêñ

Dewleta Mittaniyan li hember eşîrên Hîtîtiyan gelek qels ket. Pêwanê we li ber êrîşen Aşşuriyan negirt. Di sala berî mîladê 1200'an de ruxa. Bi ruxîna

dewleta Mittanî, eşîrêن Hûrriyî ji navçeyêن û welatên ko koçî kiri bûn xwe kişandine navçeyêن rojhilata robara Ferat.

Eşîrêن Hurriyî li wan navçe û welatan nêzîkî çarsed (400) salî mayî bûn. Di vê heyama gelek dirêj de, bi têkiliya gelên din, bi taybetî di zimanên wan-an de hin guhertin bûyî bûn. Ev guherîn di Hurriyî de bû mebesta derketîna zarawayan. Ji vê di dîroka Kurdan de cara yekemîn, di navbera eşîrêن koçkirî û yên dêmanî, ango yên koçnekirî, bi gotineke din, di navbera Naîrî-Urartuyî û eşîrêن Mittaniyî û eşîrêن din ko li rojava mayî de têvelî çê bû. Bingehê wan zarawayê wan navçeyan ji wî rojê ve hatiye danîn, ta roja me dom kîrine.

Layî ko ji aliyê gelek lêkolanzanan ve derketî holê, di navbera zimanê Hurriyî û Naîrî û-Urartu de ji aliyê damezrîn, dengsazî û hevoksazî xwedîtiya ziman heye. Dema ko li navçeyêن ko herdu ziman lê bela bûyî, li berhemêن kuytûrî yên Mezopotamyaya jorîn tênen nêrîn, wê bê dîtin ko xwedeyan herdu aliya jî ripinekê tê. Ev jî daxwîyanek xwedîtiya zimanê herdu aliya ye.

Di heyama ko Hurriyî koçî rojava kirin, eşîrêن Zagros, ango Gûtiyî û Luluyî, bi eşîrêن din ciyayî ra, bi qelsketina dewleta Aqqad, layî lehiyan xwe berdana weletê Sînear. Luluyî, Gûtiyî bi daketina welatê Sînear, dewleta Aqqad ko di bin serweriya malbata Sargon de bû, di heyama qiralê vê Şar Kalî Şarrî (2214-2084) ji qada dîrokê rakirin. Ev welat xistine bin serweriya xwe. Li vî welatî 136 salî man. Bi xurtbûyina

dewleta Uruq, qiralê Utu hegâl, Gûti û luluyan i welatê xwe derxist. Eşîrêن Gûti û Luluyî vegeriyane welatê xwe ye li ciyayê Zagros. Bi çûyin û vege-rînê de di nav zimanê eşîrêن milê Zagrosê ji têvelî çê bibû. Eşîrêن ko daketî bûne Sînear, bi aweyekî farah keti bûne bin bandura zimanê Sumerî û Samîyan. Di zimanê wan-an de hêmanêن wan ziman-an cih girtî bû. Li vegerê jî bi zara awayekî têvel çûne Zagros, bi vê yekê destpêka zaraawayê milê Zagrosê ji wî heyamî ve dest pê kîrî bû.

Dewleta Babîl, di heyama qiralê wan-an şamsu Dîtana (1546-1522) de bêhavil ket. Li

hember vê bêhaviliya Babîliyê, Kassiyî di bin serokatiya qiralê xwe Kastîliaşê sêyêmîn (1571-?) de daketine welatê Babîl. Dewleta Babîl û malbata Hammurabî ko ew welat di bbbin serweriya xwe digirt, ruxandin. Li wir bi navê Kardunî de dewletek lidar kirin.

Kassiyî li welatê Babîl 576 sal man. Di taliyê de, li hember êrîşen Elam û sumeriyan bêhavil ketin. Bi ruxina dewleta wan-an mecbûrî vegerê bûn. Ew jî xwe berepaş kişandina Luristonê. Li vegerê Kassiyî bi xwe ra zimanekî têkal birine Luristen. Ev têkelî bû mebesta têveliya di zimanê wî aliyî de. zarawayê Kel-huri, Feyli, Lakî, Bextiyarî ji vê

## D A W E R :

- 1- Tarîxa Kurdistan- Cigerxwîn- Weşanên Roja Nû-Stockholm-1985
- 2- Her yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dîlbîlîm 1, sahîfe:81-82
- 3- age., sahîfe:107
- 4- Kültürel Çevrebîlîm Açısından Güneydoğu Anadolu ,Prof.Dr.Sirri Erînç, İst.Uñ.yay.
- 5- Sumer Dîlî ve Gramerî cîlt1, Sumerce'den Örnekler. Prof.Dr.Mebrûre Tosun, Prof.Dr.kadriya Yalvaç, sahîfe:67-162. T.T.Kur.Yay. 1981
- 6- Sumerce Dîlbîlgîsî- Nâfir Aydin'in yayınlanmamış çalış.
- 7- Van Bölgesinde bulunmuş Yeni Urartu yazıtları. Dr.Phil.A.M.Dinol-E.Kavaklı,Ed.Fak.Yay. 1978
- 8- Türkiye Halkının İlkçağ Tarihi- Prof.Dr.Bîlge Umar, sahîfe:17-21, Ege Ün. Yay.-1982
- 9-Hîrit Hîyeroğlîf metînlerde Tanrıça Hepat. Prof.Dr. H.Th.Bossert çev:U.B.Alkim, Belleten, cîlt:XV. sayi:59, T.T.Kur.Yay.
- 10- Eskî Önasya'da Ehîl Atin Tarihi, Doç.Dr.Füruzan Kinal, Belleten; Cîlt: XVIII. sahîfe:66, T.T.Kur.Yay, Ankara:1953
- 11- Çîvî yazılı kaynaklara Göre Türkçe- Etîcî-Hurriçe Arasında Bağlar, Dr.Mustafa Selçuk Ar, sahîfe:616-547, T.T.Kur. Yay. Ankara-1994
- 12- her yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dîlbîlîm 1. sahîfe:145
- 13- 1-Dogu Anadolu ve Urartular, Prof.Dr. Aîif Erzen, T.T.Kur.Yay.Ankara
- 2- Urartuların Dilleri ve Kökenleri, Prof.Dr. Kemal Balkan, Belleten XLXII. sayi:191-192, T.T.Kur.Yay.-1984
- 3- Eskî Doğu ve Ege Tarihinin Ana hatları, Dr.Arif Müfid mansel, E-ed.Fak.Yay., İst01945
- 4- Kürt Kökeni Büyük Boylar, W.Torî-N.Torî, Koral Yay. İst-1991.

## Di dîrokê de dilê jiyana kurdan

Bi piranî me dîroka mirovahiyê di pirtûkên fermî yên bi tirkî de xwend. Ji xwe li gorî wan pirtûkan kurd tune bûn an jî qewmeke tirk bûn!

Dixwazim çend xêzan ji dîroka kurdan bibîrbixim talî li ser hinek nexşenê heyî rawestim.

Kurd ji tevî mirovahiyê bûn. Ta gund û welatê xwe ava kirin. Navê welatê wan “welatê di navbera du çeman de”, mezopotamya bû. Ji ber ku mezopotamya cihekî pir gewr û dewlemend bû biyaniyan dixwestin vegirin. Ev jî bû sedemê bin destiya kurdan. Belê sedem bi tenê ne ev bû.

Kurd vekişiyân ciyan. Bi tevî mezopotamyayê welatekî wan yê mezin hebû. Kurd nebûn xwedî dewlet. Dewleta hate ava kirin jî temenê wê kin bû. Serê kurdan di xire cirê de bû. Bê dijmin rêvehbirêñ kurdan jî zorbeg bûn. Mirovahî pêşde diket lê haya kurdan ji zanînê nînbû.

Tu car febriqeyên me tunebûn. Em ji bo xwe û ji bo welatê xwe nexebitîne. Zanîstê wekî welatên serbixwe sûd û kelkê negihand me. Ferma na me di destê dagirkeran de bû. Belê me ji şaxêñ şaristaniyê yên pêşverû tu kelk wernegirt lê mirovahiyê gelek sûd ji şaristaniya mezopotamyayê wergirt.

Bi kurtasî welatê me bi hezaran salan di şînê de bû, şara reş girêdabû. Li her deverên welêt qûçêñ şermazerî hebûn. Em ketibûn rewseke wi-sa, jiyana berxik an jî karikekê ji jiyana me birû-mettir bû. Di dîrokê de (di pêvajo yê de) dilê jiyana kurdan dîsa welatê kurdan û sirûşt bû.

Dîtina pere (dirav) ji bo mirovahiyê gaveke girîng bû. Lê tu esrî çavêñ kurdan bes li diravan nediket. Hêj jî wisa ye. Li devera Serhedê bi piranî ew ji bo şekir, çay, derman, hin feraq û cilan gundi hewceyî diravan dimînin. Berxik, rûn û toraqê difroşin.

Kurd destgirtî ne. İro xaniyek ji betonê încax bi milyarekê lira tê lêkirin. Gundiyên kurd avahiyên xwe bi keviran lê dikin, çend dar û bi axê seri lê digirin. Ango kurdan di vê sedsalê de, hêj cihekî bi tendurîstî peyde nekiriye.

Dîsa li serhedê ji ber serma zîvistanê hin tamatiyên xwe ji bo neşewitin di çalêñ binerdê de vedîşerin. Bi nermokê (axa spî) alav û fereqan dişon. Axê dişewitînin dikin bin dergûşan û

dipêçin.

Van metod û şax yên kevnare ne, lê kurd ji necariyê hêj jî didomînin. İro istatistikê bê çeki-rin dê bête dîtin ku mirovê kurd 45-50 sal e. Anglo ji sedî pêncî kurd zû dimirin.

Belê ji ber ku kurd bindest bûn haya wan ji zanînê û teknikê nebû, pir kul û eş kişandin. Hevdû jî pir eşandin. Rastiya dîroka vî gelî ye; ji ber henekan, ji ber pevçûnên zarokan, ji ber gevşeye giha... bi hezaran mirov hatine kuştin.

Lê di van bextreşîyan de roja me jî hat. Şara reş bi hêza gerîla li ber bayê azadiyê difire. Tu kes bi qasî me ne tiyê zanînê ye. Zanîn dameya şirîk e, pêşdeçûn e, şahî ye, serfirazî ye, serkefti ne...

### JÊRENOT:

Dixwazim di derbarê kovara yekemîn de hin nîrîn û pêşniyarêñ xwe pêşkêşî we bikim.

Min niha pesn dinivîsîn lê gotineke me hat bîra min ez dê wê bibêjim: “Zend ronahiya çavêñ me ye”

Belê Zend jî, ji gavêñ dîrokî yek e. Bi rastî xebateke bi rîkûpêk e. Kovar têr û tije ye.

### Pêşniyar:

1) Divê wergêr, an jî nûser bi serê xwe (bi tenê) peyvan çênekin.

### Mînak:

“... zêdedestxistinê (arti ürün)” rp.12

“... zêdeçêkirinê (arti ürün)”! rp. 13

Gelê me di her warî de bi jiyanekî bi rîexistînî bi ser ket. Ev ji tête vê wateyê ku di warê hûner, ziman, lêgerînan de jî xebatêñ şirîkahî (kollektif) baş bi ser dikevin.

Ez dê çend mînakin din jî bidim bes e dewre we gotiye em dê di kovara duyemîn de dest bi redaksiyonê bikin.

### Ji kovarê:

“tevayî (kollektif)” rp. 12 şirîkayî

“hestekvirê tûj” rp. 12 kevirhesteyê tûj

“kontrolkirina agir” rp. 12 zevtkirina agir

“îklîma (nebas)” rp. 12 herêm

“Dêmezinatîyê-malmezin” rp. 13 rêberî-desthilatdarî

“Gîstanê” rp. 13 gîşti-gîş

“devçem” rp. 13 berçem

“ferdîbûyî” xebatêñ bi serêxwe, kesî, kesane

“Gera (çap)” rp. 16 çepil

“germa laş bi rêk û pêk bilind dibe”.. rp. 4 şewat bilind dibe.

"(Di kurdî de germ weke "sıcaklık" a tirkî, tîn weke "ısı" ya bi tirkî tête bikaranîn)

"Koma (Jixwe çûn)" Di kurdî de koma "di ber mirêne de" ye.

"kelija wan" rp. 24 hikariya wan, bandora wan

2) Hûn jî baş dizanin ji hêla teknikî ve pêvajo û dem girîng e. Hûn cih bidin nivîsên derbarê welatên wek me bindest û dîroka wan (pêvajoya xelasîyê) dê bas be.

3) Nivîsên civakî (sosyolojîk), nivîsên derbarê kesayetiya mirovê kurd wê xwendevan gelek sûdê jê wergirin.

Silawên şoresgerî ji we û hemû xebatkaran re...

Cihan Roj

## *Hevalên Birêz Yê Xebatkar û berpirsên ZEND'ê*

Berîya hertişti ez silavên xwe yên germ li hemî xebatkarên kovarê û xebatkarên Enstituyê dikim. Bi derketina kovara ZEND'ê ez geleki dilxwêş bûm.

Bi rastî têkiliya me (yê li welêt dijîn) û Enstîtuyê tune bû. Ew derfeta me ji tune bû ku em zêde yan jî salê carekî bêne seredana we. Tenê me agahiyêne we di rojnameyan de bi avayekî kurt dibihîst. Belê bi vê kovarê wê tekiliya me hîmê xwe deyne.

Ev kovar, valahîyek pir mein ku di zimanê kurdi yê niviskî de heye tijî dike. Ev xebateke pir mezin. Bila dost û dijimin gişk zanibin ku zimanê kurdi zimanê zanistîye jî.

Lêkolîna min, ku min li ser kovarê kir, bi rasti ez birim dînyake din û pir kêfa min hat, û min ji xwe re got çîma ne matematîk a bi kurdi, çîma ne fizika bi kurdi û çîma ne pirtûkên zanistîyêne bi kurdi? Heke zanistê kurd û nivîskarêne kurd hewl bidine xwe wê fizîk û matematîk jî bi kurdi bikarîbin binivîsinin.

Belê... ev kovarek e nû ye ji bo wê yekê kêmâsiyê wê; li ser rîzman, teşe û qalîteyê henin, lê wê di hejmarêne pêş de em bawer in ji holê rabin. Mînak, bi zimanekî sivik bê nivisandin ku ji bo-

na herkes bi xwîne. Di warê wergerê de divê bi kurdi bê fikirandin.

Ji bona ku zimanê zanistî xwendevan hîn bibin, divê ferhengokek di rûpelekî de cih bigire.

Divê rûpelek an du ji xwendevan re bê veqetandin û têkili bi xwendevan re bê danîn. Ji bo ku her xwendevanek bibe berpirsek an nûnereki kovarê. Ev yek ji bo firotin û belavbûna kovarê bas e.

Hevalên birêz, ez bi piranî li ser çîrok, pêkenok û yê wekî wan dixebeitim. Ji ber wê yekê jî a niha tu nivîsên min tune ne ku di ZEND ê de bê weşandin. A niha li Mêrdinê deh heb rojname tên firotin. Lê em hewl didin ku hîn zêde bibe. Ci alîkarî ku ji me bê em, ê bikin.

Berê Azadiya Welat dû re jiyanâ Rewşan û niha jî Zend. Wekî sê reh ku ji jiyanâ mirov. Ji bo wê yekê jî emê bi hisret li benda kovarê bin.

Dîsa bi silav û rîzin xwe ez serkeftinek bê sînor ji we re dixwazim.

Hûn hemî bimînin dixwesiyê de.

Çiya Mazî / Mêrdin

## *Berpirsiyarên Kovara Zend yên birez...*

Dema we tevan xweş be...

Min di hejmara dawîn a Kovara NÜDEM ê de xwend ku we kovara Zend derxistiye... Ez dilxwazekî ziman û wêjeya kurdi yê ji dil destêne we dihejinim û pêşketinê bo we û Zendê dixwazim.

Ez jî di kovara Nûdemê de dinivîsim û nivîsên min di hin kovarêne kurdi yên din de jî derketin, nivîsên xwe bi navê Mervanê Keleş imzedikim û ji bo ku nivîsên welêt bigîhê destê min ez ji we hêvî dikim ku kovara Zend ji hejmara yekem de bo min birê bikin û ez amade me ku buhayêne wan bo we birê bikim û ez dixwazim bibim aboneyê Zendê û ji ber wê ez hêvîdikim. Ku win mercen abonetiyê bo min bi rî bikin...

Anîha bi xatirê we û dîsan pêşketin bo Zend ê dixwazim



Silavên min yên germ bo we diyarî ne...

Birayê we

Mervanê Keleş

## Li Çanda Xwe Xwedî Derkevin

Komîsyona Folklorê ya li Ensîtuya Kurdî ya Stenbolê hatiye damezrandin xebatên xwe yên li ser berhevkirina berhemên edebî yê devkî û berhemên çandî yên din dewam dike. Ji xwendevan û têkildarên ji gel ên ku li ser berhevkirina destan, efsane, çîrok, gotinên mezinan, henek, qinik, lîstikêñ zarokêñ, dîroka devkî, xwarin û vexwarinêñ herêmî, kinc û edetêñ gelê kurd dixebeitin, xebatên xwe bi kaset, dîsket, nivîskî an jî bi wênen li ser mijara xebatê, bi awayekî bigihînin Enstîtuyê û li vir ji mirinê xelas bikin em dê bextewer bibin.



## Hûn Jî Peyvekê Li Ferhenga Xwe Zêde Bikin

Xebatêñ komîsyona Ferhenga Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê didome. Heke hûn kanibin peyvîn xwe yên herêmî, yên hûn difikirin ku di ferhengêñ heyî da tune ne, ji me ra bisînin, hûn dê jî peyvekê li Ferhenga xwe zêde bikin.

**Navnîşan :** Enstîtuya Kurdî  
Ceylan Palas Apt. No: 154 / 12  
AKSARAY / İSTANBUL  
**Tel :** 0212 527 19 11  
**Fax :** 0212 527 61 49

